SERXWEBÛN

JI SERXWEBÛN Û AZADIYÊ BI RÛMETTIR TIŞTEK NÎNE

Sal: 43 / Hejmar 511 / Tîrmeh 2024

# Xeta Serkeftinê, 14'ê TÎRMEHÊ

## Berxwedana 14'ê Tîrmehê Dîroka Azadiya Kurdan Da Destpêkirin

Divê em jibîr nekin ku ev şoreşgerên her roj xwe parçe parçe helandin û xistin nava têkoşînê, tu tişt ji bo armancên xwe yên ferdî û berjewendiyên xwe nekirin. Ji bo xwe xilas bikin an jî neçarî wê bûn jî nekirin. Tenê ev rastî dîtin, rêya jiyanek rast û mirovî di têkoşîna li dijî faşîzma 12'ê Îlonê re derbas dibe. . Ji bo vê jî hebûna xwe ya fîzîkî danîn holê û têkoşiyan. Ji kûr de bawer kirin ku dê Kurdistana azad ava bibe, dê li Kurdistanê jiyanek azad û mirovî çêbibe, teqez dê ev bi ser bikeve.

**Dûran Kalkan** *Rûpel: 9*



**Fêmkirina Rastiya 14'ê Tîrmehê Di Serxistina Erkên Demê Re Derbas Dibe**

**Ji Serxwebûn** *Rûpel: 2*



### Hetanî Ku Xweparastina Jinan Nebe, Şoreşa Civakê Pêk Nayê

**Dilzar Dîlok**

Xweparastin, tenê ne rewşek welê ye ku di gotinê de îqnayê parastinê bibe. Xweparastin, bi rêxistin bûyîna xwe ve di nava girseyên herî berfireh ên jin de dixebite, xwe rêxistin dike, li dijî her êrîşê parastinê plan dike û dema ku pêdivî pê hebe bi şêweyek herî profesyonel xwe rêxistin dike û xwe bi amade kirina şerê herî dijwar ve pêktê. Cureya din tenê di gotinê de dimîne û ev jî têr nake. Bêguman gotin girîng e. Divê fikrê kar hebe û hewldana wê jî bê dayîn. Lê eger pratîk jî tinebe, yanî kirin tinebe, encama fikrî û zikrî têr nake. Bezandina baş têra nake, pêwîste xeta dawî kirinê bidî li berçavên xwe ku em vê jiyan û şerê azadiyê qezenç bikin. *Rûpel: 15*

## DÎROKA GERDÛNÎ Û ROJHILATA NAVÎN



**Rêber Apo**

Dîrok ne bi tenê ji bo civaka mirov, ji bo tevahiya pêkhatinên gerdûnî bi roleke afirîner radibe û ev heqîqetek e ku tevahiya zanistan li ser hemfikir in. Zeman pêk tîne. Rola afirandinê ya ji bo îlahan vedibêjin zeman bi xwe bi wê rolê radibe û ev yek mîna sirrekê ye. Em ji leza pêkhatinê re zeman dibêjin. Pêkhatin nebe zeman jî di çarçoveya 'tinebûnê' de ye. Xisleta wê ya sirrê bi vî awayî xwe di hişê mirov de nîşan dide. . Ji lewra rast nîne ku mirov pîrbûnê bi bandora kujer a zeman ve girê bide. Ji ber ku bandora kujer a zeman tineye, ev binavkirin jî ti qîmeta xwe nîne. Lewma mirin tineye. Mirin bîranîneke mirov e ku bi awayekî sosyolojîk hatiye avakirin. Hiseke lihevçêkirî ye. *Rûpel: 20*

### Em Stêra Moderniteya Demokratîk 19'ê Tîrmehê Mayînde Bikin

**Dûran Kalkan**

Bêguman tişta herî xeter helwest û ferasetên ku şoreşê tenê weke siyaset û rêveberiyê dibînin hene. Tu têkiliya vê nêzîkayiyê bi şoreşê re tune ye. Şoreş hişmendî û terzek ê jiyanê ye, guherîn û pêşketinek bîrdozî ye. Pêwîste em şoreşê weke şoreşa hişmendiyê, şoreşa bîrdoziyê, şoreşa terzê jiyanê bibînin û li ser vê bingehê pêş bixin.

*Rûpel: 31*

**Rastiya Rêbertî Tevgera Civakbûyî Ya Herî Bihêz Û Herî Berfirehe – 2**
**Alî Haydar Kaytan**
*Rûpel: 26*

**Şoreşa Rojava Tîrêja Rojeke Nû Ye**
**Xalîde Engîzek**
*Rûpel: 37*

**Rastiya Herî Zêde Dide Jiyîn: 14'ê Tîrmehê**
**Piling Zerdûşt**
*Rûpel: 40*

# FÊMKIRINA RASTIYA 14'Ê TÎRMEHÊ DI SERXISTINA ERKÊN DEMÊ RE DERBAS DIBE

**Ji Serxwebûn**




Em di salvegera 42'emîn de Berxwedana Mezin a Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê silav dikin. Di serî de Rêber Apo, em Roja Rûmeta Netewî ya tevayî rêhevalan, gelê xwe û dostên xwe pîroz dikin. Em afrênerên vê roja rêheval Mehmet Xeyrî Dûrmûş, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek, di kesayeta wan de tevayî şehîdên xwe yên leheng bi rêzdarî, heskirin û minet bi bîr tinin.

Em weke tevger û gel ev 42 sale li girtîgehan, çar aliyên Kurdistanê li ser Xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê û Serkeftina wê têkoşîna azadiyê dimeşînin. Weke tevger ev 40 sale li ser vê xetê şerê azadiyê dimeşînin. Têkoşîna ku bi ruhê Berxwedana 14'ê Tîrmehê re derketiye holê û jiyanî bûye, her ku diçe berfireh dibe, li ser xeta şoreşgerî radîkal dibe. Bi derketina gerîlla re şêwe û naverok qezenç kiriye. Di encama vê têkoşînê de rêhevalên di nava vê berxwedanê de cih girtine, şahidiya vê berxwedanê kirine karîne ji girtîgehê derkevin. Van hevalan li ser berxwedanê agahî parve kirine. Me destpêkê ji van hevalan girêdayî kiryarên li girtîgehan agahî girtin. Van hevalan bi awayek şênber roj bi roj biryardariya vê berxwedana dîrokî çawa derketiye holê, Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê çawa hatiye meşandin, bandora wê ya li girtîgehê, li ser van aliyan agahî dane me. Bêguman em weke gel û tevger, heta weke tevayî hêzên Şoreşger-Demokratîk xwediyê vê agahiyê ne.

Di ber ronayiya van agahiyan de em dizanin ku berxwedanek wiha di girtîgehan de çawa pêş ketiye, ev berxwedana ku dîrokek nû daye destpêkirin çawa derketiye holê, dîsa em dizanin Mazlûm Dogan bi kîjan hişmendî û biryardariyê gihiştiye berxwedanek wiha. Dîsa di ronayiya van agahiyan de Ferhat Kurtay û hevalên wî, herçar bi kîjan hestê, firkê tarîtiya girtîgehê bi agirê bedena xwe ronî kirine. Em dizanin piştî wê Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê çawa hatiye îlankirin, Kî û çawa beşdarî vê berxwedanê bûne, rewşa atmosfera ku çalakî tê de hatiye îlankirin. Îlanek wiha bandorek çawa kiriye, pêvajoya berxwedanek wiha bandorek çawa li girtîgehê kiriye, Berxwedana 14'ê Tîrmehê li hemberî hewldana xwayîn a bi navê "Kemalîstên Ciwan" têk biriye. Em vê baş dizanin. Dema rêheval Xeyrî Dûrmûş çalakiyê îlan dike, hest, ruh, derûnî, hewldan û fikrek çawa pê re çêbû, bi kîjan gotin û helwestê kete nava vê berxwedanê. Em vê jî baş dizanin. Ev nirxên ku bi fedekarî, ked, ezm û biryardariyek mezin kêlî bi kêlî hate honandin, êdî bûye mijara hûner û wêjeyê jî, bûye milkê tevayî mirovayiyê.

Bêguman ê ku Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê herî rast, bi tevayî, birêkûpêk bi wate kiriye, dahûrandiye, li ser vê bingehê nirxandinên berfireh li ser kiriye, kiriye milkê partî û gel Rêber Apo ye. Hema di her salvegerê de, di her qonaxa partîbûnê de, her ku di partîbûn û têkoşînê de rastî pirsgirêkekî dihat, hewl da dersê ji vê berxwedana dîrokî derxe. Ji ber wê jî ev berxwedan bi wate kir. Berxwedana 14'ê Tîrmehê û Berxwedana Girtîgehan a 1982'an piştgiriya herî mezin da xebatên şoreşgerî yên Rêber Apo, dîsa serkeftî meşandina xebatên derveyî welat, encamên wê veguhestina welêt, bi Pêngava 15'ê Tebaxê re bi pêşengiya PKK'ê pêşxistina Şerê Azadiya Kurdistanê. Ev 42 sale me weke partiyê hewl da vê berxwedanê rasttir fêm bikin, binirxînin. Li ser wê bingehê di her salvegera wê de, li her qadên têkoşînê yên pêwîst me hewl da xwe biguherînin û veguherînin. Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê hertim rê nîşanî têkoşerên Têkoşîna Azadiyê û gelê welatparêz da, hêzek mezin da.

Ev bi rojane li ser vê li qadên cuda nirxandin çêdibin. Bi boneya salvegera 42'emîn jî hema bêje tevayî rêxistinên me, rêveberiya navendî daxuyanî dan. Li ser vê bingehê nirxandin û nîqaş pêş dikevin. Ji bo em encamên têkoşîna em di nav de ne dahûrînin, ji bo serxistin erkên xwe dersên şoreşgerî ku divê bên derxistin, li ser bingehê Berxwedana 14'ê Tîrmehê lêpirsînek rexne-rexnedayînê tê jiyîn. Şehîdên wê tên bîranîn, hewl tê dayîn ku şehîdan fêm bikin. Ji bo Ruhê Berxwedana 14'ê Tîrmehê zindî bê hiştin û bi awayek herî bihêz veguhêzin pratîka me ya îro çalakî tên lidarxistin.

### Her tiştê PKK'ê di Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê de heye

Di rastiyê de Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê biryardayîna berxwedana ji bo azadiyê îfade dike. Dibe biryara berxwedanek fedayî û destpêka pêkanîna wê. Ji ber wê Rêber Apo ji vê berxwedanê re pênaseya "Çalakiyeke ku di her alî de nûnertiya Xeta Partiyê dike, tevayî û têrker e" kir. Yanî her tiştê PKK'ê di vê çalakiyê de heye. Ji ber ku eger yek bizane lê bigere, bixwaze lê bigere dê rastiya Partiyê bi hemû aliyê wê ve di Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê de bibîne. Dê di ruh, hişmendî û sekna bîrdozî-rêxistinî de bibîne. Dîsa dê di xeta çalakiyê, cesaret û fedekariyê de bibîne. Ev berxwedan hem rastiya pêngava herî bihêz a partîbûnê îfade dike, hem jî li hemberî rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê ji bo azadiyê biryara berxwedana fedayî dide û vê biryarê pêk tîne. Di vî alî de 14'ê Tîrmehê ji bo azadiyê biryara berxwedana bi fedayî dide û pêk tîne. Biryara ku divê wateyê de pêk hat, di 14'ê Tîrmeha 1982'an de li girtîgehê hat dayîn. Em weke Tevger û gel ev 42 sale hewl didin vê biryarê pêk bînin. Rêber Apo ji bo Berxwedana 14'ê Tîrmehê wiha gotiye, "Ji bo meşa ber bi azadiyê ve pireke ku bingehê wê bi saxlemî hatiye danîn. Ji ber wê jî gelê me dikare bi cesaret di ser vê pirê re bimeşe û beşdarî meşa azadiyê bibe û pirê derbas bike".

Bi rastî jî partî, civak bi vê hişmendiyê hat perwerdekirin. Ev 42 sale li ser bingehek wiha bi vê hişmendiyê dimeşe. Eger baş lê binêrin dê bê dîtin ku, 42 sale tevayî pêşketinên li Kurdistanê bi navê azadiyê çêbûne, di bingeha wan de Berxwedana Mezin a 1982'an, Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê heye. 14'ê Tîrmehê beşeke ku Berxwedana Girtîgehê ya 1982'an gihand serkeftinê û ew temam kir. Her tişt li ser vê bingehê pêş ket.

Di rastiyê de Pêngava 15'ê Tebaxê li ser vê bingehê çêbû. Gerîlla xwe spart vê, li ser pêkanîna biryarek bi vî awayê derket, pêş ket, Şoreşa Vejîna Netewî, Şoreşa Azadiya Jin, bi temamî pêşketina tevgerên jin û ciwanan, tevayî gavên bîrdozî, rêxistinî û çalakgerî li ser vê bingehê hatin avêtin.

Di rastiyê de guherîna paradîgmayê jî xwe spart vê têkoşîna mezin û pêk hat. Ji ber wê jî bêguman di bingeha wê de jî Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê heye. Di roja me de Şoreşa Rojava tê jiyîn. Têkoşîna Azadî û Demokrasiyê ya li çar parçeyên Kurdistanê li ser bingehê xeta azadiya jinê tê meşandin ji tevayî mirovayiyê re dibe çavkaniya hêviyê, ronî dike, kelecanê ava dike, pêşengiyê dike. Hem jî di demeke ku Yekîtiya Sovyetê hilweşiyabû, hêvî û coşa ji bo hişmendiya demokrasî û sosyalîzmê şikestîbû, ev pêk hat. Dîsa civakeke ku pergala modernîteya kapîtalîst tune hesibandî, ji bo tunekirina wê civakê sed sal di qirkirinê re derbas kirî, bi Berxwedana Fedayî ya 14'ê Tîrmehê re li ber xwe da û bi ruhê serkeftina vê berxwedanê têkoşiya û ji mirovayiyê re dibe hêvî. Ji mirovayiyê re dibe çavkaniya coş, moral û kelecanê. Bêguman ev bi serê xwe girîngiyek pir mezin hildigire.

Di rastiyê de pirsa ku divê bê pirsîn ev e: Eger berxwedaneke bi vî awayî nebûya dê çi bibûya? Eger em Berxwedana 14'ê Tîrmehê rast û têrker fêm bikin, bi boneya vê salvegerê xwe lêpirsîn bikin, li ser bingehê pirsek wiha em dikarin bigihîn bersivên herî zelal. Bi rastî jî em bizivirin û li beriya 42 salan binêrin, eger berxwedaneke wiha çênebûya dê çi bûya? Dê rastiya PKK'ê û Rêbertiyê çawa çêbibûya? Dîsa dê rewşa gel û herikîna dîrokê çawa çêbûya? Li ser vê bingehê van pirsan em dikarin bibînin û fêm bikin ku pêşketinên Berxwedana 14'ê Tîrmehê derxistine holê, çawa dikarin jiyanek nû ya civakê ava bikin.

Ji ber ku ketine girtîgehê ev berxwedan derketin holê, bêguman nirxandinek bi vî awayî tune ye. Bi rastî jî herkes dikeve girtîgehê. Ne tenê kadro û sempatîzanên PKK'yî dikevin girtîgehê. Beşên muxalîf ên li hemberî rejîman jî dikevin girtîgehê. Wê demê jî ketine girtîgehê. Di pêvajoya rejîma 12'ê Îlonê de li Tirkiyê û Kurdistanê tevayî tevger di astên cuda de hatin girtin, xistin girtîgehan. Ji aliyê rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê ve hatin darizandin an jî hewl dan darizînin. Lê piştî vê pêvajoyê têkoşîn kûr bû û berdewam bû. Tenê têkoşîn di kesayeta PKK'ê de pêk hat. Ji ber ku ew tevger tevayî di girtîgehan de xilas bûn û wisa derketin. Navê wan jî nehat qalkirin. Ev tenê bi serê xwe têrê dike ku Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê bê fêmkirin. Ji ber wê jî gelek tevgerên ku wê demê nekarîn li hemberî rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê li ber xwe bidin, taybet jî tevgerên bûrjuvaya biçûk li Kurdistanê heliyan û têk çûn, di encamê de radestî dijmin bûn. Ev rewşa ku ketine navê de xistin stûyê Rêber Apo û PKK'ê û hewl dan xwe jê xilas bikin. Bêguman ev ne rast bû. Sekn û helwestên wan ên li girîgehan ew xistin vê rewşê. Ji ber wê jî yê ku di girtîgehan de li ber xwe nedan, ji derve jî nekarîn tiştekî bikin. Li hemberî vê jî PKK'ê di girtîgehan de li dijî rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê li ber xwe da. Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê derxiste holê. Ji ber wê jî têkoşîn, fedayîtiyek di vê astê de, şerê azadiyê yê bênavber ku 40 sale didome derxist holê.

Pêwîste hema wisa nebêjin rojiya mirinê û greva birçîbûnê û derbas nebin. Gotina wê hêsan e lê pêkanîn ne ewqas hêsan e. Destpêkirina greva biçîbûnê ne hêsan e lê bidawîkirin zehmet e. Dema ji derve de lê dinêrin pir hêsan e, dibe ku weke çalakiye rihet bê pêkanîn bê dîtin. Lê rastî qet ne wisa ye. Rojiya mirinê tê wateya di her kêliya rojê de, her çirkeyî de, di nava çalakiyê de îfade dike. Berdewamiyek wiha digre nava xwe. Rêber Apo digot, "Dibe nebin barûteke yek carî tê bikaranîn". Rêber Apo digot pêwîste nebin barûtek yek carî tê bikaranîn, pêwîste enerjî û hêza xwe dilop dilop biherikînin. Terzê Apoyî ev e. Ji ber wê jî terzê 14'ê Tîrmehê, tevayî aliyên terzê têkoşîna Apoyî dixe nava xwe. Di her mercê de derdixe holê ku têkoşîna azadî û demokrasiyê tê meşandin û qezençkirin. Têkoşînek wiha ne girêdayî derfetên madî ye, ispat dike ku karê hişmendî, bawerî û vînê ye. Ji ber wê jî hertim ronî dikin.

Di rastiyê de hem gotinên çalakgeran ên di dema îlankirina çalakiyê de, hem jî berxwedêran bixwe her tişt bi awayek zelal danî holê. Erê, ji bo bê fêmkirin dikarin li ser kûr bibin, li ser wê bingehê nîqaşan bimeşînin û bidin meşandin. Dibe ku sûdê bi xwe re bîne. Lê weke ku ji nû ve Emerîkayê keşif dikin, hewldana fêmkirina Berxwedana 14'ê Tîrmehê, gelek gotin kirin zêde ne bi wate ye. Jixwe vê berxwedanê bixwe her tiştên bên gotin bi awayekî zelal bi pratîka xwe danîn holê. Herkes dikare fêm bike. Eger bê xwestin her çav dikare bibîne, her guh bibihîse û her hest fêm bike. Eger hinek ruh, hişmendî û rûmeta azadiyê hebe dikare bi rihetî bigihe wê berxwedanê.

Di wê alî de jî ne ku zêde qalkirin, pêwîste rast fêm bikin û bi serkeftî nûnertiya wê bikin, pêk bînin. Helwesta şoreşgerî ev e. Ji ber wê jî eger em encam û wateyekî ji Berxwedana 14'ê Tîrmehê ya 42'emîn derbixin, tenê dikarin li ser rastiya berxwedanê vê bikin. Nabe em bi nêzîkayiyên nehatine îfadekirin, fêmkirina wan zehmet vê pêşwazî bikin. Eger em wisa bêjin emê şaştiyan bikim û rast nêz nebin. Di wî alî de jî ji bo ku di her kêliyê de, her demê de, li her cihî xeta têkoşînê û partiya rast bibînin, ev berxwedan pîvaneke bingehîn e. Pîvaneke ku hertim rê nîşan dide, hêzê dide, bawerî, hişmendî û coşê dide, dihêle ku em rastiyan bibînin.

Di vî alî de jî partî û berxwedan çiye, tevlîbûna rast a ji bo xeta partiyê û Rêbertiyê çi ye û çawa çêdibe? Pirs û nîqaşên, gelo ev dibe yan nabe, dema rastiya berxwedanek wiha hebe zêde tiştekî îfade nakin. Rast nêznebûyîna berxwedanê ye. Pêwîste wiha nebin. Halbûkî çalakiya 14'ê Tîrmehê bixwe rastiyek evqas şênber û zelal îfade dike. Yên ku van tiştan dikin bi zanabûn dikin. Pir baş dizanin ku çi dikin, gaveke çawa diavêjin û encama wê çi ye. Ji ber wê jî dema di destê me de sergûzeştek wiha heye, ne mijara gotinê ye ku em encamên rast dernexin û bi awayek serkeftî nûnertiya wê nekin. Pêwîste em rastgo bin. Eger wateyek polîtîka ya têgîna rastgobûnê hebe, pêwîste herî zêde di bûyerên wiha de, di fêmkirina Berxwedana mezin a 14'ê Tîrmehê de rastgo bin. Ji ber wê jî pêwîste rastiya PKK'ê û Rêbertiyê bi vî awayî fêm bikin. Rastiya bingehîn a xeta bîrdozî-rêxistinî-çalakîgeriyê û ya PKK'ê dike PKK ev e. Heman demê de ev rastî rastiyek wisa ye ku bandora wê hertim berdewam e, hertim zindî ye û qet nûbûna xwe winda nake.

## Li gel ku 42 sal di ser vê berxwedana mezin re derbas bûye jî bandora wê qet kêm nabe

Niha em di salvegera 42'emîn a vê berxwedana mezin de ne. Li gel ku 42 sal di ser re derbas bûye jî weke nû çêbûye bandorê li me hemûyan, tevayî civakê, heta li tevayî hêzên şoreşger-demokratîk, lêgerînvanên azadî û demokrasiyê, her kesê agahiya wan jê heye dike. Eger em baldar bin qet kêm nabe û bandora wê kêm nabe. Yek ji pîvanên mezintiya çalakiyê jî ev e. Di salvegera 42'emîn de jî wiha ye. Yên ku dixwazin wate û encaman ji vê derbixin, dersên pir mezin ên vê berxwedanê hene. Dikarin ji her cûr pirsgirêkan re çareseriyê bibînin, dikarin her cûr erkan ser bixin. Yên ku dikarin wan dersan derxin teqez dikarin her cûr zehmetiyê derbas bikin. Dikarin her cûr erkê li her derê bigihînin serkeftinê. Zehmetiya erkên şoreşgeriyê, kêmbûna derfetan, sernexistina erkan, teqez nayê wateya ku bi ser nakevin.

Ji ber wê jî pêwîste ev sekna mezin a lehengiyê tenê bi pênasekirinê re sînordar nemîne. Pêwîste em li ser berpirsyarî û erkên vê seknê daye ser milê me lêhûrbûnan çêbikin, li ser vê bingehê ser bixin. Vê seknê ji xwe re esas bigirin. Di vê wateyê de, em di wê baweriyê de ne ku di sala 43'an a berxwedanê de rewşa li cîhan û Kurdistanê, li ser vê bingehê çi erk û berpirsyarî li ser milê me ne, emê çû û çawa bikin, dema em baş li ser bisekinin dê sûdwertir be.

Di vê mijarê de em hertim di nava ked û nîqaşê de ne. Ji ber wê jî em hewl didin fêm bikin ku çi bûye. Di vê çarçoveyê de em dibînin ku li tevayî cîhanê hema bêje tevayî dewlet hilbijartinan pêk tînin û rêveberiyên xwe nû dikin. Ji ber wê jî eger sala 2024'an sala nûkirina rêveberiyan be, wê demê gelo dê di sala 2025'an de çi çêbe? Bêguman dê rêveberiyên nû polîtîka û lêgerînên nû bînin rojevê. Wê demê dê pêşketinên ku bandorê li Kurdistanê, herêmê û cîhanê bikin çêbibin. Gelo dê ev pêşketin çawa bin? Di vê wateyê de pêwîste em sala 2025'an weke salek ku pêwîste ji gelek aliyan ve xwe jê re amede bikin binirxînin. Eger em wiha bikin dê şaş nebe. Eger em nekin emê şaştiyê bikin.

Hinek dewlet jixwe dê bi awayekî rûtin di vê salê de hilbijartinên xwe bikirina. Hinek jî ji ber sedemên cuda hilbijartinên pêşwext dikin. Yek ji dewletên ku dê bi awayekî rûtîn hilbijartina xwe bike jî DYE ye. Niha bernamzet zelal dibin. Ji bo DYE yê ev sal sala hilbijartinê ye. Herkes jî xwe li gorî vê pêvajoyê plan dike, vê pêvajoyê dişopînin. Ji ber ku pêwîste hema nebêjin DYE yû derbas nebin. Rêveberiya ku ji hilbijartinê derkeve tenê DYE yê rêve nabin, ji herkesî zêdetir bandorê li rêveberiyên cîhanê dike. Ji ber wê jî bi DYE'yê tenê re sînordar nîne, em qala pozîsyonek ku tevayî cîhanê eleqeder dike dikin.

Di pêvajoya ku nîqaşê piralî li ser hilbijartina DYE yê tên kirin de, bûyereke ku van nîqaşan germ dike hat jiyîn. Li hemberî namzetê partiya Komarperest Trump hewldana sîwqastekî çêbû. Her çendî Trump bi birînên sivik xilas bibe jî, ji ber bûyerê kesek mir û du kes jî giran birîndar bûn. Bêguman ev pir cidî ye, bûyereke ku bi armanc û plansazî hatiye kirin. Ne bûyereke ku bi sedemên derveyî siyasetê bê îzahkirin e. Di rastiyê de beriya vê bûyerê hîn zêdetir çawanî û temenê bernamzetan mijara nîqaşê bûn. Di cîhana roja me de tenê DYE yê dikarî du bernamzetên 80 saliya xwe derbas kirî yan jî ber bi 80'î ve diçe weke namzet nîşan bide.

Ev di aliyê kevneşopiya DYE yê de tiştek nû ye. Dîrokek çendsed sal mijara gotinê ye. Ne wisa pir kevin e. Eger îro di cîhanê de gihiştiye vê astê para vê nûbûnê tê de heye. Pêşketinên dawî yên di pîşesaziyê de bi awayekî lez pêk anî û bandorek mezintir çêkir. Karî çêkera xwe ya leşkerî, teknîka xwe pir bihêz bike.

Pergala Îngilîzan kal bibû. Ji bo ku pêşengiyê nede dewleta Elman a weke DYE yê ciwan e, di herdû şerê cîhanê de li ber xwe da, li dijî vê derket, şer kir û di encamê de cendirmetiya

cîhanê bi dilxwazî dewrî DYE yê kir. Niha bi hev re pergalê rêve dibin. DYE yê di pêvajoya derbasbûyî de bi Yekîtiya Sovyetê re kete nava cemserbûnekî. 40 salan pêşengtiya Cemsera Rojava kir. Ev tişt li ser vê bingehê çêbûn. Dînamîk, bihêz bû. Dema ku ji ber şerê navxweyî yê Ewropayê merc jî guncaw bûn firî û derkete pêş.

Niha dema li van hilbijartinan dinêrin di rastiyê de tê dîtin ku kevin bûye. Zehmete ku ew DYE ya nû û dînamîk bibînin. Pir perîşan bûye. Li aliyekî perîşanbûn, kevinbûn, teşhîrbûna modernîtya kapîtalîst, zorlêhatina li hemberî têkoşînên alternatîf temsîl dike. Li aliyê din jî dide nîşan ku ew bixwe kevin bûye. Ev hilbijartin û nîqaşên li ser namzetan li ser vê bingehê pêş diketin. Di navbera du kesên li cihê xwe nasekinin, nizanin li ku çi bikin pêşbirka hilbijartinê kirin, ketine rewşa hilbijartina rêveberiyê. Cîhanê ev nîqaş dikir. Herkesî hewl dida ji aliyê xwe ve fêm bike.

Weke me anî ziman rêveberiya DYE yê di astek bilind de tevayî cîhanê bandor dike. Ji ber wê jî herkes weke ku ji xwe re rêveberiyê hildibijêre dinirxîne. Nerihetiyên ku vê rewşê ava dikin hene. Niha îja xwîn kete mijarê. Ji ber wê jî yên dibêjin dê li DYE yê şerê navxweyî çêbibe jî hene. Helbet gelo rewş ewas bi rakêşe em nizanin. Aliyên faşîst-netewperest-nîjadperest hewl didin hişmendiyek “Çepgirên tundrew vê dikin”. Taybet jî Trump pêşengiyê ji vê re dike. Hewl dide cihekî pêşengiyê ji xwe re çêbike.

Demokrat û Komarperest, partiyên ku pergala dewleta DYE yê rêve dibin in. Her çendî di polîtîkayên wan de cudayiyên wan hebin jî, bi esasî xwe weke erkdarê pêkanîna pîvanên dewletê dibînin. Ne di wê çawaniyê de ye ku dijberî dewletê derkevin an jî dewletê biguherin. Cudayiyên di navbera wan de di wê astê de ye.

Niha kê ev êriş pêk anî, dê encamên rewşa niha çi bin? Dê hilbijartina DYE yê çawa bin? Hinek jî dê biencambûna salê û polîtîkayên sala 2025’an, nirxandinên bi hûrgulî dê li gorî encamên hilbijartina DYE yê bên kirin. Nêzîkayiya di herkesî de xuya dike li ser vê bingehê ye. Bûyera dawî dê rê ji çi re veke nayê zanîn, lê gelek derdor jixwe li rewşa Biden dinêrîn û diyar dikirin ku dê Trump qezenç bike. Niha wisa xuya dike ku dê ev meyl bihêztir bibe. Di derdorek wiha rakêşayî û pevçûnî de dê careke din rêveberiyek Komarperest bê ser desthilatê. Gelo dê pêkanînên li DYE û cîhanê çi bin? Rewşek wiha dê rê ji çi re veke? Helbet herkes li ser bingehê van pirsan rewşê dinirxînin û dê hewl bidin polîtîkaya xwe diyar bikin. Em weke tevger hewl didin binirxînin, bibînin û fêm bikin.

Li ser vê bingehê dikarin vê bêjin: Trump di bin navê “Destpêkê Emerîka” de polîtîkayeke hîn zêdetir hindirîn û teng dişopîne. Demokrat hîn zêde gerdûnî û bi belavbûnê re hewl didin bi bandor bibin. Bi gelemperî jî sekna wan wisa ye. Di nava 4 salên Rêveberiya Biden de jî xwestin vê bikin. Taybet jî vekişîna ji Efxanistanê, Şerê Ukraynayê, li ser vê bingehê pevçûna bi Rûsyayê re, ji nû ve sazûmankirina NATO’yê, li aliyê din avakirina rêya enerjî û bazirganiyê ya ji Hindistanê heta Erebîstana Siudî, ji Israîlê heta Qibris-Yunanistanê, li ser vê bingehê şerê Xezayê, ev 9 mehe pêşketinên li Rojhilata Navîn hebûn. Heman demê de li pasîfîkê rakişandinek pêş xistin ku Çîn û Taywan anîn pêşkerî hev. Bêguman meylên ku vê kûrtir bikin hene. Trump li dijî van derdikeve. Taybet jî îfade dike ku bi Şerê Ukraynayê re pevçûnên bi Rûsyayê re ne bi wate û rast in.

Di nêzîkayiya ji bo Rojhilata Navîn de xaleke ku wisa pir cuda tune ye. Lê dema polîtîkaya ber bi hindir ve serwer bibe, dê neçar bimîne ku hebûna li cihên cuda bipejirîne. Em vê di nêzîkayiya Rojhilata Navîn de dibînin. Di vê wateyê de polîtîkayên Trump hîn zêdetir teng û statukoyî ne.

Pêvajoya hilbijartinan a li Ewropayê jî didome. Hilbijartina esasî li Îngiltereyê çêbû. Ev demeke Îngiltere di salekî de çend caran hilbijartinê dike. Di vê hilbijartina dawî de Partiya Karkeran bi tena serê xwe bû desthilat. Wisa xuyaye herî kêm dê demekî ev hikumet li ser kar be. Li Ewropayê jî hilbijartinên Parlementoya Ewropayê gelek hilbijartinên pêşwext xistin rojevê. Di hilbijartina Ewropayê de partiyên nîjadperest-neonazî gelek deng girtin. Li gelek welatan gihiştin rewşa partiyên yekemîn. Vê jî guhertina desthilatê anî rojevê. Di vê mijarê de herî zêde Fransa bi tevger e. Macron jî ji bo pêşiya vê bigire hinek teqtîk pêş xistin. Hem ji bo ewlehiya olîmpiyatên li welatê wî çêbibin ve, hem jî ji bo pêşiya xeteriya nîjadperestiyê civak ber bi hilbijartina pêşwext ve bir. Li cihekî vê teqtîkê cihê xwe girt jî. Di encama vê de partiya nîjadperest a di Parlementoya Ewropayê de bû yekem, kete rêza sêyemîn. Tifaqa bi navê “Eniya Nû ya Gel” de ku partiyên çep, sosyalîst, komînîst di nav de cih digirin bû yekem. Partiya Macron bû partiya duyemîn. Ew pêşveçûna nîjadperest hinekî hat paşxistin. Lê niha dê hikumeta çawa bê avakirin ne diyar e. Bi nîqaş e. Di mijara dê kê hikumetê ava bike de tam li hev nakin. Macron naxwaze avakirina hikumetê bide Eniya Gel.

Di rastiyê de Eniya Gel dikare xwe ferz bike û bibe hêza rêveberiyê. Lê dixwaze bi rêveberiya li ser bingehê tifaqê bê avakirin re civaka Fransî zêdetir bandor bike. Naxwaze tenê bi paşxistina partiya nîjadperest, deng girtinê re sînordar bimîne. Ji ber wê jî dikare li ser bingehê pêşxistina fikir û rêxistinbûna xwe, xebatek ku meylên faşîst-nîjadperest lewaz bike bimeşîne. Zemînê wê ava bûye. Eger serkeftina bidest xistine li ser vê bingehê binirxîne dê pêşketinek pêşdetir derkeve holê. Ji ber dibe ku di vê xalê de hesabên asayî encamên baş dernekevin holê. Piştre dibe ku hêza di destê xwe de jî winda bikin.

## Pêşdeçûna faşîst-nîjadperest a xwe dispêre polîtîkaya penaberan heye

Bi gelemperî li Ewropayê pêşdeçûnek faşîst-nîjadperest heye. Ev xwe dispêre polîtîkaya penaberan. Tewrê li hemberî mirovên ku di bin navê “penaberan” de diguhêzin Ewropayê rê ji vê re vedike. Helbet eger ev penaberî weke penaberiya li Tirkiyê be gotina benaberî ne gengaz e. Erê teknîk pêş ket. Hîn zêdetir reklama vê tê kirin. Mirov hîn zêdetir tiştan dibînin û di encamê de jî bi cîlaya Ewropayê dixapin. Lê ji bo li gelek herêman koçberî çêbibe hewldanên taybet hene. Di vê xalê de pêwîste polîtîkayên şerê taybet bên dîtin. Ji ber vê jî li şûna meyla faşîst-nîjadperest a li dijî penaberan, lêpirsîna sedemên ku rê ji vê re vedikin binirxtir e. Dema wisa bibe mirovê bikare encamên hîn rasttir û bikêr derxe holê. Yan jî di rewşa heyî de sedem nayê lêpirsîn û encam tê dîtin, encamek vederkirinê heye. Ev bi navê demokratî û çepgiriyê tê kirin, lê ne têrker e. Ji ber ku polîtîkayên li ser vê bingehê ne têrker in, di nava civakê de gotinên nîjadperest hîn zêdetir cih digirin. Bandorek mezintir çêdikin. Pêwîste rast nêz bibin û bigirin dest. Pêwîste bi sedemên wê re bê lêpirsîn.

Li aliyê din li Îranê hilbijartin çêbû. Me ev mijar wisa zêde nîqaş nekir. Lê gelek derdor nîqaş dikin. Hilbijartina Îranê jî di encama qezayekî de ji nişkave kete rojevê. Hilbijartinek ku ne di rovejê de bû. Li şûna Serokkomar Reîsî ku gotin di qezayek helîkopterê de miriye, bi lez û bez serokkomarek nû hilbijartin. Dibêjin ku ev Serokkomar reformîst e. Namzetên din ên muhafezekar hebûn. Di nava wan de tenê yek namzetê reformîst hebû û ew hilbijartin.

Bêguman ev kes aliyê reformîst ê pergala heyî ye. Ne meylek wisa pir cuda ye. Lê weke li DYE û dewletên din jî çêbûyî, li Îranê jî meylên polîtîk ên cuda çêdibin. Hinekî hewl didin pîvanên dewleta heyî li gorî hişmendiya polîtîkaya xwe pêk bînin. Li dijberî wan dernakevin lê li ser bingehê polîtîkayên xwe reng didin û pêk tînin. Dibêjin ku dê bi Serokkomar Pezeşkiyan re hinek guhertin pêk bên. Hinekên ku dibêjin dibe Îran pêvajoyek restorasyonê bijî jî hene. Wisa xuyaye ku dikare di wê astê de guhertin çêbike. Weke meyl jî diyar dike ku ji vê re vekiriye. Dinirxînin ku Îran gihiştiye wê xalê.

Di rastiyê de eger wisa be hem di aliyê civakê de hem jî di aliyê siyaseta demokratîk de dê baş bibe. Di nava evqas gotin û namzetên muhafezekar de hilbijartina namzetekî reformîst ji bandora civakî ne qut e. Di vê de rolê şoreşa jin a di pêşengiya “Jin, Jiyan, Azadî” heye. Bêguman ev encamên hilbijartinê bi temamî nûnertiya vê tevgerê nakin, heta beşdariyek baş jî çênebû. Lê eger li Îranê restorasyonek pêk bê dê li ser bingehê şoreşa “Jin, Jiyan, Azadî” tevgera civakî û têkoşîna jin ne qut be. Tişta ku ev restorasyon ferz kir tam jî tevgera civakî ya salekê li ser piyan me ye. Ji bo ku van tevayî bûyeran ber çavan re derbas bike ev Serokkomarê nû derkete pêş, deng girt. Di vê wateyê de dikarin weke encama wê têkoşînê bibînin. Helbet pir kêm e, encamek reformîst a hindirê pergalê ye. Ji ber ku rêxistin û çalakiyek encamên şoreşgerî pêş bixe gengaz nebû. Ji bo xebateke wisa astek pêşengiyê ya têrker nehat kirin. Bêguman eger li Îranê pêşketinên di vî alî de çêbibin, dê hem herêm û qadên din ên Îranê bandor bibe. Ji ber wê jî dê şerê cîhanê yê heyî jî rasterast jê bandor bibe.

Li aliyê din di 10-11’ê Tîrmehê de li Emerîkayê civîna NATO’yê pêk hat. Li ser civînê û encamên wê nîqaş hatin meşandin. Di rastiyê de civîna NATO’ê nîqaşên hilbijartinan ên li Emerîkayê, hilbijartinên li Emerîkayê jî civîna NATO’yê bandor kir. Ev jî bû sedem ku ji aliyê Emerîkayê ve atmosfer hîn zêdetir bi rakêşan be. Yan jî li NATO’yê rewşek nû tune ye. Me di vê civîna nû de meyla hîn zêdetir pêkanîna biryarên Rêveberiya Biden ên piştî paşvekişîna Efxanistanê dît. Ji ber wê jî tiştek nû tune ye. Rêveberiya Trump hinekî DYE ji cîhanê dabû dûrkirin, teng kiribû û kişandibû nava xwe. Di civîna NATO’yê de Rêveberiya Biden planek a careke din DYE yê bike hêzek gerdûnî, bike hêzek sûper danî holê.

## Di asta gerdûnî de bandora DYE yê kêm bibû

Di rastiyê de rewşek wiha derketiye holê: Gotibûn, piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê dê DYE împaratoriyê ava bike, bibe hêzek sûper û li ser tevayî cîhanê serweriya xwe ava bike, lê nebû. Pir li paş ma. Heta hate wê rewşê ku di asta gerdûnî de bandora wê kêm bû. Rêber Apo jî dema Yekîtiya Sovyetê hilweşiya li

dijî nirxandinên bi awayê dê DYE bihêz bibe derketibû û gotibû ev şaş e. Ji ber wê gotibû, "DYE ya bihêzbûyî, li hemberî bihêzbûna Sovyetê derkete holê. Sovyeta hilweşiya yî dê DYE ya paş ketî û lewazbûyî derxe holê." Jixwe pêşketinên di 25 salên dawî de çêbûyîn ev diyar kir. Her çendî DYE bi temamî neketibe plana dawî de jî, Çîn bi lez û bi awayek bi bandor pêş ket. Li aliyê din Rûsyayê bilez xwe kom kir. Têkiliyên Çîn-Rûsyayê, Rêxistina Hevkariya Şanghayê weke hêzek nû ya girîng derkete holê. Têkiliyên aborî-bazirganiyê yên Çîn-Rûsya-Ewropayê bi awayek cidî pêş ketin. Ewropayê got mejiyê NATO'yê mir, em ne di ewlehiyê de ne, pêwîste em artêşek nû ya Ewropayê çêbikin. Êdî nîqaşên bi vî awayî derketin holê. Bi rastî jî bandora DYE yê ya li ser Ewropayê pir lewaz bû. Aha rewşa ku DYE yê di NATO'yê de destwerdan kir ev bû. Şerê Ukraynayê ji bo vê destwerdanê mînaka herî şênber e.

Wê demê ji bo vî şerî gotin, "Pûtîn şer derxist, şerê Ukrayna û Rûsyayê pêk tê". Halbûkî ne weke şerê Ukrayna-Rûsyayê, di ser Ukraynayê re weke şerê Rûsya-NATO'yê pênase bikin dê rasttir be. Niha ev hîn baştir zelal bû, derkete holê. NATO'yê di vê civîna xwe ya dawî de hîn zêdetir ev rastî zelal û şênber kir. Tevayî nîqaş li ser Ukraynayê bûn. Di navenda biryardariyên nû de Ukrayna heye. Di vê civîna dawî de biryar girtin ku 40 milyar Euro piştgiriyê bidin Ukraynayê. Serokê DYE yê bi awayek vekirî îlan kir ku li dijî Pûtîn şer didin meşandin û teqez dê Pûtîn bin bixin.

Di vê civîna NATO'yê de Çîn weke "ya piştgiriyê dide Rûsyayê" hat pênasekirin û xistin hedefê. Ev yek bû sedema bertekan. Çînê rewşa heyî bi gotinên "Weke ku careke din vedigerin şerê sar. Dixwazin şerek sar ê nû çêbikin" rexne kir. Yanî encamên vê civîna NATO'yê şibandin dema şerê sar. Ev demê jêre dibêjin "dema şerê sar", dema kişkişîna di navbera DYE û Sovyetê de ye. Ku di navbera 1949-1989'an de, yanî pêvajoya kişkişîna leşkerî-siyasî ya 40 salan e. Şerê çekdarî nekirin, lê di asta herêmî de şer dan çêkirin. Hîn zêdetir biçekbûneke aborî siyasî-istixbaratî-teknîkî meşandin.


Niha rewşa heyî dişibînin wê. Gelek kes dibêjin cîhan ji nû ve bû du cemser. Li aliyekî cemsera ku NATO têde ye, li aliyê din jî Çîn-Rûsya-Îran-Koreya Bakur weke cemsera dijber digirin dest. Taybet jî alîgirên AKP'ê vê wiha digirin dest.

Bi rastî jî dibe ku şerê sar pêk bê? Dema şerê Ukraynayê çêbû, gelek derdoran ev weke cemserbûnek DYE-Rûsyaya ya li ser bingehê şerê sar nirxand, bang li herkesî kirin ku li gorî vê helwestan nîşan bidin û polîtîkaya xwe diyar bikin. Em nizanin ev çiqas rast in, lê em wê demê li dijî vê nêrînê derketin. Ne weke cemserbûnekî, me ev weke êrişeke DYE yê ya ji bo lewazbûna xwe derbas bike dît. Bi rastî jî hinek pêngavên wisa derketin holê. Di vê serweriya DYE yê ya li ser NATO'yê ava kirin. Lêgerîn û nîqaşên ji bo avakirina Artêşa Ewropayê avêtin plana dawî. Bi vî awayî DYE yê xwe spart şerê Ukraynayê û careke din bandora xwe ya li ser Ewropayê çêkir. Ewropayê nekarî li dijî vê derkeve. Ji ber wê jî nebû xwedî bandorek ku li dijî van polîtîkayên DYE yê derkeve, wê derbas bike, têkiliyên bi Çîn û Rûsyayê re pêş bixe.

Dema Rêber Apo çû Ewropayê derket holê ku Ewropa ne xwedî vînekî ye Di rastiyê de ev rewşa Ewropayê ya bêvîniyê, di dema Rêber Apo çû Ewropayê de jî derkete holê. Wê demê Rêber Apo ji bo çareserkirina pirsgirêka Kurd derfeteke mezin pêşkêşî Ewropayê kiribû. Lê Ewropayê ji tirsa DYE bikî û karkeriyê bikî pir baş e. Hinek derfetê jiyanê dide te. Rêber Apo di parêznameyan de ji bo rewşê wiha pênaseya "karkerê kedxar" bikar tîne. Yanî li Ewropayê ji karkerên kedxwar re demokrasiyek çêbûye. Ji wê zêdetir tiştek tune ye. Aha rewşa niha jî wisa ye.

### Niha jî li ser bingehê şerê Ukraynayê heman tişt tên jiyîn

Jixwe Emerîkayê Îngiltere ji Yekîtiya Ewropayê derxist. Ewropaya ku di bin pêşengiya Fransa û Elmanyayê de jî bi rastî bê bandor maye. Beriya niha derfetek di destê wan de hebû, lê ew baş nenirxandin. Berovajî hîn zêdetir bi DYE yê re hatin girêdan. Li gorî Erê, di dîmen de Rûsyayê şer derxist, lê yê ku ew anî wê xalê Emerîkaya. Yê ku êrişî Kuweytê kir Seddam bû, lê piştre derket holê polîtîkayên DYE yê Seddam anî wê xalê. Êrişa Rûsyayê ya li ser Ukraynayê jî bi heman awayî ye, bi bandor û berîdana DYE yê pêş ket. Ji ber wê jî Pûtînê ku herkes dibêje pir aqile û li ser polîtîkayê serwer e, teqez li Ukraynayê şaştî kir û winda kir. Niha dibêjin Pûtîn li hemberî DYE yê li ber xwe dide. Lê di wê pozîsyonê de bû ku dikarî têkiliyên xwe yên bi Ewropayê re hîn xurttir bike û bandora DYE yê kêmtir bike. Bi şerê Ukraynayê re gelek tişt winda kir, bû sedem ku DYE bandora xwe ya li ser Ewropayê evqas pêş bixe. Ew zemîn ava kir û derfet da DYE yê.




çarçoveyê de NATO ji nû ve zindî kirin. Rêya Enerjiyê ya ku Çîn-Rûsyayê dixwest di ser Ukraynayê re bigihînin Ewropayê sabote kirin. Dîsa bazirganiya enerjiyê ya Rûsya-Çînê bi Ewropayê re qut kirin. Taybet jî girêdanek xurt ya Elmanya û Fransayê bi gaza xwezayî ya Rûsyayê re çêbibû. Bi vî awayî têkilî pêş diket. Têkiliyên bazirganiyê yên Çîn-Rûsya-Ewropayê pêş diketin û yekdestî li ser vê bingehê ava dibû. Pêvajoya jêre digotin gerdûnîbûyîna sermayê di vê çarçoveyê de pir bilez pêş diket. Ew vala derxistin. DYE yê hewl da Ewropayê li dijî Rûsya û Çînê derbixe. Îsveç û Fîlandiya xistin NATO'yê. Careke din yê Rêbertî weke "kesê nayê xwestin" îlan kir û ji Ewropayê derxist. Ji wê wêdetir helwestek nîşan nedabû. Bi vî awayî derket holê ku pirsgirêkên demokrasiya Ewropayê, hêza wê ya çareserkirina siyasî û vîna wê tenê ji bo parastina berjewendiyên xwe yên aborî-siyasî ye û tenê wê îfade dike.

Niha jî li ser bingehê şerê Ukraynayê heman tişt tên jiyîn. Di rastiyê de pergala Ewropayê jî di aliyê hêzê de pir lewaz bûye. Dîsa demokrasiya wê weke xirbeyan e. Cîlayek wê heye, lê dema tu dikevî hindir, taybet jî dema muxalefetê bikî tuyê bi encamên pir cuda re rûbirû bimînî. Helbet dema tu dest li çêkera wê nedî, xizmetê xwesteka DYE yê tevger kirin. Jixwe biryarên di civîna dawî ya NATO'yê de jî li ser vê bingehê ne. Tenê rêveberiya Erdogan nerazîbûnan nîşanî rewşa heyî dike. Ji ber wê jî yekane rêveberiya ku li dijî şerê Ukraynayê derket, têkiliyên xwe bi rêveberiya Rûs re didomîne, di nava tifaqê de ye rêveberiya Erdogan e. Pêwîste hema em nebêjin rêveberiya Erdogan û derbas nebin. Karî bi serê xwe helwestekî nîşan bide. Lê li Ewropayê kesî helwest nîşan neda. Kesekî negot, "çima em li Ukraynayê bi Rûsyayê re dikevin şer".

Di rastiyê de niha hertişt zelaltir bû. Başe, ew çi ye? Teqez DYE yê bingeha vî şerî amede kiriye. Niha şerê Ukraynayê Ewropa û NATO'yê bihêztir dike. Lê bi wê re qada Rojhilata Navîn û Pasîfîkê heye. Piştî civîna NATO'yê ya sala 2022'an de hinekan nirxandinên "DYE sê NATO'yan birêxistin dike" kirin. Dîsa weke polîtîkek a dewletê hewldanên Biden ên ji bo Rojhilata Navîn hene. Di rastiyê de ji Şerê Korfezê heta niha ji bo pêvajoya heyî amedekarî kirine. Em niha vê baş dibînin. Li ser vê bingehê ji bo avakirina xeta nû ya enerjî-bazirganiyê karîn gavên girîng biavêjin. Bi tifaqa Ereb-Israîlê re biryara xeta nû ya enerjî-bazirganiyê ku ji Hindistanê heta Yunanîstan diçe girtin û plan kirin. Niha hewl didin

di vî alî de pêk bînin. DYE yê têkoşîna xwe ya 20 salî ya ji bo xeta enerjiyê, di bin pêşengiya xwe de li ser qadeke nû xiste nava çarçoveyekî. Li ser vê bingehê gihiştine asta lihevkirinekî jî. Qet nebe ji Hindistanê heta Xezayê, heya Korfezê tu pirsgirêk xuya nakin. Niha tenê ewlehiya rêya di der Derya Spî ya Rojhilat, ji Israîlê heta Qibrisê û heta Yunanîstanê maye. Jixwe li ser vê bingehê rewşa pevçûnî û bi nakokî ya di ser Libnanê re gur dibe. Bi rastî jî dê weke Xezayê şereke pêk were an dê li hev bikin? Bersiva vê pirsê pir ne zelal e. Dewleta Tirk dixwaze weke Xezayê şer çêbibe. Ne tenê ji bo şerê Israîl-Hemasê, ji bo şerê Îran-Israîlê çêbibe dixebite. Jiber ku dixwaze projeya rêya enerjiyê li Libnanê ji ber sedema şerek herêmî sabote bibe. Di vî alî de gelek hewldan û tehrîkan dike.

Li ser projeya rê pevçûna esasî dê li ser Qibris û Deryaya Spî bi Tirkiyê re bê jiyîn

Lê Tirkiyê li gel ku pir dixwest jî nekarî di şerê Xezayê de şerê Îran-Israîlê derxe holê. Başe, dikare li Libnanê vê pêk bîne? Di rewşa heyî de em dikarin bêjin bi rêveberiya nû ya li Îranê re dibetiya şerekî wiha zehmettir bû. Dibetiya li şûna şer lêgerîna çareseriya lihevkirinê bihêztir e. Ji ber wê jî dibe ku ji derbasî Qibrisê bibe û pirsgirêkên bi Tirkiyê re bikevin rojevê. Wisa tê fêmkirin ku li ser bingehê vê rêyê dê Îran bikeve lihevkirinan. Heta niha hertim wisa bû. Ev projeya rê dê pevçûna xwe ya esasî di ser Qibris û Derya Spî re bi Tirkiyê re bijî. Tevayî tirsa Tirkiyê ev e. Tirsa herî mezin a dewleta niha û hikumeta AKP-MHP'ê ev e. Jixwe Rêber Apo beriya 10-15'an salan got, bi caran hişyar kir. Eger li ser çareseriya pirsgirêka Kurd Tirkiyeyek demokratîk û yekîtiya demokratîk a Rojhilata Navîn gav neyên avêtin, an dê Tirkiye weke çîna sêyemîn bikeve bin serweriya sermayê, radest bibe û bibe kole, yan jî eger bixwaze bikeve şer dê parçe bibe. Rêbertiyê hişyar kir û got dê heta wê astê bê.

Niha ew dibetî hîn zêdetir bihêz bûye. Ji ber wê rêveberiya Erdogan li hemberî tevayî biryarên NATO'yê bû rêveberiyek muxalîf. Ji ber wê jî ji şerê Xezayê bigire heta têkiliyên bi Israîlê re, dîsa heta şerê Ukraynayê li dijî tevayî biryarên NATO'yê derket. Welatên NATO'yê bi piştgiriya terorê, çêkirina têkiliyan bi terorîstan! re sûcdar kir. Herî zêde ji ber pozîsyona wê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê DYE sûcdar kir. Di esasî de mijarên ku NATO'yê nîqaş kirin ev bûn. Tirkiye hema bêje di tevayî mijarên bingehîn de dijî biryarên NATO'yê derket. Çima? Ji ber ku faşîzma AKP-MHP'ê dixwaze qirkirina Kurdan temam bike. Naxwaze Kurd ji tu tiştî sûdê bigirin. Ji ber ku dibêje dê Kurd ji tiştên nû sûdê bigirin, hemûyan red dike.

Komara Tirk li ser vê bingehê destwerdana Iraq û Sûriyê kir. Di rastiyê de dê wê heta ku bibe ne diyar e. Eger ev rewş berdewam bike wê demê ji derveyî Rojhilat dê tevayî Kurdistanê bixe bin serweriya xwe. Wê demê dê Komara Tirk bi pirsgirêkek pir mezin a Kurd re rûbirû bimîne. Di vî alî de jî ditirse, statûkoperest nêz dibe. Li aliyê din jî dixwaze xwe li gorî nakokî û pevçûnên niha yên li Rojhilata Navîn û pêşketinên çêdibin eyer bike. Bi gotina "ez Mishak-î Millî pêk tîmin" hem Bakurê Sûriyê hem jî Bakurê Iraqê dagir kir. Hîn jî didomîne.

Di rastiyê de Tirkiyê statûkoya berê parçe kir. Pîvan û polîtîkaya pêwîste Komara Tirk sînorên xwe biparêz e, bi şandina leşkeran ji derveyî sînor re ji holê rakir. Niha ne dikare vekişe ne jî dikare pêşde biçe. Ji ber wê jî ji bo Kurdan tune bike dixwaze hinek tifaqan bi hêzên dixwazin Rojhilata Navîn biguherîn re çêbike. Eger pirsgirêka Kurd nebe, berxwedana Kurdan bi temamî bê perçiqandin xuyaye dê ser bikeve û bigihe encamê. Hesab dike ku dê cihên dagir kiriye bidin wî û di destê wî de bimîne. Helbet ji ber wê jî dixwaze demildest û bilez berxwedana Kurdan biperçiqîne. Ji bo vê jî tevayî derfetên xwe yên hindir û derve ji bo vê seferber dike.

Yek ji mijara pêwîste em li ser biseknin jî bûyer û pêşketinên li qada Pasîfîkê di navbera Çîn û DYE yê de çêdibin e. Niha DYE vê taybet jî di ser Taywan û Endonezyayê re ava dike. Di rastiyê de ji van herêman gelek rêveberên dewletê weke mêhvan beşdarî civîna NATO'yê kirin. Bi vî awayî gefxwarina li hemberî Çînê didomînin.

DYE li aliyekî bi dijberiya Rûsyayê re lêgerîna cemserbûna berê ya DYE-Sovyetê nîşan dide. Wan bi xwe jî paşdeketina DYE yê ferq kirin. DYE kengî pêş ket? Dema bi Sovyetê re cîhan dabeşî du cemseran kir. Her kesê di bin gefa Sovyetê de serî li ber DYE yê danî. Kete bin mihwera ewlehiya DYE yê. DYE yê hêza xwe ji wê girt. Niha DYE heman polîtîkayê dimeşîne, dixwaze cemserbûnê di ser Çînê re bike. Lê Çîn nakeve navê vê û neket. Di salên dawî de Çîn û Îran weke xwesteka DYE yê dijminayiya DYE yê nakin. Taybet jî Çîn qet nake. Pîvanek Mao Zedong a bi vî şêweyî hebû, "Çîn dê tu caran nebe dewletek sûper". Helbet fikrên Mao Zedong nayên pêkanîn. Pergala heyî ji mêj ve di aliyê bîrdozî-siyasî-aborî de dest ji pêkanîna fikrên Mao Zedong berda ye. Ji mêj ve ketiye nava pergala kapîtalîst, lê pergalek wan a li gorî xwe û polîtîkayek wan heye. Mînak Çîn, ji bo gerdûnîbûna sermayê pir vekirî û guncaw e. Bi herkesî re têkiliyên aboriyê çêdike, ji derveyî Taywanê bi kesî re dijberiya leşkerî najî. Li wir hestiyariyek wan heye. Ji derveyî wê bi kesî re nakeve nava dijminiyek leşkerî-siyasî. Bi herkesî re dikeve nava têkiliyên aborî û ji ber vê aboriya wê mezin bû, pêş ket, derkete plana yekemîn. Ev pêşketina Çînê hem Ewropayê hem jî DYE yê ditirsîne. Taybet jî polîtîkaya dawî ya DYE yê ewe ku hewl dide Çînê weke rikberekî sûper bigire dest, li ser vê bingehê cemserbûna Çîn-DYE yê kûr bike û xwe ava bike. Di cîhanê de gelek aliyên vê dixwazin jî hene. Lê diyare Çîn ji vê re ne vekiriye. Êdî dê encam tam çibe ne diyar e. Helbet dê pêşketinên polîtîk vê diyar bikin, lê sekna polîtîk a heta niha derxist holê ku Çîn vê naxwaze, neketiye nava tiştekî wiha. Rêveberên Çînê gelek caran ev bi awayekî zelal îfade kirin.

Rêveberiya Pûtîn di ser Ukraynayê re kete xefikê. Li ser Rûsyayê jî zextek hebû û di vê mijarê de Rûsyayê bi baldarî tev digeriya. Lê dema Ukrayna kete rojevê rêveberiya Pûtîn bi bandora nêzîkayiyên netewperestiyê kete xefika DYE yê.

Gelek siyasetmedarên şapînozî hene ku dixwazin li vê cîhanê weke dema Şerê Sar du cemser çêbibin, ew jî pişta xwe bidin yekê û bi rihetî bijîn. Di rastiyê de ev ne siyasetmedariye. Xwe bi aliyekî ve girê didan, dixwestin di bin minwera wê de bijîn û bi wê ve bên girêdan. Ev jî dûrketina ji azadiyê îfade dikir. Ji bo gelek hêzan bi vî awayî siyasetkirin, dewletbûn, serokatiya dewletê, serokwezîrtî hêsan bû. Welat difrotin û bi cihekî ve didan girêdan, di bin siya wî de dijiyan. Piştî hilweşîna Sovyetê zemînê siyasetek wiha nema. Derfetên meşandina têkoşîna polîtîk zêde bûn, xitimîn hat derbaskirin.

Di rastiyê de cemserbûn hîn zêdetir ber bi rizandinê ve dibe. Bêguman kesên naxwazin ji bo rihetiya xwe vê rizînê bibînin pir in. Di vî alî de kesên li cîhana cemserbûyî digerin pir in. Di vê mijarê de taybet jî ew nifşê siyasetmedar-teorisyen ku di demê DYE-Sovyetê de xwe perwerde wisan in. Fikir û vebijêrkên wan ên polîtîk ku li ser vê bingehê pêş ketine qet naşkên. Hertiştî li gorî pevçûna du hêzan dinirxînin. Ji ber wê jî hema dixwazin cîhanê bikin du parçe û bidin şerkirin. Ev nabe. Cemserbûna DYE-Sovyetê bi hebûna Yekîtiya Sovyetê re pêk hat. Niha ne Çîn Yekîtiya Sovyetê ye, ne jî Rûsya Yekîtiya Sovyetê ye. Yekîtiya Sovyetê pergalek cuda bû. Ji vê pergalê cudatir xwe weke alternatîfekî didît. Erê, nebû alternatîf. Lê weke Çîn û Rûsyaya niha jî ne parçeyek ji pergalê bû. Îddaya alternatîfbûnê dişopand. Li gorî wê polîtîka dida meşandin. Yekîtiya Sovyetê nedihişt nakokî û pevçûn derbasî aliyê leşkerî bibin. Xwe weke Parêzvanên Aştiya Cîhanê didîtin. Ji bo kêmkirina çekên nûkleerî ewqas ked dan. Bi rastî jî bandorek wan a wisa hebû. Ji ber wê jî niha rewşeke wisa dernakeve holê. Eger ji bo cemserbûna DYE yê yan jî NATO-Rûsyayê bêjin, aha Rûsya nûnerê Sovyetê ye, wê demê ji nû ve cemserbûna dema Şerê Sar hat, diyare ku ne xwedî tu nêrînên bîrdozî-siyasî ne. Yanî dê bibe nêzîkayiyek pir şaş û serasera. Eger cemserbûn pêş bikeve, emê çima cemserbûna DYE-Sovyetê ya şerê sar bînin rojevê? Di rastiyê de cemserbûn Hîtler-Mussolînî û cemserbûna DYE-Sovyetê-Fransa-Îngilîzan hîn zêdetir bi pênaseya niha re guncaw e. Yan jî dikarin cemserbûna Elmanya-Osmanî-Awusturya-Macarîstanê û cemserbûna Îngilîz-Fransiz-Rûsan bigirin dest.

Jiber ku ev herdu cemserbûn jî hîn zêdetir nêzî ya îro ne. Eger îro di pergala heyî de, di asta cemserbûnê de tifaq derkeftin holê, cemserbûna ku Şerê Cîhanê yê Yekemîn derxiste holê hîn zêdetir nêzî roja me ye. Di wî alî de ev nabe şerê sar, eger wisa be dê bibe şerê germ. Şerê nûkleerî li aliyekê, tu gef dê hêzeke ku bikeve şerekî wiha ranawestîne. Ew xeternak e. Pêwîste ew neyê nîqaşkirin jî. Rewşek wiha pêwîste tevayî cîhan û herkes red bike. Li dijî derkeve. Pêwîste nebêjin dê şerê sar çêbe, şerek mezin çênabe. Dîsa lêgerîna; dê du cemser çêbin û ezê xwe bispêrin yekî pir xeter e. Ev, Yekîtiya Sovyetê ya tune bûye weke heyî nirxandin jî pir xeter e. Halbûkî cemserbûna heyî ne cemserbûnek wisa ye. Ev pêngava DYE yê ya bi destê demokratan bi bandorbûyîn e.

### Encamên hilbijartina DYE yê dê pevçûn û nakokiyên sala 2025'ê diyar bike

Şerê niha yê li Ukraynayê hinekî jî ferdî bûye. Veguheriye şerê Pûtîn-Biden. Pêwîste ev bê dîtin. Trump got, "Dema ez bibim serok, ezê ne şer bi hevdîtinan pirsgirêkên bi Rûsyayê re çareser bikim". Ji ber wê jî dê rewş biguhere. DYE dê polîtîkayên li wê herêmê biguhere. Ji ber wê jî li gel biryarên NATO'yê û nîqaşên di vê çarçoveyê de tên meşandin jî kesek tiştek berbiçav nabêje. Ji ber ku rewşek hîn jî diyar nebûye heye. Başe, ev çi ye? Bêguman polîtîkaya DYE yê ye. Herkes li benda polîtîkaya DYE yê ye. Ji ber wê jî encamên hilbijartina DYE yê dê şer, pevçûn, têkiliyên aborî-leşkerî-polîtîk ên di sala 2025'an de pêşkevin diyar bike. Ji ber ku namzetên heyî polîtîkayên cuda dişopînin. Dibe ku li Rojhilata Navîn guhertinek zêde pêk neyê, lê li Ewropayê mînak nêzîkayiyên şerê Ukraynayê cuda ne. Nêzîkayiyên ji bo

Pasîfîkê bi temamî ne weke hev in. Ji ber wê jî pêwîste encamên civîna NATO'yê bê nirxandin. Taybet jî bi encamên hilbijartinên DYE yê re polîtîkaya ku DYE bişopîne binêrin û dê çawa bên pêkanîn texmîn bike dê rastir be.

Ji bo rewşa me jî çend tiştan bêjin dê di cihê xwe de be. Ji 3'ê Tîmehê ve faşîzma AKP-MHP'ê bi erêkirina rêveberiya Iraqê û beşdarbûnê wê re, bi aktîf beşdarbûna PDK'ê re êrişek nû ya dagirkeriyê daye destpêkirin. Di rastiyê de ev di 16'ê Nîsanê de destpêkir. Armanca wê ewe ku di ser Metînayê re parçe parçe qadan dagir bike, qada dagirkeriyê berfireh bike û qadên parçeyî bigihîne hev. Piştî 3'ê Tîrmehê dixwazin tevayî rojavayê Zapê û qadên Metînayê bigirin û bigihin armancekî. Rêveberiya Erdogan dibêje "Em kilîtê digirin". Êdî dixwaze qada navbera Avaşîn-Hêzilê dagir bike, ji Batûfayê heta Şêledizê li ser rê sînorekî ava bike, bixe destê xwe, bike bin venêrîna xwe, mirovan ji tevayî herêmê derbixe, di bin navê "herêma tampon" de bixe bin venêrîna xwe û bixe nava axa xwe. Li Metînayê di vê xalê de valayî hebûn. Dîsa di nava Metînayê de gund hebûn. Li Zapê girê Bihar di destê gerîlla de bû. Valayî ava dikir. Aha gotina wan a "Em kilîtê digirin" girtina van valayiyan îfade dike. Êrîşeke wiha dimeşînin. Zivistana borî bi rêveberiyên Iraq û PDK'ê re nîqaş dan meşandin. Bi lihevkirinan ev plan amede kirine.

Di rastiyê de armanca wan zêdetir bû. Amedekariyên wan berfirehtir bûn. Dixwestin ji Zaxoyê heta Silêmaniyê xetekî ava bikin, yekîneyên zirxî lê bicih bikin, hêzek hevpar a ji Iraq-PDK-YNK-Tirkmen û hêzên Komara Tirk ava bikin. Vê hêzê li ser wê xetê bicih bikin. Li hember hebûna PKK'ê ya li Bakur bi hev re şer bikin. Dixwestin vê bikin. Diyare ku YNK beşdarî vê nebû. Rêveberiya Iraqê jî îfade kir ku beşdarî tiştek wiha nabe. Li vir bandora Îranê jî heye. Li holê tenê PDK-AKP-MHP man. Wan jî li gorî hêza xwe plan kirin ku îsal vê xetê bi temamî bigirin. Diyare ku dixwazin xeta Heftenîn-Metîna-Zap-Avaşîn-Xakûrkê-Xinêrê bi temamî bigirin. Dixwazin ji Balayakatî heta Hecî Umranê, xeta Çoman-Qesrê-Diyanayê heta Biradostê, herêma Rêkanî, Nirvey, Berwarî, dîsa ji Heftenînê heta Zaxoyê, herêma Sindiler û Gulêlerinê bigirin. Ev dane bin venêrîna Komara Tirk. Tenê herêma Barzan û Gerdî dimînin. Wan qadan jî jixwe aydî xwe dibînin. Qadên ji derveyî van herêman bi temamî pêşkêşî Komara Tirk kirine. Iraqê ev pejirandiye, PDK jî pêk tîne. Yanî firotine.



PDK axa Kurdistanê difiroşe

Me têgeha 'firotinê' bikaranî, lê vê têgehê pir eleqe nedît. Têgeha dagirkeriyê hê zêde tê bikar anîn. Dibêjin ku dewleta Tirk 'dagir' dike. Rast e dagir dike, em vê têgehê bikar bînin lê PDK jî difiroşe. Xakek li Kurdistanê difiroşe. Li gorî min ew qasî dagirkeriyê girîng e. Ne hindik e. Ji ber vê yekê divê em bizanîn û îfade bikin ku ev der ji aliyê PDK'ê ve ji Tirkiyeyê re tê firotin. Pêwîste îxaneta PDK'ê li ser vê bingehê bê teşhîr kirin. Em dibêjîn "Xwe ji hinek deveran vedikişîne, çavên xwe digire û piştevanî dide" lê em nikarîn vê rastiyê bi vî şiklî welê eşkere û zelal teşhîr bikîn. Vegotinên me têra rastiya heyî nakin.

Niha li her devera Metînayê tê şewitandin. Bi vî şiklî gundiyên wê derê direvînin. Tê gotin ku 168 gund tevahî hatine vala kirin. Wê bi vî şiklî hemû gundên herêma ku em behs dikîn vala bikin. PDK vêya dike û dide kirin. Bûyîna bi vî şêweyî qebûl dike. Dixwazin heman tiştî li xeta Xakurkê-Xinêrê û hetanî Helgurtê pêk bînin. Bi rojan in ku wan hemû zozanan ji hewa ve bombarduman dikin. Dîsa xeta Zap-Metînayê bombarduman dikin. Ji bo ji Garê ber bi Zap û Metînayê piştevanî neçe aliyê Garê jî bombarduman dikin. Di eslê xwe de Tirkiye bi vî awayî qadek di firehiya 20-30'î km'yî de û di dirêjahiya 150 km'yî de, bi navê "Herêma Tampon" îlhaq dike. Wan deran dixînin bin venêrîna Tirkiye. Iraq û PDK hemû hêza xwe ji wê derê kişandin. Dixwazin gelê wê derê neçarî koçberiyê bikin. Tirkiye bi hevdîtinên ku li gel Iraq û PDK'ê kirin re peymanek wiha çêkirine. Rêveberiya koordînasyonek hevpar a ku pênç kes ji Iraqê û pênç kes jî ji Tirkiye pêktên ava kirine. Ew vê tevgerê hemûyê rêvedibin. Jixwe PDK wek çalak di nava vî karî de ye. Niha êrîşa li ser vê qadê ji 3'ê Tîrmehê û hetanî niha bi vî şêweyî pêşdikeve. Lê ev dibe pêngav û hedefek destpêkê. Tirkiye dixwaze bi hemû hêza xwe ya leşkerî ve wan deveran bixîne bin kontrola xwe. Vaye ji ber vê komên çete yên DAIŞ, El Nusra, Pêşmergeyên Roj tên gotin tîne vê derê. Dixwaze bi yekîneyên xwe yên zirxî ve ji Batufa û hetanî Bêgovayê bigire, gundên wan deveran bi vala kirinê ve bixîne bin venêrîna leşkerî û îlhaq bike.

Ji aliyê din ve êrîşên li ser Rojava hene. Êrîşên li ser Bakur Rojhilatê Sûrî didomin. Hewl didin bi rêveberiya Esad re hevdîtin çêbikin û li hev bikin. Ji bo ku pêşî li hevdîtinek wiha veke rayeyek tam daye Hakan Fîdan. Her hal ji ber îstîxbaratek kevne lewra wan karan baş dizane. Tayîp Erdogan ji bo ku bi Beşar Esad re hevdîtin çêbike beşdarî civîna Rêxistina Hevkariya Şanghayê bû. Li ser vê bingehê bi Putîn re hevdîtin çêkir. Eger bikare Beşar Esad îqna bike wê Putîn, Beşar Esad û Tayîp Erdogan li Enqere yan jî li Stenbolê bên ba hev û li hev bikin. Em dîbînin ku ev timî bi rêya çapemeniyê ve tê rojevê. Her hal Putîn ji Tayîp Erdogan re gotiye "Eger tu dikarî Beşar îqna bikî û bînî ez jî wê bêm." Niha Tirkiye li pêy hevdîtinek wiha ye. Dixwazin bêyî ku ji dawiyê salê re bihêlin hevdîtinekê pêk bînin û bigihijin li hev kirinek nû. Di vê mijarê de nakokî zêde ne. Wek leşkerî gelek qadên Sûrî dagirkirine. Rêveberiya Esad dibêje 'hetanî ku ev dagirkerî ji holê ranebe, paşve kişandin çênebe em ê hevdîtin çênekin.' Yanê li holê rewşek wiha hêsan çareser bibe tineye.

Lê dewleta Tirk di vê mijarê de jî hedef pir teng kiriye. Hedefa dîplomasiya ku bi Hakan Fîdan re tê rêvebirin li ser "Peymana li dijî PKK'ê" hatiye ava kirin. Dibêjin bila yên din bimînin. Dixwazin li dijî PKK'ê peyman çêbikin. Ango dibêjin em "Peymana Edenê" nû bikîn, bila yekane peymana me tekoşîna hevpar a li dijî Bakur Rojhilata Sûrî be. Dibe ku em bi vî awayî îqna bikin, bi nêzîk bûyînek wiha ve tevdigere. Helbet li beramberî vê jî gelek tawîzan didin. Dewleta Tirk çima dixwaze lez û bez hevdîtinek wiha çêbike? Ji ber ku îsal hilbijartin çêdibin. Wê 2025 bibe salek polîtîkayên nû. Êdî şerê Xezayê xelas bû. Niha Emerîka, wê piştî hilbijartinan li ser Lubnan-Qibris-Rojhilatê Behra Spî bisekine. Ji ber vê yekê wê Emerîka, Îsraîl û hêzên din li ser Lubnan-Sûrî polîtîkayên nû pêşbixîn in. Wê gelek hêz bikevin nava vî karî. Ji ber wê jî dixwaze ku hîna polîtîkayên nû yên li ser Sûrî neketin rojevê, li dijî PKK'ê bi rêveberiya Esad re bigihije peymanekê. Her çiqas piştî peymanek wiha tiştên cur be cur pêşketibin jî, wê bi gotina 'em du dewlet bi hev re ne û me li hev kiriye' ve yan wê polîtîkayên nû asteng bikin an jî ji bo ku Kurd ji wan polîtîkayên nû feyde nebînin wê bendavekê çêbikin. Bi vî şiklî dixwazin pêşiya pêşketinên nû yên polîtîk ên ku bibin lehê Kurdan bigirin. Bêguman qasî ku ji webayê bitirsin ji pêşketinek wiha ditirsin. Welê tê fahm kirin ku wê di sala pêşiya me de pêşketinên nû yên polîtîk çêbibin. Niha rêveberiya Tayîp Erdogan bêyî ku bêje şev û roj 24 saetan hemû hêza Tirkiye arasteyê pêwendî û peymanek wiha dike. Bêyî ku direng bikeve, sal tijî bibe dixwaze bigihije encamek wiha. Ev jî nîşan dide ku wê di sala pêşiya me de pêşketinên nû yên ku Lubnan, heta Qibrisê jî digire nava rû bidin. Wê polîtîkayên nû yên Sûrî bikevin rojevê. Ne diyare wê Sûrî parçe bikin an wê dîsa bikin yek? Destpêkê dixwestin dabeşî sê parçeyan bikin û rêveberiya Esad hilweşînin. Piştre hêzên derve yên destwerdanê dikin gotin bila Esad demek din jî bimîne. Bitaybet jî Emerîka-Tirkiye xwestin vêya li ser birayên Misilman pêk bînin. Di vê îstîqametê de hêzên wekî El Qaîde, DAIŞ bikar anîn. Niha wê pêşketinên nû çêbibin. Temam, pirsgirêka Lubnan-Hîzbulahê heye lê hetanî ku li Sûrî jî pirsgirêka rêveberiyê çareser nebe, wê Behra Spî di ewlehiyê de nebe. Ji ber vê yekê êdî wê Sûriyeyek çawa çêbibe li gorî wê gelek dewlet polîtîkaya nû biafirînin. Wê li ser NY'ê pêşketinên nû li ser avaniya nû ya Sûrî çêbibin. Tirkiye beriya ku pêşketinek wiha çêbibe dixwaze bilez û bez bi rêveberiya Esad re hevdîtinekê rû bi rû çêbike tawîz bide wî û peymaneke dij Kurd çêbike.

Gava ku em niha dikevîn salvegera Berxwedana 14'ê Tîrmehê rewşa polîtîk hinek wiha ye. Di eslê xwe de divê pêşketinên di xeta Lubnan-Sûrî de rast bê fahm kirin û dîtin, pêşxistina helwestên ku hewldanên polîtîk ên AKP'ê vala derdixînin pêwîstin. Dîsa pêşketinên di Sûrî de di pozîsyona ku xizmet ji yekitiya demokratîk a gelan bike de girtin girîng e.

### 8 salin di Herêmên Parastina Medya de berxwedanek mezin heye

Me li hember dagirkeriya li ser Qadên Parastina Medya pêşdikevin berxwe da. Ev dagirkerî di 26’ê Tebaxa 2016’an de destpêkir. Nû nîn e. Di ‘92’an de jî vê tîfaqê êrîşî wan qadan kir. Şer li Heftanîn, Avaşîn û Xakurkê zêde bibû. Lê şerê ku wê demê pêşket yek-du mehan da xelas bû. Niha êrîşek dagirkerî ya ku ji Tebaxa 2016’an û hetanî niha berdewam dike û li dijî wê berxwedanek gerîla heye. 8 salên vê berxwedanê çêbûn, dikeve sala xwe ya 9’emîn. Ev pêvajo bi demên cur be cur ve derbas bû. Êrîş ji destpêka 2018’an li ser Heftanîn û Xakurkê destpêkir. Di 2021’an de li ser Garê êrîşek nuqteyî çêbû. Ji 17’ê Nîsana 2021’an û hetanî niha jî bi armanca ku wan hemû qadan dagir bikin êrîşek dagirkeriyê didome. Li dijî wan hemûyan 8 salin berxwedanek mezin a gerîla heye. Me wek tevger berxwe da. Jixwe dema ku me 2001’an Herêmên Parastina Medya îlan kir, me eşkere gotibû ku em ê li dijî her êrîşa li ser vê derê berxwe bidin, em ê wan qadan biparêzîn û şer bikin. Me li dijî êrîşên dagirkeriya ku dewleta Tirk bi PDK’ê re pêşxistî jî li ser vê bingehê berxwe da.

Niha heman berxwedanên ku li dijî êrîşên ji 3’ê Tîrmehê û hetanî niha pêktên jî hê zêde pêşdikevin û didomin. HPG’ê ji raya giştî re parve kir ku ji 3’ê Tîrmehê û hetanî niha 28 leşkerên dijmin di Girê Bihar de, di qadên din ên wekî Girê Cûdî, Girê Amediyê û xeta Metînayê de hatine kuştin. Firokeyek û balafirek keşfê hatin xistin. Ji yekîneyên zirxî di hejmarek zêde wesayît hatine tune kirin. Ji ber vê yekê berxwedana lehangane ya gerîla li dijî dagirkeriyê rêvedibe didome. Hat îlan kirin ku wê ev berxwedan hetanî dawî bidome. Qasî tê fahm kirin ku nekarîne li her devera Girê Bihar hêz danin. Dihat diyar kirin ku hinek hêz di du berojan de danîne. Hêza ku derxistin Sergeleyê lêdanek zêde xwar. Di Xakurkê de hinek hêz daxistine Şekîfê. Ya din jî êrîşên hewa berdewam dikin. Êrîşên kîmyevî û taktîkî dewam dikin. Li hember wan berxwedana gerîla ya qehremane heye û wê bidome. Me hetanî niha berxwe da û em ê îro piştre jî berxwe bidîn. Lê helbet berxwedan tenê bi wan deveran re sînordar nîn e, ji ber ku dijmin êrîşî wan deveran dike divê bi wan cihan re sînordar neyê hiştin. Şerê şoreşgerî li her deverê ye, êrîşên şerê taybet faşîst ên dijmin jî li her deverê hene. Di eslê xwe de divê şer li her devera Bakur û Tirkiye hatiba belav kirin. Hewldanên ji wî aliyê ve jî çêbûn. Di vê meha derbas bûyî de di meha Hezîranê de li gelek qadên Bakur de şer û pevçûn rûdan. Di xeta Zagrosan de şer û pevçûn çêbûn. Niha disa di xeta Geverê de, di Geliyê Dostkî de çalakiyên gerîla yên li hember dijmin çêbûne. Çapemenî dide. Pêwîste hê zêde bê pêşxistin.

Bêguman wê berxwedana gelê Başûr, hemû gelê Kurd û helwesta rayagiştî encama berxwedana gerîla diyar bike. Birastî jî di rewşa heyî de hinek helwest pêşdikevin. Li dijî dagirkirinê bertekên cur be cur hene. Li dijî êrîşên heyî yên dagirkeriyê hinek partî û hêzên siyasî yên Başûr û Iraqê bertekên xwe raber kirin. Tê dîtin ku hinek rêxistinên biçûk ên aligirên Îranê eşkere li dijî vê derrketin. Jixwe bangawaziya civînê li Meclîsa Iraqê û konseya Ewlehiyê kirin, nîqaş çêbûn. Ji bo ku li cihê bûyerê rewşê lêkolîn bikin şandeyek ava kirin. Di giştî rewşenbîran de, rayagiştî de bertekek heye. Helbet KNK’ê li derve civînek lidar xist. Bi rêxistinên Kurd re ji derdorên siyasî re name hatin şandin. Çalakiyên gel hene.

Jixwe em ji 10’ê Cotmeha 2023’an û hetanî niha li ser bingehê Hemleya Azadiya Kûrewî ya ku Azadiya Fîzîkî ya Rêber Apo û Çareseriya Pirsgirêka Kurd hedef dike, tekoşîn rêvedibîn. Niha tekoşîna li dijî êrîşên dagirkerî û îlhaqa mijara gotinê jî bi vê hemleyê ve girêdayî didome. Ev hemle ji aliyê girseyî ve ber bi qadên cuda yên Tirkiyeyê ve belav dibe. Siyaseta demokratîk bi berxwedana ku bitaybet jî li dijî êrîşên qeyûm û dişibîn wê pêşdikevin ve dibe yek û çalakiyên siyasî bihêz dike. Li dijî mehkum kirina îxaneta hevkar, dagirkerî û îlhaqê hestiyariyek, derket holê. Dîsa li derveyî welat jî girse li ser piyan in, tevgerek heye.

Dema ku em dikevin salvegera 42’emîn a Berxwedana 14’ê Tîrmehê rewş ev e. Welê tê fahm kirin ku wê sala 43’emîn bibe sala şer û berxwedanek mezin. Faşîzma AKP-MHP’ê bêyî ku ji 2025’an re bihêle dixwaze vê xetê bigire saxlemê, bi rêveberiya Esad re peymanek nû ya li dijî PKK’ê çêbike. Vala derxistina wan polîtîkayên ku tenê ne çarenûsa gelê Tirk a hemû gelên Sûrî diyar dike wê di pêşxistina azadiya gelan de hê zêde bike xwediyê derfet û fersendan. Ji ber wê jî divê derfet, pêwendî û tifaqên siyasî rast bên bikar anîn. Pêwîste berxwedan jî rast û serkeftî bê rêvebirin. Hewceye em teqez berxwedanek gerîla ya ku êrîşan dişîkîne, fersend nade îlhaka Zap û Metîna bê pêşbixînîn û serbixînîn.

Em çima di salvegerek 14’ê Tîrmehê de wan, vêya dibêjîn? Ji ber di cihê ku her kesî/ê digot ‘nabe’, ‘li vê derê tiştek nikare bê kirin, li ser navê derfet-fersendan tiştek tineye’ de Berxwedana Rojiya Mirina Mezin a 14’ê Tîrmehê pêşket. Li wê derê serkeftin hat qezenç kirin. Dema ku em ji wê derê mêze dikin dibînîn ku di qada berxwedana Zapê de, di her devera Herêmên Parastina Medya de, dîsa di tunelan de, li derve û li her devera Kurdistanê derfet û îmkan ji ya Zîndana Amedê qat bi qat zêdetirin. Ji ber vê yekê eger Xeta 14’ê Tîrmehê rast bê fahm kirin, rast bê pratîze kirin, wê li her deverê rêvebirina tekoşînên mezin, pêşxistinên çalakiyan, derb kirina dijmin û serxistin pêkan bibin. Divê gotina nabe neyê bilêv kirin. Pêwîste em ji destpêkê ve bi gotina derfet-fersend tunin ve sînordar û asteng nekîn. Beriya her tiştî Berxwedana 14’ê Tîrmehê fêrî me dike ku em pêwîste wiha nekîn. Dibêje “Rewşek welê tineye. Li her deverê, li her dem, di her zirûfan de berxwedan, tekoşîn dikare bê dayîn, serkeftin dikare bê serxistin. Bes rast fahm bikin, rast bihizirin, rast lêkolîn bikin, afirîner, berxwedêr, wêrek û fedekar bin. Wê demê hûn ê li ku derê, li çi û çawa bigerin bibînin, bizanin û bi serkeftî pêkbînin.” Û dibêjin “Eger di destê we de ti derfet tinebin jî hûn dîsa dikarin xwe bikin hêza şer û şerek ku dijmin têk dibe derbixînin holê.” Xeta Berxwedana 14’ê Tîrmehê ev nîşanî me da. Gerîla jî di vê xetê de pêşket.

Binêrin yê ku piştî 2 salan şûnve, Biryardariya Berxwedana 14’ê Tîrmehê, bi Pêngava 15’ê Tebaxê ya 1984’an ve pratîze kir, gerîla bû. Berxwedana gel û gerîla ev tekoşîna ku ew hemû pêşketin afirandin derxist naverastê. Niha jî gerîla pêşengtî ji berxwedana li dijî wan êrîşên dijminê faşîst-qirker ên topyekun dike. Em behsa şerek 40 sal bê navber berdewam dike dikin. Mehek şûnve wê Pêngava Gerîla ya 15’ê Tebaxê bikeve 40 saliya xwe. Yanê wê şerî heyî 40 salên xwe li pêy xwe bihêle. Gerîla 40 salan şer dike. Berxwedana gerîla ya ku Tekoşîna Azadiya Kurd rêvedibe li gel di asta kûrewî de komplo rêxistin kirin û êrîş lidar xistin ew hemû vala derxistin.

Em wek dîrokî behsa berxwedanên sedsala 19’an û 20’an dikîn. Dest 40 salan berdin, 40 rojan jî nekarîne berxwe bidin. Yên ku 40 hefte dîtin jî tunin. Lê berxwedana PKK’ê ya ku Rêber Apo rêxistin kirî û pêşxistî, bi şêweyek bênavber 40 salin şerê şoreşgerî û berxwedanê rêvedibe. Ruh, Xeta Fedaî ya Berxwedana Rojiya Mirina Mezin a 14’ê Tîrmehê di gerîlayê 15’ê Tebaxê de şênber bû, vegeriya rêxistin û çalakiyê, bû berxwedana jin û gel. Şoreşa Vejîna Neteweyî pêşxist, şoreşên azadiyê da destpêkirin, dimeşîne. Her ku diçe sînorên Kurdistanê derbas dike, digihije astek ku hemû herêm û cîhanê bandor bike. Hêzêk wiha mezin, xwe anî rewşa tevgerek mezin a enternasyonalîst, kûrewî jî.

Ji ber vê jî rojên ku em niha tê da derbas dibin, rojên pir biwate ne û dikarîn dersên mezin derbixînin. Demek pêvajoya ku ji 14’ê Tîrmehê ber bi 15’ê Tebaxê ve diçe, pêwîst dike ku em vê heqîqetê rast fahm bikin. Dema ku me ew baş fahm kir em ê piştre têbigihijîn ka dijmin kî ye, dixwaze çi bike. Wê bibînin ku xayîn-hevkar kî ye, dixwaze çi bike. Em ê bizanîn ku wê çawa li dijî xayîn tekoşîn bikin, li dijî dagirker wê çawa tekoşîn bikin, li dijî qirker, reformîst û teslîmiyetê çawa tekoşîn bikin û bersivên wan pirsan bibînin. Wê ev jî me arasteyê tekoşînek rast û serkeftinê bike. Ji ber vê jî timî ronahiya me, çavkaniya me ya herî bingehîn Berxwedana Rojiya Mirina Mezin a 14’ê Tîrmehê ye.

Bêguman gelek berxwedanên ku li ser vê bingehê pêşdikevin hene. Lê di bingeha hemûyan de Berxwedana Rojiya Mırina Mezin a 14’ê Tîrmehê heye. Divê em kêliyekê jî vê rastiyê ji bîr nekîn. Berxwedana Rojiya Mirina Mezin a 14’ê Tîrmehê di her zirûfê de rêya rastî dîtinê, ji bo azadiyê tekoşîn kirin û qezenç kirinê nîşan dide. Nexwe divê em dersa 14’ê Tîrmehê baş û rast fahm bikîn. Divê biawayek têrker bipejirînîn û baweriya xwe ya têkildarî qezenç kirina timî ya hingî ku em di vê xetê de tekoşîn bikin em ê pir bihêz qezenç bikîn biparêzîn. Ji ber ku Xeta 14’ê Tîrmehê xeta qezenç kirin û serkeftinê ye. Qasî xeta tekoşîn kirina di bin zehmetî, bêderfetî, her cure astengî û zextan de, di heman demê de xeta serkeftin bidestxistin û qezenç kirinê ye. Em di salvegera berxwedana 43’emîn de wek tevger, wek gel û wek hemû dostên şoreşger-demokratîk wê vê xetê esas bigirîn û bipejirînîn. Em ê bi Rêbaz û Ruhê Berxwedana Fedaî ya 14’ê Tîrmehê ve tekoşîn bikin û teqez qezenç bikîn. Em li ser bingeha wan carek din salvegera 43’emîn a Berxwedana Rojiya Mirina Mezin a 14’ê Tîrmehê silav dikîn, şehîdên xwe bi rêzdarî û biminet bibîrtînîn. Dîsa em di salvegera 43’emîn de ji hemû heval, gelê me û dostên me re serkeftinê dixwazîn.

***Bijî Ruhê Berxwedana Fedaî ya 14’ê Tîrmehê***

***Bijî Rêber Apo***

***14’ê Tîrmeha 2024’an***

■■■

# Berxwedana 14'ê Tîrmehê Dîroka Azadiya Kurdan Da Destpêkirin



*Me têkildarî Berxwedana Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê roportajek bi Endamê Desteya Rêvebir a PKK'ê Dûran Kalkan re çêkir. Em vê roportajê diweşînin.*

***Bandora lehengiya 14'ê Tîrmehê heta roja îro bûye çavkaniya têkoşînê. Piştî 42 salan dikarin çi li ser lehengî û ruhê 14'ê Tîrmehê bînin ziman?***

Em 42 saliya Berxwedana Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê li pey xwe dihêlin û dikevin sala wê ya 43'an. Em di salvegera 42'emîn de Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê careke din silav dikin, lehengê xwe yên netewî ku ev berxwedan gihandin serkeftinê, rêheval Mehmet Xeyrî Durmuş, Kemal Pîr, Akîf Yilmaz û Elî Çîçek bi rêzdarî, hezkirin û minet bibîr tînim.

Ez rêheval Mazlûm Dogan ku Berxwedana Mezin a Girtîgehê destpê kir, dîsa rêheval Ferhat Kurtay, Mahmût Zengîn, Necmî Oner û Eşref Anyik ku ev berxwedan veguherandin pêlek agir, heman demê de rêheval Sara ku pêşengî ji berxwedana jin re kir bi heskirin, minet û rêzdarî bibîr tînim. Diyar dikim ku emê di 43 saliya Berxwedana 14'ê Tîrmehê de rastiya vê berxwedanê hîn rastir û kûrtir fêm bikin, xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê hîn bihêztir bikin û bigihînin serkeftinê.

Di nava 42 salan de gelek tişt li ser Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê hatin gotin û nivîsîn. Gelek nirxandin hatin kirin. Bêguman nirxandinên herî bi wate, kûr û encamgir ji aliyê Rêber Apo ve hatin kirin. Rêber Apo got, 'Berxwedana 14'ê Tîrmehê ruhê PKK'ê ye'. Diyar kir ku di her alî de ev berxwedan nûnertiya rastiya partiyê dike û çalakiyeke dibe serkeftinê. Heman demê de got ku 14'ê Tîrmehê xeta fedayî ya Apoyî ava kiriye, li ser vê bingehê têkoşîna ji bo azadî û demokrasiyê gihandiyek xalek jêneveger. Bi ruhê Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê re gel û partî di xeta lehengiyê de perwerde kir, birêxistin kir û berê wan da çalakiyê. Ji ber wê jî di bin her tiştê di nava 42 salan de li Kurdistanê hatiye kirin, dîsa di wateya azadiyê de her tiştê hatiye qezençkirin, rokek mezin ê Berxwedana 14'ê Tîrmehê têde heye. Xeta fedayî ya bi Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê şêwe girt, bû afrênerê van pêşketinan hemûyan.

Weke tê zanîn girtiyan di girtîgehan de bi feraset, bawerî û bedenên xwe têkoşîna azadiyê meşandin. Ji derveyî vê di destê wan de derfetek din a berxwedanê nebû. Li aliyê dijber jî rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê hebû ku tevahî derfetên hindir û derve yên dewletê di destê wê de bûn. Bi wê hêz û derfetê êrişî şoreşgerên ku di girtîgehan de komkiribûn kirin. Xwestin bi awayê ruhî, hest, fikir û jiyanî ji armancên wan qut bikin, weke cehfekî lê bikin û ji holê rakin. Li ser vê bingehê bi awayek rêkûpêk êriş kirin. Di atmosferek wiha bê hevsengî de têkoşîn û berxwedanek bêhempa hate meşandin.

Berxwedêrên girtîgehên 1982'an, lehengên ku Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê dane destpêkirin û gihandin serkeftinê Mazlûman, Kemalan û Xeyriyan ev rewşa berbiçav pir zelal û rast nirxandin. Rastiya dijmin û armanca wan bi kûrayî hîs kirin, fêm kirin û dahûrandin. Li hemberî wê fêm kirin ku li Kurdistanê hebûna azadiyê, hebûna jiyanê, ji wê jî zêdetir weke mirovên bi rûmet ketina dîrokê tenê bi berxwedana li dijî rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê ku hişmendiya tunekirina Kurdan têde şênber bûye gengaz e. Fêmkirin ku serkeftina li hemberî vê hişmendî û pergalê jî di fedayîkirina hebûna wan a fîzîkî re derbas dibe. Ev di nava pêvajoya têkoşînê de dîtin û fêm kirin. Li ser vê bingehê jî biryardariyek ava kirin û bi vê baweriyê berxwedana mezin a serkeftin avakirî derxistin holê.

Di vî alî de Tevgera Azadiya Kurd, Rêber Apo, Gelê Kurd 14'ê Tîrmehê weke "Roja Netewî ya Rûmetê" îlan kirin. Diyar kirin ku rûmeta netewî ya gelê Kurd bi Berxwedana Girtîgehan a 1982'an, bi Berxwedana 14'ê Tîrmehê ya Rojiya Mirinê hat parastin, pêşxistin û şêwe girt. Ev têkoşîna li dijî her cûr bêrûmetiyê, li ser xeta Apoyî biryardariya di mirovbûnê de hat meşandin, tevahî êrişên dijmin şikandin, rejîma leşkerî-faşîst a 12'ê Îlonê di aliyê bîrdozî de bin xistin. Bi vî awayî nîşanî herkesî kirin ku dikarin di şer mercî de li dijî rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê, hişmendî û pergala ew nûnertiyê dike tê bikoşin. Bi serkeftina Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê re ev zelal kirin û ispat kirin. Bi vî awayî ne tenê ruhê PKK'ê, heman demê de bûn vîn, biryardariya jiyana azad û rûmeta netewî ya gelê Kurd. Lehengiyek mezin derxistin holê. Ruh û lehengiya 14'ê Tîrmehê ruhê berxwedan û serkeftinek wiha ye. Lehengiya 14'ê Tîrmehê di mercên herî neyînî û bêderfetiyê de, li hemberî dijminê ku her derfet di dest de bû li ber xwe da û dijmin bin xist. Lehengiya 14'ê Tîrmehê lehengiyek wiha ye. Helbet têkoşîn û lehengiyek wiha bi têgihiştin, bawerî, vîn, cesaret, fedekarî û pêşbîniyek mezin pêk hat. Ji ber wê jî berxwedêrî û lehengiya 14'ê Tîrmehê bûyerek mezin a feraset, vîn û îdayê ye.

### 14'ê Tîrmehê rênîşiya xwe didomîne


Li aliyê din Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê li hemberî pergala modernîteya kapîtalîst a Kurdistan parçe kir, li ser civaka Kurd qirkirin-faşîzm- mêtîngerî dimeşand, şêwegirtina wê ya li ser Kurdistanê yanî Komara Tirk a qirker-mêtînger, rêya berxwedan û serkeftinê, terz, islûp û tempoya wê derxist holê. Berxwedana 14'ê Tîrmehê xeta şer û têkoşîna PKK'ê ya li dijî pergala qirker û mêtînger ava kir.

Başe, ev xet çi îfade dike? Ev xet, di mercên herî zehmet de, di nava bêderfetiyên herî mezin de, li hemberî dijminê xwe bi her cûr derfetên hêz û madî pêçayî, têkoşanê û serkeftinê îfade dike. Nûnertiya terzê têkoşînek wiha dike. Li ser vê bingehê derxist holê ku dê têkoşîna li Kurdistanê ne hêsan be, dê têkoşîn di atmosferek zehmet de pêk bê, di her cûr atmosfera newekhev de bi feraset, bawerî û vînek mezin têkoşîn bê meşandin. Ev îspat kir û da nîşan. Heman demê de ev jî ispat kir: Têkoşînek li ser vî terzî di encamê de teqez dê serkeftinê bixwe re bîne. Bi vî awayî ruh da xeta têkoşîna demokrasiyê û azadiyê ya li Kurdistanê li dijî hişmendî û pergala qirker-mêtînger-faşîst tê meşandin. Terzê wê pêş xist, islûbê wê derxist holê, tempoya wê ava kir. Xeta fedayî ya berxwedana PKK'ê derxist holê. Ji ber vê Rastiya Berxwedana 14'ê Tîrmehê bû bingeha her tiştî. Ji ber vê sedemê tu car bandor wê kêm nebû, berovajî her ku çû zêde bû. Tu caran kêm nebû, hertim nûbûna xwe parast. Rêrêbaz û terz da têkoşana azadî û demokrasiyê. Di vî alî de bû çalakiyek ku tucar kevin nabe, hertim zindîbûna xwe diparêz e, hertim hêzê dide û ders jê tê derxistin.

Niha di salvegera 42'emîn de heman zindîbûnê, nûbûnê diparêz e. Berxwedana 14'ê Tîrmehê bi tevahî heybeta xwe rênîşiyê didomîne. Fêr dike ku pêwîste li ku çi bê kirin û kîjan rêbaz bên bikaranîn. Lenîn dibêje, "Mezinayiya çalakiyekî bi asta pejirandina dijmin ve jî tê pîvan". Berxwedana 14'ê Tîrmehê xwedî rastiyek wiha ye. Taybetmendiya çalakiyeke ku xwe bi dijmin jî daye pejirandin hildigire. Cûntaperestên 12'ê Îlonê li hemberî Berxwedana 14'ê Tîrmehê bin ketin. Şefê faşîst ê cûntayê Kenan Evren piştî serkekftina Berxwedana 14'ê Tîrmehê li Qada Şêx Seyîd di axaftina xwe de destê xwe dirêjî

girtîgeha Amedê kir û got: “Li wir ên wisa hene ku hûn serê wan jî jê bikin dest ji bawerî û armancên xwe bernadin.” Bi van gotinan bi awayek zelal li xwe mikur hat ku li hemberî Berxwedana Girtîgeha Amedê û Berxwedêrên wê bin ketine û bêçare mane. Bi vî awayî mezinayiya Berxwedana Girtîgeha Amedê pejirandin. 14’ê Tîrmehê çalakiyek evqas mezin û xwedî bandorek herdem e.

Vê çalakiyê ev nîşanî gel û partiyê kir: Eger tu bixwazî li Kurdistanê mirovayiyê biparêzî, azad û bi rûmet bî, rêya vê di têkoşana li ser xeta fedayî ya li dijî pergal û hişmendiya qirker-mêtînger-faşîst re derbas dibe.



Eger li ser vê bingehê têbikoşî tûyê ser bikevî, azad û birûmet bibî, bibî mirov. Ji derveyî vê tu rêyên din tune ne.

Pêwîste ev berxwedan baş bê fêmkirin; ruhekî ku ev tevahî ava kirin ruhekî çawa bû? Li gel ewqas newekhevî û bêderfetiyê ev ruhê xwe evqas bi bandor kir, serkeftin qezenç kir, ruhekî çawa ye? Di atmosferek evqas newekhev û di nava êrişan de, ruhê ku li ser bingehê serkeftinê nûnertiya cesaret, têgihiştin, vîn, biryardarî, bawerî û fedekariyê dike ruhekî çawa ye? Pêwîste em baş bibînin û rast fêm bikin. Pêwîste em jibîr nekin ku ev şoreşgerên her roj xwe parçe parçe helandin û xistin nava têkoşînê, tu tişt ji bo armancên xwe yên ferdî û berjewendiyên xwe nekirin. Ji bo xwe xilas bikin an jî neçarî wê bûn jî nekirin. Tenê ev rastî dîtin, rêya jiyanek rast û mirovî di têkoşîna li dijî faşîzma 12’ê Îlonê re derbas dibe. Ji bo vê jî hebûna xwe ya fîzîkî danîn holê û têkoşiyan. Ji kûr de bawer kirin ku dê Kurdistana azad ava bibe, dê li Kurdistanê jiyanek azad û mirovî çêbibe, teqez dê ev bi ser bikeve. Ji bo wê li ber xwe dan. Ji ber dîtin ku xeta azadî û demokrasiyê ya Rêber Apo pêş xistiye xeta jiyana rast e, teqez dê ev xet terz, islûb û tempoya serkeftinê ava bike, teqez dê ser bikeve. Heta dawî ji vê bawer kirin. Ji ber wê Kemal Pîr li ser tevgera Apoyî wiha got, “Ez di vê tevgerê de serkeftinê dibînim”.

Hîn ji wê demê ve dît, xeta demokrasî û azadiyê ku Rêber Apo pêş xistiye, di PKK’ê de şênber bûye dê di her mercî de têbikoşe û teqez serkeftinê qezenç bike, ji wê bawer kir. Bi biryardariyek mezin a vê têgihiştin û baweriyê ava kiribû çalakiyek di dîroka mirovayiyê de nehatibû dîtin pêk anî.

Bêguman pêwîste ji vê berxwedanê re nebêjin ‘çalakiya rojiya mirinê’ û hema wisa derbas nebin, pêwîste serasera lê nenêrin. Rojiyên mirinê çalakiyeke ku bi rastî jî destpêkirina wê hêsan e lê bi encamkirina wê pir zehmet e. Serxistina çalakiyek wiha zehmet e lê devjêberdan hîn zehmettir e. Ji ber wê jî destpêkirina çalakiyek wiha dide nîşan ku di karê xwe de çiqas cidî ne. Jixwe li ser bê bingehê jî çalakî serxistin. Her roj parçe bi parçe heliyan, lê tucar dest ji armanca xwe, baweriya xwe bernedan. Rejîma faşîst-leşkerî ya 12’ê Îlonê, Komara Tirk bi tevahî hêza xwe hewl da wan asteng bike û ji armanca wan dûr bixe. Lê biser neket. Kemal Pîr ji bo van hewldanên dijmin jî wiha got, “Hêza we têrê nake ku vîna min û baweriya min bişkîne”. Yanî li hemberî tevahî hêza madî ya Komara Tirk bi têgihiştin, bawerî, vîna xwe li ber xwe da û ser ket. Bi awayekî zelal derxist holê ku hêza madî nikare manewiyatê bin bixe. Berxwedana 14’ê Tîrmehê rastiyek wiha îfade dike.

**Şefê faşîst Erdogan li hemberî berxwedana girtîgehan çok danî**

Eger baldar bin hertişt li ser bingehê Berxwedana Mezin a 14’ê Tîrmehê ava bû. Çalakiyên ku ji derveyî Berxwedana 14’ê Tîrmehê pêş ketin, ji wan çalakiyan re rejîma faşîst-leşkerî û nokerên wê qulpek çêkirin. Nêrînên cuda pêve kirin. Ji bo civakê bixapînin her cûr derew gotin û kirin. Lê tukesî nekarî ji Berxwedana 14’ê Tîrmehê re tiştekî bêje. Şefê faşîst Erdogan jî çû ber deriyê girtîgeha ku Berxwedana 14’ê Tîrmehê lê pêk hatibû. Got, “çi berxwedanên mezin pêk hatine” û rondikên derew barandin. Neçar ma ku li pêşiya Berxwedana 14’ê Tîrmehê û Berxwedana Mezin a Girtîgehan a 1982’an çok dane. Aha Berxwedana 14’ê Tîrmehê berxwedaniyek wiha ye. Rastiyek ku dijmin di vê astê de bandor bike, ma qey çawa dibe bandorê li gelê Kurd, jinan, ciwanan, kedkar û karkerên Tirkiyê neke. Bêguman bandorek mezin çêkir. Bi rastî jî gelek şoreşger, jin, ciwan, kedkar û karkerên Tirkiyê bi rêzdariyek mezin li ber Berxwedana Mezin a Girtîgehan a 1982’an bejna xwe ditewînin. Wê xetê weke xeta antîfaşîst û têkoşîna şoreşgerî dibînin, erê dikin. Civaka Kurd jixwe xwe di vê xetê de perwerde kir. Têgihiştin û vîna xwe bi vî ruhî pêçandin. Kesayeta xwe li ser xeta lehengiyek wiha şêwe kirin. Lehengiya Kurd, egîdiya Kurd, lehengiya fedayî ya Apoyî ku xwe di gerîllayên azadiya Kurdistanê de şênber kir wiha derkete holê. Aha rastiya Berxwedana 14’ê Tîrmehê ev ava kirin û vê heqîqetê îfade dike. Ji ber van sedeman e ku bandora wê hertim nû ye, zindî û domdar e. Tucarî kêm nabe, berovajî dê hertim zindî bimîne. Bi rastî jî di salvegera 42’emîn de jî wiha ye, dê di sala 43’an de jî teqez wiha be. Dê bandora wê ji her demê zêdetir be, dê ruh, xet, cesaret û fedekariya Pêngava Azadiya Gerdûnî ku ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo tê dikoşin ava bike, dê di pratîk û serkeftina wê de bijî. Dê bibe rênîşê rêya vê pratîkê û afrênerê serkeftina wê.

***14’ê Tîrmehê ji bo Têkoşîna Azadiya Kurdistanê weke gavek dîrokî tê nirxandin. Ev gava dîrokî tê çi wateyê? Ji aliyê Têkoşîna Azadiya Kurdistanê ve çi îfade dike?***

Ev pirs jî xwedî girîngiyek mezin e. Teqez rast fêmkirin û rast nirxandinê maf dike. Ji ber ku Berxwedana Mezin a 14’ê Tîrmehê bi rastî jî di Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de qonaxek nû da destpêkirin. Di vî alî de jî bû gavek dîrokî. Em dema pêkhatina berxwedanê bi kurtayî bîr bînin; di 12’ê Îlona 1980’an de Cûntaya Kenan Evren derbeya leşkerî-faşîst pêk anî û li Tirkiyê dest danî ser tevayî desthilatê. Tevayî saziyên dewletê fesix kir. Armanca wî ji nû ve şêwedayîna dewletê bû, yanî bi gotina wî avakirina “Komara Duyemîn” bû. Ji bo Komara Duyemîn jî ava bike, xwest dersên pêwîst ji Komara Yekemîn derbixe, astengiyên li hemberî xwe bi tundiyê çareser bike û astengiyan derbas bike.

Başe, astengiya ku herî zêde dixwestin derbas bikin, pirsgirêka dixwestin çareser bikin çi bû? Bêguman pirsgirêka Kurd bû. Jiber, Komara Tirk dewleteke ku xwe bi awayê yek gel, yek ziman, yek dewlet şêwe kiribû. Li ser vê bingehê gelek êrişên qirkirinê pêk anîbû û hîn jî tê meşandin. Bi qirkirina Ermendiyan encamên diyar girtin. Bi qirkirinên Asûrî-Sûriyanî û Rûm encamên girîng girtin. Lê li gel tevayî komkujî û êrişên qirkirinê encama ku dixwestin ji qirkirina Kurdan negirtin. Serhildana Şêx Seyîd bi xwînrijandinê perçiqandin. Berxwedana Agiriyê bi xwînrijandinê perçiqandin. Li Dêrsimê di sala 1937-1938’an de bi awayek vekirî qirkirin pêk anîn. Li Kurdistanê Kurd qetil kirin, mişextî cihên din kirin. Dîsa ji qadên din mirov anîn û li Kurdistanê bicih kirin. Piştî wê bi hewldan, rêxistinî û plankirî qirkirina çandî dan destpêkirin. Di her alî de bi awayek plankirî ketin nava êrişên helandinê. Yanî xwestin komkujiya fîzîkî vê carê jî bi komkujiya spî, qirkirina çandî, helandinê bidomînin. Li gel vê jî gelê Kurd liberxwe da. Bêguman gelê Kurd li parçeyên din jî hertim li ser piyan bû û li hemberî êrişan liber xwe da.

**Li Kurdistanê derketina nû ya Rêbertiyê qirkirin asteng kir**

Lê Rêber Apo, ji destpêka 1970’an ve di nava Tevgera Şoreşgerî ya Ciwanan de berxwedanek nû pêş xist. Di 12’ê Adara 1971’an de derbeya faşîst-leşkerî pêk hat. Li hemberî derbeyê bi pêşengiya Denîz Gezmîş, Mahîr Çayan û Îbrahîm Kaypakkaya berxwedana çekdarî pêş ket. Rêber Apo li ser bingehê sergûzeşta vê berxwedanê, ji sala 1973’an ve derketinek nû ya Rêbertiyê çêkir. Koma Apoyî pêş xist. Weke parçeyek bingehîn a şoreşa demokratîk a li Tirkiyê şoreşa azadiya Kurdistanê da destpêkirin. Vê têkoşînê di 27’ê Mijdara 1978’an de xwe di şêweyê PKK’ê de birêxistin kir. Bi berxwedana Hîlwanê ya 1978’an û Sîwerekê ya 1979’an de li hemberî hişmendî û pergala qirker-mêtînger-faşîst xwe weke berxwedanek bîrdozî, teorî-pratîkî bi şêwe kir. Bandor li civakê kir, ji partîbûna pêşeng gav avête gerîllatiyê. Her çendî Kurdistan hatibe perçiqandin jî, komkujiyên giran pêk hatibin, helandinek kûr jiyabe jî, dîsa her çendî li Kurdistanê hevkarî, nokerî, xiyanet û radestiyê di astekî de bingeh girtibû jî, welatparêziya azadî û hebûna Kurdîtiyê diparast, vîna Kurdîtiyê diparast neşikestî bû. Bi awayek zindî heye û di pêşengiya Rêber Apo de veguherî berxwedana azadiya netewî ya modern. Derbeya faşîst-leşkerî ya 12’ê Îlonê xwest tiştek ji yên beriya xwe cudatir bike û êrişên xwe jî li

ser vê bingehê meşand. Xwest çi bike? Xwest hişmendî, vîn, rêxistinî û çalakiya azadiya Kurd ku ji dayîk dibû bi komkujiyan ji holê rake. Jixwe piştî derbeyê tevayî êriş li ser vê bingehê pêş xist. Heta ji beriya derbeya leşkerî-faşîst a 12'ê Îlonê jî li Kurdistanê ji bo tesfiyekirina tevgera azadiyê dest bi êrişan kiribû. Ji ber wê sedemê jî derbeya 12'ê Îlonê ji bo armancek wiha pêk hat.

Helbet piştî rêveberiya derbeyê hat avakirin, êrişên mijara gotinê ne hîn berfirehtir û bibandortir kirin. Rejîma 12'ê Îlonê Kurdistan çiya bi çiya, gund bi gund, dol bi dol ji nû ve dagir kir. Hem ji bo pêşengên şoreşger bibîne û biperçiqîne, hem jî ji bo kesek beşdarî vê berxwedanê nebe, ji bo li Kurdistanê perçiqandinê, şikestinê û tirsê derxe holê herkes lêpirsîn kir, di êşkenceyê re derbas kir. Bê ku bêje jin û mêr herkes xiste girtîgehê. Zextek giran çêkir. Ji bo armanca xwe pêk bîne, perçiqandina şoreşgerên di girtîgehê de, îmhakirin, perçiqandina ruhê berxwedanê yê bi pêşengiya Rêber Apo û PKK'ê derketiye holê armanc kir. Li ser vê bingehê bi ser girtîgehan de çû. Xwest têkoşîna azadiyê ya pêş dikeve di girtîgehan de bifetisîne.

Di sala 1981-1982'an de berxwedana di navbera tevgera azadiya Kurdistanê û pergala mêtînger-qirker-faşîst de, di girtîgehan de navendî bû. Di nava girtîgehan de jî girtîgeha Amedê pêşengî ji têkoşînê re kir, rolekî navendî lîst. Wisa bû ku girtîgeha Amedê her tişt diyar kir. Derket holê ku kî têkoşîna li girtîgeha Amedê qezenç bike dê ew pêşerojê ava bike. Di vê mijarê de Cûntaya Kenan Evren heta dawiyê têgihiştî û bi plansazî bû. Xwest feraseta azadiya Kurd, ev feraseta bi pêşengiya Rêber Apo pêş ket û şîn bû di girtîgeha Amedê de ji holê rake, qirkirina Kurd temam bike. Xwest bi vê re PKK'ê û xeta Apoyî tune bike û ji dîrokê rake. Wisa hesab kir ku eger vê di girtîgehê de ser bixe, ji derve jî dikare têkoşîna li dijî PKK'ê biser bixe û encam bigire. Bi rastî jî rewş hinekî wiha bû.

Ji aliyê PKK'ê ve li girtîgeha Amedê li berxwedan û serkeftin bû rewşek ku nebe nabe. Bi awayek zelal derket holê ku rêya hebûn û azadiya Kurd di serkeftina berxwedana li girtîgehan re derbas dibe. Ev rastî bi awayek zelal derket holê. Eger baldar bin ne tenê PKK kete girtîgehê. Tevayî rêxistin ketin girtîgehê. Zext û êşkence ne tenê li ser PKK'ê hat meşandin. Rejîma leşkerî-faşîst a 12'ê Îlonê tevahî şoreşger û welatparêz xistin girtîgehê, êşkenceyek ku di dîrokê de nehatiye kirin li wan kir. Lê encam bû çi? Di serî de girtîgeha Amedê, li tevayî girtîgehan tenê rêvebir û kadroyên PKK'ê bi awayek têgihiştî û rêxistinî li dijî êşkence, radestgirtin û êrişên qetilkirinê yên rejîma faşîst a 12'ê Îlonê derketin û berxwedan pêş xistin.

Ev têkoşîna ku di 1982'an de li girtîgehan pêş ket, li ser bingeha serkeftina Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê û piştî wê gerîllatiya PKK'ê têkiliyek xurt heye. Dîsa têkiliyek xurt di navber vê Berxwedanê û pêşketina tevgera hebûn û azadiya Kurd de heye. Ji ber wê jî PKK ya di girtîgehan de li ber xwe da, li çiyê jî li ber xwe da. Bû gerîlla û bû serhildana gel. Veguherî tevgera azadiyê. Lê yên li girtîgehan li ber xwe nedan tune bûn. Eger PKK'ê Berxwedana Mezin a Girtîgehan a 1982'an pêş nexistibûya, eger di wê berxwedanê de ser neketibûya, dê pêvajoya piştî wê li Kurdistanê û Tirkiyê rewşa rêxistinên din bijiya. Ji ber wê jî PKK ya di girtîgehan de ser ketî, piştre li Kurdistanê têkoşîna azadiyê û şerê azadiyê pêş xist, veguherî tevgerek azadiyê, li Tirkiyê jî bû tevgerek ku nûnertiya demokrasiyê kir.

Jixwe yên ku di girtîgehê de li ber xwe nedan nekarîn li derve jî berxwedanê pêş bixin. Yan ew jî derketibûn derveyî welat. Çûbûn Ewropayê û Rojhilata Navîn. Hêjmarek mezin a kadroyên wan jî hebûn. Li kampên Filistînê perwerdeyên gerîllatiyê dîtin. Hinek ji tevgeran jî bi dehan û sedan kadro birin Bakurê Kurdistanê û Başûrê Kurdistanê, perwerdeyên leşkerî dîtin. Lê yek ji wana jî xebatên xwe yên ji derveyî welat temam nekirin û encamên wan neanîn welat. Di xebatên derveyî welat de ser neketin. Perwerdeyên gerîlla yên li Başûrê Kurdistanê û qada Libnan-Filistînê dîtin veneguhestin Kurdistanê û veneguherandinên pratîkî. Neketin şerê gerîlla. Çima? Ji ber ku di girtîgehan de li ber xwe nedan. Pêwîste em vê rastiyê baş bizanin. Eger PKK'ê karî Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an pêk bîne, li gel tevayî êrişan gerîlla derxist serê çiyê û bû artêşek azadiyê girêdanek mezin bi vê rastiyê re heye. Dîsa ji salên 1990'an ve di pêşengiya gerîlla de ji Nisêbîn û Cizrê serhildanên gel pêş ketin. Şoreşa vejîna netewî derkete holê. Di bingeha van tevayiyan de Berxwedana Mezin a Girtîgehan a 1982'an heye. Heleqa bingehîn a serkeftina wê Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê bû. Serkeftina vê berxwedanê ev ava kir.

Bêguman hertişt tenê bi berxwedana li girtîgehê re çênebû. Eger ew ruh rast nehatiba fêmkirin, ew berxwedan rast û têrker nehata têgihiştin, li ser wê bingehê perwerde, rêxistinî, amedekarî û têkoşîna leşkerî-siyasî ya ew domand nehata pêşxistin, berxwedana girtîgehan bi tena serê xwe dê pêşketinek pratîkî çênekiriba. Di vî alî de pêwîste hertişt tenê bi berxwedana li girtîgehan ve negirin dest. Rêber Apo ew berxwedana li girtîgehan pir rast fêm kir, dahûrand, li gorî wê xetê xebatên ji derveyî welat pêş xist, gerîlla amede kir û veguherand welat. Ev rastiya Rêber Apo, PKK ya di pêşengiya Rêber Apo de xebatên ku hevdû temam dikirin bûn. Ji ber wê jî Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê bû bingeha tevayî pêşketinên azadîxwaz ên pêvajoyên piştî xwe.

Bêguman eger xebatên Rêber Apo yên ji derveyî welat, serkeftina wê nebûya, eger ew xebat derbasî welat nekiriba û cesareta Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an nîşan nedaya, li ser vê bingehê serhildanên gel pêş neketina, berxwedana girtîgehê, Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê de bi tena serê xwe pratîkek ava nekiriba. Ji ber wê jî ya ku berxwedana girtîgehan bi wate kir, Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê veguherand rêxistinê û çalakiyê rastiya Rêber Apo bû. Şerê gerîlla yê ku destpêkê li derveyî welat û paşê jî li Kurdistanê hat meşandin da kirin. Bêguman xebat û hewldanên Rêber Apo, PKK û gerîlla ruh û xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê bi beden kir. Gihand rêxistin û çalakiyê. Ev rastiyek e. Lê ev jî rastiyek e: Eger li girtîgehan kadro û rêveberên PKK'ê Mazlûman, Kemalan, Xeyriyan, Ferhatan, Sarayan bi lehengî li ber xwe nedabûna, eger rejîma 12'ê Îlonê ya leşkerî-faşîst, hişmendî û pergala qirkirinê li ser Kurdan dimeşîne di asta bîrdozî de di girtîgeha Amedê de bin nexistibûna, encamek di vê astê de nedihat girtin. Dîsa eger Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê li hemberî hişmendî û pergala qirker serkeftinek bîrdozî qezenç nekiriba, dibe ku xebatên derveyî welat jî di vê astê de serneketibûna. Dibe ku veguhestina wê ya ji bo welat, pêşxistina Pêngava 15'ê Tebaxê bi vî awayî pêk nehatiba. Hem serkeftina xebatên derveyî welat, hem serkeftina Pêngava 15'ê Tebaxa 1984'an bi ruh, cesaret, têgihiştin û vîna berxwedana girtîgehan, Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê pêk hat û xwe spart wê.

Pêngava 15'ê Tebaxê bi tevayî bi veguhestina berxwedana girtîgehan, Berxwedana 14'ê Tîrmehê ji bo serê çiyê, rêxistinkirin û çalakkirina wê pêk hat. Eger di têkoşînê de dema nû, Pêngava 15'ê Tebaxê, piştî wê jî serhildanên gel destpêkiribin, ya ku ev da destpêkirin, biryara van da, gava destpêkê ya van avêt, Berxwedana Mezin a 1982'an bû. Yanî Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê bû.

Biryara berxwedan û serkeftina li dijî rejîma 12'ê Îlonê ya leşkerî-faşîst di girtîgeha Amedê de hat dayîn. Mazlûman, Kemalan, Xeyriyan, Ferhatan ev biryar da. Wan pêvajoya berxwedan û serkeftina nû da destpêkirin. Ji ber wê jî demeke nû dane destpêkirin. Li hemberî rejîma 12'ê Îlonê ya faşîst-leşkerî dema berxwedanek giştî û serkeftinê dane destpêkirin. Li ser vê bingehê Berxwedana Mezin a Girtîgehê û Rojiya Mirinê ya Mezin bûn gavên dîrokî. Ji ber ku pêvajoyek nû ya dîrokî dane destpêkirin. Her cûr hevkarî, radestî şikandin, li hemberî pergal û hişmendiya faşîst-qirker-mêtînger dîroka berxwedan û qezençkirina azadiyê dane destpêkirin. Di bin êrişên qirker-mêtînger de hebûna Kurd a li ber tunebûnê bû derbasî pêvajoya vejînê kirin. Dîroka tunebûnê rawestiya, dîroka hebûna bi azadî destpê kir. Bû mîladek (zayînek). Ji ber wê evqas bi wate bû. Ji ber wê ew çalakî weke Çalakiya Rûmeta Netewî hat nirxandin. Rûmeta netewî, jiyana azad li wir ava bû. Ji wir destpêkir û pêş ket.

Beriya vê pêvajoyê jî heye. Têkoşîna ji 1973'an ve hatiye meşandin heye, berxwedanên Hîlwan û Sîwerekê hene. Ev destpêkek bûn, ev bingeh avêtin bûn. Lê ya ku ev bingeh ji bo her cûr çalakiyên azadiyê pêş xist, gihat hêzek ku serbikeve, terzê wê, islûp, tempo, terzê fedayî derxist holê Berxwedana Mezin a Girtîgehan, Berxwedana 14'ê Tîrmehê bû. Di vî alî de gavek dîrokî ye.

Dîroka tunebûna Kurdan a di bin mêtîngerî û qirkirinê de, li ser bingehê vê pêşketinê hat rawestandin. Bi pêşengiya gerîlla berxwedan hat pêşxistin, dîroka hebûna Kurd û serkeftina azadiya Kurd destpê kir. Berxwedana Mezin a Girtîgehan a 1982'an, serkeftina bîrdozî ya Çalakiya 14'ê Tîrmehê ev kir. Bi çalakiyên 15'ê Tebaxê yên li Eruhê û Şemzînanê re gerîlla ev veguhêste qada siyasî û leşkerî, bi beden kir, veguhêste civakê, birêxistinî û çalakî kir. Yekbûna van mîlada Kurdan ava kir. Dîroka mêtîngerî û qirkirina ku li Kurdan dihate ferzkirin bi dawî kir, li ser bingeha berxwedanê dîroka Kurdan a azadiya hebûnê da destpêkirin. Di vî alî de dîroka me ya azadiyê di sala 42'emîn de ye. Biryara Rojiya Mezin a Mirinê ya 14'ê Tîrmehê, Çalakiya Çaran a bi pêşengiya Ferhat Kurtay, rastiya Mazlûm Dogan a ji van tevahiyan re bûye çavkanî, di Newroza 1982'an de roja lehengiya Kurd weke Kawayê Hemdem biryara destpêkirina dîrokek nû da. Ev bû destpêka her tiştî. Pêwîste ev rastî bi vî awayî bê dîtin û hîn rasttir fêm bikin ku ji bo têkoşîna me Berxwedana Mezin a Girtîgehan tê çi wateyê, çiqas girîng e û çi îfade dike.

***Qasî tê zanîn mînakek weke ya hovîtiya Girtîgeha Amedê di dîrokê de nehatiye jiyîn.***

***Girtiyên di nava hovîtiyek wiha û bêderfetiyê de, xwedî baweriyek çawa bûn ku dijmin di aliyê bîrdoziyê de di çeperên wan de bin xistin? Radestiya ku li girtiyan dihat ferzkirin çi îfade dikir? Berxwedana 14'ê Tîrmehê ya li dijî vê pêşketî gihişt encamên çawa?***

Weke hatî diyarkirin zext, zilm û hovîtiya di nava salên 1981-1982'an de li Girtîgeha Amedê hatî meşandin, ne gengaze hemşêweyê wê di dîroka mirovayiyê de bê dîtin. Bêguman di dîroka têkoşîna her gelekî de bûyerên wiha hene. Mînak Berxwedana Vietnamê berxwedaneke ku pir tê zanîn. Vietnamê bi şerek pir dirêj re serbixwebûna xwe ya netewî bidest xist. Lê di nava şerekî wiha de berxwedana li girtîgehên Saygonê xwedî cihek diyar bû. Di girtîgehên Saygonê de êşkenceya ku mêtîngeran pêş xist û berxwedana şoreşgerên Vietnamî, berxwedanek ku hemşêweyên wê tune bûn. Weke di dîroka gelê Vietnamê de, di dîroka tevahî gelan de mînakên wiha yên berxwedanê hene. Li Kurdistanê rastiya ku di salên 1981-1982'an li Girtîgeha Amedê hat jiyîn jî mînakeke weke van e. Lê hem di aliyê armancê de hem jî di aliyê rêbazên şiyarbûnê de qat bi qat berxwedanên din derbas dike. Li Amedê pergala şerê taybet ê Tirk, rêbazên ku kontrgerîlla bikar anîne, hovîtî, zilma wan ne gengaze li cihek din bê dîtin. Ya ku li Amedê hatî meşandin êşkenceyek piralî bû. Li aliyekî armanc dikirin ku mirovan ji mirovayiyê derbixin, bê rûmet bikin, ji kesayeta wan derbixin, ji armanc û doza azadiyê dûr bixin. Li aliyê din jî armanc dikirin ku mirovan ji Kurdîtiya wan, têgihiştina netewî, hebûna netewî dûr bikin, ji Kurdbûnê derbixin, bihelînin û bikin Tirk. Armanc û rêbazên ku di bin navê îtirafkariyê (aşarte) de li Girtîgeha Amedê li ser şoreşgeran dihat meşandin, ne gengaze li cihekî din bê dîtin. Ji ber ku mêtîngerî û qirkirina Tirk a li Kurdistanê tê meşandin, li tu derê hemşêweyek wê tune ye. Ev mêtîngerî-qirkirin ne tenê perçiqandin, kolekirina Kurdan armanc dike. Dixwaze Kurdan ji Kurdbûnê derbixe û bike Tirk. Bi qirkirina çandî bifaştinê armanc dike. Yanî di aliyê hest, ruh, fikir, çand, dîrok, têgihiştin, di her alî de manewiyat û hebûna mirovan dike armanc. Dixwaze hundirê wê vala bike û Tirktiyê bixe şûna wê. Pêkanînek wiha mêtînger-qirker li cihek din ê cîhanê tune ye. JÎ ber wê jî rêbaz, hovîtî û zilma li Girtîgeha Amedê hatî meşandin, li cihek din ê cîhanê hemşêweyê wê tune ye. Yên ku jiyane tînin ziman, gelek pirtûk hatin nivîsîn, bername hatin çêkirin. Rêheval û welatparêzên me yên ev hovîtî jiyan bi şêweyên cuda hovîtiya li Girtîgeha Amedê, kiryarên hovane yên Esat Oktay Yildiran, zilma wî, rêbazên wî yên hovane, êşkenceya wî teşhîr kirin. Raya giştî, herkes vê dizane, lê pêwîste hîn zêdetir li ser bê sekinîn, bê nûkirin. Pêwîste ew têgihiştin zindî bê hiştin. Pêwîste ev neyên jibîrkirin, neyên windakirin û hertim bên weşandin. Pêwîste di her salvegera 14'ê Tîrmehê de ev bên weşandin. Ev kirin film. Pêwîste hertim ev film bê nîşandan. Her çendî mejiyê mirov li gorî zindiyên din pir pêşketîbe jî meyldarê jibîrkirinê ye. Teqez pêwîste jibîrkirin bê astengkirin. Ji ber wê jî pêwîste yên ev jiyane hertim bînim ziman. Pêwîste em ciwanan, mirovan û civakê li ser vê bingehê perwerde bikin.

### Hovîtiya ku mirov nikare li mirovan bike Komara Tirk li Kurdan kir

Niha yên ku ji nîmeta azadî û hebûna Kurd sûd digirin, ên ku tama azadiyê girtine pêwîste ji bîr nekin ku ez azadî bi hêsanî bidest neketiye. Ev pêşketin û destkeftî bi hêsanî derneketine holê. Di bin vê de têkoşîn, cesaret û fedekariyek çawa heye? Di pêkanîna zilmkariyek çawa re derbas bûn? Kîjan berxwedan çêbûn û ev dîwarê zilmê parçe kirin, çawa pêşiya jiyana azad vebû, ji bo kîjan jiyana azad ev destkeftî derketin holê? Pêwîste herkes vê bizane. Taybet jî pêwîste ciwanên nû, zarokan li ser vê bingehê perwerde bikin. Yên ku vana nizanibin nikarin bigihin wateya azadiyê. Nikarin jiyana azad fêm bikin. Nikarin jiyana azad biparêz in. Hem dê bi awayek rast nejîn, hem jî neparêzin û pêş nexin. Nikarin li hemberî êrişan biparêz in. Heta vana bizanin dê bikarin biparêz in.

Di vî alî de axaftinên kesên ku hovîtiya Girtîgeha Amedê jiyane girîng in. Em jî axaftinên wan dixwînin û lêkolîn dikin. Tiştên ku mirov nikare li mirovan bike, tu zindî ji zindiyên din re rewa nabîne, di Girtîgeha Amedê de ji aliyê erkdarên Komara Tirk ve, ji aliyê rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê ve li têkoşerên PKK'ê û Kurdan hat kirin.

Yên ku dibêjin, 'Kurd çima li ber xwe didin, çima şer dikin? Kurd li dijî me derdikevin, Kurd xiyanetê dikin' bila baş bizanin ku Kurd li dijî Tirkan derneketine. Tirkan ji bo perçiqandina Kurdan her tişt kir; rûmeta wan şikandin, dijûn kirin, zilm kirin, qir kirin, komkujî pêk anîn, helandin, nasnameya wan, zimanê wan nas nekirin, henekên xwe bi kesayeta wan kirin. Yên zalim, yên ku xiyanet li Kurdan kirin Tirk in, an jî Kurdan tiştek bi Tirkan nekirine. Piştî evqas zilm, dijûn, kêmkirin, îxanetê eger Kurd ji bo azadî û hebûna xwe têkoşiyabin, tiştek ji vê rasttir, xweşik û watetir tune ye. Tiştek nikare ji vê re tiştekî bêje. Tukes nikare Kurdan darizîne û bêje çima hûn vê dikin. Ma dê Kurdan çi bikira? Gelo dê çawa gengaz bûye ku weke mirov bijiyana, hebûna, weke mirov mabûna û bigihiştina jiyana azad? Başe, bila li ber xwe nedabûna û bibûna weke amûr û bipejirandibûna? Başe dê tevayî hest, fikir, nirxên xwe yên mirovî vereşandina? Başe wisa bikirina dê çi ji wan mabûya? Dê sûda vê ji kê re hebûya? Em bêjin hema wisa bû. Dê sûda Kurdekî wisa ji Tirktiyê re çibûya?

Qala dîrokek hezar salî tê kirin; pêvajoya Tirkan a hatina Anatoliyê heye. Herî dawî qala şerê di bin pêşengiya Mustefa Kemal de, qala têkoşîna rizgariyê tê kirin. Kurdîtiya azad di van tevayiyan de cih girt. Yanî jî Kurdîtiya bûye amûr dikaribû çi bike? Kurdê azad, Kurdê egîd li hemberî dagirkeriya Fransa û Îngilîzan şer kir, li hemberî her cûr êrişên Seferên Xaçperestan û Bîzansan rawestiya. Evqas welat girtin, ev rewşa Tirktiyê bi xizmeta Kurdê azad û hebûna Kurdê egîd çêbû. Tu niha hindirê Kurdîtiyê vala dikî, dikî amûrek. Lê dê çi sûda Kurdekî wiha li we hebe? Sûda wê ji kesî re tune ye. Qet nebe divê ev gotina Mustefa Kemal neyê jibîrkirin: "Kesê ku sûda wê/wî ji gelê xwe re nebe, dê sûda wê/wî ji me re tune be". Wê demê Kurdîtiya radestbûyî, heliyayî, Kurdîtiya ku sûda wê ji hebûn û azadiya xwe re nebe, sûda wê ji kesî re nabe. Niha dîktatoriya faşîst a AKP-MHP'ê dixwaze Kurdên wiha ava bike. Di rastiyê de ev nîşan dide ku çiqas ji rastiya xwe dûr ketine.

Başe, berxwedana li dijî vê çawa çêbû? Çawa serkeftin hat qezençkirin, ev berxwedan û rastiya serkeftinê xwe spart çi? Bêguman bi vîn û baweriyek pir mezin çêbû. Cesaret û fedekariya di asta lehengiyê de ev berxwedan pêşxist û gihand serkeftinê. Lê di bin van tevahiyan de hişmendiyek kûr a azadiyê hebû. Mazlûm, Kemal, Ferhat, Xeyriyan xwedî hêza hişmendiyek wiha bûn. Bi wê hişmendiyê bawer kirin, vîn qezenç kirin. Çalakiyek weke ya 14'ê Tîrmehê bê dudilî gihandin encamê, serkeftin qezenç kirin. Xwe parçe parçe kirin, lê tu caran dest ji berxwedana xwe bernedan. Ew vîna mirov a mezin ku armanca wan gihand serkeftinê derxistin holê. Teqez hişmendiyê ev vîn û bawerî derxist holê. Erê di wî alî de em girîngiyê bidin vîn û baweriyê, lê em girîngiyê bidin hişmendiya ku ew vîn û bawerî jî ava kir.

### Mazlûm Dogan hişmendî bû

Rêber Apo ji bo hevalê Mazlûm got, "Hevîrê hişmendiya PKK'ê bû". Di rojê de 500 rûpel pirtûk lêkolîn dikir. Ji bo xeta Rêbertiyê fêm bike 24 demjimêrî dixwend, lêkolîn dikir, nîqaş dikir. Li ser vê bingehê xwe perwerde dikir. Ji ber wê jî ne rasthatine ku Berxwedana Mezin a Girtîgehan a 1982'an ji aliyê Mazlûm Dogan ve hat destpêkirin. Mazlûm Dogan ji beriya herkesî rastî dît, bi cesaret û fedekariyek mezin biryara çalakiyê da. Ev bi temamî serkeftina hişmendiyê ye. Bi awayek zelal nîşan dide ku ya di vîn û baweriyê de diyarkere hişmendî ye. Mazlûm Dogan yanî hişmendî. Tevayî cesaret, bawerî û fedekariya xwe ji hişmendiyê girt. Ji herkesî zêdetir bawer kir ku hebûn û azadiya Kurd dê bi pêşengiya Rêber Apo ser bikeve, PKK tevgerek a serkeftinê ye, dê bi PKK'ê re serkeftin pêk bê. Ji herkesî zêdetir xwedî vê hişmendiyê bû. Xwedî pêşdîtinek wiha bû. Dema dest bi vê çalakiyê kir hîn di wê demê de dît û zanî ku dê piştî 42 salan herkes bibe Mazlûm, li her qadê li ser xeta Mazlûm çalakî pêş bikevin, dê gelê Kurd ji bo azadiyê rabe ser piyan. Yan jî eger ew nedîtiba biryarek wisa nedigirt û nedixist nava çalakiyê. Eger ew hişmendî nebûya Kemalan, Xeyriyan, Akîfan, Eliyan Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê bi encam nedikirin, nedigihandin serkeftinê. Bi hişmendiyek wiha vîn, cesaret û fedekariyek wiha derxistin holê û encam girtin. Ji ber vê pêwîste me girîngiyê bidin hişmendiyê, li ser vê bingehê xwe perwerde bikin. Xwe perwerdekirin tê wateya zanabûnê, nirxandina zanistê, qezençkirina hêza wateyê. Ev jî bi rexne û rexnedayînê çêdibe. Pêwîste xeta Apoyî bê fêmkirin û di wê xetê de bi rexnedayînê şoreşa xwe ya kesayetî pêk bînin. Perwerdeya li ser vê bingehê pir girîng e. Di serê her tiştî de teqez perwerde tê. Taybet jî jin û ciwanên Kurd, civaka Kurd û tevahî kedkar vê rastiyê fêm bikin. Taybet jî pêwîste ciwan fêm bikin. Banga me ya ji bo rêhevalên ciwan, pêşniyara me ya bi rêhevaltî li ser vê bingehê ye.

Pêwîste em hîn zêdetir xwe li ser xeta Rêbertiyê perwerde bikin, hêza xwe ya wateyê pêş bixin. Ji ber ku emê pêşerojê bi wê re bibînin. Emê bikarin bi vê hişmendiyê biryara rast bidin. Ew hişmendî dikare cesaret û fedekariya çalakîkirinê bi me dibe qezençkirin. Yan jî em xwe perwerde nekin û hişmendiyek wiha qezenç nekin, emê nekarin tiştekî bikin. Ne emê bikarin biryarek rast bidin, ne jî cesaret û fedekariya çalakîkirinê pêş bixin. Di wî alî de jî Berxwedana 14'ê Tîrmehê xwedî hêzek mezin a vîn û baweriyê bû. Rêber Apo got, "Mazlûm, Kemal û Xeriyan bi bawerî û têgihişin beşdarî min bûn. Hem di asta îmanê de bawerî bi rastî û serkeftina min

anîn, hem jî ez fêm kirin. Ne tenê bi awayekî fanatîk bawer kirin. Fêm kirin, hêza wateyê qezenç kirin. Rastiya min dîtin, dîtin ku ezê biser bikevim. Li ser yekbûna ruhî xwe beşdarî min kirin. Bi min re bûn yek". Ji ber wê Rêber Apo got, "Heqî Karer weke ruhê min ê veşartîbû". Kemal Pîr jî got, "Ruhê Rêber Apo ruhê me tevan e".

Wê demê yekbûna ruhî ya bi Rêbertiyê re, beşdarbûna ruhî tê wateya beşdarbûna bi zanabûn û bawerî. Yê ku bi zanabûn û bawerî beşdarî Rêbertiyê bibe, li ser vê bingehê Rêbertiyê fêm bike dê hertim rêya rast bibîne. Li ku dibe bila bibe, dê biryar rast bide. Ji bona azadiyê dê cesaret û fedekariya her tiştê pêwîst nîşan bide. Ji ber wê jî dê hertim ser bikeve. Eger em nikarin biryarek rast bidin, nikarin rê û rêbazên rast bibînin, tiştê dikin ser naxin, wê demê pêwîste em beşdarî, bawerî û hişmendiya xwe lêpirsîn bikin. Pêwîste em kêmanî û xeletiyên li wir sererast bikin.

Berxwedêrên girtîgehên 1982'an, Berxwedêrên 14'ê Tîrmehê li ser bingehê yekbûna ruhî beşdarî Rêber Apo bibûn. Hişmendî û baweriyek ku beşdarbûnek bi vî awayî çêbike di xwe de ava kiribûn. Li ser vê bingehê rastiya dijmin baş nas kirin, baş fêm kirin. Dijmin dixwaze çi bike, armanca dijmin çi ye, zext, zilm û hovîtiya dike bi çi armancê dike, pêwîste çawa li hemberî van kiryarên dijmin bisekinin, di asteke bilind de fêm kirin, nirxandin. Dîtin ku pêwîste li hemberî wan êrişên dijmin bi cesaret û fedekariyek çawa tê bikoşin. Tiştên pêwîst dîtin û pêk anîn. Ji ber ku Mazlûm Dogan ji beriya herkesî bû xwediyê vê hişmendiya kûr, rastiya dijmin baş nas kir, gihişt hişmendiya doza Kurd, ji beriya herkesî ev gihişt vê biryardariyê. Ji ber ku Xeyrî, Kemal, Elî û Akîfan xwedî vê bawarî û hişmendiyê bûn, du mehan hebûna xwe ya fîzîkî feda kirin û berxwedanek mezin derxistin holê. Komara Tirk li gel tevayî hewldanên xwe nekarî wan ji berxwedana wan dûr bixe, paşde gav bide avêtin, dest ji armancên wan bide berdan û çalakiya wan bişkîne. Di encamê de serkeftin derxistin holê.

### Faşîzma AKP-MHP'ê dixwaze Kurdan tune bike û bike Tirk

Di vî alî de radestiya li girtiyan dihat ferzkirin encamên pir giran derxist holê. Pêwîste ev pir baş bê fêmkirin. Hîn jî faşîzma AKP-MHP'ê li pey heman armancê ye. Di girtîgehê de, ji derve û çar parçeyên Kurdistanê êrişî gelê Kurd, jin û ciwanên Kurd dike. Armanca van êrişan heman e. Dixwaze hebûn û azadiya gelê Kurd tune bike. Ne tenê ji bo derbeyan li Kurdan bixe, vîna wan bişkîne, bixe bin zextê, bike kole, bixe xizmeta xwe, bibe xwediyê Kurdistanê, mêtîngeriya dewlemendiyên Kurdistanê bike van êrişan pêk tîne. Heman demê de dixwaze netewa Kurd tune bike, qirkirina çandî pêk bîne. Dixwaze Kurdîtiyê tune bike û mirovê Kurd bike Tirk, bihelîne. Dixwaze Kurdan ji rastiya wan dûr bixe û berê wan bide rastiyek din. Yanî dixwaze ji mirovayiya wan dûr bixe.

Hîn jî rastiya ku dîktatoriya faşîst a AKP-MHP'ê ferz dike ev e. Di sala 1982'an de şoreşgeran di girtîgehê de li dijî vê li ber xwe dan. Mazlûman, Kemalan, Xeyriyan, Sarayan li dijî vê ala berxwedanê bilind kirin, bi tu awayî nepejirandin. Hebûnek li ser wî bingehî teqez red kirin. Li wir nûnertiya hêza fikrî ya Rêber Apo ku digot, "Eger jiyanek hebe, yan dê azad be yan jî dê qet nebe" kirin. Li hemberî tevayî êrişên li ser vê bingehê hatin kirin li ber xwe dan. Bi tu awayî bejna xwe netewandin. Di encamê de bi çalakiyên xwe ev êriş şikandin, pergal û hişmendiya faşîst-qirker-mêtînger bin xistin. Li hemberî wê hebûn û azadiya Kurd gihandin serkeftinê. Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê teqez ev derxist holê.

Di pêvajoyek weke 1982'an de ku Komara nû şêwe girt, Komara Tirk û pergal-hişmendiya wê ya dixwestin li ser bingehê qirkirin-mêtînger-faşîst ava bikin nepejirandin. Li hemberî wê ber xwe dan û rejîma 12'ê Îlonê bin xistin. Li hemberî hişmendî û bîrdoziya Kurd neyî dihesibandin, bi her cûr êriş, zext û mêtîngeriya Kurdan bikin Tirk li ber xwe dan û bin xistin. Rêya berxwedanê ya jiyana azad ava dike dîtin, li ber xwe dan û serkeftin.

### Yên dijîn yên berxwedêr in

Niha em careke din dibînin ku yên dijîn yên berxwedêr in. Berxwedêrên 14'ê Tîrmehê; Mazlûm, Kemal û Xeyrî ne. Li gel ku 42 sal derbas bûne jî rastiyên zindî yên gelê Kurd, Kurdistanê Kemal, Xeyrî, Akîf û Elî ne. Yên ku gelê Kurd, jin, ciwan, 50 milyon Kurd û dostên Kurdan dizanin, her roj bi wan re dijîn, li ser zimanan digere rastiya Malzûman, Kemalan û Xeyriyan e.

Em dizanin ku dawiya xayîn, hevkar û yên radest bûne çi lê hat. Em dizanin ku dawiya êşkencekaran jî çi lê hat. Esad Oktay û yên weke wî çûne ku? Çi bi serê Şahîn Donmezan hat? Ma kesek wan bi bîr tîne? Li vir rastiyên zindî yên dijîn Mazlûm, Kemal û Xeyrî ne. Berxwedêriya Mezin a 14'ê Tîrmehê ye. Dîroka nû ya Kurdê azad, mirov û civaka Kurd a azad di encama berxwedanek evqas mezin de derkete holê û rastiyên ku niha dijîn ev in.

***Bi boneya salvegera 14'ê Tîrmehê weke rojaneyî dikarin çi encamê ji vê berxwedanê bên derxistin? Li ser bingehê ruhê berxwedana 14'ê Tîrmehê, di aliyê pêvajoya li pêşiya me de hûn dikarin li ser erk û berpirsyariyan çi diyar bikin?***

Em 42'emîn salvegera Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê dijîn, em dikevin 43 saliya vê berxwedana mezin. Xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê bi awayekî zindî dijî. Di pêvajoya em tê re derbas dibin de, berxwedan ji bo meşandina têkoşîna hebûn û azadiya Kurdan, demokratîkkirina Tirkiyê rêya me ronî dike. Ev pêşiya têkoşîna mezin ronî dike. Feraset, rêbaz û terzê wê nîşan dide. Nûnertiya cesaret û fedekariya têkoşînek wiha dike. Rêya Pêngava Azadiya Gerdûnî ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û çareseriya pirsgirêka Kurd armanc dike nîşan dide. Ruhê Berxwedana 14'ê Tîrmehê li ser bingeha azadiya fîzîkî ya Rêber Apo di Pêngava Azadiya Gerdûnî de dijî.

### Jinûve di xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê de biryardarî

Li aliyê din weke di her salvegerê de, di salvegera 42'emîn a Berxwedana 14'ê Tîrmehê de pêwîste em rastî, ruh û lehengiya wê rast fêm bikin û rast tê bigihin. Pêwîste em li ser bingehê xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê xwe perwerde bikin. Li ser xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê xwe bi awayê rexne û rexnedayînî lêpirsîn bikin. Eger aliyên me yên bi vê xetê re dijber hebin pêwîste em derbas bikin. Pêwîste em rastiya Berxwedana 14'ê Tîrmehê baştir fêm bikin û bi kûrayî tê bigihin. Divê em bihêztir beşdar bibin. Pêwîste em hişmendî û baweriya xwe hîn zêdetir bi rastiya Berxwedana 14'ê Tîrmehê bipêçin. Pêwîste em xwe bînin wê astê ku vê xetê, xeta fedayî ya 14'ê Tîrmehê yanî xeta Rêber Apo rast fêm bikin û serkeftî pêk bînin. Ji ber wê tenê bi pesindayînê, nostaljîkirinê nikarin bigihin encamê.

Dema em dikevin sala nû ya Berxwedana 14'ê Tîrmehê tişta ku divê em bikin ev e: Pêwîste em xeta berxwedan û serkeftinê ya 14'ê Tîrmehê rast fêm bikin, hişmendî, vîn, terz, islûb, tempo, cesaret û fedekariye ku wê bi awayek serkeftî jiyanî bike di xwe de ava bikin. Pêwîste em kesayeta xwe li ser vê bingehê biguherin, veguherin û nû bikin. Pêwîste em xwe di xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê de perwerde bikin, nû bikin û jinûve bi biryar bikin.

Helbet bi vê ve girêdayî jî di vê pêvajoyê de pêwîste em erkên xwe yên şoreşgerî û welatparêziyê li ser xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê pêk bînin. Pêwîste em bi ronahî û rênîşiya 14'ê Tîrmehê tev bigerin. Pêwîste em xeta 14'ê Tîrmehê li her qadê esas bigirin û xebatên xwe yên şoreşgerî ji serkeftinekî bigihînin serkeftinek din.

Li ser vê bingehê em dikarin di sala 43'emîn de di aliyê têkoşînê de, kîjan encaman rojaneyî ji rastiya Berxwedana 14'ê Tîrmehê derbixin? Di serî de pêwîste em careke din binê vê xet bikin; Berxwedana 14'ê Tîrmehê ispat kir ku di her mercê de dikarin li dijî êrişkariya faşîst-mêtînger-qirker têbikoşin û serkeftinê qezenç bikin. Di roja me de rastiya berxwedana Îmraliyê nûhertiya vê dike. Xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê û rastiya berxwedana Îmraliyê bi vî awayî weke goşt û neynokê bi hev re girêdayî ne. Di vî alî de pêwîste em ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo Pêngava Azadiya Gerdûnî, çalakiyên wê li her qadê bi awayek bihêz bimeşînin. Di vê mijarê de hêncetên weke "me fêm nekir, nebû, derfet tune ye, astengî hene" nabe ku li dijî têkoşîna me bibin asteng. Xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê van hêncetan ji binî ve ji holê radike. Ji ber ku Berxwedana 14'ê Tîrmehê nûnertiya têkoşîn û serkeftina di mercên herî zehmet, bêderfetiyê de dike.

Wê demê yên ku vê xeta berxwedanê esas bigirin, dê bikarin li her derê, her demê de têkoşînên herî mezin bidin meşandin û bigihînin serkeftinê. Lê ji bo vê pêwîste rastiya dijmin baş nas bikin. Pêwîste hişmendî û pergala faşîst-mêtînger-qirker baş fêm bikin. Yên ku vê tenê di gotinê de dihêlin û nateyîsînin hişmendiyê, heta yên di bin bandora dijmin de dimînin, pêwîste bi dijmin re li hev



nekin. Yanî tuyê dijmin û xwe baş nas bikî. Tûyê hişmendî, bawerî, vîn û îdaya têkoşîna li dijî dijmin di xwe de ava bikî. Rastiya vê ya hatî ispatkirin heye. Tûyê vê hişmendî û baweriyê ji rastiya Berxwedana 14'ê Tîrmehê bigirî. Ev gengaz e. Encameke herî girîng a ji vê derbixî ev e. Bila kes nebêje, "Em nikarin tê bikoşin, ne bi bandor in, nikarin ser kevin, derfet tune ye, astengî hene".

Girtîgeh li ber xwe didin. Berxwedêr ketine greva birçîbûnê. Dixwestin bikevin rojiya mirinê jî. Lê bi şêweyên cuda ji aliyê hinek derdoran ve hatin astengkirin. Dema wisa bû rêbazên cuda yên berxwedanê dîtin. Hîn jî berxwedaneke ku pêşengiya civakê dike li ser bingehê Pêngava Azadiya Gerdûnî dimeşînin. Bi vî awayî beşdarî Pêngava me ya Azadiya Gerdûnî dibin. Wê demê rê û rêbaz tên dîtin. Xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê di her mercê de rê û rêbazan dibîne, mirovan afrêner dike, ser dixe. Bes bila ew xet rast bê fêmkirin. Dikarin vê ji derve, li çar parçeyên Kurdistanê, li derveyî welat, Ewropa û li qadên din jî bikin. Ji ber wê jî xeta ku ji gelê Kurd û dostên wan re derbasdar e ev e.

Xala duyemîn, pêwîste feraseta çareseriyek zû, bi hêzên mêtînger-qirker re li hevkirin û li kêleka wan sekinîn, feraseta bendewariyê bê şikandin. Berxwedêriya 14'ê Tîrmehê her tişt hesab kir. Pêşbîn kir ku li cih û dema guncaw gav biavêje. Lez nekir. Lê ji kesê nekete nava bendewariyê. Taloq jî nekir. Hem li Tirkiyê hem jî li derveyî welat gelek kes di nava bendewariyê de ne. Di vê wateyê de rewşa nasnekirina hêzên jiderve heye. Ji wan hêvîkirinek heye. Ev nêzîkayî ne nêzîkatiya Mazlûman, Kemalan, Xeriyan e. Ev nêzîkayî nêzîkatiya reformîst, yên radestbûyî, xeta netewperestiya burjuvaya biçûk e. Başe, netewperestî, reformîstbûyîn û radestbûyînek wiha heye? Erê, heye û ev hertim li dora me dizivirin, li dora me kom dibin.

Niha xeta Berxwedanê 14'ê Tîrmehê red nakin. Qet nebe di gotinê de red nakin. Bêguman di hindir de erê nakin, napejirînin. Lê dîtin ku pratîkkirina vê xetê ev pêşketin û derfet ava kirin. Ji bo sûdê ji van derfet û pêşketinan bigirin dirûtiyê dikin. Ji ber wê jî di her derfetê de dixwazin ji rê derbixin. Xeta çalakiyê pasîfîze dikin, reformîze dikin, parçe dikin, rewşeke bendewariyê ava dikin. Ji DYE yê, Ewropayê yan jî ji CHP'ê hêvî dikin. Di ser gelek hêzan re rewşên bendewariyê ava dikin. Pêwîste vê rewşa bendewariyê ji holê rakin. Xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê ji kesekî tiştek hêvî nekir, kes guhdar nekir. Armanca azadî û demokrasiyê li çi, li ku, kengî dê pêk bê dîtin, biryar dan. Berxwedêriya Mazlûm jî wiha pêş ket. Berxwerdêriya Mezin a 14'ê Tîrmehê jî wiha derkete holê. Wê demê divê rastgotir û şênber bin.

Mehmet Xeyrî Dûrmûş di 14'ê Tîrmeha 1982'an de, di dadgeha 12'ê Îlonê de destpêkirina rojiya mirinê îlan kir. Di vê xalê de em li axaftina Xeyrî Dûrmûş binêrin. Diyar dike ku di rastfêmkirin û pêkanîna Rêber Apo de kêm maye û rexnedayînê dide. Rewşa ku têde ne bi wê ve girê dide. Ji be wê got, "Ez deyndar im, bila li ser kêlê gora min binivîsin deyndar". Negot, "Min evqas qezenç kir, ez wiha têkoşiyam, ev mafê min e, ev hiqûqa min heye". Hiha gelek derdor kom bûne, armanc dikin ku derfetên vê têkoşînê derxistine holê bidizin. Emê vê nepejirînin. Pêwîste ev bên dîtin û li dijî van têkoşîn bê meşandin. Cihê ku ev lê ne xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê lê jiyanî nabe. Wê demê pêwîste li ser xeta 14'ê Tîrmehê li dijî van helwest û nêzîkatiyan têkoşîn bê pêşxistin. Dê herkes bi rexnedayînê nêz bibe, dê xwe deyndar hîs bike. Ev 26 sale Rêber Apo di bin êşkence, tecrîd û qirkirina Îmraliyê de ye. Em weke tevger û gel têdikoşin, lê heta niha me ev pergal bi tevayî neşikand.

Erê, me serkeftina komployê asteng kir. Rêber Apo bixwe pergala Îmraliyê parçe kir. Fikrê xwe gihand her alî. Bû Rêbertiyek gerdûnî. Di serî jin û ciwan rê nîşanî tevayî bindestan dide. Lê pergala Îmraliyê ya qirkirin, tecrîd û qirkirinê bi temamî nehatiye parçekirin û tunekirin. Nekarî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo pêk bînin. Li ser vê bingehê ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd rê nehat vekirin û di pratîkê de pêk nehat. Wê demê emê bikarin qala kîna maf û hiqûqê bikin. Pêwîste em xwe deyndar bibînin. Pêwîste em xeta Xeyrî Dûrmûş rast fêm bikin. Dema Xeyrî Dûrmûş kete rojiya birçîbûnê ji bo dayîna deynê xwe dest pê kir. Dîsa jî got ku deyndar e. Niha emê xwe çawa bibînin. Ji ber wê jî emê çawa rast fêm bikin û rexnedayînî nêz bibin.

Divê em jibîr nekin ku Xeyrî Dûrmûş di heman axaftinê de binê tiştek din xêz kir; "Kesên ku dixwazin ji bo serxwebûn û azadiya Kurdistanê têbikoşin, teqez divê xeta têkoşîna çekdarî esas bigirin. Bi awayek din ev têkoşîna azadî û serxwebûnê pêş nakeve û nagihe serkeftinê". Ev jî xeta bingehîn a Berxwedana 14'ê Tîrmehê ye.

Wê demê heta berxwedana şoreşgerî ya çekdarî nebe têkoşîna azadî û demokrasiyê pêş nakeve. Berxwedana 14'ê Tîrmehê her cûr rêbazên têkoşîn pêşbîn kir, lê ji bo xwe berxwedana çekdarî esas girt. Wê demê eger şerê şoreşgerî yê li ser bingehê parastina cewherî, têkoşîna şoreşgerî ya çekdarî û gerîlla nebe emê nekarin tiştekî qezenç bikin. Eger baldar bin xeta 14'ê Tîrmehê di Pêngava Gerîlla ya 15'ê Tebaxa 1984'an de hebûn qezenç kir. Bi têkoşîna gel a bi pêşengiya gerîlla pêş ket.

Îro jî rêya bingehîn a rast fêmkirin û serxistina xeta 14'ê Tîrmehê bi esasgirtina şerê parastina cewherî ya bi pêşengiya gerîlla ye. Emê beşdarî vî şerî bibin. Her kesê ku destê wê/wî çekê digire, yên ku hêza wan têrê bike dê beşdarî vî şerî bibe, piştgiriyê bide vî şerî. Dê di pêşengiya vî şerî de têbikoşe. Heta ku şerê parastina cewherî ya bi pêşengiya gerîlla nebe, heta ku êrişên qirker-mêtînger-faşîst û êrişên komploya navnetewî neyên şikandin, em nikarin qala jiyanekî, destkefiyek mayînde bikin.

Rastiya ku me anî ziman ji bo roja me rojaneyî û derbasdar e. Ji ber ku faşîzma AKP-MHP'ê ji her alî ve êriş dike. Her cûr zilm û heqaretê dike. Em bi awayekî baş li hember nasekinin. Sîxwir û xayîn cirîdê diavêjin, lê em lê naxin. Qasî tê xwestin tolê hilnadin. Erê, li Zapê, Avaşînê, Metîna, Xakûrkê, li çiyayên Kurdistanê gerîlla şer dike. Lê ev şer şerekî sînordar e, li qadeke teng tê meşandin. Li gel vê jî gerîllayên azadiya Kurdistanê, li ser bingehê şerê ku 15'ê Tebaxê li ser xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê destpêkirî, di sala têkoşînê ya 40'emîn de didomîne. Derbeyên giran li dijmin dide. Hem jî vê bi di asta herî jor de jiyanîkirina xeta fedayî ya Rêber Apo de dike. Di vê wateyê de derbên mirinê li faşîzma AKP-MHP'ê dide. Zivistana borî li Zap û Metînayê bi Operasyonên Şoreşgerî faşîzma AKP-MHP'ê felc kirin. Anî ber rewşa hilweşînê. Serweriya istixbaratî û teknîkî ji holê rakir. Lê ev ne têrker e. Pêwîste em di bin pêşengiya vê de şerê şoreşgerî yê parastina cewherî li her derê belav bikin. Pêwîste em vê li bajaran, deştan belav bikin. Pêwîste ciwan, her kesê ku destê wan çekê digire xwe perwerde bikin, birêxistin bikin û vî şerî bimeşînin. Pêwîste pêşengiya têkoşîneke bi vî awayî bikin.

Bêguman pêwîste em ji serhildanan heta çalakiyên girseyî, ji têkoşîna aborî-hiqûqî heta têkoşîna demokratîk, tevayî têkoşînan di bin pêşengiya şerê parastina cewherî de pêş bixin. Serkeftina tevayiyan bi meşandina şerê parastina cewherî ve girêdayî ye.

Wê demê şer ne tiştekî ji rêzê ye. Ev ji bo me wesiyet û fermana rêheval Xeyrî Dûrmûş, heman demê de ya Berxwedana 14'ê Tîrmehê ye. Êdî pêwîste em li gorî fêmkirina xwe pêk bînin. Lê divê em bizanin ku azadî û demokrasî bi şerê şoreşgerî yê parastina cewherî tê qezençkirin. Em dikarin bi berxwedana gelemperî ya li dora şerê parastina cewherî pêşdikeve ser bixin. Pêwîste di bingeha her têkoşînê de berxwedana şoreşgerî ya çekdarî hebe. Yên ku li dijî berxwedana çekdarî derdikevin, ên ku vê red dikin derewan dikin, bêrûmetiyê dikin. Hîn rasttir dixwazin li ser vê bingehê destkeftiyên derketine holê ji holê rakin. Hinek di bin de bin de vê dikin. PDK yî, ew reformîstên burjuvaya biçûk hewl didin xiyanet û hevkariya xwe di nava civakê de belav bikin, hewl didin vê di bin de bin de bikin. Ev ji dijmin zêdetir dijminê têkoşîna azadiya Kurdan in. Di demê borî de jî ev kirin. Dema Berxwedana 14'ê Tîrmehê pêş diket, ev li dijî berxwedanê derdiketin. Her cûr êriş pêk dianîn. Niha jî heman tiştî dikin. Pêwîste herkes vê bizane. Pêwîste ciwan, jin, şoreşger, welatparêz vê baş bibînin. Ji ber wê jî pêwîste em li dijî vana têbikoşin, bertek nîşan bidin. Pêwîste em hem xwe bikişînin xeta rast, hem jî yên liser xeta şaş, yên me asteng dikin, hişmendî û nêzîkatiyên li hemberî dijmin lewaz dihêlin, bi terz û helwestek bi bandor, bîrdozî, siyasî têbikoşin. Heta têkoşîna bîrdozî neyê meşandin, têkoşîna leşkerî-siyasî pêş nakeve. Têkoşîna li dijî hevkarî û radestiyê, bi têkoşîna li dijî mêtîngerî û qirkirinê re hevpar e. Ji hev nayên cudakirin. Wê demê emê van têkoşînan bi hev re bigirin dest. Emê ji rastiya Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê vê encamê derbixin.

Eger ev bên esasgirtin dê Xeta Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê di sala 43'an de hîn bihêztir, fêrker û rênîştir bibe. Dê bi awayekî bibandortir jiyanî bibe û pêk bê. Emê hîn zêdetir bi ruh û hişmendiya fedayî ya Rêber Apo ku Berxwedana 14'ê Tîrmehê nûnertiya wê dike xwe bipêçin, bi awayekî afrênertir, gelemperî û bibandortir beşdarî têkoşînê bibin. Li ser vê bingehê emê Pêngava Azadiya Gerdûnî ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo armanc dike, li herçar parçeyên Kurdistanê û derveyî welat hîn bibandortir pêş bixin, di sala 43'an de bigihînin serkeftinê. Armanca me teqez ev e. Rast nêzbûn, esas girtin, beşdariyek rast a ji xeta Berxwedana 14'ê Tîrmehê re dê tenê bi vî awayî pêk bê. Li ser vê bingehê ez careke din lehengên Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê rêheval Xeyrî, Kemal, Elî û Akîf, di kesayeta wan de tevayî şehîdên me bi rêzdarî, heskirin û minet bi bîr tînim.

Di serî de jin û ciwanan, bang li tevayî rêheval û gelê me dikim ku xeta Berxwedana Mezin a 14'ê Tîrmehê di sala 43'an de hîn rasttir fêm bikin û bi serkeftî pêk bînin!

■■■

# HETANÎ KU XWE PARASTINA JINAN NEBE ŞOREŞA CIVAKÎ PÊKNAYÊ

**Dilzar Dîlok**

Mirovahiya cîhanê ji roja ku bajêr, dewlet û çîn hat ava kirin û hetanî niha di nava şer de ye. Şerê Cîhana 3'emîn a ku em îro di nav de ne jî, şereke ku li dijî jinan û civakê tê rêvebirin. Wekî ku Rêbertiya me bi girîngî û bitaybet destnîşan kirî, divê jin tenê û tenê bibe ya xwe û pêwîste ji bo vê jî xwe biparêze. Ji bo ku xwe ji mirinê rizgar bike hewceye ku xwe biparêze. Ji bo ku biwate jiyan bike û vê jiyanê bi nirxên jin ve ava bike lazime xwe biparêze. Di vê wateyê de bi danezanek hevpar ve a di meha Nîsanê de KJK û PAJK'ê banga rêxistin kirina xweparastinê, mezin kirina şoreşê û serxistina şoreşê li hemû jin, rêxistinên jin kir, çalakiyek wateya wê mezin bû. Pêvajoya Şerê Cîhanê ya 3'emîn, afirandina wan qeyranan sîstematîze dike, berdêla wan qeyranan bi civakan dide razandin û hegemonyayê li herêmê ava dike. Qeyran diafirîne û dibêje ez ê çareser bikim. Çûyîna Iraq û Efganîstanê ya bi armanca 'ez ê demokrasiyê bînim" a Emerîkayê wiha ye. Di eslê xwe de dayîna mînakeke rojane wê hê baştir be. Dewleta Tirk a qirker bi saziyên xwe ve, bi pêkanînên xwe yên faşîst sîstematîk ve li dijî gelê Kurd qirkirinê pêktîne. Enerjiya ku ji xweza, çavkaniyên Kurdistanê bidest dixe nade Kurdan, wî bixwe şewata ku digotin ji dîrekên kehrebê rûdaye derxistiye ê ku neçû şewatê bitefîne ew bixwe ye – ku hefteyek beriya wê ji bo şewata li daristana Çanakkalê pir hêz-derfet xistibû dewrê ku rast bû- yê ku kesên dixwestin şewatê bitefînin nexistî qadê, rê girtî ew bixwe ye û dîsa yê ku mirina mirov-heywanan temaşe dikir ew bixwe bû, lê yek jî yê ku dixwest biçe sersaxiyê rûne jî ew bixwe bû. Bêguman êdî Kurd gurên ku libas guherî bi gur re dixwe û bi şiwan re digirî nas dike. Gelê me bi awayek pir baş walî û cendirme ji cihê sersaxiyê qewirandin. Hetani derketina kesê dawî jî hemû berteka xwe danî holê. Şerê Cîhanê yê 3'emîn bi vê mantiqê ve dixebite, bi derxistina qeyranê re bêaramiyê çêdike lê xwe wek afirîner-mîmarê aramiyê nîşan dide. Piştre jî dema ku xwe vedikişîne li holê xirbe dimîne. Dîmenên mirovên ku piştî Emerîka ji Efganîstanê xwe vekişandin şûnve derketin holê û tabloyek ku dîroka mirovahiya cîhanê, tevgerên azadiyê ji bîr nekin derxist naverastê ku berdêla wê jî herî zêde jin didin.

Her qada jiyanê vegerandin qadên ku ev qeyran hebûna xwe bidomînin. Talana xwezayê pirsgirêka ekolojîk mezin dike. Dewlemendiya hê zêdetir a dewlemendan, kendalên çînî kûr dike. Medyaya dîjîtal û cîhana ragihandinê piştî gotina bisêhr a 'xwe gihandina agahiyan', ji hemû mirovahiyê tişta ku dide hê zêdetir distîne, mirovahiyê ber bi rûxandinek exlaqî ve dibe. Dest bi guhertina avaniya mejiyê mirov kir. Bêguman civak û jinên ku cewher, xwe û rastiya xwe winda nakin, jiyan kirina bi wan pergalên wiha ve qebûl nakin. Ji ber vê sedemê ye ku tekoşînên li dijî pergalê cur be cur dibin.

Her çiqas Şerê Cîhanê yê 3'emîn bi salên '90'an re destpêkiri be jî bi sala 2023'an re lez û bezî qezenç kiriye. Nekarîn şerê Surî xelas bikin, vegeriya qadek ku dêwên cîhanê şantajên xwe parve bikin. Kurdistan jî tam di nava vî agirî de cihe xwe digire. Şerê Rusya-Ukraynayê bi hemû tundiya xwe ve birastî bi hemû bêwateyiya xwe ve didome. Dîsa şerê tirsnak a ku HAMAS'ê da destpêkirin û ji Îsraîlê re jî bû fersendek mezin, didome. Şerê Ermenîstan-Azerbaycanê heye. Li Efganîstanê anîna li ser desthilatdariyê ya Talîbana ku dijminê jin û civakê, êrîş-darbeyên leşkerî yên ku timî di parzemîna Efrîqayê de tên jiyan kirin, di serî de welatên Abya Yala di gelek welatên cîhanê de; veguhestina partiyên faşîst a li ser desthilatdariyê, dîsa welatên wekî Lubnan, Iraq, Yemen, Sudanê jî bûne welatên ku şer xelas nebin. Di cihê ku şer hebe de qetlîam hene, cihê ku şer hebe xizanî, rûxandina ekolojîk, qetlîama xwezayê û qetlîama kedê heye. Di cihê ku şer hebe de tecawîz, fihûş, tiştên xerab hene. Û ew hemû dibin pêvajoyên ku jin herî zêde bên qetil kirin, bên tepisandin û bikevin pozîsyonek ku ji çîna duyemîn hê paşdatir. Di navenda hemûyan de jî jin heye.

### Êrîşa sîstematîk û rêxistinkirî ya pergala mêrê serwer heye

Li dijî jinan êrîşek bipergal û birêxistinkirî heye. Yê ku êrîş dike kiye? Pergala mêrê serwer û desthilatdariya biçîn-bidewlet êrîş dike. Dîrok, paşeroj û ezmûnên bi hezaran salan a wan êrîşan hene. Em nikarîn wekî ku ev êrîş, ev qetlîam, ev tundî, ev hovîtî nebin tevbigerîn. Ji ber tevgerandina ku wekî tine, tê wateya taqlîda mirinê. Lê em jiyan dikîn û hene. Yanê em ne mirîne. Eger em nemirîbîn, nexwe ji bo jiyanê em mecbûrîn ku herî baş, di asta rast û têrker de parastinê fêr bibîn.

Dibêjin ku eger mirovek êş hîs bike zîndiye, lê eger êşa yekî din hîs bike mirove, bawerim gotin wiha bû. Ev tespît ji bo jinan diguhere, tê rewşa hê berfirehtir. Em jin tenê êşa hin kesan, êşa mekanên cuda jiyan nakin; êşa demên cuda yên zîndiyan jî hîs dikin, parve dikin. Ev me ber bi avabûyînek nû ya tirsnak ve araste dike. Ava bûyîna me hîna berdewam dike, em zêde dibîn, di nava zêde cur be curiyan de em-ez dibîn em. Ev me dike xwediyê jiyana ku bi tijî têgihiştinên mezin ve dagirtî û helbet bi xwe re dike xwediyê şans-derfetên bên pratîze kirinê jî. Em dikarîn welê jî bêjîn: Dema ku jinek tenê û timî bi diyardeya 'ez' ê ve bihizire, eger bi tevgera hesta 'ez' ve nebe em; dibe mêr, dibe rehîneya eqlê mêr. Ji ber ku ji diyardeya 'ez' re elîqî mayîn tê wateya ku eql û dil cemidiye. Ev jî nîşaneya avaniyên desthilatdar û ji ber vê yekê zîhniyeta mêrê serwer e. Çawa jiyanên mirovek ku 7 hezar sal beriya niha hatî dinyayê û zarokek mirov ê ku îro hatî dinyayê cuda dibin?

Dema ku mirov tê cîhanê hebûnek e. Bi beden û ruhî ye. Her du jî bê ezmûn in, mihtaç in. Herî zêde jî pêdivî bi dayîkê heye. Piştî hênaseya destpêkê şûnve, bi hewldanek mezin dev diavêje memikê diya xwe û şîrê wê vedixwe. Hem daxwaz, xwestekên wê/î pêktên û hem jî hebûna wî/ê digihije derfetên cur be cur. Dema şîrê destpêkê vexwar şûnve êdî tê wateya ku dersa ewilî ya jiyanê girtiye. Jiyan bi dayîkê re di bin ewlehiyê de ye. Xwestek, xwestekên hebûnê dikare bi dayîkê re pêkbên. Diyardeya dayîkê, tê wateya garantî kirina jiyanê û pêkhatina daxwazan. Helbet ev têgihiştin û ev domandina wiha ya vê avaniya ruhî ya ku bi vê






têgihiştinê ve girêdayî pêkhatî, pêkane ku hebûn beşdarî jiyana xwezayî jî bibe. Asteng kirina jiyanê, pêknehatina daxwazan, ne pêşwazî kirina pêdiviyan, şûna pêdiviyan bicih kirina tiştên cuda, tundî û zext tên. Dîsa gava ku daxwaz bicih tên, daxwaz ji heqîqetê derdikevin, vedigerin heqîqetek biêş. Têgihiştina destpêkê û wateya ewilî sekinî. Wê hesta baweriyê parçe parçe bibe û xew bireve. Eger ev zarokê mirov kur be, hingî mezin bibe û bibe mêr, wê bibe hebûnek nû yê ku ji mirovbûyînê derketî û bibe xwediyê hebûnek ruhî yê pasîf-parçe parçeyî.

Wê êş bide û bê baweriyê biafirîne. Eger ev zaroka mirov jin be, hingî ku mezin dibe û dibe jin hê zêde pasîf û parçe parçe dibe. Ji ber ku pergal, wê ji daxwaz standinê dûr digire û hê zêde êş pê dide kişandin, hê zêde ber bi jiyanek bêewle ve dahf dide, hê zêde zerar dide û tevahî vedigerîne hebûnek ku her ku biçe ji hembêza dayîkê dûr bikeve û êş bikişîne. Di vê serdemê de jin bûyîn, bi xwe nas kirinê re tê wateya êş kişandinê. Hûn di kîjan erdnîgariyê de jiyan dikin bila bikin, ev wiha ye. Her çiqas hinek cudahî hebin jî cewherê wê wiha ye. Bêguman şiklî di parzemîna Ewropayê de û şiklî nîvgirava Ereban ne wekî hevin, lê dûrahiya xwebûnê ya ku di cewher de tê jiyan kirin heman in. Di her du parzemînan de jî jin bûyîn, rewşa êrîşek timî ye. Êrîş, ji desthilatdariyek ku pêşî li daxwazên hebûnê, pêwîstiyên jiyanê digire ve destpêkiriye û her ku diçe ji pozîsyona mirovbûyînê zêdetir ber bi wêdatir ve kaş dike, tê. Têşedayîna nava malbatê- navê wê bûye kevneşopî, rêûresm, faktora hawirdorê û hwd. – zexta hawirdora ku dikeve navê û qafesa nayê dîtin a ku saziyên dewletê afirandin, ji bo jin dibe wek mirinê.

Li hember wan hemûyan şertê hebûnê; pêşxistina zanebûn, haydar bûn, xweparastin û rêxistine. Di vê wateyê de danezana xweparastinê ya ku KJK'ê û PAJK'ê hevpar weşandîn, ronahiya pêşî ya manîfestoyek jin a têkildarî wê jin çawa azad jiyan bikin in. Divê em wiha bixwînîn. Tenê ne rojaneyî ye, vê pêvajoyê jî baş vedibêje, lê di tarzê ku pêwîste karakterê serdemê çawa bibe de ye. Li hember heqîqeta hebûna azadiyê, şansê modernîteya kapîtalîst tineye. Tiştên ku tên xespkirin wê wextek şûnve xelas bibin. Dîsa afirandina qeyranê ya ji bo vekirina qadên nû yên mêtîngeriyê, taybetmendiya herî karakterîstîk a modernîteya kapîtalîst e. Xizan kirina civakê, di nava civakê de anîna rewşa ku malbat mihtacê pergalê bibe, ji bilî vê bixîne rewşa parsekek pergalê, bi heman şiklî di nava malbatê de jî jinê hê zêde bike parseka pergal û mêr, dibe yek jî rêbazên herî bingehîn ên pergala serdest. Ev xizan kirin ne ji ber xwe ye. Ne bûyîna têrker a av, xurek û bidestnexistina zirûfên jiyanê, dibe encamê polîtîkayên pergala heyî. Pir girînge ku xizaniya jin, ji aliyê rêxistinên jin ve tê rojevê. Ji ber ku xizan kirina jin, rêbazek zêde kirin û rewa kirina fihûşê ye. Ji aliyekê ve bi navê dewlemendên cîhanê kesên cîhana xeyalî diafirînin hene û kesên bi dewlemend bûnê ve nizanin wê çi bikin, pare didaqurtînin hene û ji aliyê din ve jî mirovên birçî hene. Ev bêhevsengî-ev rewşa dîn û harî, encama pergalê ye.

Jiyan wekî rûbarekê ye. Derfetên ku jiyanê pêşkêşî mirov, heywan û hemû zindiyan re kirî jî wekî rûbarekê ye. Her kes dikare li perava vî rûbarî qasî pêdivî pê hebe av vexwe. Eger nekare vexwe jî û hinek bi satilan av tijî bikin û ber bi aliyên cuda ve birijînin, qirêj bikin û hinek jî ji bêaviyê bimirin ev ne tiştek asayî ye. Xizantî ne tiştek asayî ye. Ferqa di navbera çînan de ne rewşek welêye ku bê qebûl kirin. Tekoşîna îro ya çînan têkildarî rakirina ji holê ya pergala ku vê xizaniyê diafirîne ve girêdayî ye. Di koka vê tekoşîna çînî de jî azadiya jin heye. Rêberê me, Bîrdoziya Rizgariya Jin, wek vekirinekê di sosyalîzmê de pêşbînî kiriye û pêşxistiye. Ji ber ku di koka afirandina çînên jêr û xizan kirina civakan de dijminatiya jinan heye.

Divê bi wan hemûyan re hinek caran li kêleka vê herikîna pir zêde, pir serî û tevlîhev bisekine û binêre û xwe ji nû ve pênase bike û bêyî ku pênaseyên destpêkê ji bîr bike, pênaseyê bibîrbixe. Jin bûyîn pir zehmet e, di zanebûyîna jin bûyînê de û bi vê hişmendiyê ve jiyan kirin hê zehmetir e. Ew qas jî tevlîhev, biqeyran, wate barkirî û hisiyateke ku ji lêgerîna wateyê re derfet peyda dike. Bêguman zanebûna jinbûyînê bi gihiştina wateya jiyanê ve eleqedar e. Zanebûna jin bûyînê, tê wateya ku zanebûna dîrokî ya dayîkê fahm kiriye, rojane kiriye, heps kirina nava sînorên temen û biyolojîk red kiriye. Di her jina ku Rêbertî fahm kiribe, hîs kiribe, xwesteka jiyana bi wî re kûrahiya dilê xwe de hîs kiribe, ev wihaye. Îro ji bo ku vêya

fahm bike û ji bo ku bigihije asta zanebûna jinê, divê li dijî wan êrîşên mêrê serwer ên ku kêlî kêlî pêşdikevin zana bibe, xwe rêxistin bike û rêvebirina wê serbixîne.

Xweparastin, tenê ne rewşek welê ye ku di gotinê de îqnayê parastinê bibe. Xweparastin, bi rêxistin bûyîna xwe ve di nava girseyên herî berfireh ên jin de dixebite, xwe rêxistin dike, li dijî her êrîşê parastinê plan dike û dema ku pêdivî pê hebe bi şêweyek herî profesyonel xwe rêxistin dike û xwe bi amade kirina şerê herî dijwar ve pêktê. Cureya din tenê di gotinê de dimîne û ev jî têr nake. Bêguman gotin girîng e. Divê fikrê kar hebe û hewldana wê jî bê dayîn. Lê eger pratîk jî tinebe, yanî kirin tinebe, encama fikrî û zikrî têr nake. Bezandina baş têra nake, pêwîste xeta dawî kirinê bidî li berçavên xwe ku em vê jiyan û şerê azadiyê qezenç bikin.

Ger xweparastin nebe şoreş nabe. Pêwîste di her qada tekoşîna şoreşgerî de xwe rêxistin kirin hebe, dibe ku kêmasî hebin, hinek kar bên taloq kirin. Lê hetanî ku xweparastin nebe şoreş nabe. Xweparastin nikare bê taloq kirin. Hetanî ku xweparastin di asta herî baş de neyê rêxistin kirin şoreş nabe. Divê wek tekoşîna azadiya jin, em teqez xweparastinê di hemû qadên ku em rêxistinkirî de rêxistin bikîn. Eger komek jin zana dibin û bingeha siyaseta demokratîk azad diafirîn in, ev tê wateya ku wê derê zemîna xweparastinê jî heye.

Sernavek din a girîng jî ew e ku xweparastin nikare ji kesek din re bê hiştin. Xweparastin dewrî kesek din nayê kirin. Xweparastina jin dewrî kesek din nayê kirin, radestî ti kes û pergalekê nayê kirin, hela qetiyen ji mêr re nayê hiştin. Eger jin parastina xwe tenê ji mêr re bihêle, ev tê wateya ku teslîmê pergalê bûye. Her zindî mecbûre ku bersiv bide êrîşa li ser xwe û xwe biparêze. Ji ber vê yekê bi gotina “Lêxe gerîla lêxe, Kurdistanê ava bike” ve nabe. Gerîla pêşeng e, wê timî jî pêşengtiya xwe bike. Lê hiştina li ser milên gerîla ya hemû xweparastinê jî nabe. Tişta ku em dibêjin Kurdistan zanabûnek welat e, lê ji wê hê zêdetir em dikarin di nava wê de azad jiyan bikin û bersivek biwate bidîn pirsa çawa bijîn. Her ku mirov jiyana xwe ava kir dibe heqîqetek pêkan. Û ev karê her kesî/ê ye. Armanç, xeyal, hesret û erka her kesî/ê ye. Gerîla pêşengê vî kariye, pêşengê ava kirina Kurdistanê ye. Lê ne yekane avakerê wê ye. Divê em xwe ji vê şaşitiyê rizgar bikin. Xwe ne rizgar kirin û tenê ji gerîla re- ji hêzek din a jor re hiştin- wê wextek şûnve rewşek ku mirov ji dewletê daxwaz bike, biafirîne. Wê pêşî lê bigire ku hêza gel bixwe dernekeve. Helbet parastina gelê me û deskeftiyên gelê me erka me ya bingehîn e. Lê pêkanîna şoreşê berhemê gelan e.

Tevgera Azadiyê guhertinên mezin afirand. Ji aliyekê ve hewl dide bide fahm kirin ku hêza gerîla hêza pêşenge, lê belê ne hêza yêkane ya şoreş lidar xistinêye; wê vêya bi gel re bike, wê ji gel re pêşengtî bike, perwerde bide û gel arasteyê Şerê Gelê Şoreşgerî bike û wê ji aliyê din ve jî hewl bide li ser vê bingehê ji gel re bêje ku tenê li benda gerîla nesekine, erê li pêy pêşeng biçe lê belê; tu hêza bingehîn a şoreşêyî.

Bêguman ev ne tenê xebat, plana pêvajoyekê ye. Ev xebata zîhniyetek a di nifşekê de, di neteweyekê de, di serdemek û hemû mirovahiya cîhanê de bê afirandinê ye. Zîhniyet şoreş bixwe ye. Di vê wateyê de îro asta ku tevgera azadiya jin hatiyê, wekî ku di danezana ku hatî weşandin de jî tê dîtin nîşan dide ku em di qonaxek girîng a şoreşa me ya azadiyê de ne. Asta ku gihiştî girînge, biwate û mezine, lê erkên ku pêwîste hatin qezenç kirin hê zêde bên mezin kirin, mayînde kirin û pergalîze kirin.

Mînak wê şoreş li Rojavayê Kurdistanê çawa mayînde bibe? Bêguman bi beşdarî kirina gel a ji rêxistin kirinên şoreşgerî re, hê zêde gel beşdarî xebatên ava kirina ku gel çêkirîn bike û pergala hatî ava kirin hê zêde bihêz bike, fermî bike, berfireh bike û nifşên nû li ser bingeha zîhniyeta vê pergalê perwerde kirinê ve…

Parastina gel tenê ji saziyên rêxistinkirî yên artêşê re hiştin jî ne rast û têrkere. Ji bo jinan YJA-Star hêza parastina bingehîn e. Kurdistan û Rojhilata Navîn garantiya azadiya jin e. Di her parçeyê de hebûna hêzên jin ên xweparastinê pêwîste ku hebin. Bi wê re divê her jin xweparastinê fêr bibe, ji bo vê jî xwe rêxistin bike, rêxistinên sivîl ên xwecihî ava bike. Jinên ciwan ên ku di taxekê de jiyan dikin, dema ku êrîşên tacîz, tecawîz an jî netewperestî li ser wan çêbûn her hal wê benda YJA-Starê ne sekinin. Pêwîste di her taxê de jinên ciwan xwe teqez rêxistin bikin, bi hev re tevbigerin û xwe biparêzin. Ên ku xweparastina xwe ji yekî din re dihêlin nikarin azad bibin. Mînakên vê di cîhanê de pir zêde ne. Mesela ne Emerîka dikare jinên Efganîstanê biparêze û ne jî Talîban ku jinên Efganîstanê jî di vê zanebûnê de ne, lewra rêxistinên xwe mezin dikin. Li gel paşverûtiya êrîşkar a Talîbanê jî tekoşîna xwe didomînin.

Di vê mijarê de sernavek jî têkildarî pêşxistina hişmendiya xweparastinê ye. Pêwîste di vê mijarê de hemû jin bên pêşxistin. Mînak em tevgerek 50’î salîne, avaniyên me yên jin ên rêxistinkirî yên 40 salî hene, lê hîna derdorên ku me xwe negihandin wan hene. Gelê me ji tune bûyînê hebûn ava kir û di nava şoreşan de şoreş jiyan kir, lê hîna şoreşên ku bên kirin hene. Beşên ku me hîna ji wan re behsa şoreşê nekirî hene. Ji ber vê yekê erkên girîng dikevin li ser milê çapemeniya jina azad jî. Divê çapemeniya jina azad, xweparastinê bixîne rojeva xwe. Em dizanîn ku jinên xebatên çapemeniya azad rêvedibin, ji avaniyên fîzîkî û hetanî gotinên xwe, ji şêwazên xwe yên jiyanê û hetanî tiştên ku dikin bi her tiştê xwe ve di bin êrîşên serweriya mêr de ne, di bin gefan de ne. Dîsa em dizanîn ku ev kar û xebat di bin zehmetiyên mezin de tên rêvebirin. Ev rewş pêwîste dike ku xweparastin di rojevê de bimîne.

### Divê jin bizanin ji hêla fîzîkî ve xwe biparêzin

Di vê mijarê de xebatên girîng tên kirin, mijarê hildidin rojevê, nîqaş dikin. Dîsa me di hinek televîzyonan de dosyayên bianîmasyon ên xweparastinê temaşe kirin. Ji pirsa ku dema jin rastî kesên ku ji bo tacîz-tecawîzê nêzîkî wê dibin, tundî pêktînin xwe çawa biparêze re bersiv bû. Hêsan-sade û baş bû. Pêwîste ev tarz hê zêde bê kûr kirin, hê zêde bêhurgîlî kirin û bi rêbazên hê afirîner ve bê domandin. Divê her jin bizane ku xwe ji aliyê fîzîkî ve biparêze. Ji bo vê jî hewceye taktîkên vê yên xweparastinê jî bizane. Lê lazim e ji aliyekê ve jî wekî ku avaniyên jinên rêxistinkirî tînin ziman jin bi hev re tevbigerin, rêxistinkirî bin, li hember amadekariyên pergala mêrê serwer bêamadekar an jî tena serê xwe nebin.

Mînakek din jî dikare li ser tundiya nava malbatê bê dayîn. Ev mijar birîna herî mezin a civakan in. Mijara xweparastina li dijî tundiya nava malbatê pir girînge. Zanebûn û çareser kirina rêya kurt ne pêkan e. Divê zana bibe, xwe rêxistin bike û bihêz bike. Faktora herî mezin nebûyîna civak, nebûyîna jin û mêrê azad e. Em di demên dawiyê de nûçeyên têkildarî mêrên ku hevjînên xwe dikujin, hevjina xwe ya di qonaxa hevberdanê de dikuje, xizm, bav û hwd. dikuje û piştî wan jî xwe dikuje, dibihîzîn. Mêrê ku ji aliyê pergala serwer ve hatî mezaxtin, jinê jî dikuje û dest û lingên xwe ji jiyanê vedikişîne. Di eslê xwe de pergala serweriya mêr, artêşa tetîkkêş a ji mêran pêktê ava dike û piştre tetîkkêşan jî ji holê radike. Ev dibe wek çerxa xwe dubare dike ya koletiyê. Rêbazên herî bingehîn ên faşîzmê ye. Derxistina mêran a ji vê çerxa ku xwe dubare dike, pir girînge. Ji bo vê jî divê diyardeya malbatê bê nîqaş kirin. Pêwîste jin, di qadên rêxistin kirî de diyardeya malbatê bixînin li ber nîqaşê. Ne dîtina vê pirsgirêkê ya wek pirsgirêka xwe; ya kesên bi hev re bûyînên di tarzê burjuwayê biçûk de rêvedibin yan jî kesên ku li gorî xwe astek pêwendiyan bidestxistîn, şaş e. Dîsa dîtîna vê pirsgirêkê ya wek rewşek paşverûtî-ne pêşketinî şaş e. Ji ber ku mêr di kîjan çînê de be bila bibe hetanî ku serweriyê derbas neke, pêwîste di çarçoveya “Kuştina zilam” de bê destgirtin. Di mijarên malbat, jin û mêran de zanebûn pêwîste û girînge. Dîsa divê destpêkê jin têkildarî; wê bi kî re, çi û çawa jiyan bike, biryar bide. Ji bo ku jin jî biryara rast bidin hewceye zana bibin û di wateya azadiyê de pîvanê bilind bikin. Ji ber ku jiyan û pîvanên pêwendiyan, ecibandin, hedefên jiyanê ji aliyê modernîteya kapîtalîst ve pir zêde hatine daxistin, lewra pîvanên jinan ên qebûl-red kirinê tên lewaz kirin. Divê di hemû parçeyên Kurdistanê de û di qadên em rêxistinkirî de çalakî, xebat û atolyeyên pîvanên red-qebûl kirinê diafirînin hebin. Ez ê çi qebûl bikim, çi red bikim… Jiyan bi kîjan mêr re dikare bê jiyan kirin, wê bi çi bê jiyan kirin, çawa bijî û bi kîjan mêr re di kîjan zirûfan de…? Divê ev hemû mijar di perwerdeyan de bên nîqaş kirin. Pêwîste di tax û gundan de bên nîqaş kirin. Birastî di rewşa heyî de bilêvkirina vê pêkan e. Bi mêrê heyî re nayê jiyan kirin. Ji bo vê jî pêwîste çalakiya kuştina zilam bê pêşxistin, mêr bê guhertin û di mêr de jî pîvanên azadiyê bên afirandin.

Lazim e parastina ferdî, parastina rêxistinkirî, parastina ku bi zanebûna kolektîf ve û birêxistin kirinê ve tê pêşxistin, dîsa hişmendiya parastina kesek din, taktîk û teknîk bên fêr kirin. Ji bo vê jî pêwîstî bi zanebûna cins, zanebûna jintî, fer kirina wate û nirxê wê heye û ya hê girîngtir hîs kirin dixwaze. Divê îro zerara ku jina di destê faşîzmê de û bi eqlê mêr tevdigere dide mirovahiya cîhanê, hindik neyê dîtin. Ji ber vê yekê jin bûyîn, bi hestên hevpar, bi eql û dilê jin ve ava kirin şertên bingehîn ên azadiyê ne. Ev mijarên girîng in. Lê ya hê girîngtir û ya jiyanî ew e ku mecbûriyeta parastina nirxên Rêbertî, nirxên azadiyê û nirxên jina azad in.

### Divê fikrê hevjiyana azad a Rêbertî rast bê fahm kirin

Dîsa êrîşên bêzanebûn tên kirin hene. Di eslê xwe de bi gotina civakê ve mînakên cehaletê hene. Pêwîste fikrê hevjiyana azad a Rêbertî rast bê fahm kirin. Rêber Apo fikrê hevjiyana azad, bi dayîna şerên asta Prometheusan ve afirand. Helbet afirandina wan nirxan wiha hêsan û erzan çênebû. Dema ku rastiyek wiha hebe, di nava pergala modernîteya kapîtalîst de lidar xistina zewacek klasîk û vêya jî wekî pir taybet û azad hîs kirin-pêşkêş kirin xapandinek mezin e. Di vê mijarê de di hinek qadên me de şaşîtiyên cidî hene. Dikare di nava lêgerînan de be, lê di nava pergalek îro de ku hîs bike bi zewaca bihezaran

mirov dikin ve wê azad bibe xapandinek mezine, birastî pêngav ji koletiyê re tê avêtin, serê xwe-mejiyê xwe girêdide. Destgirtina wek hevjiyana azad a zewaca ku di nava pergalê de pêktê, her roj tê kirin û bilez xerab dibe xapandinek mezin e û ev di heman demê de êrîşek mezin a li ser Rêberê me ye ku nirxên hevjiyana azad-paradîgmaya xwe di oxira berdêlên mezin de afirandî ye. Jixwe bi hezaran salan tê dubare kirin, mirov pêwendiyên kole pêşdixînin, wiha dikeve qadên bikaranînê yên pergalên serwer û dema ku ev dubare kirin gelek lêgerînerên binirx ên azadiyê didaqurtîne; pênase kirinek wiha ya zewacê û berevajî kirina pênaseyên Rêbertî, dibe rewşek ku pêwîste cidî bê rexne kirin û pêşî lê bê girtin. Arasteya ji zewacê re, encama ne afirandina pêwendiyên azad û beza ber bi pêwendiyên ferdî ye.

Em dikarîn li vê derê paragrafek kurt ji Rêber Apo bixwînîn:

" Dema ku di zirûfên roja me de, di rastiya me ya civakî de û di xebatên ava kirina bizehmet a neteweya demokratîk de serkeftinên mezin hatin bidesxistin, wê hevjiyana azad a herî biîdeal a jin û mêr bê jiyan kirin. Di Kurdistana roja me de di rastiya civaka Kurd de diyalektîkek evînê ya biwate mecbûre ku di rêjeya mezin de platonîk be. Ev evîn binirxe. Evîna platonîk evîna fikr û çalakiyê ye. Ji bo vê binirxe. Di her kêliyê de bi jinek bedew a cîhanê re jiyan kirin, ne evîn e. Jixwe ji ber ku ne evîne, lewra wextek kurt şûnve wê dirûtî bên pêşkêş kirin. Ji ber ku bê wate hatiye ava kirin an jî ji pêdiviya pêwendiyek biyolojîk çavkaniya xwe digire. Li beramberê vê di pratîka PKK û KCK'ê de gelek jin û mêrên ciwan ên ku duh qet bi hev re neman, kole; bi evînek platonîk ve bi hev re di ava kirina neteweya demokratîk a gelên xwe de cih digirin û bi serxistina karên mezin ve piştrast kirine ku çiqas kesayetên mezin in. Di vê mijarê de bi hezaran şehîdên me yên leheng hene. Ev lehengên mezinin ku Mem û Zîn-î serxistine."

Rêberê me her tiştê me ye. Nirxê me yê herî hêja, nirxê me yê herî mezin e. Hestiyariya li dijî êrîşên rasterast an jî ne yekser ên li ser Rêberê me û nirxên me yên Rêbertî û çi dibe bila bibe parastina wan nirxan, sedema me ya hebûn û tinebûnê ye. Ne parastina wan nirxan, di serî de tê wateya têkçûyîna li hember pergala modernîteya kapîtalîst û bûyîna bermahiya pergala qirkirinê.

Netewperestî çawa derket holê, çawa çêbû ku hişmendiya netew vegerandin çekekê… Dîsa ol çawa derket holê, çawa di astek ku mirov qebûl bikin de hat pergalîze kirin, çi çêbû ku ev piştre vegerandin çekekê? Hem alîgirên xwe kir kole û hem jî dest bi tinekirina dijberên xwe kir. Ev bêguman di encama operasyonên ku li dijî mirovahiyê, herî destpêkê de jî li dijî civaktiya ku bi nirxên jin ên azadiyê ve hatin ava kirin, pêşket. Ev operasyon ketin serhev û nuqteyên şikestina mirovahiyê pêkanîn. Ji ber ku jin di deverên herî hesas de cih digirin, lewra hem dişikên û hem jî ji destpêka şikestinan û hetanî niha di nava êşek ebedî de ne. Hinek jî qeyrana jin ev e. Niha em dibêjin xweparastin, hinek peyva aştiyê derdixînin pêşiya me. Bêguman di nava aştiyê de jiyan kirin daxwaza hemû kesî/ê ye. Lê dema ku pergalek serwer a wekî îro hebe, operasyonên kolekirina li ser jinan bênavber dewam bikin, eger her pêngava pergalê wek êrîşek li ser jinan vedigere, ne hizirandina parastinê û ji bo xwe parastinê ne rêxistin kirin her hal wê neyê hizirandin. Pêşnexistina parastin û xweparastina li hember pergalê û di serdemek wiha de, teslîmiyete. Dereng xistin, paşguh kirin, paşxistin an jî nêzîkbûyîna rûxar xeflet e.

Pergala dewleta mêr, eqlê ava kirina pergalan e. Ji aliyekê ve bi hincetên hiqûqî ve pêşî çekdariya ferdî digire, heta gotinên humanîst pêşdixîne, mirovan bêparastin dihêle û ji aliyê din ve jî artêş, artêşên rêk û pêk û endustriyên çek tên mezin kirin, artêşên çete tên ava kirin û belavî her deverê dikin, di bin navê şîrketên ewlehiyê de artêşên kirêkirî wekî robotên şer belavî hemû cîhanê dikin. Ji mêran artêşa rûxandina cîhanê tê ava kirin. Bêguman divê mêr jî xwe ji vê rewşa robotê şer derbixîne. Di paralela artêşan de şîrketên ewlehiyê, komên çete tên ava kirin. Bi şer kirinê ve mêrê ku bêkar hatî hiştin, dikin xwedî kar, birçîtî wiha tê tepisandin. Tişta ku em behs dikin, bîrdoziyên çar çete ku bûne belayê serê mirovahiya cîhanê.

Ev çar çete çi ne: Netewperestî, olperestî, zayendperestî, zanistperestî…

Em îro li Tirkiyeyê binêrîn, çawa avaniyên çete ava dike, yên ku ava dike çawa bikartîne û em li tehlîlên wan çeteyan binêrîn. Netewperest in. Îro MHP nasnameya destpêkê ya çeteyên li Tirkiyeyê ye. Eger Kurd jî bin mafya ne. Mecbûrîn ku destê çeteyên MHP'ê maç bikin. Di cîhana çeteyan de Kurditiyek tobe kirî li hember Tirkan tê qebûl kirin. Dîsa olperest in.

Hemû cîhanê dizanî ku DAIŞ ol çawa bikar dianî, çawa anîbû rewşa amûrek bîrdozî-siyasî û çawa olperestî dikir. Eger di hinek welatên Ewropayê de nêzîk bûyîn-meylên Îslamofobîk çêdibin; hemû mirovahiya cîhanê ne ji ber karakterê Îslamî, ji ber dijmintiya jin, dijmintiya civakê ya DAIŞ'ê tekoşîna hevpar meşandin. Piştî wextek dirêj şûnve dijberiya DAIŞ'ê bû nirxê hevpar ê mirovahiyê. Di vê wateyê de jî erênî bû. Eger em carek din vegerîn li ser çeteyan… Zanistperest in. Xerabiya herî mezin a ku siyaseta AKP-MHP'ê li Tirkiyeyê kir, kuştina bikok a hez kirina zanist û zaninê bû. Vaye em dibêjin pergala qirker; destpêkê wateya di mirovan de dikuje. Baş e di mirovê Tirk de ew qas tirsa terorîze bûyînê, ew qas dijmintiya Kurd çawa tê afirandin? Bêguman ji bo ku vêya bike divê destpêkê wateya di wan mirovan de bimire. Destpêkê wate, ruh û hezkirina ji zanîn, xweza, zanist û wateyê re heyî kuştin. Mirovê/a ku dihizirî hat biçûk xistin, rastî heqaretê hat, rastî êrîşê hat û xerab hat nîşandayîn. Di encamê de yan mirovên zanyar xistin zîndanan yan jî şandin sirgûnê. Niha li Tirkiye tebeqeyek din a zanyaran heye. Tebeqeyek welê ye ku wek hemû jî pisporê terorê bun, pisporê ewlehiyê bin û profesorê tîran bin… Di derdora wan de pergalek zanînê ya sexte ava kirin. Vaye ev tarzê zanîna çetegeriyê ye. Nuqteya ku ev her sê çete gihiştîn hevdu jî zayendperestiye. Zayendperestî bi serê xwe wekî ti tiştek nebe xuya dike. Lê hetanî ku zayendperestî nebe zanistperestî ne ti tiştê. Hetanî ku zayendperestî nebe olperestî bi serê xwe ne ti tişte. Êrîşa ku herî zêde DAIŞ xwe pê îfade dikir, dijmintiya jin, tecawîz, heta tecawîza li ser mêran û bi revandina keçikên Êzidî ve xwe îfade dikir. Wek kole dihatin bikaranîn.

## Zayendperestî ezmûna dawî ya hebûna hemû bîrdoziyên serwer in

Hetanî ku zayenperestî nebe netewperestî jî pir kubar dimîne. Em ji şopên qirkirina li ser Ermeniyan dibînîn ku çawa tecawîz di nava hev de bi qetlîam û bi koçberkirinan ve hatin rêvebirin. Dîsa di hemû êrîşên qirkirinê de tecawîza li ser jinan-zarokan jî wek parçeyek bingehîn a êrîşan rol leyîstiye. Netewperestî di cewher de bîrdoziya mêre, ji ber ku bi zayendperestiyê ve dikare hebûna xwe bidomîne, lê encax wê demê rastiya wê derdikeve holê. Wek zayenperestî, dibe ezmûna dawî ya hebûna bîrdoziyên serwer. Wekî em timî vedibêjîn; vegerandina sedsala 21'an a wek sedsala jinan; bi afirandina serdem-civakek ku jin hebûnên xwe yên azad bînin rewşa îradeyek kolektîf, xwe ava bikin û xwe parastinê ve pêkan dibe. Ji ber vê sedemê jî tam di niha de li dijî qetlîamên jinan, tundiya mêr û dewlet netewe, bê nirx dîtin û kedxwariya li ser keda jin û dema xwe parastina li hember diziya keda jin-dayîkan e. Dema parastina xwe, pêşeroja xwe û azadiya xwe ya li dijî pêkanînên mobîng ên di qadên kar-ked de li ser jinan pêktînin, kedxwariya kedê, tundî, zext-tacîza li ser medyaya dijîtal, tundiya di nava malbatê de pêşdikeve; zext û zordariyên ku dispêrin kevneşopiyan, qirkirina ku di bin navê zewacê de tê domandinê. Ji bo vê jî çi pêwîst be divê ew bê kirin, bixwînîn, xwe rêxistin bikin û xwe bînîn asta ku bikarîn rêvebibîn. Mînak em dibêjîn ku xwe li dijî suneta jinan biparêzîn. Ji bo vê jî pêwîstî pê heye ku jinên ji sunetê re hatîn îqna kirin bên guhertin û veguhertin. Divê jinên temen mezin ên ku hatin sunet kirin bên perwerde kirin, îqna kirin û şaşîtiya vê biawayek têrker bê vegotin ku yên vêya dikin paşda pêngav biavêjin. Nexwe zaroka keç a di temenê pitikekê de nikare xwe biparêze. Bêguman suneta jinan, encamek olperestiyê ye. Encameke ku olên yekxwedayî dixwazin aliyê xwe yê serweriya mêr li ser jinan ferz bikin, li ser jintiya nebes mêrtiya ku dixwazin biafirînin. Rastî gerdûnî ne. Ev ji bo rastiyên ku di çarçoveya paradîgmaya Rêbertî de derketîn holê pir zêde derbasdar in. Ji ber ku rastiyên xwe dispêrin paradîgmaya Rêbertî tenê Kurdan, jinên Kurd eleqedar nakin, hemû jinên cîhanê eleqedar dike. Jinên ji hemû gelan, hemû neteweyan, baweriyan û her wekî din xwe di felsefeya Rêbertî de dibînin. Niha paradîgmaya me, asta ku tekoşîna me ya azadiya jin gihiştî û ezmûnên ku hatin afirandin; bi beşên diyar ve tên parve kirin. Qasî afirandina zemînan zemîn ava kirinan, afirandina ziman-zimanê dil û zimanê eqlê hevpar jî girînge û em jî hewl didin vêya bikin. Êrîşkariya li ser jin, dijmintiya jin a cîhana mêrê serwer, bêguman ne tenê pirsgirêka Kurdistanê yan jî Rojhilata Navîn e. Li hemû cîhanê êrîşa li ser jin, nirxên jin, dîroka jin û wateya jin a serweriya mêr heye. Şiklek bi navê jin derxistine pêş, yek jî jinek tê qetil kirin, ji wateyê tê xistin heye. Mixabin modela jin a ku derdixînin pêş modeleke ku şiklî û fîzîkî derdixînin pêş û di asta diyar de bandor jî dike. Xebata herî bingehîn a ku em li hember wan dikin xebata zana kirinê ye. Helbet bingehê xebata zana kirinê jî îro di çarçoveya Jîneolojiyê de pêşdikeve. Dîsa di vê çarçoveyê de jin bûyîn, parastina nirxên jinan, vegotinên ji jinên cîhanê re ya pergala me ya konfederala jin û afirandina nirxên hevpar jî di nava armancên me yên girîng de ne. Ev pêngav jî hatin avêtin, encam jî hatin girtin. Bêguman em nikarîn nirxên derketîn holê wekî pergala dewletparêz mekanîk an jî di rewşa qaliban de bihizirîn. Hemleyên wekî rêxistinên hevpar, kampanyayên hevpar û hemleyên biarmanca hevpar hatin ava kirin jî hene. Dîsa mijara ku em herî zêde girîngî

didin jî tevgerên jinên cîhanê di welatên xwe de, di qadên xwe yên jiyanê de hişmendiya jin bilind dikin, têkildarî afirandina pergalek jiyanê ya derdora jin pêngav diavêjin. Bi hemû rêgezên xwe ve Bîrdoziya Rizgariya Jin, di çarçoveya wate-jin de digirin dest. Û xebatên me yên li ser vî bingehê berdewam dikin. Di astek girîng de û di erdnîgariyek berfireh de ji welatên Rojhilata Navîn hetanî welatên Efrîqaya Bakur, ji Efganîstanê hetanî Abya Yala û Ewropayê, bi rêxistinên jin re hevkarî hatine afirandin. Bêguman em ji rêxistinên mayînde yan jî hevkariyan, şibandin fahm nakîn. Em hedef dikin ku her gel, jinên her welatî di nava çand û rastiyên baweriyên xwe de hebûnên xwe bidomînin, parastinên xwe pêk bînin û têkildarî pêşeroja azad jî nirxên nû yên hevpar biafirînin. Zehmetiyên wê hene. Ji ber ku cihê cudahiyên çand û baweriyên gelan wek dewlemendiyekê bên dîtin, wek parçe kirinê derdikevin holê, dîsa cihê ku cudahî bên pêşxistin bi kûr kirinê ve tên sor kirin. Dîsa pirsgirêkên me yên hevpar hene. Li kêleka serweriya mêr zextên li ser jinan a avaniyên dewletparêz, dîsa rêvebirina polîtîkayên hegemon ên li ser jinan, xizan kirin û araste kirina fihûşê û qetlîamên jinan bûne derdên me yên hevpar. Dijminên me yên hevpar jî hene. Ji bo xwe rêxistin kirinê astengî jî hene, lê dezavantajên ku erdnîgariyên dûr anîn jî hene, lê ji bo rêxistin kirinê pir zêde sedemên me jî hene. Ji bilî vê paradîgmaya me ya Rêbertî ya ku rêya me ronî dike jî heye. Em ê vê qadê hê zêde pêşbixînîn. Şerên emperyalîst ên ku jin rastî tên, mêtînger kirina karkerên jin, diziyên kedê, bandorên mezin û zehmetiyên ku jin di tekoşîna ekolojîk de rû bi rû tên, zehmetiyên asta qirkirina ku di derdora malbatê de tê jiyan kirin û rewşên cuda cuda yên welatên cuda cuda jî hene. Em bi şiklekê bi hemûyan re di nava eleqeyê de ne. Ji ber ku paradîgmaya me derfetê rêvebirina tekoşînek wiha berfireh dide me.

Wek tevgera jin a ku dîroka wê ya tekoşînê digihije niv esrê, berpirsyariya me heye ku em tekoşîna xweparastinê veguhezînîn hemû jinên cîhanê. Di vê wateyê de erkên ku pêwîste em bikin jî hene. Ji ber hingî ku jinên cîhanê zana dibin û tekoşîna xwe ya azadiyê mezin dikin, pergala serweriya mêr lewaz dibe. Wek paralel jî li şûna modernîteya kapîtalîst modernîteya demokratîk dibe diyarkerê jiyanê. Divê ev bê destnîşan kirin ku çawa di cîhana me de, di gerstêrka me de jiyan hebe, ev tê wateya ku di nuqteyên cuda yên gerdûnê de jî jiyan heye. Em niha bêyî ku bibînîn dikarîn biparêzîn. Lê rastiyek em bikarîn bibînîn û biparêzîn jî heye ku ew jî, jinên li her devera cîhanê dixwazin tekoşîna xwe pêşbixînin û hewldanên wan jî hene. Tiştên ku em ji tevgerên jinên cîhanê fêr bibîn zêde ne. Bi heman şiklî tiştên ku em ji ezmûnên xwe bidin jî pir zêde ne. Ew hemû bingehê tekoşînê ne. Deskeftiyên jinên ku ji kuncikên herî dûr ên cîhanê pêngavên girîng ên pêşketina moderniteya demokratîk in û moderniteya demokratîk paradîgmaya me ya jiyanê ye. Ji nêzîk ve me eleqedar dike. Bêguman anîna wan a bahev pêwîste, lê dibe ku dîtina her tiştî ya di nava yekparetiya mekanîk de jî nebe nêrînek rast û têrker. Helbet ev nayê wateya ku pêwîstî bi wan zemînên hevpar tunin.

Îro di artêşên mêr de jin jî hene, pergalên hegemonîk ên derdora mêr radestî jinan tê kirin. Wek pergalek tirsnak faşîzm derket holê û di welatên Ewropayê de jin anî ser partiyên faşîst û ew jî anîn li ser serê civakê, xwestin bi destê jinan ve civakan kole bikin, ji nirxên demokratîk dûr bixîn in. Em qasî welatê xwe, pêşketinên herêm û cîhanê jî dişopînîn. Di eslê xwe de bingehê hevpar bûnê zêde ye. Ji ber ku pirsgirêk hevpar in. Dinya heman dinyaye, hewa heman hewaye û pirsgirêk jî heman pirsgirêk in. Dema ku Rêbertiya me li ser dahûrandinên pergala cîhanê nirxandin dikir, ev biawayek bihêz danî holê. Gava ku moderniteya demokratîk datîna holê jî ji Kurdistanê û hetanî Emerîkayê bêyî ku cudahiya erdnîgariyan bike, pêşniyarên xwe yên çareseriyê û perspektîfên xwe danî holê. Ji ber vê yekê em tenê di lêgerîna zemîna hevpar de nîn în. Lê fahm kirina bi eqlê hevpar a wan zemînên heyî heye û pêdiviya vê ya hev ragihandina vê jî heye. Helbet di çavkaniya hemûyan de jî pêdiviya xwe azad kirin û xwe rêxistin kirinê heye. Di hemû Kurdistanê de pêdivî bi pêşxistina rêxistina jin, kûr kirina rêxistinan, bi derxistina ji çerxên cîhana mêrê serwer a jina ku ber bi wê derê ve hatî araste kirin û pêdivî pê heye ku bîne rewşa ku xwe rêvebibe. Yanî bi kurtasî pêdivî bi şoreşek jin heye. Şoreşa jin, tê wateya afirandina kêlî kêlî ya pêşketinên şoreşgerî. Û hingî ku ev bên kirin, serxistin wê hevkariya me ya bi jinên cîhanê re pêşbikeve. Mînak çawa ku şoreşa Rojava bû şoreşek jin, qasî pêşketina di xakên xwe de, belkî jî hê zêde pêşketinek di navbera jinên cîhanê de çêkir. Di eslê xwe de em vedigerîn vê rastiyê. Rêbertî destnîşan kiribû: “Ya herêmî gerdûnî ye.”

Pêdiviya mirovahiya cîhanê, ya gerstêrk û cîhanê bi şoreşek jin heye. Tekoşîna ekolojîk jî di cewherê xwe de tekoşîna jin e. Hestiyariya ji xwezayê re, feraseta zindîwariyê, hîs kirîn… Dîsa tekoşîna demokratîk jî tekoşîna jin e. Eger garantiya hebûna yekî din wek domdariya hebûna xwe û ewlehiya xwe ditîn demokrasî be, vêya encax dil-mejiyê jinê dikare pêkbîne.

### Danezana xweparastina ku KJK-PAJK’ê weşandî di rêya ku tê meşandin de ronahiyeke

Dema ku Rêber Apo pergala konfederal datîne holê, pergala neteweya demokratîk ava dike, binavê rehendan sernavek vekir, dîsa danî holê ku dibe ku li ser bingehê pêdiviyan rehend zêde bibin. Dema ku em jî pergala xwe ava dikin ava kirina wan rehendan û li ser vê bingehê rêvebirina xebatên me yên ava kirina civakî esas digirîn. Hîna qadên ku rehendên wan nehatin ava kirin jî hene, qadên ku rehendên wan heyî lê naveroka wan biawayek têrker nehatin tijî kirin jî hene. Yanê me pergala xwe ava kir, em di gelek qadan de rêxistinkirî ne, lê ev têra ava kirina pergala konfederal a demokratîk nakin. Rewşek welê heye. Em ji aliyekê ve bi bermahiyên 5 hezar salan ve mijûl dibîn, ji aliyek din ve xwe ava dikîn, hewl didîn di xwe de, yekoyek di kesan de, di gelê me de, di jinan de şoreşa zîhniyetê biafirînîn, rêxistina jinan pêşbixînîn, ji aliyê din ve jî wek kêlî, rojane bi êrîşên moderniteya kapîtalîst re, bi êrîşên qirkirinê ve mijûl dibîn. Bêguman ev faktor in, lê giştî ne sedem in. Bi wan re aliyên lewaz jî hene. Mînak xebatên me yên perwerdehiyê di rehenda girîng de ne. Perwerdeya civakê heye lê ne têrker e. Xweseriya her qadê heye, rewşek cuda ya her parçeyê heye. Dîsa xebatên çandê hene lê di her qadê de ne welê ye, berhem jî hene. Pirsgirêka ava kirina eqlê jin, bi eqlê jin ve bi dilê jin ve çêkirina berheman heye. Di feraseta estetîkê de pêdiviya cidî ya şoreşê heye. Qadek estetîkê ya ku vegeriya êrîşa li ser jinan heye. Ez vêya di wateya biyolojîk de nabêjim. Di têgihiştina estetîkê de mayîna bi bandora pergala serwer heye. Di eslê xwe de nikare bê gotin ku feraseta estetîka nû pêkhatiye. Ji ber vê yekê ne afirandina şêwazê, ne afirandina ekolê jî heye. Dîsa jinan di qada siyaseta demokratîk de qonaxên girîng bidestxistin. Wek tê zanîn pergala hevserokatiyê pir zêde bûye. Rêber Apo pergala hevserokatiyê pêşxist, îro pergalek ku gelek rêxistinên sosyalîst esas hildan hat afirandin. Lê di naverok tijî kirinê de kêmasî hene. Ji bilî vê êrîşên serweriya mêr û pirsgirêka ne hezm kirinê heye. Di jinê de, pirsgirêkên pêşxistina eqlê jin jî heye. Lê li gel her tiştî jî di rewşa heyî de qadek girîng a siyaseta demokratîk hatiye avakirin.

Mijara ku tevlî hewayna wan hemûyan bû xweparastina jinan e. Di wekî nebe nabe de ye. Di vê wateyê de danezana xweparastinê ya ku KJK-PAJK’ê weşandin, di rêya ku tê meşandin de ronahiyeke. Di rê de zehmetî, astengî zêde ne, wê kemîn jî çêbibin, lê ya girîng ew e ku divê ronahiya wê neyê windakirin. Wekî ku di mînaka DAIŞ’ê de jî hatî dîtin pergalên serwer tarîne. Zîhniyeta tarî diafirînin, çavan kor, guhan ker dikin. Ne hêsane ku mêran ji nîmetên ku dixapîne yên serweriya hezar salan dûr bixîne. Li dijî wan pêdivî bi azadiyê, ronahiya di pêşengtiya jinan de heye. Ji bo vê jî wekî ku di danezanê de hatî destnîşan kirin, divê Rêbertî esas bê wergirtin û azadiya wî bixîne navenda xwe. Divê bê zanîn ku bidestxistina azadiya xwe jî bi xebat û serxistina azadiya fîzîkî ya Rêbertî ve pêkan e. Rêbertî diyar kiribû ku ji bo azadiya jinan qasî Prometeusan berdêl daye. Pêwîste ev şer bê fahm kirin, ev şer bê hîs kirin û bê zanîn ku Rêbertî kêlî kêlî di cihê herî dijwar a vî şerî de ye, divê ev rastî kêliyekê jî neyê jibîr kirin. Encax dikare bi vê hişmendî û pratîkê ve pêngavên jin bûyînê biavêje. Em dikarin derfetên jiyana azad di pêşengtiya jina azad de ji bo mirovahiya cîhanê biafirînîn. Em bi vê wesîleyê ve wek jin hez kirin, hûrmet û bêrîkirinên xwe ji Rêber Apoyê ku hebûna me gihandiye zanebûnê, wekî ku ruh dabe ceset û wate dabe madeyê, pêşkêş dikin. Ez girêdayîna xwe ya ji şehîdên me yên ku ev nirxên pîroz afirandin û soza xwe ya layiq bûnê dubare dikim. Ez li ber bîranînên wan bejna xwe ditewînim. Ez fermandar û şervanên YJA-Starê yên ku zanebûna xweparastinê di lûtkeyê de jiyan dikin, di xeta Rêbertî de pêkanînê esas digirin, ji bo vê jî di zirûfên herî zehmet de tekoşîna azadiyê kêlî kêlî didin, birêzdarî silav dikim. Ez hevrêyên me yên şervanên azadiyê yên ku bawerî pê tînin wê di bin fermandariya jin de azad bibin û dîsa bawerî pê tînin ku şerê mêran destpêkirî wê jin xelas bikin jî, silav dikim. Qezençkerê vî şerî jin in. Ji ber ku dema jin di vê jiyana zehmet û ezmûnên azadiyê de derbas dibûn hêza şer û îradeya mezin qezenç kirin. Pêngavên civaktiyek nû hatin avêtin. Di Kurdistan û Rojhilata Navîna ku Şerê Cîhanê yê 3’emîn herî zêde tê jiyan kirin de şer kirin, bi hîs-fikrên herî bedew ve û bi hestên herî paqij ve beşdarî demên herî dijwar ên şer bûn û xwe cewherî tevî kirin. Û bûn nîşaneya serkeftina me ya teqez.

■■■

# DÎROKA GERDÛNÎ Û ROJHILATA NAVÎN

*Ji Pirtûka "Di Rojhilata Navîn de Qeyrana Şaristanî û Çareseriya Şaristaniyê" hatiye wergirtin*

**Rêber Apo**

Dîrok ne bi tenê ji bo civaka mirov, ji bo tevahiya pêkhatinên gerdûnî bi roleke afirîner radibe û ev heqîqetek e ku tevahiya zanistan li ser hemfikir in. Zeman pêk tîne. Rola afirandinê ya ji bo îlahan vedibêjin zeman bi xwe bi wê rolê radibe û ev yek mîna sirrekê ye. Em ji leza pêkhatinê re zeman dibêjin. Pêkhatin nebe zeman jî di çarçoveya 'tinebûnê' de ye. Xisleta wê ya sirrê bi vî awayî xwe di hişê mirov de nîşan dide. Ji lewra rast nîne ku mirov pîrbûnê bi bandora kujer a zeman ve girê bide. Ji ber ku bandora kujer a zeman tineye, ev binavkirin jî ti qîmeta xwe nîne. Lewma mirin tineye. Mirin bîranîneke mirov e ku bi awayekî sosyolojîk hatiye avakirin. Hiseke lihevçêkirî ye. Lê ji bo jiyanê bîranîneke gelekî hêja ye. Ya rastî bandoreke hişyarker e. Ez weke Hegel hewce nabînim derkevim 'Rêwîtiya Tînê (cewher)'. Lê ez fêhm dikim ka Hegel bi vê yekê xwestiye çi bike. Herçiqas bi teoriya 'bîng bang' temenê gerdûnê li derdora 13 mîlyar salî were destnîşankirin jî bi îhtîmaleke mezin ev jî vegotineke nû ya mîtolojîk a şaristaniya Rojava ye. Tevî zanistîbûna wê hemûyî jî weke çîrokên afirandinê yên di Pirtûkên Pîroz de, bi roleke civakî radibe. Lê ji ber ku ev wisa ye, zeman nayê înkarkirin. Bi tenê tê îdîakirin ku xisleta xwe ya sirrbûnê diparêze. Ez weke şensekî mezin dibînim ku karibim di nava civaka mirov de wê hinekî û qismî keşf bikim. Dîroka civakî di çêkirin û pêkanîna mirov de rola xwe heta dawiyê girîng e. Eger sirra zeman wê bê jihevderxistin, em dikarin vê bi tenê di van pêvajoyên kinik ên pêkhatinê de keşif bikin. Hêza civaka mirov a çêkirina ferdê xwe ji texmînan wêdetir jî nebûye xwediyê maneyê. Eger mirov li ser gelekî bixebite wê karibe di warê manedanê de kûr û serwext bibe. Naxwe em nikarin di ti fenomenî de hêza zeman keşif bikin. Ji lewra ez zanista civakî weke xwedawend an jî melîkeya sereke ya zanistan hemûyan digirim dest û dibînim. Dîsa divê ez weke tespîteke girîng destnîşan bikim ku ji tevahiya zanistên xwe nasipêrin zanista civakî şik û gumanê dikim. Rêya rasterast biçe zanistên din hemûyan wê di pêkanîna me ya zanista civakî re derbas bibe. Em çiqasî zanista civakî pêşde bibin em ê karibin ewqasî xwe bigihînin hin agahiyên din. Zanista civakî çiqasî pêş bikeve, em ê ewqasî bigihêjin zanista pirtikên jêr-atoman ên maddeyê û ya gerdûna kozmîkku tê îdeakirin hê fireh dibe.

### Xaka mirî ya civaka neyînî

Ne bi tenê Hegel, Xwedayê di Pirtûka Pîroz de jî wexta dest bi serhatiya afirandinê dike, wê bi xwesteka 'fêhmkirinê' girê dide ango vê weke 'fikir dest pê dike li xwe difikire' tîne ziman û ev tespîteke girîng e. Fikra dest pê dike, hewl dide xwe bifikire, cewherê heqîqetê ye. Bi qasî ku em dizanin, ev yek jî li derveyî civaka mirov, bûyereke me şahidiya wê kiriye, nîne. Xwefikirîna mirov bingehê afirandinan hemûyan e. 'Gelo bi qasî atomê, di nava gerdûna kozmîk de jî fikir heye?' Hêja ye ku mirov pirseke bi vî rengî bike û pirseke dijwar e. Ez divê bibêjim ku ez cesaret nakim yeqîn bikim hem gerdûnên makro û hem jî gerdûnên mîkro, bêfikir pêk tên. Têgîna 'maddeya bêcan' ku em wer hînkirine, êdî têra xwe derketiye holê ku têgîneke gelekî pûç a sosyolojîk e. Ji ber vê gotina min divê neyê hişê ti kesî ku Hegelparêziyê dikim. Têkiliya fikrê bi pêlên di mejiyê mirov de tespît bûye; hema hema mirov jê piştrastbûne ku tiştekî mîna enerjiyê ye. Li vir pirsgirêk ew e ku ev rastiya hatiye piştrastkirin, em çiqasî dikarin cesaret bikin li ser xwezaya li derveyî mirov nîşan bidin. Bi van gotinan dixwazim vê bibêjim: Em neçar nînin 'axa mirinê' ya civakdariya negatîf reşandiye ser çavên me, qebûl bikin. Civakdariya pozîtîv, bi gotineke din civaka misêwa azad dibe, yekane zemînê heqîqetê ye. Danasîna herî zelal a dîroka gerdûnî weke zemînê heqîqetê pêşketina civakî ye. Di vê çarçoveyê de civaka mirovî bi tenê dîroka mirovî nîne, ya rastî dîroka gerdûnê ye. 13,8 mîlyar salên bi rengekî sivik weke temen tê gotin jî têde, ev dem dîroka gerdûnê ye. Ji ber vê yekê jî divê mirov girîngiyê bi insên, civaka wî û dîroka wî bide.

a- Mirov destnîşan bike ku Serdema Qeşayî ya Dawî li derdora bîst hezar sal berê bi dawî bûye, ev yek di pêşketina dîroka civakî de qonaxeke girîng e. Di dîroka Rojhilata Navîn de ku bi vê dîrokê dest pê dike, nexasim di dema destpêkirina vê dîrokê de sîstema li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê û herêmên çol ên cîran ji bo cinsê mirovî bi awayekî awarte derfetên qût û zad, ewlehî û îmkanên zêdebûnê hêsan dike. Wexta ev hersê hêman têne cem hev an jî bi hev re peyda dibin, ji bo cinsekî zindî şensekî awarte yê jiyanê tê hesibandin. Cinsê mirov ê ji Efrîka Rojhilat derketiye û beridandina wî li derdora heft mîlyon salan tê qebûlkirin, seranserê Efrîka Rojhilat derbas dike, ji Deryasor di qûntara çiyayên Rojhilatê Deryaspî re heta Rîfê (qelşa kutleya du erdên sereke pêk tînin) diçe Torosan xeteke belavbûnê ya xwezayî xêz dike. Bi qasî ku tê tespîtkirin herî kêm ji mîlyonek salî ve timî mirov herikîne Asya û Ewrûpayê. Kevana Toros-Zagrosan di vê rêwîtiyê de misêwa bi rola stasyoneke bingehîn rabûye. Bi vî awayî em girîngiya jeolojiyê baştir fêhm dikin. Herî kêm bi qasî van qûntarên çiyayan, çolên cîran ên di dema xwe de gelekî bi bereket jî bi roleke bi heman rengî rabûne. Bi dawîbûna Serdema Qeşayî ya Dawî re şert û mercên mayînê li van stasyonan peyda dibin û ev yek dihêle ku di dîroka cinsê mirov de qonaxeke nedîtî dest pê bike. Em îro ji vê cografya û erdnîgariyê re Rojhilata Navîn dibêjin. Girîngiya herêmê ya jeolojîk, biyolojîk û civakî ji ber vê rastiya nêz a dîrokî ye. Rojhilata Navîn êdî parçeyekî cografyayê yê ha yellah nîne, wî mekanî pêk tîne ku li ser dika wê dîroka gerdûnî wê bê lîstin.

> **Em n**eçar nînin 'axa mirinê' ya civakdariya negatîf reşandiye ser çavên me, qebûl bikin. Civakdariya pozîtîv, bi gotineke din civaka misêwa azad dibe, yekane zemînê heqîqetê ye. Danasîna herî zelal a dîroka gerdûnî weke zemînê heqîqetê pêşketina civakî ye. Di vê çarçoveyê de civaka mirovî bi tenê dîroka mirovî nîne, ya rastî dîroka gerdûnê ye. 13,8 mîlyar salên bi rengekî sivik weke temen tê gotin jî têde, ev dem dîroka gerdûnê ye.



Li gorî qenaeta hevpar a zanistî cinsê mirov heta piştî serdema qeşayî ya dawî bi rêxistineke tîpa klan a ji 25-50 kesî pêk hatî, nebihurîye. Civaka klan weke yekîneyên pêşî yên kominên piçûk hatine dîtin û ev yek 'şovenîzma şaristaniyê ye' ku piştre pêşketiye. Mirovatiyê ji sedî 98'ê dîroka xwe bi civakeke bi vî awayî derbas kiriye. Klan, di pêkhatin û çêbûna civakê de bi rola hucreya dayik an jî sereke radibe. Çawa ku di pêkhatina zindiyan de bi hewldana mîlyaran salî ya hucreya dayik gav ber bi pêkhatina tîpên nebat û heywanan hatiye avêtin, serhatiya jiyanê ya mîlyonan sal a civaka klan jî derfet daye ku gav ber bi civaka heterojen ve bê avêtin. 'Şoreşa Civaka Pirranî' yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye. Kengî 'zimanê sembolan' şûna 'zimanê îşaretan' girt, mirovatiyê ev qonax derbas

kir. Zimanê sembolan ê mirov, ji ber awayê xwe yê qirik û bedenê, xwediyê potansiyeleke mezin a pêşketinê ye. Derfeta zimanê sembolan wê şoreşa fikrê jî mumkîn bike. Dîrok herçiqasî di çarçoveya avahiya jeobiyolojîk a Efrîkayê de texmînî behsa bike ku divê zimanê sembolan beriya serdema qeşayî ya dawî li derdora 100.000 salî pêk hatibe jî şoreşa zimanê sembol a rastî girêdayî avahiya jeobiyolojîk a Rojhilata Navîn piştî serdema qeşayî ya dawî li derdora 20.000 salî pêk hatiye. Di vê mijarê de zanyar hemfikir in. Agahiyên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî yên zelal hene ku komên weke Semîtîk têne binavkirin li derdora şeş hezar sal berê ji Sehra Mezin heta bi çolên Erebistan û Îranê yên ji aliyê dar, pel û pincaran ve dewlemend li dora zimanê Samî 'sîstema qebîleyan' bi awayekî berfireh pêk anîne. Ji zimanên Efrîkayê yên îşaretan ên gelekî dewlemend, derbasbûna sîstema qebîleyan a xwe disipêre awayê zimanê sembolan ê Semîtîk, yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye. Ev koma çand û ziman, çi di şoreşa cotkarî ya neolîtîk û heywan xwedîkirinê de û çi jî di şoreşa bajêr de (medeniyet, şaristanî) wê bi roleke mezin rabe. Duyemîn şoreşa mezin a zimanê sembolan li ser avahiya jeobiyolojîk a sîstema çiyayên Toros-Zagrosan komên sîstema qebîleyên Aryenîk pêk hatiye ku weke koma Hind-Ewrûpa jî têne binavkirin û ev yek jî dîsa bi xebatên antropolîjîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî hê zelaltir hatiye piştrastkirin. Rola vê komê di şoreşa bajar û cotkariyê de jî sereke ye ku ev jî xisleteke girîng a rastiya piştrastkirî ye. Sêyemîn koma mezin a zimanê sembolan li başûrê daristanên Sibîryayê ji aliyê sîstema qebîleyên weke koma zimanê Ûral-Altay têne binavkirin pêk hatiye. Ev komên behsa wan têne kirin, piştî serdema qeşayî heta bi Çîn, Moxolîstan, Tirkîstan û Fînlandiya îro belavbûne û bi qasî herdu komên pêşî nebe jî di dîroka gerdûnî de hem di warê şoreşa neolîtîk û hem jî di warê şoreşa bajêr de, kêrhatîbûna wan girîng e. Li Qafqasan, Emerîka û hin komên din ên îzolebûyî bi awayekî marjînal be jî çi di warê zimanê sembolan, çi jî di warê şoreşa bajêr û cotkariyê de rola wan heye û di vî warî de agahiyên antropolojîk, etnîk û çavdêriyên dîrokî hene. Bi tevahî xebatên zanistî yên jeolojîk, arkeolojîk, antropolojîk, etnîsîte û zimên piştrast bûye ku şoreşa gund-cotkariyê bi awayekî bingehîn li sîstema qûntara çiyayên Toros-Zagrosan ku di dîrokê de weke 'Hîlala Bi Bereket' jî tê binavkirin, li ser avahiya jeobiyolojîk û girêdayî cureyan pêşketiye. Ev qonaxa şoreşê di dîroka gerdûnî ya mirovatiyê de bingeh e. Ez neçarim careke din destnîşan bikim ku mebesta min ji şoreşê ew e; cewherê wê û çawa pêk hatiye. Girîngiya vê şoreşê pirralî ye. Yekemîn, civak ji qonaxa civaka klan a demdirêj (komên piçûk ên homojen-yên dişibin hevdu) derbasî qonaxa 'sîstema qebîleyan' a heterojen (pirraniyên cihêreng) bûye. Sîstemên qebîleyan ên xwe disipêrin zimanê koka wan hevpar, nîvkoçer û nîvbicihbûyî ne, di nava xwe de tiştên weke diyariyan pevdiguherin, perestgehên wan ên hevpar hene û bûne xwediyê mekanên lê miriyên xwe veşêrin, şêweyekî civakî yê demdirêj in. Erdkolanên arkeolojîk ên li Girê Navikê yê li nêzî Ûrfayê ye, ji bo rohnîkirina dîroka mirovatiyê weke 'supernovayê' tê qebûlkirin. Di erdkolanên li Girê Navikê de kevirên tîk ên perestgehê yên 10.000 salan B.Z. hatine avakirin, nîşan didin ku sîstemên qebîleyan ên berî şoreşa cotkariyê weke têne zanîn ewqasî paşvemayî nînin, berevajî, avahiyên civakî yên têra xwe pêşketî ne û ev yek jî weke keşfeke girîng a dîrokî derdikeve pêşberî me. Ev kevirên tîk ên perestgehê yên hatine verotin û bi awayekî xelekwarî li kêleka hev hatine danîn, nîşan didin ku li Girê Navikê jiyaneke xurt a fikir û hisan pêk hatiye. Divê mirov bi girîngî destnîşan bike ku jeobiyolojiya Ûrfayê ji bo pêşketina sîstema van qebîleyan, rewşeke îdeal pêşkêş dike. Li ser vê sîstema qebîleyê û çanda wê, divê xebatên dîrokî û analîz ji sedî sed bêne kirin û ev xebat çiqasî bêne kirin, bêguman wê dîroka gerdûnî hê baştir zelal bibe. Duyemîn, pêkhatina gundan heta niha bi şoreşa cotkariyê ve girêdayî hatibû nirxandin. Bi perestgeha Ûrfa-Girê Navikê piştrast bûye ku mirovan ji sîstema qebîleyên nîvkoçer gav avêtine avabûna gundan û ev rastiyeke din a civakî ya girîng e. Berê min derketina bajêr û dewletê bi perestgehên rahibên Sumeran ve girêdabû. Bi heman awayî divê ez bi giringî diyar bikim ku rêveberiyên komin û gundan ango demokrasiya destpêkê ya resen û orjîn jî li dora sîstemên hevpar ên perestegeha van qebîleyan pêk hatiye. Her perestgeha hevpar a bicihbûyî, dibe hîmê danûstendina destpêkê û şoreşa fikir (huner) û hissa hevpar. Hingî xusûsa sêyemîn a mirov dikare bîne ziman jî ew e; şêweyê bazirganiyê yê destpêkê û orjîn bi danûstendina diyariyan, di hevdtînên li perestgehên hevpar de pêşketiye. Ya çaremîn, di çavkaniya derketina dîn û huner de jî perestina li perestgehên hevpar heye. Ev herdu kategorî di destpêkê de bi hev re ne, û hêmanê bingehîn ên çanda manewî ne. Li Girê Navikê wêneyên perestgehê yên gelekî nêzî nivîsê bûne, asta pêşketina fikir û hissan piştrast dikin. Hunerekî welê heye, mîna ku ji mêj ve xeber didin ku wê nivîsên Sumer û Misriyan bên. Mirov hê jî dikare xusûs û şîroveyên bi heman awayî pêşde bibe û bike. Xusûseke din a girîng ku divê mirov destnîşan bike ew e; ev çand ji ber xisleta xwe ya nîvkoçeriyê xwediyê karektereke gelekî nerm û zû belavbûnê ye. Ev çand di dîrokê de di navbera salên 15.000 û 10.000 B.Z. de di serî de Rojhilata Navîn di asta gerdûnî de belav bûye. Bi vî awayî destnîşankirina vê xusûsê wê vegotinên dîrokî têra xwe rohnî bike. Li gorî qenaeta min a şexsî, vê çandê tevahiya Asya, Efrîka, Ewrûpa, Emerîka û heta Awûstûralyayê ji aliyê çandî ve fetih kiriye.

b- Şoreşa cotkariyê xwe spartiye sîstema qebîleyên nîvbicihbûyî û pêşketiye. Dîroknas û jiyan bi xwe xwedî hukmekî hevpar in ku ev yek xwedî maneyeke şoreşî ye. Mirov qada berfireh a jeobiyolojîk a Ûrfayê weke herêma bi bereket a Hîlala Bi Bereket qada navendî ya şoreşa cotkariyê ya herî demdirêj (texmînî 10.000-5000 B.Z.) bigire dest, ev yek ê vegotina dîrokî ya herî nêzî rastiyê be. Çi girtina nebatan ji bo cotkariyê, çi jî ji bo kedîkirina mîh, bizin û dewaran qadên behsa wan têne kirin xwedî derfet in, û ji aliyê cûrbicûriyê jî nêzî îdealê ne. Awayên erd, bereketa erd, şertên bahewayê, flora û fauna nebat û heywanan li gorî dema xwe, herî îdeal e. Mîna xwedî şert û mercên avdaniyeke xwezayî be. Her weha erdên avdaniyê yên berfireh li ser Dîcle-Firat û şaxên wan her hebûn. Lêkolînên li qadê her roja derbas dibin rola herêmê di vî warî de derdixin holê.

## Cureyek bivegotina dîroka biçûk tineye

## Ev cure vegotin gotina pozîtîvîst a herî çors e

Ev dem yek ji qonaxên bingehîn ê dîroka gerdûnî ye, û der barê wê de jî mirov dikare xusûsên bi heman rengî diyar bike. Yekemîn, di pêkhatina perestgeh û gundan de ji aliyê çawayetî û çendayetiyê ve pêşketin hene. Çandên Bismil-Kortiktepe, Çemê Hallan, Erxenî-Çemê Kotber (Çayönü) û Swêreg Newala Çorî hêza belavbûn û bicihbûnê ya çanda Ûrfa-Girikê Navikê (Göbeklitepe) nîşan didin. Di dema 10.000-7000 B.Z. de ku weke qonaxa bê kûz û dîzik tê hesibandin di tevahiya xususên diyarkirî de pêşketin hene. Divê mirov diyar bike ku vê demê di serî de cografya Rojhilata Navîn di karektera belavbûnê ya gerdûnî de rê li pêşketinê vekiriye. Duyemîn xusûsa girîng ew e ku piştî salên 7000'î B.Z. qonaxeke di ser neolîtîka bi kûzik û dîzik re pêş dikeve û pêşketineke welê civaka mirovî tîne ber bajarbûyînê. Tevahiya erdkolanên arkeolojîk vê rastiyê piştrast dikin. Mirov dikare bibêje; li heman qada navendî, nexasim ji salên 5000'î B.Z. û pêve belavbûneke çandî ya bi lez di serî de li Misr, li Mezopotamya Jêr Sumer, li nava sînorên îro yên Hindistan-Pakistanê Pencabê (pêncav) û heta bi Amûderya Tirkistan û geliyên Sîrîderyayê li qadeke berfireh a jeobiyolojîk rê li ber pêşketineke gihiştiye ber proto-bajarbûnê, vekiriye. Li gorî demê, bi awayekî sîstema navend-hawîrdorê cara pêşiye bi şêweyekî were dîtin, sîstemeke global pêk tîne. Eger mirov destnîşan bike ku ev çand ji Çînê heta Ewrûpayê ango di navbera du okyanûsan de bi roleke sereke rabûye û belavbûneke nifşê duyemîn di dema 4000-2000 B.Z. de zêdetir bûye, ev ji aliyê dîroka gerdûnî ve gelekî girîng e. Globalbûn fenomenek e ku bi tenê di roja me ya îro de nîne. Belkî jî globalbûna herî demdirêj, ne zordest, ne mêtinkar (îstîsna pîvanê xira nakin) û herî girîng di van deman de pêk hatiye. Xusûsa divê ji dîroka gerdûnî were fêhmkirin ev e. Hem maddî û hem jî manewî belavbûneke global û pêkhatineke çandî ya hevpar ji bo vegotineke manedar a dîrokê bingeh e. Ya divê ji dîroka gerdûnî were fêhmkirin ev e; bi tevahî fikrên civakan û pratîzekirina wan xelekên wekhev ê obje-sûbjeyê ne. Di serî de dîrokên neteweyan, vegotinên dîroka mîkro hemû eger di nava dîroka gerdûnî de neyên bicihkirin, wê bi tenê bi qasî çîrokekê maneyeke wan hebe. Ya rastî cureyekî vegotinê bi navê dîroka mîkro nîne. Pêdiviya yekdestdarên kapîtalîst bi propagandayê, dîroka mîkro derxistiye holê. Ji bo mirov dîrokê fêhm bike serwextbûna li vê xusûsê gelekî girîng e. Cinsê mirov tenê bi xwe nîne, ew dîroka tevahiya gerdûnê ye. Ya di mirov de ji nû ve pêk tê, asta yekparebûna tevahiya herikînên madde û enerjiyê ye. Li derveyî mirov çi hevgirtina enerjî, madde û parçeyê gerdûnî nîne weke hiss û fikir ji nû ve di mirov de neyê cem hev û ava nebe. Yekemîn, eger em dibêjin dîroka gerdûnî, mebesta me jê ev e. Rastiya panteîzm jî hewl dide haya xwe jê hebe ev e. Wexta em dibêjin dîroka gerdûnî vegotina din a divê bê fêhmkirin; pêşketina çanda maddî û manewî ya xwezaya civakî ye ku weke Xwezaya Duyemîn jî tê binavkirin. Mirov vê dîrokê dikare ji klanan ku bi awayekî weke hucreya kok a civakê bigire û weke çemê sereke an jî çemê dayik ê civakan ê diherike binirxîne. Di vê vegotina dîrokê de têgîna çemê sereke, mezin an jî dayik, girîng e. Çawa ku ji bo qalkirina dîroka gerdûnê ya

ne mirov e, hewce bi tevahiya koma madde-enerjiyê nîne, bi tenê hewcedarî bi qalkirin û fêhmkirina gavên derbasbûna mekanîzmayan (li cem Hegel mentiq û moment) û xelekên sereke (fizîk, kîmya, biyolojî) heye, ji bo dîroka civakê ya weke Xwezaya Duyemîn jî tê binavkirin vegotineke bi heman rengî hewce ye. Bêguman mebest ji dîroka civakê, sosyolojî ye. Vegotinên cihê yên dîrok û sosyolojiyê jî hewcedariyeke hegemonya îdeolojîk a yekdestdariya kapîtalîst e ku timî yekparebûna maneyê parçe dike. Di vê rewşê de li gorî herdu maneyan jî dîroka gerdûnî yekpare ye. Bêguman ev nayê wê maneyê ku di vê vegotinê de cihê ferd, diyarde û bûyeran nîne. Berevajî ferd, diyarde û bûyer kengî di nava vegotina gerdûnî de rol bigirin, wê manedar bibin. Dîroka mîkro bi dîroka makro (gerdûnî) bi tenê di nava têkiliyeke diyalektîkî de dikare cihê xwe bibîne. Dîroka mîkro bi serê xwe tê wê maneyê ku vegotinên wêje û sosyolojiyê bê felsefe bin, û di dawiya dawî de bi awayekî herî çor wê ev bibin gotinên tewş ên pozîtîvîst. Li Hîlala Bi Bereket di dema 6000-4000'î B.Z. de ji bo derbasbûna şaristaniyê hêmanên hewce yên maddî û manewî yên sereke hemû pêk hatibûn, li ser vê tespîtê jî dîroknasên girîng xwedî qenaeteke hevpar in. Têra xwe çavdêrî, lêkolînên arkeolojîk û etnîk hene ku vê qenaetê piştrast dikin. Di serî de di warê xwenixumandin, xwedîkirin û deverên starê de amûrên çanda maddî bûn îndustrî û gihiştin asta hilberînê. Ji bo demên xela û felaketên cuda karîbûne berhem û mayeyê civakî komî serhev bikin. Hîmê bazirganiyê hatiye danîn. Ji çanda diyarîdayînê wêdetir êdî ji bo pêdiviyan berhem têne serbiserkirin. Gelek hêmanên çanda manewî jî hatine bidestxistin. Di rewşên resen ên pêşî yên dîn, xweda, huner, zanist û teknîkê de pêşketinên mezin hene. Ji madenê derbasî teknîkê bûne. Tekelik tê bikaranîn. Ji veguherîna enerjiyê sûd tê wergirtin. Bêguman ji texmînan wêdetir, zêde keşif hene. Ji vê jî girîngtir di jiyanê de jin serek e, û di jiyanê de nakokî bi hawîrdorê re nînin. Wexta ku mirov bi roja me ya îro re dide berhevdu, ev xusûs bi tenê jî ji bo ravekirina serdestiya civaka wê demê têrê dike. Şaristaniya me ya îro gelekî zordestiyê li jin û hawîrdorê dike, ji lewra mirov ti carî nikare civakeke welê serketî û pêşketî bihesibîne. Eger mirov ê behsa tenduristî û serdestiya civakekê bike, divê krîterên me yên bingehîn femînîst û ekolojîk bin (ne di maneya bûrjûwa de). Ji vî alî ve, civakên roja me ya îro bi rastî civakên nexweş in.

c- Derbasbûna bajêr û civaka şareza ya xwe disipêre wê, bi nirxên çanda maddî û manewî yên Hîlala Bi Bereket ên bi rêûresma civaka hezar salan ketibûn serhev, bi pêşdebirina kalîteya wan pêk hat. Hêmanên çanda heyî yên li devê çemên bi aluviyon ên Dîcle, Firat, Nîl û Pêncavê kengî bi hêmanên din re sentez çêkirin hingî bajêr bivê nevê wê pêk bihata. Ev sentez tê wê maneyê ku berhem jî wê gelekî zêde bibe. Divê mirov vê xusûsê bizane ku di ser heman qadên bi aluviyon re bi sed hezaran salan mirov hatin û çûn. Lê van mirovan, bihêlin ku bi hêza xwe ya bingehîn bajaran ava bikin, di wê qabîliyetê de nebûn ku civaka klan jî li ser piyan bigirin. Li van qadan ji bo gavavêtina şaristaniya bajêr, diviyabû têkiliya wan a diyalektîkî bi civakeke neolîtîk a pêşketî re hebûya; ev şertê pêştir e. Li Çînê jî wê li ser hîmê heman diyalektîkê pêkhatineke bi heman rengî çêbibûya. Di mijara bajarê pêşî de dîrok li ser Ûrûkê hemfikir e ku li qada bi aluviyon a Dîcle-Firat xwe digihîne deryayê ava bûye. Ji ber ku dema Ûrûkê (3500-3000 B.Z.) destpêka şaristaniyê îfade dike, ji bo dîroka gerdûnî girîng e.

## Koletiya kûr dibe ya jinê û derketinên desthilatdariya ku bûye nexweşî ya qral Xweda

Destanên li ser navê qralê pêşî yê qehreman Gilgamêş û xwedawenda bajêr Înannayê hatine gotin, çanda Ûrûkê nîşan didin û mirov yekser dikare ji bo van destanan bibêje; vegotinên xulase yên dema xwe ne. Van destanên resen ku bi awayekî nivîskî gihiştine heta roja me ya îro mirovatiya beriya xwe bi fikir, bawerî û xwestekên wan nîşan dane û der barê paşerojê de hesretên xwe yên bêmiriniyê weke bîranînekê bi me didin hiskirin. Dîroka gerdûnî ev e. Di destana Înanna de behsa 104 pîvan, teknîk û saziyên civakî yên bi afirêneriya keda jinê ya hezarên sala hatiye hilberandin tê kirin. Xwedayên dibin mêr ên xasûk û bi hêz ji bo van berhemên jinê jê bistînin serî li her dekûdolabê didin û destan behsa van zordarî û hîleyan dike. Di destanê de qala serhatiya Gilgamêş jî tê kirin ka çawa cara pêşî jiyana qraltiyê bandor lê kiriye, lê wexta dîtiye wê alîkarê vê jiyana wî Enkîdo bimire û ev jiyan ê ji dest biçe, gelekî xemgîn bûye û bi pey wî gihayî ketiye ku mirovan dike nemir. Koletiya jinê ya her ku çû zexm bû û rewşa qral-xwedê ya bi gavavêtinên desthilatdariyê veguherî nexweşiyê, nakokiya diyalektîkî ya pêşî û mezin a şaristaniyê ye. Çavkaniya nakokiya kole-efendî jî bingeha wê ev nakokî ye. Di roja me ya îro de karker, bêkar û heta bi koleyên ji her kokê ku têne xizankirin, ev çîrok wê reh û rîşên xwe hê bêhtir berde û dewam bike. Diyarkirina momentên sereke û binavkirina qonaxa şaristaniyê ya dîroka gerdûnî, gelekî girîng e. Bajar di destpêkê de pêdiviyên bazirganiyê yên warên li derveyî bajêr baş bi kar tînin û ji bo bersiva vê bi hilberîneke bi bereket bide li ser pêşnûme û teknîkê tê avakirin û ji lewra jî bajar di destpêkê de bi roleke neyênî ranabin. Berevajî bajar bi qadên li derveyî xwe re bi awayekî lihevkirî û di nava hevkariyê de pêşketina civakî bi lez dike. Lê belê li ser mayeyê civakî yê zêde dikeve serhev û rê lê tê vekirin, şer û têkoşîn tê meşandin, ev jî dihêle ku qonaxa çînîbûnê ya xwe disipêre bajêr û dewletbûnê, her biçe ji bo tevahiya sîstemên qebîleyan, kedkarên bajaran, gundiyan û mirovên li derveyî bajaran dimînin, bi tehlûke bibe. Bi gotina Hegel civak bi giştî bi têkilî û nakokiya kole-efendî re rûbirû tê hiştin. Qonaxa şaristaniyê ya dîroka gerdûnî wê timî bi şerên ji vê nakokiyê peyda dibin û bi van şeran re bi şêweyên dewletên ava dibin dewlemend e. Di vê çarçoveyê de dîrok 'selexaneya mirovî' ye. Di civakên şaristaniyê de hiyerarşî misêwa rê li ber dewlet û desthilatdariyê vedike, divê mirov vê rewşê rast analîz bike, ji ber ku ev yek ji bo vegotineke rast a dîrokê xusûseke din e ku gelekî girîng e. Pêvajoya civaka desthilatdar ji aliyê çawayetiya xwe ve ji civakên berê gelekî cihê ye. Saziya efendiyan an jî desthilatdarî di tevahiya dîroka şaristaniyê de xwedî karektereke welê ye ku timî mezin dibe, pêşde diçe û xwe berfireh dike. Fena nexweşiya kansêrê ye; belav û zêde nebe nikare li ser piyan bimîne. Saziya desthilatdariyê weke nexweşiya yekdestdarên kapîtalîst e, divê misêwa karê bike û bide serhevdu. Di cewherê xwe de herdu jî bi mayeyê zêdebûyî yê civakê dijîn. Diyardeya çînayetiyê bi mayeyê civakî dikare bimeşe. Ev maye çiqasî qut yan jî kêm bibe, ewqasî jî krîza civaka dewletdar bivê nevê wê pêk bê. Encam, şerê xwe timî hildiberîne û dewleta nû, li desthilatdariyê digerin û dixwazin bibin parçeyekî wê. Sazî û elîtên desthilatdariyê mîna nêçîrvanên li pey nêçîrê ne. Divê mirov dewletan jî weke şêweyê vê meseleyê yê rewakirî bi nav bike û bide naskirin. Bêguman di rewakirina dewletan de pêdiviyên giştî yên rêveberiyê yên civakan bi temamî weke maskeyekê têne bikaranîn. Rêveberên dewletan hemûyan di tevahiya dîrokê de bi îhtîmameke mezin hewldane, xwe bi vê maskeyê bidin naskirin. Mirov dikare hin rêveberiyên civakî weke pêdiviyekê rewa bibîne: mînak weke ewlekarî, avdaniya mezin, hewldanên îndustriyê û karûbarên dadgeriyê. Lê rêveberiyên dewlet û desthilatdariyê van karên civakî her di dereceya duyemîn de digirin dest û di çarçoveya rewakirina xwe de bi kar tînin. Civakên desthilatdar civakên serwer ên zilam in. Der barê rêveberan de weke Pirtûkên Pîroz jî gelek caran tînin ziman di civakê de têkiliya 'şivan-kerî' xwedî hukim e. Ev têkilî wexta ber bi roja me ya îro tê, bi awayekî welê dimeşe ku kedkar û hawîrdor ber bi pîrekbûnê ve diçin. Ev yek bi karektera desthilatdariyê ya mêr pêk tê. Di civaka neolîtîk de rêveberî pirranî bi giraniya jinê radibûn û bi armanca hilberandin, ewlekarî û zêdekirina nifşê mirov tevdigeriyan, lê di civakên şaristaniyê de armanca rêveberiyên desthilatdariyê li hundir û derve mêtinkarî û şer in. Ji lewra jî di rêza pêşî de girîngiyê bi teknolojiya desthilatdarî û şer didin. Herweha hawîrdorê timî weke qadeke mêtingeh a divê bê fetihkirin dibînin. Di çanda desthilatdariyê ya Rojhilata Navîn de mirov dikare van rewşên mucerred dikare desthilatdariyê berçav bi awayekî herî dewlemend û cihêreng bibîne, ne tenê dîtin, ji bo meseleyê norm û pîvan in. Divê mirov sîstema şaristaniyê bi tevahî û navendî bigire dest û nêzîk bibe, ev ji bo rastfêhmkirina wê şert e. Di nava demên dirêj de valatiyên parçebûyî û qutbûn nabin. Ji lewra biwêja ''Desthilatdarî 'valatiyê' qebûl nake'' ji vî alî ve rast e.

d- Şaristaniya navendî pişta dîroka gerdûnî pêk tîne û çavkaniya wê ya sereke Mezopotamya ye ku bê navber pênc hezar sal e diherike û tê. Ji lewra gelekî girîng e ku mirov ji aliyê metodolojiya bingehîn ve şaristaniya navendî weke hîmê bingehîn ê dîrokê bibîne û lêbikole. Di vê mijarê de ji rêbazên nêzîkatiya çînî ya ekonomîst a teng bigirin heta bi rêbazên huqûq, nêzîkatiyên di mîhwera dewleta netewe de û nêzîkatiyên xwe disipêrin sîstema hilberînê di wê rewşê de nînin ku dîrokê yekpare bigirin dest. Nexasim rêbazên dîrokê yên mîkro pozîtîvîst ku her diçin belav dibin, mîna ku bi temamî bi rola tevkujiya maneyê radibin. Eger mirov rabe dîrokê di serî de bi hêmanên ferd, bûyer, xanedan, netewe, dewlet, çîn û ekonomiyê analîz bike, ango bi hêmanên tekane bi awayekî reduksiyonîst rave û qal bike, ev wê bê wê maneyê ku rastî bi parçekirinê tê qetilkirin. Ev vegotinên mîtîk ên di bin hegemonya îdeolojîk a yekdestdarên kapîtalîst de têne kirin, bi giranî bi rola propagandayê radibin. Bêguman vegotina beşan pêwîst e, û girîng e. Lê eger di nava herikîna dîroka gerdûnî de bi awayekî yekpare cih negirin wê ji bo tevahiya serwextbûna

li rastiyê bi kêr neyên. Di roja me ya îro de vegotina dîrokê mijareke gelekî bi pirsgirêk e. Ji vegotineke rast re hêz û hewldaneke mezin divê. Ez hem behsa hewldana fikrî û hem jî behsa hêza çalakiyê dikim. Heta mirov serwext nebe ku xisleteke desthilatdariyê ya weke sermayeya timî li pey karê heye, mirov nikare civakên şaristaniyê ji hev derxe û analîz bike. Ya rastî mirov heta desthilatdariyê weke sermayeya herî xas a rêxistinkirî nefikire, wê bi temamî wê fêm neke. Rast nîne ku mirov sermayeyê bi temamî ekonomîk (weke Marksîst û Lîberalan) û bi temamî jî polîtîk (weke alîgirên dewleta netewe) bifikire. Yek bê ya din nabe, yek a din çêdike, ango mirov wan weke cêwiyên bêyî hev nabin bike têgîn, wê encamên hê nêzî rastiyê derxe holê.

### Bajarê cîhana hegemonîk a dema xwe: Babîl

Mirov dikare sîstema şaristaniya navendî di çarçoveya van binavkirin û nasandinan de weke sîstemeke civakî û dîrokî ya bêhtirî pênc hezar salan dewamkirî, binirxîne. Em dikarin weke sê versiyonên sereke û gelek komên jêr şematîze bikin. Yekemîn, derketina resen a Sumerîk e. Mînaka Ûrûkê xwe zêde kiriye, vê yekê hiştiye ku bajarên mezin weke gidîş û lodan pirr bibin. Qada navendî Mezopotamya Jêr e. Hêza hegemon dewleta sîte ya Ûrûkê ye. Bi qasî pêncsed salan dewam kiriye, her cihê gihiştiyê lê nîv-kolonî û dewrûber çêkirine. Em dikarin bibêjin, tevahiya Hîlala Bi Bereket weke navend û dewrûber bi rêxistin kiriye. Di encama pêxîrtengî û buhrana konjonkturel a sîstemê de salên 3000'î B.Z. hêza hegemonîk ketiye destê sîteya Ûrê. Serdema Ûrê ji ber buhranên cûrbicûr qetqetî be jî hezar salî dewam kir. Em dema 3000-2000 B.Z. dikarin weke Serdema Ûrê binirxînin. Bi tevahî rola navend û dewrûberê ya Ûrûkê girtiye ser xwe, zêdetir berfireh kiriye û bajarên xwe pirr kirine. Bajarbûn li navend û dewrûberê gelekî di ser dema Ûrûkê re pêşketiye. Em dibînin bi dehan bajar têne avakirin. Di nava civakê de hem ji jor ber bi jêr ve, hem jî ji jêr bi awayekî berfireh rêxistinî zêde bûye. Nivîs pêşketiye. Perwerde û zanist bi sazî bûye. Nîppûr mîna bajarê zanîngehan e. Li welatê li rojhilat cîranê wê yê nêz li herêma Elamê bajarê Sûsê, li rojavayê wê Heleb û Ebla, li bakurê wê Marî û Kazaz û li peravên Firatê gelek koloniyên bi heman rengî hatine avakirin. Mirov dikare bajarbûna li geliyên Misr-Nîl û Pêncavê weke komên jêr ên dewrûberên dûr binirxîne. Geliyên Nîl û Pêncavê ji bajarên xweser zêdetir dişibin mîna koloniyan. Şaristaniya Misrê di sêgoşeya qesr, qebr û perestgehên Firewn de dişibe komineke mekanîk a koleyan. Nekarîbûye xwe bigihîne bajarvaniya xweser û reqabetvan a şaristaniya Sumerê.

Gundekî mezin ê kollektîfbûyî bi bîra mirov dixîne. Ji ber vê xisleta wê jêre sosyalîzma firewnan tê gotin. Cihûwarên Mohenjodaro û Harappa yên li Pêncavê zêdetir koloniyekê tînin bîra mirovî. Heye ku koloniyên Sumeran bin. Piştre şaristaniya Çînê ya di salên 1500'î B.Z. de li devê Çemê Zer (Huáng Hé) pêk hat, fena duyemîn mînaka Misrê be. Em bajarvaniya li Bakurê Mezopotamyayê bi rengekî cihêtir dibînin. Komên li vê qadê bi hêza ji salên 3000'î B.Z. ve derbasî bajarvaniyê dibin, li dijî kolonîzasyonên Ûr û Ûrûkê (di dema 4500-3500 B.Z. de li dijî belavbûna çanda El Ubeyd) xwe diparêzin û xuya ye ku di nava demeke kin de van hêzên kolonîzasyonê di nava xwe de dihelînin. Li herêmê sîstemeke xurt a qebîleyan, avahiya gund û cotkariyê heye û ev dihêle ku karibe hêzên kolonîzasyonê di nava xwe de bihelînin. Dişibe Ewrûpaya li hemberî DYE'yê. Ji komeke jêr an jî dewrûberê zêdetir rewşa wê bêhtir nêzî rola navendeke duyemîn e. Sîstemên hegemonîk ên Ûrûk û Ûrê di nava xwe de bi reqabetên bajaran (di serî de Babîl û Nînova), ji derve jî bi şerên êrîş û parastinê yên ezbetên aryenîk ên li bakur-rojhilat û Amorîtên bi koka xwe semîtîk (yên sereke Gotî û Aqad in) di dawiya salên 2000'î B.Z. de hêza xwe neman. Hêzên nû yên hegemonîk Babîl û Asûr in. Babîl salên 2950-1600'î B.Z. di dema xwe ya pêşî de bi awayekî gelekî bi heybet derketiye ser dika dîrokê. Hemmûrabûyê navdar nîşandeya vê serdemê ye. Dema duyemîn bi ezbetên bakur û rojhilat re bi awayekî hevpar derbas bû (hevgirtinên Hittît û Hûriyan vê yekê tîne ziman) û salên 1600-1300 B.Z. ne. Di encama koalîsyona bi Medan re hegemonya Asûran hilweşandin û piştî vê jî dema dawî ye, ango ev dem salên 600-540 B.Z. ye. Nebûqetnezar ê ku cara pêşî Cihû mişextkirin nîşaneya vê demê ye. Babîl di tevahiya demên xwe de navenda hegemonyayê ye. Hegemonya kapîtalîst a London û Newyorkê tîne hişê mirovan. Navenda pîşesazî, bazirganî, dîn, huner û zanistê ye.

Lewma bi nav û deng e. Gotina 'Heftê û du millet' ji Babîlan maye. Ti qebîle û ezbet nemaye ku wê ew nekişandibe cem xwe. Ji bo Yewnaniyên demê Parîs û London e. Fîlozofên wê yên pêşî di ekola Babîlê re derbas bûne. Bi kurtî di dema xwe de bajarê hegemonîk ê dinyayê ye. Hegemonya Asûrê jî mirov dikare li sê deman dabeş bike. Salên 2000-1600 B.Z. dema koloniyên bazirganiyê yên bi ser Babîlê ve, salên 1300-1000 B.Z. bi temamî dema hegemonîk e. Dema dawî jî salên 900-600 B.Z. ye. Ji Zagrosan heta bi Deryaspî, ji Anatolya Navîn heta bi Misr û Ummanê li cografyayeke berfireh karîbûye bibe hêzeke hegemonîk. Di pîşesazî û bazirganiyê de rê li pêşketinê vekiriye. Malê mamûl firotiye û maddeyên xam veguhestine metropolên xwe. Gelek xisletên kapîtalîzmê weke muhasebe, wezn, pîvan, kredî, pere û wekî wan pêşde birine. Di dema dawî de herçend Ûrartûyên navend Wan weke hevrikekî ciddî derketin pêşberî Asûrê jî heman serketin bi dest nexistin. Ya rastî gelekî girîng e ku Ûrartû weke hêza bi tenê karîbûye li dijî Asûran li ser piyan bimîne. Asûriyan di tevahiya demên xwe yên hegemon de koloniyên bi hêz pêkanîne. Koka têgînên kar, karxaneyê ji karûmê (acente) tê. Li rojhilat Med û Pers, li rojava Misr, Îsraîl, Fenîkî û heta bi nava Anatolyayê karîbûn gelek begtî û mîregiyan bikin kolonî û wan bikin bin destê xwe.

### Piştî Asûr hêza hegemona nû ya Rojhilata Navîn tifaqa Med-Pers

Hêzên Hûrrî û Hîtît yên bi ser qebîleyên Aryen, çawa ku di dema Ûrûk, Ûr û Babîlan de li dijî hegemonyayê di berxwedanê de bi serketin, ev yek li dijî hegemonya Asûrê jî dubare kirin. Em dizanin ku Qralê Hîtîtê Mûrşîlî yê yekemîn tevî hevgirên xwe yên Hûrrî di sala 1596'an B.Z. de Babîl jî di navê de navenda hegemonîk bi tevahî hilweşand. Şaxê Hûrriyan, Mîtaniyan di dema 1500-1250'î B.Z. de ji Kerkûkê heta bi Deryaspî li herêmeke berfireh hêzeke mîna împaratoriyê pêkanî. Med û Ûrartûyên ji heman kokê ne jî di dawiya berxwedanên salên dirêj de sala 612'an B.Z. kirin ku Asûr bi awayekî stratejîk têk biçe. Lê mirov têkçûna Asûrê bi tenê bi şerên derve ve girê bide nêzîkatiyeke kêm e. Sedema bingehîn ew e ku di şer de êdî kar û destketî nîne. Çawa ku wexta kara sermayê kêm dibe rê li pêxîrtengî û krîzê vedike, ji bo şeran jî qanûn e ku wexta kar û destketiyên wan kêm dibin bi krîz û têkçûnan bi encam dibin. Piştî Asûran li Rojhilata Navîn hêza nû ya hegemon împaratoriya Pers a xwe disipêre hevgirtina Pers û Medan e. Împaratorên Pers ên bi rola hegemonê dinyayê rabûne, di dema 550-330 B.Z. de di avakirina sîstema herî berfireh a global de bi ser ketin. Qada wan a desthilatdariyê ji peravên Egeyê digihêje Pêncavê. Ji wan hat ku ji bilî Çînê tevahiya qadên dinyayê yên ku li gorî wê demê şaristanî ne, di bin hegemonya heman hêzê de bikin yek. Di vê serketinê de weke çanda manewî, para Zerdeştiyê diyarker e. Sîstem bi serhildanên dewamî yên hêzên hê kevintir hêzên şaristaniya Misrê û hêzên di pêvajoya şaristaniyeke nû de, hêzên şaristaniya Îon ve hat hilhilandin û peritandin. Babîl a mîrateya Mezopotamya Kevin dewam dikir jî tim û tim isyan dikir. Ezbetên Skîtan ên li bakur mîna gerîllayên demê bi şerê êrîş û parastinê herî zêde sîstem êşandin û peritandin. Mekedonya bi bandora çanda Grek bi lez pêşde diçe û li serê wê qralekî nû û gelekî ciwan Skender heye. Ev qralê ciwan şagirtê Arîsto ye ku serdestiya wî ya îdeolojîk û taktîk dawî li hegemonya Persan tîne. Bi vî awayî şaristaniya nû ya Grek bi serketî xwe dide qebûlkirin.

e- Hêza nû ya hegemonîk dikeve destê şaristaniya Helen a serdestiya xwe daye qebûlkirin û hêzên temsîla wê dikin yên Greko-Romen. Ev cara pêşî ye ku hêz bi awayekî ciddî dest diguhere û ji Rojhilat derbasî Rojava dibe. Şaristaniya Greko-Romen a xwe disipêre çanda bajêr a Îonê a li peravên Egeyê (600 B.Z. - 500 P.Z.), di dîroka gerdûnî de rê li duyemîn pêla mezin a bajarbûnê vekir. Çavkaniya hêza vê şaristaniya bajêr çanda ketiye serhev a maddî û manewî ya Misr, Babîl, Hîtît, Grît û Med-Persan e ku belkî bi sedsalan hatiye girtin û qebûlkirin. Hema bêje zanyarên sereke yên Îonê nînin (Solon, Thales, Pîsagor) ku li qesrên Misr, Babîl û Persan negeriyabin û zêde zêde li çanda wan çav negerandibin û lêkolîn nekiribin. Bêguman ji gelek aliyan ve feydeya Greko-Romenan jî li şaristaniyê bûye. Ya girîng ew e ku şaristanî bi awayekî zincîrwarî bandorê li hev dikin. Di bingehê wê de jî bi destxistina mayeya civakî heye. Şerên desthilatdariyê û saziyên wê timî weke mîraseke rêûresmê yek dewrî ya din dike. Kî desthilatdariyê herî zêde bike, ew xwe herî zêde serketî dihesibîne. Ev jî bi mezinkirina berhemê zêde û bi destxistina wî ve têkildar e.

### Şopandina dîrokê ya girêdayî civakê wê cewherê dîroka gerdûnî bide

Şaristaniya Ewrûpayê di sedsalên 9.-13. de çawa ku çanda maddî û manewî ji şaristaniya Rojhilat veguhest, bi heman rengî şaristaniya Greko-Romen jî di salên 1600'î B.Z. de pêşî bi mînaka Mîken Hellas a li Nîvgirava Yewnan, û paşê di salên 1000'î B.Z. de jî bi Etruskan li Nîvgirava Îtalyayê çanda maddî û manewî ji şaristaniya Rojhilat veguhest. Veguhestina çanda Neolîtîk jî ji demên 7000-4000 B.Z. misêwa dewam kiriye. Ji dîroka gerdûnî veguhestina çandê yekalî nabe, timî bi awayekî hewcedariya beramberî hevdu pêk hatiye û tê. Di demên şaristaniyan

de belavbûna xwe disipêre tehekumê ji texmînan wêdetir, bi sînor e. Dîrok jî her tişt nîne; em nikarin propagandaya dîrokên fermî weke dîrok qebûl bikin. Belavbûna şaristaniyên bi koka xwe desthilatdar perçeyekî bi sînor ê dîroka gerdûnî pêk tînin. Di binî de jî rola bingehîn a dîroka civakî ye ku ji gelan û qebîleyan pêk tê. Gelekî zehmet e ku mirov navê dîroka desthilatdar li dîrokê bike. Eger mirov dîrokê di çarçoveya civakî de bişopîne ev yek wê cewherê dîroka gerdûnî bide me. Ez divê careke din destnîşan bikim ku ev pirsgirêk hê jî bi tevahiya giraniya xwe têne guftûgokirin. Bajarvaniya li herdu keviyên Derya Egeyê (700-500 B.Z.) û tevgera çand û şaristaniyê ya xwe disipêre wê ji aliyê dîroka gerdûnî ve sentez û momenteke nû îfade dike. Di pêkhatina şaristaniya Ewrûpaya Rojava de mirov dikare vê sentez û momentê weke gavavêtin û derketineke orjînal binirxîne. Ji bo nêrîna ji hemû aliyan ve li dinyayê weke destpêkekê tê pejirandin. Şaristaniya navendî ya Ewrûpayê di vê mijarê de tevî hemû îdeayên felsefîk û zanistî, para bêhtir nêzîkatiyeke mîtolojîk nîşan dide û dema vê dike dîroka gerdûnî gelekî berevajî dike. Ji vegotinên heta niha gelekî baş tê fêhmkirin ku çanda li peravên Egeyê pêşketî, heta bi dema xwe ji tevahiya çandên bi koka xwe Rojhilata Navînî bi veguhestina sedsalan û heta hezar salan dewam kirî, wergirtiye û sentezeke gelekî girîng a vê veguhestinê ye. Hewce nake ku mirov dûr biçe. Bi tenê senteza ji salên 600'î B.Z. ji têkiliyên Pers-Helen pêkhatî (eger em Medan jî li vê zêde bikin) heta bi hilweşîna Romaya Rojava dewam kirî, ango em li encama têkiliyên heta salên 500'î P.Z. (em Sasaniyan jî lê zêde bikin) dewam kirî, şahidiyê dikin û ev yek rastiyê piştrast dike. Mirov bi tenê çavekî li panteona xwedayan a li çiyayê Nemrûdê yê li Semsûrê bigerîne, têrê dike ku mirov li vê rastiyê serwext bibe. Tevgera bajarbûnê ya Grekan sentezeke serketî û qonaxeke li jor e. Atmosfera çandî ya rê li ber vekir, hişt ku îdeolojiyên dînî yên bi giranî koka wan mîtolojîk in, ji hev derxîne û bi vê re kir ku felsefe û zanist bibin xwedî gotin. Ji bo vê yekê gelekî bikêrhatî bû. Ji bo ku hîmê vê felsefe û zanistê deyne, rola vê kêrhatîbûnê diyarker e. Ji lewra, dîroka gerdûnî bi awayekî ciddî bi lez kiriye. Rê li pêşiya zanista biyolojî, kîmya û fizîkê hatiye vekirin, bingeha felsefa civakî û dîrokî jî bêhtir bûye xwediyê pîvanên zanistî. Di hunerê de jî nexasim di mîmariya bajêr, heykeltraşî, şano û vegotina destanan de mînakên bi heybet derketine holê. Bêguman li pişt serketinên mezin ên Skender ev serdestiya çandî heye. Dîsa ya hegemonya eskerî û siyasî ya Romayê derxist holê jî ev serdestiya çandî bû. Roma çi di qonaxa komarê û çi jî di qonaxa împaratoriyê de veguhestina çanda Grek ji bo qada eskerî û siyasî îfade dike. Roma li derdora hezar salî xwediyê serhatiyeke hegemonîk e (508 B.Z.-495 P.Z.), bi vê jî hem niyetên Atînayê rast derketine, hem jî bi cih hatine. Ji lewra, mirov nikare weke sentezeke din an jî weke orjîn bihesibîne. Bêguman ji aliyê çendayetiyê ve gelekî mezin bûye, ji aliyê çawayetiyê ve jî (di warê hegemonya eskerî û siyasî de) hewl daye xwe bigihîne mukemmeliyetê. Di warê huqûq, mîmarî û retorîkê de mînakên vê hatine nîşandan. Hegemonya Romayê gerdûnîbûn û dîroka gerdûnî têra xwe tengav kiriye. Ji vî alî ve alîkarî û kêrhatina wê girîng e. Lê divê neyê jibîrkirin ku bi giranî di qada çandî ya Rojhilata Navîn de bi vê rolê rabûye. Mînaka Romaya Rojhilat (Împaratoriya Bîzansê) vê rastiyê pirr eşkere îfade dike. Hewl daye xwe bigihîne şaristaniya Ewrûpayê, hewl daye bibe Rojava. Di vê hewldana xwe de li dijî Gotan (qebîleyên Germenîk) ji bo seferên eskerî ji çêkirina hin rêyan, kelheyan û bircên parastinê wêdetir neçûye. Di gerdûnîbûna wê de ji sedî sed aliyên rojhilatî serwer in. Demeke dirêj Dîcle û Firat sînorên wê yên Rojhilat bûn. Ji mînakên Grekê zêdetir bûye Rojhilatî. Hem di qada maddî de û hem jî di qada manewî de bi vî awayî bû, di warê çendayetî û çawayetiyê de jî sentezeke bi vî awayî îfade dike. Bêguman di pêkhatina şaristaniya Ewrûpayê de qonaxeke dîrokî û pêşezmûnek e. Di dema hegemonya Romayê de li şûna Persan (xanedanên Hêxamenîş) çanda Rojhilat xanedanên Part û Sasaniyan ên şûna wan girtî, hewl dane temsîl bikin (li derdora salên 250 B.Z.-650 P.Z.). Wexta ez dibêjim temsîl, ez îşaret bi rehên eskerî û siyasî yên çanda desthilatdariyê dikim. Di vê temsîlê de çawa ku piştî Skender li pişta hegemonya Greko-Romen cîhana çanda Helen hebû, li pişt desthilatdariyên hegemonîk ên bi giranî Pers-Med bûn jî çanda Zerdeşt a li qûntara çiyayê Zagrosan li dora agirên Magan (agirê kuçikê) ên vêketî pêkhat, rola xwe ya diyarker heye. Di navbera du hêzên hegemonîk de li derdora hezar salî şerên serdestiyê yên eskerî û siyasî dewam kirine û pêre, di navbera herdu çandan de bi heman awayî şerekî îdeolojîk dewam kiriye. Di senteza çanda Rojava de rola van pevçûn û şeran diyarker e. Pêwîst e, ez vê xusûsê bi girîngî destnîşan bikim ku çanda civakî ya xwe disipêre qûntara çiyayên Toros-Zagrosê di ti demê de bi temamî resenî û orjînaliya xwe wenda nekiriye. Radestî hegemonyayên siyasî û eskerî yên ji nava wê derketî û heta rahibên dînî nebûye. Weke civaka dîrokî her hebûna xwe dewam kiriye. Tevahiya dîrokê ji çar aliyan ve êrîşên dagirkeriyê bi ser de hatine û tevî vê yekê karîbûye hebûna xwe ya civakî dewam bike. Di vê yekê de rola sîstema qebîleyan a kokên wê kûr in (ji salên 15.000'î B.Z. heta roja me ya îro) û ekonomiya xwedîkirina heywên diyarker in. Di vê çandê de ji mirov wer tê du alem hebin. Yekemîn, cîhana civakî ya gel û qebîleyên di kûrahiya dîrok û axê de veşartî ne; duyemîn, cîhana dewlet, pevçûn û şerên hegemonya desthilatiyê ya bêhejmar hêzên dagirker, mêtinkar, mêtinger û îmhakeran e. Ya ez dixwazim qal û behsê bikim ew e ku ji aliyê dîroka gerdûnî ve pêşketina diyalektîkê ya heta roja me ya îro dewam dike, xeta sor a di navbera herdu cîhana de ye. Çanda herêmê qet nebe di warê kirdarbûnê de hîç dewrûberî qebûl nekiriye, nexwestiye vê bîne bîra xwe jî û herçiqasî di warê xwesteka navendbûnê de çîrokên wê yên trajîk û komîk hebin jî timî di navendmayînê de israr kiriye. Wexta ku mirov ji vî awirê gerdûnî ve li dîroka me ya mîkro binêre dikare bi hezaran mînakên hem rûmetê hem rezîliyê, hem êşê hem coşê, hem komediyê hem trajediyê bibîne û em ê di fêhmkirina vê de zehmetiyê nekişînin. Em ê li xwezaya xwe ya civakî (tevî xwezaya fizîk, kîmya û biyolojîk a yekpare jê nabe) zêdetir serwext bibin û ji bo paşvexistina neyêniyan em ê zêdetir ber bi çalakî û îradeya wê ve bibezin.

f- Pêngava gerdûnî ya dawî ya şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn di sentez û momenta şaristaniya Îslamî de pêk hatiye. Di bin navê Îslamê de berevajî yeqîn û texmînan îdeolojiyeke dîn a rafîne bûyî nîne, senteza tevahiya varyasyonên îdeolojîk ên heta wê demê ye. Îslam orjînalîteyek nîne, di herikîna çanda gerdûnî ya Rojhilata Navîn de û di şaristaniya wê de, demek e, kêliyek e. Di heman demê de sentezeke îdeolojîk a gelekî tevlîhev e. Bêşensî di vir de ye, Ewrûpaya Rojava senteza Xirîstiyaniyê ji nû ve analîz kir û bi vê yekê di zanist û felsefeyê de rê li ber pêngaveke dîrokî gerdûnî vekir, lê analîzên felsefeya zanistî bi sentezên Îslamê dest pê kirin, hînê negihiştin encamê, hatin tepisandin û ev jî bû yek ji sedemên girîng ku şaristaniya navendî ya Rojhilata Navîn destbiguhere û bikeve destê Ewrûpayê.

### Îslamiyet, dogmatîzma olî û rûxandin

Şaristaniya Îslamê, di destpêkê de tevî hemû naverok û temayên xwe yên rizgarîxwaz di demeke pirr kin de (Xanedaniya Emewî, 650-750) veguherî şaristaniyeke hegemonîk. Di demên dawî de xwelihevrakişandina Bîzans-Sasaniyan a gelekî dejenerebûyî û ya kar têde nîne, gelên herêmê û komikên civakî têra xwe hilhilandin. Ya rastî, li dijî vê pevçûna asêbûyî û çareserneker, Îslamiyetê xwe weke gaveke dijber û çareseriyê pêşkêş kiriye. Çawa ku ji navê wê jî tê fêhmkirin ev peyam Selam e, ango dînê aştiyê ye. Koka têgîna Îslamê ji selamê tê. Lê çawa ku dibêjin ê hatî xweziya mirov bi yê çûyî tîne, bi Xanedaniya Emewî (Muqawela – peymana – Medîneyê ya Muhemmed ji 620 heta 650 dewam kiriye, di xwelihevrakişandina Muawiye-Elî de ji Qureyşan Xanedaniya Emewî bûye aliyê serketî) şerên şaristaniyê yên li Rojhilata Navîn hînê zêdetir bûne. Bîzans û Sasanî gelek caran hatine têkbirin, dor li Konstantînopolîsê hatiye girtin, bajarên Sasaniyan bi tevahî hatine girtin. Lê li sînorên Çînê (750) hatine rawestandin. Ji Hindistanê heta bi Nîvgirava Îberê û dewrûbera Efrîkayê bi cih bûne. Piştî ku ezbetên Tirkan misilman bûn li nîvê dinyayê yê Bakur, ji Ewrûpaya Navîn heta bi tevahiya Başûrê Sîbîrya û Asya Navîn belav bûye. Di qadên desthilatdarî-dewlet-şaristaniyê de gelekî berfireh bûye. Di dema Xanedaniya Abbasî de (750-1250) gihiştine asta herî jor a hegemonyayê. Navê têgîna Împaratoriya Cîhanê gelekî tê hildan. Çanda Grek, Hind û heta ya Çînê bi lez tên tercumekirin û telîfkirin, bi vê dixwazin Îslamê di warê çandî de serdest bikin. Kapîtalîzma bazirganiyê xwe gîhandiye qonaxa herî pêşketî ya dîrokê. Ya rastî, bixwaze dikare Ewrûpaya ku wê paşê di warê hegemonîk de wê têk bibe, bixe bin destên xwe û heta hêza wê heye ku wê dagir bike. Ji ber ku kar têde nîne, qîma xwe bi fetheke bi sînor a Ewrûpayê tîne. Berevajî yeqînan dagirnekirina Ewrûpayê bi sedema berxwedana wê nîne, çawa ku di dagirkeriyên Romayê de hat dîtin, bi sedema bêbereketbûnê dagirkeriyên wan nîvco man. Dîsa dagirkeriyên Hûn û Cengiz Xan ji ber heman sedeman nîvco hatine hiştin. Şensê Ewrûpaya heta sedsala 15. ew e; hê nebûye qadeke bi bereket û bi kar ku hêzên mezin (yên bi koka xwe ji Rojhilata Navînî) dilê xwe bibijîninê. Wexta ku Ewrûpa hatiye wê astê jî ji sedsala 19. û pêve jêhatiye bi pêngaveke dijber hegemonya xwe pêk bîne û mayînde bike. Dema weke şaristanî hilweşîna hegemonîk

a Îslamê tê analîzkirin, ji derve êrîş û dagirkeriyên Xanedaniya Cengiz Xan a Moxol û li hundir jî pevçûnên mezheban weke sersebeb têne nîşandan. Ev vegotin û ravekirineke kêm e. Çawa ku tê gotin, sedema bingehîn ew e ku nekarîbûye Ronesansa çandî pêk bîne. Haya serdema Abasiyan ji vê rastiyê heye. Baş dizanin ku wê bi tenê bi peyama



aştî û rizgariyê ya Îslamê û kêrhatina wê ya dînî nikaribin împaratoriyê li ser piyan bigirin. Bi rastî di dema 800-1200 de hewldanên nêzî Ronesansa Îslamî gelekî hatine nîşandan. Di zanist û felsefeyê de gavên ciddî hatine avêtin. Di warê bijîşkî, biyolojî, matematîk, fizîk, kîmya, dîrok û zanistên civakî de li pêşiya Ewrûpayê ne. Di warê felsefeyê yê zanîn, tesewif, mentiq, îlahiyat û edaletê de gavên gelekî ciddî têne avêtin. Lê di encamê de bi giraniya dogmatîzma dînî re ev xebat korkirine û heta lanet li wan anîne û bêkêr kirine. Ewrûpa jî berevajî li aliyekî hewl dide yekser xwe bigihîne çavkaniyên Greko-Romen, li aliyê din jê hatiye ku tevahiya çavkaniyên li welatên Îslamê bigewdebûne û dikare sûdê ji wan bigire, di vê demê de veguhezîne. Ronesansa li Rojhilata Navîn înqîta bûye (qut bûye) li Ewrûpayê gav diavêje. Sedsalên 14. û 15. li Ewrûpayê sedsalên Ronesansê ne. Şensê Ewrûpayê ew e ku tevî dogmatîzma Xirîstiyaniyê, karîbûye Ronesansa xwe dewam bike û li tevahiya Ewrûpayê belav bike. Di sedsala 16., 17. û 18. de bi şoreşên Reformasyon (di dîn de reformên bi kok), felsefî û zanistî pêvajo rohnî kiriye û jê hat bi awayekî serketî pêşde bibe. Di encamê de wexta em tên serê sedsala 19. serketina şoreşa çandî (zêhnî) ji sedî sed e. Di warê destguhertina hegemonyayê de serketina şoreşa çandî bi roleke diyarker rabûye. Ango ji ber vê yekê şaristaniya Îslamî hegemonya xwe ji dest dide û hegemonya dikeve destê Ewrûpayê.

Di mijara destguhertina hegemonyayê de sedemeke din a divê di rêza duyemîn de bê qebûlkirin ew e ku kapîtalîzma bazirgan bi şêweyekî bi heman rengî serketî veguhestin Ewrûpayê. Di serî de Venedîk, Cenova û Floransa bajarên Îtalyayê ji sedsala 11. û pêve bi Seferên Xaçperestan pêngava mezin a bazirganiyê ya ketin navê, bi tenê bi armanca kar û qezencê nebû. Herweha karîbûn, bi tevahî pêşketinên kapîtalîst (cotkarî, pere, bazirganî, îndustrî) yên bi hezarên salan li cîhana Rojhilata Navîn çêbûbûn, tevî karê weke çandekê veguhêzin. Tevî mal tevahiya teknîk û usûlên vî malî hildiberînin jî vediguhêzin. Divê mirov teknîkên weke kaxiz, barûd, çapxane, top û hwd. yên ji şaristaniya Çînê hatine girtin jî li ser veguhestinan bihesibîne. Nexasim di rêza sêyemîn de mirov veguhestinên eskerî û siyasî yên 'Bi Rêya Moxol' dikare bibîne. Ewrûpayê xweber teknîkên dewlet û desthilatdariyê û fikra li pişt wan ava nekiriye; para bêhtir jêre mîras maye. Lê ji sedsala 16. ve karîbûye alîkarî û kêrhatina xwe li vê çandê zêde bike. Divê mirov di rêza çaremîn de veguhestinên huner û wêjeyê bi cih bike. Di van veguhestinan de dewletên bajêr ên Îtalyayê û Dewleta Îslamê ya Endulusê bi rola sereke rabûne.

Di dawiyê de mirov dikare Xirîstiyantiyê jî weke amûrekî veguhestina moral û manewiyatên bingehîn binirxîne. Piştî hilweşîna Romayê, Xirîstiyantiyê Ewrûpa ji aliyê moralê ve rakir ser piyan. Ji vê jî girîngtir, pêngava nû ya bajarvaniyê pirranî li dora perestgehên Xirîstiyantiyê bi pêş ket. Tevgerên nû yên bajarbûnê yên ji sedsala 11. ve li peravên Îtalya û Ewrûpaya Rojava bi lez bûn, ji aliyê gerdûnî ve piştî pêngava Sumer û Îonê pêngava sêyemîn a sereke ye. Ev pêngavên dîrokî yên hem çanda li pişt wan û hem jî şêweyê avabûna wan cihê, aliyê wan ên wekhev jî gelek in, bêguman gelek komên wan ên jêr jî hene. Çîroka şaristaniya pênc hezar salî di heman demê de çîroka pêşketina varyasyonên bajêr e. Bajar weke qayişên hem maddî û hem manewî yên çandê di dîrokê de bi roleke domdar û mayînde rabûne. Qonaxa bajarbûnê ya Ewrûpayê hê jî dewam dike û nayê zanîn ku wê çawa bi encam bibe, ji ber ku pêxîrtengiyên dijwar û bi awayekî kansêrwarî mezinbûna bajêran dibe mijara guftûgoyên mezin û lêgerînên nû yên çareseriyê. Xirîstiyantî bi van aliyên xwe di warê veguhestina hêmanên çanda maddî û manewî de bi rola pêşengtiyê ya stratejîk û taktîk rabûye. Wexta mirov kokên Xirîstiyantiyê yên ji Rojhilata Navîn li ber çavan bigire, mirov ê baştir fêhm bike ku Ewrûpaya ji sedsala 16. ve derbasî şaristaniyeke nû bûye, çawa derketiye holê. Şaristaniya Ewrûpayê ya ji şaristaniya Greko-Romen nîvco mayî, li ser van veguhestinên nû xwe nû kiriye, xwe gihandiye sentezeke çandî ya bi hêz û bi veguherînên radîkal ên di şêwazê hilberîn-danehevê de karîbû bi awayekî serketî hegemonya xwe ava bike. Di avakirina hegemonyayê de dewletên bajêr ên Îtalyayê, tevgerên jinûvefetihkirinê yên Qraliyetên Spanyayê û ceribandinên Împaratoriyê, bilindbûna Ingilîstan û Hollandayê, hevrikiya Franse û Elmanyayê bi vê re talî dimînin. Divê mirov bi girîngî destnîşan bike ku di vê bilindbûna hegemonîk de hêmanên maddî û manewî yên çanda Cihûtiyê di warê rolgirtina stratejîk de herî kêm bi qasî Xirîstiyantiyê bi tesîr bûne. Ji cîhana Îslamê di veguhestina tevahiya hêmanên çandî de rola pêşengiyê ya Cihûyan, ji sedî sed e.


Di hînkirina Ewrûpayê ya pere û bazirganiyê de ew timî bi rola sereke rabûne. Di her tevgera fikir, zanist û felsefeyê de Cihûyan şopên mayînde hiştine. Di pêşengiya taktîk û teorîk a hemû şoreşan de misêwa hebûna xwe dane hiskirin. Di şaristaniya nû de bi rola xwîn û mejî rabûne, nayê înkarkirin ku herî kêm di pêşketina vê şaristaniyê de xwediyê pareke sereke ne. Weke encam mirov dikare bibêje; dîroka gerdûnî ya Hegel bi dewleta bajêr da destpêkirin û xwest bi dewleta netewe ya Napolyon bi dawî bike, gelekî eşkere ye ku hîç wekî ew vedibêje nîne. Felsefeya lîberal a bi Hegel re di nava dijberiyê de jî bi jihevketina Yekîtiya Sovyetê re kehaneteke bi heman rengî ya 'dawiya dîrokê' kiribû. Li vir 'dawî' heye; lê ev, dawiya dîroka gerdûnî nîne, dawiya dîroka şaristaniya navendî, desthilatdarî û şêwegirtinên dewletên wê ne. Dewleta netewe heta bi çaviya herî mahrem a civakê ve çizirî ye, di heman demê de bi vî awayî pirsgirêkbûyîna desthilatdarî û dewletê bi dawî kiriye. Ango heke felsefeya Hegel bi vî awayî li ser piyên wê bê danîn (ne ku weke Marks kirî) hingî mirov wê karibe zêdetir jê hîn bibe û ew ê kêrhatî be. DYE'yê di dawiya salên 2000'î de wexta ku di pêngava li Rojhilata Navîn de serê Saddam Husên birrî, min timî ji xwe pirsî gelo haya wê jê heye ku bi vî awayî dawîanîna li dewleta netewe îlan dike. Bersiv ewçend girîng nîne, rastî bi xwe girîng e. Min şibandineke wisa jî kiribû: Ji bo avakirina dewleta netewe di Şoreşa Franseyê de serjêkirina Louîsê 16. çiqasî girîng be, serjêkirina Saddam jî herî kêm di dawîanîna li dewleta netewe ya Rojhilata Navîn de ewçend girîng e. Yên dizanin hûrûkûr û rast li dîroka gerdûnî binêrin, ji niha ve dikarin gelek îşaretên dawîlêhatinê bibînin ku xelekên dewletên netewe yên ji Afganistanê dest pê dikin û heta bi Fasê dirêj dibin, çawa diqurifin û dişkên. Lê belê bi dawîbûna fenomenên şarisanî-dewlet-desthilatdarî yên bi şêwazê Hegel, dawîlêhatina dîroka gerdûnî nîne, maneya wê ji paradîgmayeke din destpêkirineke nû ye. Dîroka civakî ya li herî binî ya dîroka gerdûnî ye, lê timî mîna damara sereke misêwa hildiavêje, piştî navberên dirêj ji nû ve serê xwe derdixe rûyê erdê û xwe amade dike ku bi rola xwe ya dîrokî rabe. Di tezên şaristaniya demokratîk de li ser avakirina dewletan û hilweşandina wan zêde îdea peyda nabin. Şaristaniya demokratîk bi şaristaniya dewletdar û hiyararşîk re timî hewl dide xetên taktîk û stratejîk ên di navbera xwe de zelal bike. Ev herdu şaristanî di dîroka gerdûnî de her hebûn, niha jî hene. Wezîfeya me jî ew e; em şaristaniya xwe ya demokratîk, tevahiya bernameyên siyasî û îdeolojîk, amûr û prensîpên taktîk û stratejîk pêşde bibin, belê ne weke ku K. Marks Hegelparêziya Çepgir kir, em ê bi tevahî felsefeya wî rexne bikin jê bibihurin û em ê felsefeya şaristaniya xwe ya demokratîk pêk bînin.

■■■

# Rastiya Rêbertiyê

## Tevgera Civakbûyî Ya Herî Bihêz Û Herî Berfirehe – 2

**Alî Haydar Kaytan**



Dema ku li rastiya Rêbertî bê mêzekirin em dibînin ku Rêber Apo miroveke ku li dijî şaristaniyê berxwe dide û tevî wê nabe. Taybetmendiya herî bingehîn a Rêbertî eve, hîna zarok jî beşdarî şaristaniyê nabe. Pergalek şaristaniya feodal heye ku ji ber zirûfên welatê li jiyan dike tê derbas kirin, Rêbertî tevî wê nabe. Pergala modernîteya kapîtalîst a ku nû pêşdikeve heye, tevlî wê jî nabe. Li hember her duyan seknek raber dike. Rêber Apo dikare wek zarokê beşdarî şaristaniyê nebû bê pênase kirin. Beşdarî ya biyanî nabe, yek jî taybetmendiyên herî diyarker ên Rêbertî ev in. Rêber Apo têkildarî vê mijarê got “Min ti demê îxanet li xeyalên xwe yên zaroktiyê nekiriye. Min ti demê ruhê xwe ne firot, min bekareta ruhê xwe” parast. Birastî jî parastina bekareta ruhê xwe tiştek pir girînge, divê ev têgeh bixwe bikûrahî bê lêpirsîn kirin.

Bekareta ruh, parastina ruh, ne firotina ruh çiye? Çînayetî bixwe, ji civaka dayîkê qutbûn firotina ruh bixwe ye, cewherê wê ev e. Pênaseyên Rêber Apo yên têkildarî nasnameya xwe ku berê kiribûn hene. Di pirtûka wî ya “Ji Dewleta Rahîp a Sumeran ber bi Şaristaniya Demokratîk” da jî heye, lê di parêznameyên piştî wê de wek hê balkêştir bi sernavek “Nasnameyek Dixwaze Ji nû ve bê Pênase kirin” ve heye. Rêber Apo dibêje “ Bi girêdayî asta hişmendiya ku ez gihiştimê ve min carek din nasnameya xwe pênase” kir. Zarok di pêvajoya navbera temenên 5-7’an de wek biyolojîk û wate hîna pêşketinek tam îfade nake. Wek biyolojîk pêdivî bi dayîkê heye, ji destpêkê ve zarok parçeyek qut nabe yê dayîkê ye, qada wî/ê ya jiyanê bedena dayîkê ye, ji wê naveqete, bi xwedî kirin, ewlehî û her tiştê xwe ve girêdayî dayîkê ye. Zarok wek zîhnî di wan temenan de pir pêşneketiye. Pêvajoya ku zarok xwe, derdora xwe nas dike û dixîne li ber lêpirsînê, piranî derdora 7’an e. Zarok ji vê temenî şûnve dixwaze derdora xwe nas bike, xwe fahm bike, hewl dide pirs bike. Di destpêkê de di zarok de xwesteka fêrbûnê heye, jixwe zindîbûyîn bixwe fêrbûneke, zindîbûn tê wateya fêrbûnê, cewherê wê ev e. Lê rewşa hê diyarker bitaybet jî ketina pêvajoya lêpirsînê, pêvajoya pirs pirskirinê, bi pirs kirinê ve ketina pêvajoya fahm kirinê derdora 7’an e. Ev pirs hewldana destpêkê ya xwe îfade kirina gerdûnê ye. Belkî hemû pêşketinên di gerdûnê de ji bo ku bigihijin pirsek wiha bin. Belkî armanca gerdûnê jî ev be. Ji ber ku deriyê ku ji zanînê re vedibe ji vê derê destpêdike. Yanê deriyê xwe naskirinê, deriyê zanîna gerdûnê ji vê derê vedibe. Pirsa “Ez kî/ê me” wek esas pirseke ku ji gerdûnê re hatiye pirskirin. Ji ber ku bersiva we daye vê pirsê, wê we hetanî encama “Ez ez im, ez gerdûn im” bibe.

Di çavkaniya hemû fahm kirinan de mirov heye, kirdeya hemû têgihiştinên me mirove, derveyî mirov çavkaniyek me ya agahiyê tineye. Çavkaniya zanîn û hişmendiyê mirov e. Derveyî mirov hêzên ku em agahî jê derdixînîn hene, lê hêzên ku agahî pêşkeşî me dikin tinin. Têkildarî gerdûn, xweza û mirovahiyê çi agahiyên me hebin hemû jî aîdê mirov in. Derdora temenê 7 jî ji aliyekê ve pêvajoyeke ku pirsek wiha hatiye rojevê, pêvajoya xwe naskirinê ye. Xwe nas kirin destpêkê bi pirsa “Ez kî/ê me” ve destpêdike, eger hun vêya wiha bişêweyek formulkirî ve rasterat nepirsin; lê sekna we, lêpirsînên we wek esas hemû tên vê wateyê. Hinek tişt zû tên ferq kirin, tiştek wekî mirinê heye. Ya duyemîn; ez cuda me, hinek din hene, rastiya dayîk-bav heye, dewlemendî xizantî heye, têgihiştina eş û çoşê pêktê, zarok wan kişf dike. Eger mirov vegere zaroktiya xwe wê hebûna tiştek binavê dewlemendî û xizaniyê ferq bike. Hinek xizanin, feqîr in, di bin zextan de ne. Bandora ku wan li zarok afirandî hene. Ji aliyekê ve fêrbûn bi êşê re rû bi rû hatine, birastî jî wiha ye. Dibêjin “Berdêla rastî dîtinê êş e.” Ji ber ku dema we neheqî dît, kesê nemafdar dît hun êş dikişînin. Ji ber wê jî ji bo ku hinek êş nekişînin, dibe ku bizanebûn çav girtinê tercîh bikin. Zarok wan dibîne ji ber vê yekê di vê wateyê de cudahiya xwe fahm dike, fahm dike ku ew bixwe hebûnek cuda ye, di nava rastiyek civakî de ye lê ji wan cudaye. Ji aliyekê ve jî digihije ferqa xwe, xwe ferq kirin şêweyê herî pêşketî yê zanînê ye. Birastî jî pêkane ku azadî bi ferqkirinê ve bê pênase kirin, zanîn ev e, fahm kirin û ferq kirine. Dikare bê gotin ku ji bo Rêber Apo pêvajo hinek jî li derdora vî temenî û bi vî şêwazî destpêkiriye. Rêber Apo di Dibistana Navendî ya Partiyê de pirsên wiha “Li gorî we ferqa min çibû? Ji we hinek din cudatir im. Ti kes nikare bidestxistina min a pêşketinek diyar înkar bike, min çima ev serxist? Min çima pêşiya pêşketinek wiha vekir? Baş e, hun çima neketin nava pêşketinek wiha?” dikir. Digot “Hêza min ji kêliya ku min jiyan naskir şûnve bi gotina min a ‘ez wiha jiyan nakim’ ve destpêkir, çavkaniya hêza min ev e, ji ber ku min jiyana heyî ya civakê mêze kir û min ew jiyan xist li ber lêpirsînê.”

Ev lêpirsîn ne lêpirsînek dişibe asta lêpirsîna îro, divê teqez wiha neyê mêze kirin. Rêbertî sekna xwe dixîne li ber lêpirsînê, bi gotina “Sekna min tê vê wateyê” ve pênase dike û dibêje “Ev ne jiyane ev jiyan rastî îxanetê hatiye û bi rewşa heyî ve nayê jiyan kirin, divê bi vê rewşê ve beşdar nebe. Ez ê beşdarî vê jiyanê nebim, ez ê wekî we jiyan” nekim. Ev seknek pir girîng e. Birastî çavkaniya mezinbûyîna Rêbertî wek esas li vê derê ye. Yek jî paş plana vê heye. Di navbera jiyan û rastiyê de pêwendiyek heye, rastî nebe jiyan nabe, jiyana ku şaş hatiye ava kirin rast nayê jiyan kirin. Ji ber wê jî divê ji bo jiyan kirinê rast bê jiyan kirin. Li holê jiyanek şaş heye. Rêbertî

got "Ev jiyan jiyanek şaş e." Ev jiyan wek esas jiyaneke ku şaş hatiye ava kirin, wê demê divê jiyana rast çawa bê jiyan kirin. Ji bo jiyanê rastî pêwîste, wê demê rastî li ku derêye? Vaye lêgerîn wiha destpêdike. Her meşa jiyana azad meşa lêgerîna rastiyêye. Ya rast çiye? Wekî ku em timî destnîşan dikin heqîqet bi rastiyê ve girêdayiye, cewherê heqîqetê rastiye, hemû lêgerînên me yên rastî, başî, bedewî û azad timî li gorî vê çarçoveyê pêşdikeve, lê ya esas ya rast e. Baş e, rastî çiye? Ji ber wê jî beza li pêy a rast, meşa heqîqetê bixwe ye. Hemû hewldanên piştre yên Rêbertî bişêweyê lêgerîna rastiyê ve derbas dibin.

Ne beşdariya jiyana heyî çi îfade dike? Ya yekemîn; ne beşdariya pergalekê ye. Ji ber ku jiyan di nava pergalek diyar de derbas dibe. Pergalek heye, ew jî pergala şaristaniyê ye. Dema ku Rêbertî tê dinyayê pergala şaristaniya feodal e, helbet em niha nikarin pir zêde behsa pergala feodal li Kurdistanê bikin, ji ber ku kapîtalîzmê feodalîzm rûxand, helbet wek bermahî di zîhniyetan de bandora wê heye, lê dema ku me wek tevger Kurdistana em jê derketin pênase dikir me digot "Kurdistan mêtînger û welatek nîv feodal e." Nîv feodal, nîv kapîtalîst lê ya serdest feodalîzm e. Hun niha dikarin bêjin "Kurdistan welatek nîv feodal e", ne wisaye. Tenê wek zîhniyet heye, hemû feodal bûn burjuwa. Şivanê gund jî di nava pêwendiyên jiyana modernîteya kapîtalîst de ye.

Rêber Apo beşdarî şêwazê jiyana feodal û pergala wê ya şaristaniyê nabe. Pergala şaristaniya kapîtalîst a ku nû pêşdikeve heye. Rêber Apo derveyî wê jî dimîne, beşdarî her du jiyanan jî nabe. Ji her duyan re jî sekna dijber û helwest nîşandayîn tiştek girîng e. Di dema zaroktiyê de pevçûnek bi dayîka xwe re ya Rêber Apo heye, li wê derê jî bişêweyek pir hêsan rastî dikare bê dîtin. Dayîk kesa ku zarok ji jiyanê re amade dike. Rêbertî di hevoka destpêkê ya parêznameyên xwe de dibêje "Dayîk hêza esas a civakbûyînê ye, hêza bingehîn a civakbûyînê" ye. Yanî civaktî timî li derdora jin dayîk pêşdikeve. Çiqas lewaz be bila bibe, dayîka herî lewaz jî hêza bingehîne ku li mal zarokê xwe civakî dike. Ji destpêkê pê ve yê şikl dide zarokê xwe wek esas dayîk e. Rêber Apo ji bo xwe digot "Dayîka min ez ji bo rastiyek civakî amade" dikirim. Yanê her hewldana dayîk a perwerde kirina zarok di heman demê de hewldanek ku wî/ê ji civakê re amade dike. Zarok ji perwerdeya dayîka xwe re derbas dibe û beşdarî civakê dibe. Rêber Apo di vê xalê de bi dayîkê re şer dike. Di nirxandinên îro yên têkildarî vê mijarê de destnîşan kirinên Rêbertî "Dayîka min xwestiba jî civakek wê ya ku daba min tinebû, ew civak ji zû ve hatibû belav kirin. Dixwest jiyanekê pêşkêşî min bike, lê li gel ku wê jî nedikarî bidestbixe lê dixwest bide min" hene.

**Ne beşdariya pergalê, ne beşdariya qirêjiyekê ye**

Hinek heval wê demê jî wekî ku Rêber Apo mucîzeyek be, wiha digotin, lê ev ne rast e. Rêber Apo vedigere zaroktiya xwe zaroktiya xwe dinirxîne, dixîne li ber lêpirsînê û bi gotina "Ev tevgera min dihat çi wateyê? 've dinirxand. Nexwe di wî temenî de wekî niha nirxandin ne dikir. Rêbertî seknek raber dikir, helwestek nîşan dida, ziman û wateyek wê helwestê heye. Rêbertî îro dizivire û wî zimanî dadihûrîne û dibêje "'Ev dihat vê wate"
ye. Ne pêkane ku mirov heyranê Rêbertî nebe, hinek caran jî hatina wê astê ya rexnedayînan ji mirov re tirsnak tê.

Ev xal pir girînge: Me hê zêde bi şoreşgertiyê re got "Ez wiha jiyan nakim", dikarin bêjin ku em bi biryardariyek welê re rû bi rû hatin. Kêliya ku hun biryara şoreşgertiyê didin dibêjin 'ez ê wiha jiyan nekim', biryara we tê wê wateyê. Hun dibêjin "Ez ê ji xwe re jiyanek nû hilbijêrim, ez êdî cuda jiyan nakim" û ji pirsa "Çawa bijîn" re bersiv didin. Belkî piştî ku sal dikevin navberê şûnve, dema tên temenê 18-19-20 pirsa 'çawa yan jî çima bê jiyan kirin?' derdikeve pêşiya me. Em beriya wê wan pirsan pir zêde ji xwe napirsîn, belkî jî pirsa destpêkê pirsa 'çima bê jiyan kirin' e. Pirsa "Çawa bijîn?" pirseke ku di plana duyemîn de dimîne. Destpêkê pirsa ku pêwîste bê bersivandin pirsa 'çima bijîn?' e. Dema ku we bersiv da vê pirsê hun dikarin xwe li hember bersiva ku hun didin pirsa 'çawa bijîn' ragirin, wê ev hêza ku hun bikarin li hember zehmetiyên wê berxwe bidin, bide we. Lê divê destpêkê bersiva pirsa 'çima bijîn?' bê dayîn. Eger gotin cih de be di Rêber Apo de lêpirsînên ji vê hêlê ve jî hene. Derketina destpêkê, red kirin, em dikarin bêjin ku ji ne beşdariya vê jiyanê re xala destpêkê ye. Binêrin hîna di xala destpêkê de nebeşdarî heye, piştre kesayet şikl digire, zanebûyîna biryara destpêkê kêliya fîlîzdayîna ewilî ye. Vaye ji kêliya destpêkê şûnve dibêje "Ez ê wiha jiyan" nekim. Ev jî ne beşdariyek pergalê ye, ne beşdariyek a qirêjê, xwe tevî ya îxanet û şaş nake. Cewherê wê ev e. Tê wateye 'ez ê beşdarî vê şaşîtî, vê kirêtî û xerabiyê' nebim. Eger hun şaristaniya kevin wek pergala civakî ya ku xwe dispêre derewan bigirin dest, ev tê wateya 'ez ê beşdarî vê pergala civakî ya ku xwe dispêre derewan' nekim. Baş e, wê demê pirsa 'wê çawa jiyan biki' derdikeve holê. Rêbertî bersiva wê jî dide xwe. Dibêje "Ez ê jiyanek alternatîf" ava bikim. Heta dibêje "Ez bêjim min nekarî jiyanek alternatîf ava bikim, wê demê ez ê razber jiyan bikim, lê ez ê qetiyen beşdarî vê pergalê, vê jiyanê" nebim. Baş e, jiyana razber çiye? Ev di wateya derketinên destpêkê seknên destpêkê rastiya Rêbertî de girîng in.

Dema ku Rêber Apo vê hêlê xwe dixîne li ber lêpirsînê, got "Di vê mijarê de nebesiya min a herî mezin ew bû ku min bajar ronahî dizanî, baweriya min a têkildarî bajar ew bû ku di hembêza xwe de rastî dihewîne yan jî meyla min bû, qeneata min a ku dibe rastî li wê derê" be. Rêbertî ev qeneata xwe xist li ber lêpirsînê, ev xelet dît. Erênî jî piranî tê wateya lêgerîna tişta ne holê. Hun dikarin her tiştî red bikin, tiştên ku hun red bikin pir zelal in hemû jî li ber çavan in lê tiştên ku dixwazin qebûl bikin, tiştên ku hun bêjin 'erê' piranî ne, lê ne di naverastê de ne. Hun neçarin ku xwe bigihijînin piranî tiştên ku hun dibêjin erê yan divê hun wan bixwe derbixînin naverastê yan jî ava bikin. Mînak jiyanek azad ne li holê ye, hun mecbûrin ku destpêkê wê jiyanê pênase bikin û wê ava bikin. Jixwe ya rastî ev e, bi pênase kirinê ve jî girêdayî ye. Eger hun nekarin pênase bikin demek hun nikarin zanista wê jî çêbikin, vaye hinek jî bi zanistî ve girêdayî ye. Rêber Apo got "Tiştek ku pênaseya wê nekare bê kirin, zanista wê jî nikare bê" çêkirin. Divê birastî jî ji wî aliyê ve jiyan rast bê pênase kirin. Lêgerîn piştre pêşdikeve. Rêber Apo ji temenê xwe yê 7 salî şûnve dikeve nava lêgerîna heqîqet û rastiyê. Rêber Apo hetanî komploya 15'ê Sibatê ya 1999'an heqîqet peyda kir, gihişt rastiyê? Rêber Apo vêya red dike. Aliyê balkêş dibêje 'min hetanî wê demê xwe jî nas nekiribû.' Di vê mijarê de di Parêznameya Atînayê de hevokên pir zelal hene. Dibêje "Pêvajoya min a derketina Ewropayê ya bi komploya 9'ê Cotmehê re ez bi îflasekê re rû bi rû anîm, di min de pêşiya îflasa paradîgmaya modernîteyê vekir. Paradîgmayek di Rêbertî de îflas dike, hemû rastiya ku wê pêvajoyê piştrast kirî ev bû. Rêbertî dibêje ' ez difikirîm ku hemû pirsgirêkên modern çavkaniya xwe ji rojava digirin. Pirsgirêka neteweya Kurd jî pirsgirêkeke ku dikare vê çarçoveyê de bê destgirtin, ji ber vê yekê çareseriya wê jî dikare di nava pergala rojava de bê lêgerîn. Maceraya min wiha destpêkir lê encam bû îflasa paradîgmayekê, mîn hîna xwe nedîtiye, ez ê çawa azadî bidim vê netewê?' Dema ku Rêbertî dikeve pêvajoya Îmraliyê biryara ku gihiştiyê ev e, lê pêvajoya berê belasebeb neçûye. Lêgerîn berdewam dike, rewşek meşê dewam dike. Ketina rê, meş berdewam dike, pêşketinek zêde tê bidestxistin, bi kêmasî û erêniyên xwe ve pêşketinek diyar heye lê ev nayê wateya ku rastî hatiye dîtin, derdora esas bi şêweyek saxlem ber bi îstîqamet rast ve tam vegeriyaye rewşek ronahî, rewşa di Rêbertî de ev e. Em vê rastiya Rêbertî mêze dikin, yek jî em li rastiya xwe mêze dikin, di me de rehetiyek wekî ku rastî timî bi me re ye, heye. Di vê wateyê de lêpirsîn lewaz e. Heqîqet meşek raste, meşeke ku belavî salan dibe. Ev di Rêbertî de pir zêde wihaye.

**Lêgerîna heqîqetê di heman demê de lêgerîna civakbûyînekê ye**

Ji bo lêgerîna heqîqetê mijarek girîng jî ev e: Jiyan tişteke ku bi civakbûyînê ve girêdayî ye. Cureya mirov jiyana xwe di zemînek civakî de didomîne, ji ber vê yekê her lêgerînek heqîqetê di heman demê de lêgerînek civakbûyînekê ye. Hetanî ku civakbûyîn neyê ava kirin jiyana ku tê jiyan kirin wê nebe jiyanek mirovane. Cihê ku civakbûyîn hatibe belav kirin hun êdî nikarin behsa zirûfên hebûna mirovahiyê bikin, ji bo ku mirovahî hebûna xwe bidomîne mecbûre ku civakbûyîna xwe ava bike. Niha civaktiya Kurd hatiye belav kirin. Em asta netewî bidin aliyekê, wek kesayetek derveyî civakê hun nikarin wek kes jiyanê ava bikin. Ji bo vê jî her pêngava ku ber bi jiyanê ve tê avêtin di heman demê de pêngavek civakbûyînekê ye. Hun dikarin vêya di rastiya Rêbertî de bi şêweyek pir balkêş bibînin, Rêbertî got "Şerê min a bi dayîka min re li ser civakbûyînê bû, dayîka min ez ji bo civaka xwe amade dikirim, min jî ji wê re digot 'ez ê civaka xwe bixwe ava bikim, ez ê bi hevalên xwe re' bimînim. Ev pir girîng e. Kesên ku Rêbertî digot "hevalên min in" hevalên lîstik û dibistanê bûn. Di her çalakiya Rêber Apo de civaktî heye, jixwe hewlda ava kirina ya alternatîf vêya îfade dike. Ji ber ku Rêber Apo dibêje 'ez ê wiha jiyan nekim, baş e ez ê çawa jiyan bikim, wê demê divê ez alternatîfa vê biafirînim.' Wê alternatîfê çawa çêbike?

Wê bi civakbûyînek nû ve. Rêber Apo wê di wan zirûfan de civakbûyînek nû çawa ava bike, helbet wê bi hevalên xwe yên zaroktiyê ve ava bike. Dema ku du mirov bên bahev civaktî destpêdike, pêwendiya mirovek bi mirovek din re dibe pêwendiyek civakî. Rêber Apo got "Her çalakiya civakî di heman demê de çalakiyek civakbûyînê" ye. Ev jî rewşek welê ye. Biyanîbûna civaka Kurd tê çi wateyê? Berevajî kirina kûr a di hestan de tê çi wateyê? Pergalê kesayetek welê afirandiye ku guhê wî/ê tiştên pergal dixwaze bibihîze dibîhîze, çavê wî/ê tiştên dijmin dixwaze bibîne dibîne, zimanê wî/ê tiştên dijmin dixwaze bêje dibêje. Bikurtasî hemû hest di vê wateyê de hatine berevajî kirin. Di cihek ku her tişt wiha hatiye berevajî kirin de, şiklgirtin bi her tiştê xwe ve li gorî dijmin û di vê mijarê de jî di cihek encam tê wergirtin da, helbet cihek pir mezin ji hestan re dimîne. Guhertina çav, ziman, guh ji ber vê yekê têşe kirina ji nû ve ya hemû hestan, bi hestên hatin nû kirin re nêzîkî rastiyê bûn, girîngî qezenç dike. Bi çavek ku ji dijmin bandor nebûyî ve li rastiyê mêze kirin, ne tiştên ku dijmin dixwaze tiştên ku gel dixwaze bibîhîze, girîng e. Ev di Rêbertî de jî wiha ye. Ew bi çavê dijmin ve li rastiyan mêze nake, jixwe ne beşdariya wî ya jiyana ku rastî îxanetê hatî jî vêya îfade dike. Parastina hestan, ne xerab bûna hestan îfade dike. Tiştên ruhî tişteke ku bi hestan ve girêdayî ye. Civakbûyîn bixwe ruhek e. Civak vegotinek yekitiya ruh e, mirov ruhtiyek hevpar ava dikin. Yekitiya çandî yekitiyek ruhî ye, dema ku hun behsa çanda hevpar dikin hun behsa ruhek hevpar dikin. Berê dema ku pênaseya netew dihat kirin me yekitiya ruhî wek yek jî pênaseyên girîng ên netewî digirte dest, me ew jî wek yekitiya çandî pênase dikir. Gava ku çand tê gotin tiştên teng tên eqlê gelek mirovan, çarçoveya çandê dihat teng kirin. Lê belê çand di cewherê xwe de qada manevî ya mirovahiyê ye, bîrdoziye, rastiya jiyanê ye, pîvanên ecibandinê ne. Dema ku di vê çarçoveyê de bê mêze kirin hun dikarin Şaristaniya Demokratîk wek şaristaniya manevî jî binirxînin. Çand hê zêde jî bi berhemên manevî ve girêdayîne, cewherê wê ev e. Gava ku berhemên madî jî li ser hatin zêde kirin tê gotin ku digihije pênaseya çand a herî berfireh, lê di wateya teng de wek esas çand di qada manevî de ye; manevî nirxên moralê ne, şêwazê hizirandinê ye, ecibandine û exlaqe. Hevpariya ku di wan mijaran de tê bidestxistin hevpariya ruhê hevpar e. Di vê wateyê de civakek biyanîbûyî, tê wateya ku ji yekitiya ruh qutbûye, her biyanîbûn qutbûna yekitiya ruhî îfade dike, cewherê biyanîbûnê ev e, hun nikarin bişêweyek cuda biyanîbûnê pênase bikin. Rêber Apo di vê çarçoveyê de kesayeteke ku biyanî nebûyî ye. Di zaroktiya Rêber Apo de jî dîtina cîhanek mezin a hestan pêkan e.





### Dema ku eqlê analîtîk ji eqlê hestan qutbû dikare cîhanê vegerîne dojehekê

Di vê rewşê de dikare li ser eqlê hest û analîtîk jî bê sekinandin. Rewşa xebitandina wan a di rastiya Rêbertî de zanîn girîng e. Eqlê hest di hemû zindiyan de eqlê hevpar e. Taybetmendiya wê ya bingehîn ew e ku bi refleksan ve dixebite yanî bi bertekên yekser ve bersiv dide pêşketinan. Taybetmendiyek wê ya ku bikare şîrove bike tineye. Şîrove kirin taybetmendiya eqlê analîtîk e. Jiyan kirina hebûn taybetmendiya karakterîstîk bingehîn a eqlê hest e, eqlê ku esas dide jiyan kirin eqlê hest e. Eqlê hevpar a hemû zindiyên ku hîna nehatîn rewşa şaneyekê eqlê hest e, di çêbûyîna zindiyek ku hîna nehatî rewşa şaneyekê de jî eql heye, ev eql rewşa xwe ya herî pêşketî di mirov de dibîne. Mirov wek yekuna pênç hestan xwediyê eqlê hest ê herî pêşketiye. Pêkane ku mirov wek zindiyê ku hestek zêde jiyan dike jî bê nirxandin. Ya bingehîn û kok eqlê hest e. Di mirov de her dem zemînê eqlê analîtîk heye, lê pêşketina wê dikeve pêvajoyên piştî wê. Tişta ku wek esas bi şêweyek hê bileztir eqlê analîtîk pêşdixîne şoreşa ziman e. Beriya wê şûna zimanê sembol zimanê beden, zimanê lebatê hebû rewşa ku bi peyvan ve lihev bikin ne mijara gotinê bû. Ji vî aliyê ve şoreşa ziman yek jî şoreşên herî mezin ên mirovahiyê ne. Yek jî taybetmendiyên şoreşa ziman hêza ku bi pêyvên razber ve dikare bihizire. Rêber Apo vêya bi şiklek pir balkêş ve wiha "Hun behsa çav dikin, pêwendiyek biçav a pêyva rasterast ji devê we derketî tineye, lê dîsa jî dema ku peyva çav derbas dibe hun di serê xwe de çav zindî dikin. Bêyî ku hun rasterast bi hebûn re rû bi rû bên, di mekanek girtî de jî dikarin têkildarî hebûn û çêbûnê de bigihijin behra çêkirina fikr" îfade dike. Birastî jî pêşketina eqlê analîtîk pêşketinek muezem e, lê di nava xwe de xeteriyê jî dihewîne. Rêber Apo ji ber vê sedemê dibêje 'eqlê analîtîk hinek jî dişibe enerjiya dendikî.' Dema ku rast bê bikaranîn wê ji bo mirovahiyê feydêyên mezin bidestbixe lê dema ku şaş hat bikaranîn jî dikare pêşiya texrîbatên herî mezin veke. Ya girîng ew e ku her du eql bi hev re bixebitin. Li vê derê jî tevgera bi hev re ya her duyan dikare cîhanê ji bo mirov vegerîne bihûştê, lê dema ku eqlê analîtîk ji yê hest qut jî bû dikare vê cîhanê vegerîne dojehekê û tişta ku hinek tê jiyan kirin jî ev e. Em hemû jî dixwînîn, agahiya me heye, di salên dawî de di avhewaya cîhanê de guhertinek mezin heye, di germahiya hewa de zêdebûyînek pîleya 4-5'an heye, eger em vêya ji bo seranserî gerstêrkê bihizirîn ev tê wateya destpêkek mezin a karesatê û ev jî tişteke ku bi destê mirov tê afirandin. Dîrok niha ye. Bi yek kirina niha ya paşeroj û pêşerojê ve jiyan kirine. Dîrok ji niha ve destpêdike yanî rewşa dixebite niha ye. Divê rewşa heyî bê mêze kirin, wekî ku qutbûnek heye. Gava ku hun rewşa heyî mêze dikin dikarin behsa pêşketinek gelemperî bikin. Vaye mirov hene û li ser lingan in, başe ev rewşa zindî tiştek zêde îfade dike? Wate biserê xwe tiştek zêde îfade nake, derketina potansiyel tiştekî îfade nake. Hetanî ku potansiyel ji nû ve neyê ava kirin ango yekparetiya wate û avaniyê nehate avakirin wate biserê xwe dikare dejenere bike. Dahurandina Rêber Apo ya "Em bêjîn ku hun ê cihekî bîr bikolîn av derbixînin, deştek rast e; hun hizirîn û we cihê ku av mihtemelen zû derbikeve dît û hun ê piştre kun bikin û avê derbixînin. Em bêjin ku we av derxist, avê dest bi herikandinê kir, potansiyel derket holê, baş e eger hun avê biserê xwe bihêlin wê ev belavî derdorê bibe û wê derdorê vegerîne çiravek tam", vê rewşê îzah dike. Rêbertî, derxistina naverastê ya potansiyela civakê û biserê xwe hiştina ku piştî hat derxistin, wek xeteriya çiravê binav dike. Çirava civakî wiha çêdibe. Hingî ku hun wî rêxistin nekin eynî wekî mînaka avê, piştî we av derxist şûnve eger pergala qanalê çêbikin, hun dikarin wê avê wekî dixwazin binirxînin. Hun dikarin di avdanê de, di vexwarinê de, di çêkirina enerjiyê de, di paqijiyê de û hun dikarin gelek qadan de bikarbînin lê bi şertê ku hun qanal çêbikin, dikarin bikarbînin. Qanal rêxistin kirine. Hingî ku civakek ne rêxistin kiribe, ew potansiyel derbikeve lê ne rêxistinkirî be du tişt derdikevin naverastê. Yek, hêzên dijmin hene wê wî ji holê rakin. Du, wê ew bixwe xwe bixwe, wê ji ber ku xwe ava nekiriye wê birize. Wate û avanî timî di nava hev de ne, Tişta ku em dibêjîn sazîbûn û rêxistinbûn ev e. Divê ev derbikeve holê.

### Di civakekê de şoreşa zîhnî neyê kirin ji nû ve ava kirin nabe

Rêber Apo, di parêznameya xwe ya binavê Ji Dewleta Rahîb a Sumer ber bi Şaristaniya Demokratîk de dibêje "Hetanî ku hun şoreşa zîhnî nekin, şoreşgertiyê bidin aliyekê hun nikarin bibin mirovek biexlaq ji rêzê jî." Yanê wê tenê kadro şoreşa zîhnî pêkneyne, wê şoreşa zîhnî belavî hemû civakê bike. Di civakek ku şoreşa xwe ya zîhnî pêk neanîbe û ji nû ve avakirin nabe. Bitaybet jî ma li Kurdistanê jiyan di bin êrîşek tirsnak de nîn e? Jiyan qetlîamekê jiyan dike, Kurd di bin penca qirkirinê de ye ji ber vê yekê jiyana Kurd di bin êrîşek erjeng de ye. Ji her aliyê ve li we dixin, êrîş ji her aliyê ve

tê; di vê rewşê de ji bo ku hun bikarin jiyan bikin, mecbûrin ku hestiyar bin. Birastî dikare welê jî bê gotin; yên ku dozên mezin ên jiyanê hebin tirsên wan ên mezin hene. Em jixwe bipirsîn tirsên me yên mezin hene? Tirsa winda kirinê, tirsa têkçûyîna Partiyê, tirsa winda kirina tekoşînê, tirsa durketina ji xetê, ew hemû we dibin tedbîr girtinê. Yên ku tirsa wan tinebe tedbîr girtina wan nabe mijara gotinê. Rêber Apo tedbîr di esasê de di rêxistiniyê de dît. Tişta ku Rêber Apo li Kurdistanê beralî rêxistin kirinê kir bêguman girtina Her tişt dizivire tê li derdora jiyana azad dizivire. Ji ber vê yekê jiyan di ser her cure nirx de ye, ji jiyanê jortir nirxek din tineye. Ev di Rêbertî de pir şênber e, jixwe Rêbertî bixwe jî destnîşan dike, dibêje "Mecbûrî heye ku jiyan li ser her nirxî bê girtin, erka bingehîn a kesê/a ku dixwaze rast jiyan bike jî fahm kirina jiyan" ye. Di vê wateyê de lêgerîna heqîqetê lêgerîna fahm kirina jiyan, cewherê wê eynî ye. Fahm kirina jiyan jî ji hurmet nîşandayîna wê re derbas dibe, em birastî jî vê jiyanê çiqas fahm dikin, çiqas kir, got 'texrîbata herî mezin a modernîteya kapîtalîst, pênaseya jiyanê tune kir.' Birastî jî hun nikarin di modernîteyê de jiyanê pênase bikin. Em jiyanê bi civakbûyînê ve nas dikin, binêrin civaktî zirûfê hebûna jiyana mirove, hetanî ku civaktî nebe jiyan nabe. Ji ber ku cihê kapîtalîzm hebe civak nabe. Di cihê ku civak nebe de mirov nabe, her du nebin wê demê wek xwezayî jiyan jî nabe. Bi mêze kirina civaka kêrî ve, bi mêze kirina civaka xwepêşandan ve pênase kirina jiyanê ne pêkan e. Ez jî vê rewşê nikarim bi behsa girêdayîna jiyanê ya di pîleya eşq û azweriyê de dikim. Dema ku ji aliyekê ve tişta ku nêrîna we ya jiyanê di asta eşqê de tuj dike, we bi azwerî jiyanê ve girêdide, di wê rê de hun hebûna xwe qasî ku mirinê jî tine bihesibînin danin holê; eger bedewiyên jiyanê bin, ji aliyê din ve jî xerabiya tirsnak a pergala ku hun di nav de jiyan dikin in. Hun ê vêya bihizirin û bêjin 'li vê derê xerabiyek heye bi vê xerabiyê ve nayê jiyan kirin, li vê derê kirêtiyek heye li vê derê bi vê kirêtiyê ve nayê jiyan' kirin. Li ser hev ew qas sergoya dîrokî, bêhna wê wek bedewiyê pêşkêş bike, lê ev tiştek hê tirsnaktir e. Têgihiştinek welê tê ava kirin ku tu dikarî ji ya kirêt re bêjî 'xerab û şaş', lê bi vê şêwazê pênasekirina vê ve nayê wateya ku hêrsa te pir mezin e, ya girîng ew e ku tu ji ya dibêjin 'ew xerabe' re hêrsa mezin hîs biki. Wê hêrsa we, we mezin bike. Tişta ku we digihîne jiyana azad; hêrsa mezin a ku hun li dijî tişta dibêjin 'xerab' e, nîşan bidin. Kîna ku hun nîşanî ya heyî bidin. Dema ku Rêber Apo behsa hestan dike, digot "Di eslê xwe de kîn hestek paşverûye lê ba me



pozîsyona ku gel bikare li hember hêza ku ew qas zêde êrîş dike li ser lingan bimîne û xwe jiyanê ragire bû. Dema ku di vê çarçoveyê de bê mêze kirin jî hîs kirin an jî lewaziya hêza me ya ku sezgîtî tê gotin, di eslê xwe de dikare bê gotin ku çavkaniya xwe ji rêznegirtina jiyanê digire.

Dema ku Rêber Apo tê gotin wek nebe nabe destpêkê jiyan tê eqlê mirov. Hemû pirsên têkildarî heqîqetê timî bi jiyanê ve girêdayîn e. Hemû pirsên ku Rêbertî pirskirîn rasterast bi jiyanê ve girêdayîne. Di encamê de Rêbertî jiyana azad digere ji ber ku heqîqet ew e. nas dikin? Pirsa ku pêwîste bê pirskirin ev e: Jiyan birastî jî ji bo me di ser her cure nirx de ye? Di ser dayîk, bav, ji min, ji te, her cure nirx de ye? Şehîd jî, şehadet jî ji bo jiyanê ye. Çima şehîd dikevî, ji bo ku jiyanê berz biki şehîd dikevî. Jiyan ne tiştek derveyî te ye. Birastî heqîqet di te de ye ji ber vê yekê jiyan di te de ye.

Rêber Apo herî dawî di pênaseyek xwe ya têkildarî jiyanê de got "Dibe ku jiyan nekare bê pênase kirin, bê fahm kirin" ango dikare beşek bê fahm kirin. Wateya nikare bê pênase kirin çiye? Destnîşan kirinek din a balkêş gotinan ve tam îfade bikim, gotin û wate bi hevdu ve girêdayî ye lê dibêjin wate ji gotinê hê biheztir e. Wate bi gotinê ve tê bilêv kirin lê dibe ku gotin nekare wê têrker îzah bike. Dema ku wate û gotin tevahî bi hevdu re pêwendî danin, wê birastî jî tiştek erjeng derbikeve holê. Ev di Rêbertî de hê diyarkere, birastî jî di me de gotin bêwate dimînin, di îfade kirinê de zehmetî pir zêde derdikevin holê.

Gelek mijarên ku pêwîste têkildarî felsefeya jiyanê bên destgirtin hene. Di asta evînê de jiyan kirina jiyanê, eşq bûyîna jiyanê jî bûyerek felsefiye. Ez ew qas kirêtî, pîsatî û ew qas xerabiya dîrokî li ser hev kom bûne ku hun ê bêjin ku bi vê re nabe. Yek jî tişta ku we ber bi pêş ve dahf dide ev e, ne qebûl kirina rewşa heyî. Di me de yek jî aliyê ku kême ev e, di mijara tiştên ku em dibêjin 'na' de di gotinê de em ew qas zelal bin jî, di pratîkê de li hember wan tiştên ku qetiyen bi wan re nabe da sekna me lewaz e. Lê tişta ku pêwîste bê kirin ew e ku bêje 'eger ew hebin ez tinim' û welê jiyan bike. Li cihê ku kirêtî hebe bedewtî nabe, hun nikarin her duyan li hev bînin, ji ber ku kirêtî înkara bedewtiyê ye, heta dibe ku kirêtî xwe di Kurdistanê de di wateya mutleq de hestek ku pêwîst dike ye. Li hember a şaş, kirêt û xerab hêrs û kîn nîşandan, ji wê nefret kirin û lazim e bi hestê tol girtinê ve nêzîkatî çêbibe. Di we de bi vê şêwazê kîn û hêrs qet tineye. Di we de hêza şêwazê li hev kirinê birastî çavkaniya xwe ji bêkîndariyê digire. Kesayetê/a li hev dike kesayeta/ê bêkîndar e."

Birastî jî wiha ye. Hun nikarin rastî û şaşitiyê li hev bînin, li hev kirin tê wê wateyê. Beşdarî ya baş re heye, cihê ku li hev kirin hebe li wê derê xerabî heye, ev li hev kirina her du şaşitiyên xerab in. Divê ev

bûyera li hev kirinê şaş neyê fahm kirin, tişta ku em bal dikişînîn li ser neyîniya wê bûyera li hev kirinê ye, nexwe hinek caran li hev kirin tên kirin caran neçar dimîne ku li hev bike, pêwîste nebêjin di jiyanê de qetiyen li hev kirin çênabe. Di nêvenga partiyê



de jî Rêbertî bi gelek kesan re li hev kir, ji bo ku bi me re tekoşîn bike ew wek şêwazekê girt dest lê ev tiştek çawa bû, wekî ku wê bi me re li hev bike me îdare bike dihat dîtin, lê di eslê xwe de ji bo ku me bîne nuqteyek hê baştir em amade dikirîn. Eger birewşa ku em tê dane li ser maseya ameliyatê hatiban razandin, em hemû wê li ser masê maban. Eynî wekî rewşa nexweşek ku pêwîste bê ameliyatkirin, lê hun fizîka wî/ê mêze dikin dibêjin ‘wê ev bi vê rewşa xwe ve li ser masê bimîne’ û divê hun wê/î bînin nuqteya ameliyatê. Ji bo wê jî lazim e ku hun taybet xwedî bikin, piştî ku we taybet mêze kir şûnve pêwîste ameliyat bikin. Rêbertî jî welê nêzîkî me hemûyan bû.

Bawerî hestek e. Rêber Apo dibêje “Rêbertiya min ne ferz kirineke, Rêbertiya ku ez temsîl dikim bi zanebûn û baweriyê ve xwedî” dibe. Divê li ser vê bê fikirandin. Nabêje “Rêbertiya min bi bawerî û zanebûnê ve xwedî” dibe. Têgeha ‘xwedî kirinê’ heye, yanê pêwîste tu xwedî biki. Lê gelek kes timî dixwazin ji Rêbertî bigirin, lê hevaltî ew e ku tu jî hinek tiştan tevî Rêbertî biki, dema ku we tiştek tevî kir hun dibin heval. Şêwazê beşdariya ji rastiya Rêbertî re şêwazê evînê ye û beşdariya Rêbertî bi bawerî û zanebûnê ve xwedî kirina Rêbertî ye. Ji ber wê jî dema ku hun tevlî Rêbertî dibin beşdarî rastiya Rêbertî dibin û hun jî di rastiya Rêbertî de cih digirin.

Lê belê di me de rewş welê ye: “Em dibêjîn wê Rêbertî me xwedî” bike. Birastî ji aliyekê ve xwedî dike lê eger tu tenê bi vê ve qîma xwe bînî ev nabe. Em dibêjîn ‘jixwe amade ye’, li ser tişta heyî şoreşgerî kirin tiştek tirsnak e û ev dijberiya PKK’ê ye. PKK’tî bi red kirina tişta amade ve destpêdike, ya hê rastir bi ya amade ve destpênake, PKK ne tevgereke ku bi ya amade ve destpêbike.

Mevlana jî bi awayek pir cidî diyardeya amûr û derfetan rexne dike û dibêje “Ronahiyê bê cam bibîne ku dema cam şikest da ku tu kor” nebî. Wateya wê bal dikişîne li ser dîtina bênavbeynkar. Bêyî ku bikeve nava lêgerîna derfetan derketina meşa wateyê ye. Ya pêwîst ev e û cewherê şoreşgertiya PKK’ê jî ev e. Nuqteya bingehîn a ku min xwest ez li vê derê destnîşan bikim, pirsgirêka me ya ku dema em beşdarî Rêbertî dibîn zêde kirin, mezin kirin û pratîze kirina Rêbertiye. Rêbertî got “Şêwazê min ê Rêbertiyê qetiyen ne ferzkirine, bi bawerî û zanebûnek mezin ve xwedî dibe. Hêza kesên ji vî aliyê ve tinebe divê dûr bisekinin. Kesayetên ku serdema me ew nexweş xistin, nikarin beşdarî Rêbertiyek bi vî şêwazî bibin, eger tevlî bibin jî nikarin encam” bigirin. Rêbertî nexweşiyê çawa pênase dike: Di bingeh de ferdperestiye, li gor xwe bûne, ezezîtiye, keyfiyet e. Nexweşiyên herî bingehîn ew in û kesayetên bi vî şêwazî birastî jî nikarin beşdarî Rêbertî bibin. Hewceye ev wiha bê fahm kirin, nexweşî wiha bê destgirtin, ferdperestî nexweşiyek penceşêrê ye, civakê dikeritîne. Eger hun kesayet wekî şaneyekê û civakê jî wekî beden binirxînin dikarin bigihijin vê encamê. Penceşêr ji ku derê destpêdike, bi mezin bûna zêde ya şaneyekê ve destpêdike, piştre jî belavî hemû şaneyan dibe, vaye ferdperestî jî tiştek wiha ye. Rêbertî dibêje ferdperestî rola mişkê ku civakê dikeritîne dileyîze. Ferdperestî di pergala fikrî ya Rêber Apo de tê vê wateyê, nexweşî ev e.

Hetanî ku hun tiştekî nasnekin hun nikarin beşdarî wê bibin, ji bo tevlîbûyînê divê mutleq nas bikin. Ji bo ku hun tiştekê hez bikin jî pêwîste hun nas bikin, tiştê ku hun nasnekin nikarin hez bikin. Jixwe ji ber vê sedemê dibêjin hezkirin çalakiyek keşfê ye, destpêka wê jî eleqe û meraqe. Hun ê eleqe nîşan bidin, meraq bikin, hewl bidin nas bikin, hingî ku hun nas bikin wê hewl bidin bedewtiya wê derbixînin naverastê. Wê bi wê ve bên girêdan û hez kirina wiha pêşdikeve. Birastî jî di navbera nas kirin û hezkirinê de pêwendiyek rasterast heye. Mirov ji tişta nas neke re hurmet nîşan dide lê ji tişta herî nêzî xwe re jî hez kirin nîşan dide. Hurmet nîşandayîn hê zêde jî rastî pêwendiyek biyanî dikeve, navberek heye lê di hezkirinê de jî ketina nava hev heye. Di hevrêtiya de hez kirin û hurmet nîşandayîn hê zêde di nava hev de ye. Hez kirin hê zêde helandin, yekparetî, du kes mayîn lê dîsa jî yekbûyînê îfade dike. Di hez kirinê de tiştek wiha heye lê ev jî birastî bi naskirinê ve girêdayî ye. Ji bo vê nas kirina rastiya Rêbertî, nas kirina gel hê girîng e.

Berê me gelê xwe Kurd nasnedikirin. Ji ber me derketina xwe wek çalakiyek evînê, fêrbûnê negirtibû dest, ji ber ku hê zêde jî vegeriyabû şewazek zanebûnê, lewra vêya di me de pir zêde hez kirina gel pêşnedixist. Lê dîsa jî dema ku em bi demê re hizirin, hun di nava pêvajoya dîrokî de nasname, diyarde û çêbûyîna Kurd nas dikin. Hun çêbûyîna vê nasnameyê cihê wê ya herî giştî ya di nava çanda civakî de hê baştir derdixînin zanebûnê. Hingî ku mirovahiya çanda kok xelas nebe ya ku xelas nabe çande. Hingî ku mirovahî hebe ti êrîş nikarin vê çandê temamî xelas bikin, dema ku çand xelas bû jixwe mirovahî xelas dibe. Kurd nûnerên vê çanda kok in. Sosyolojiya giştî bi vê çandê ve eleqedar e, hêza avakirina esas a vê çandê Aryen in. Çand û zimanê Neolîtîk di heman demê de ziman û çanda Aryen in. Di çavkaniya kesên ev şoreşa çandî pêkanîn de dayîk û kalên Kurdan hene. Ji vê hêlê ve aliyên ku dişibîn gelên din ên Kurdan hene, wek giştî gel pir dişibin hevdu heta aliyên wan ên dişibin hevdu ji xweseriyên wan pir zêde ne. Lê cudahiyên wan ên heyî jî bedew in, xweşikiyên wan in û ev cihêtîne ku wan tînin bahev. Dema ku cihêtî her ku diçe pêşketin bidestdixin girêdayîn jî hê zêde pêş dikeve. Meyla cihêtiyê di eslê xwe de meyla azadiyê ye, dikare bê gotin ku azadî xwe bi şêweyek herî balkêş xwe datîne holê. Kurd di eslê xwe de birastî jî di nava şaristaniyê de di pozîsyona dayîkekê de ne; diwelidînin, xwedî dikin.

Şoreşa Neolîtîk Aryenan kir. Lê şoreşa neolîtîk belavî her devera cîhanê bû, gelên din ev çand amade girtin. Ewropa çand wek amade girt, welê belavî Hindîstan, Çînê bû, ji vê derê belavî parzemîna Emerîkayê bû, ji vê navendê, ji vê erdnîgariyê û ji Hîlala Zêrîn çû. Em vêya dibînîn, yên ku vê çandê bênavber û bi şêweyek hê zêde jiyan dikin dîsa Kurd in. Kurd bi şêweyek bênavber ji sala 3 hezar a B.Z’ê ne û hetanî 7 hezar-8 hezar salan ev çand jiyan kirin. Ji ber wê jî di ti civakan de qasî Kurdan çanda neolîtîk bihêz nîne. Ev aliyê bedew ê Kurdan pêktîne.

Eger tu dixwazî pênaseya civakek bitendûristî biki; tu wê rastiya Kurd mêze bikî, cewherê wê ev e. Dema ku li ser vî bingehî vî gelî mêze biki hezkirina te ya ji wî re hê zêde dibe. Gava ku hez kirina te zêde dibe hêrsa te jî zêde dibe. Ji ber ev nuqteya ev çanda ku di koka mirovahiyê û bi heman şiklî şaristaniyê de cih digire, di roja me de ketiyê çi rewşê. Kurdistana ku dayîk niştîmana çanda neolîtîkê çawa ew qas xizanbû, wekî ku Rêbertî got “Welatê nan çima bê mal û çawa bê nan ma?” Pirsgirêka Kurd pir girînge. Rêbertî bi Parêznameyên nû re bitaybet jî bi Parêznameya dawî re erkên pir şênber datîne pêşiya me, erkek ava kirina pir berfireh, erka ava kirina neteweya demokratîk datîne pêşiya me. Dibêje di çarçoveya vê erkê de ew dikarin bên kirin: “Di nava ava kirinek wiha de birastî sînorên hevî û bêrîkirinan” nîn e. Di pêşiya pêkhatina wan armanç û bêrîkirinan de astengiyek cidî ya ku çavkaniya xwe ji kesayet bigire jî tineye. Yanê Rêbertî dewlet û desthilatdariyê jî asteng nahesibîne, dibêje ‘yekane astengî kesayet bixwe’ ye.

Dendikek tov nabêje ‘ax pir hişke ez nikarim derbikevim derve’, çawa ku ji axê derdikeve yekser bejn diavêje. Tişta ku dibêje pêwîste mirov jiyanê fahm bike aha ev e. Yek jî rastiya mirov heye, mirov tê wateya îradeyê, îradebûyîn têgehek girîng e, tu jî piştî ku bû îrade şûnve; hêza herî mezin tu yî, êdî ti hêz nikare li pêşiya îradeya te bisekine.

■■■

# Em Stêra Moderníteya Demokratîk 19'ê Tîrmehê Mayînde Bikin

**Dûran Kalkan**

Em 12'emîn salvegera pêngava şoreşgerî, Şoreşa Rojava ya di 19'ê Tîrmeha 2012'an de pêş ketî dijîn. Di serî de em mîmarê şoreşê Rêber Apo bi hezkirin û rêzdarî silav dikin. Em jin, ciwan di serî de gelê Kurd, tevayî gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyê ku ev Pêngav dan destpêkirin û 12 sale diparêzin pîroz dikin. Bi hezaran şehîdên vê Şoreşa Azadiyê hene. Em tevahî şehîdên xwe di kesayeta rêheval Şîlan û Xebat de bi hezkirin, rêzdarî û minet bibîr tînin. Heman demê de em ciwanên şoreşger ên Tirkiyeyî ku beriya 10 salan ji bo beşdarî avakirina Kobanê bibin ketin rê û li Pirsûsê hatin qetilkirin bi rêzdarî û minet bibîr tînin.

Rojava qadek biçûk a Kurdistanê ye. Di çaryeka yekemîn a sedsala 21'emîn de li ser bingehê Xeta Moderníteya Demokratîk pêngavek wiha ya şoreşgerî pêş ket. Bêguman ev pir girîng e û tijî ders e. Helbet gelek tişt hene ku di serî de tevgera me, gelê me û tevayî mirovayî ji van dersan derxe. Di vî alî de helbet pêwîste ev Pêngava Azadiyê ku li Rojava destpêkê û Bakur-Rojhilatê Sûriyê jî xist nava xwe, sergûzeştên dewlemend ên 12 salî bên goftogokirin, nirxandin. Bêguman pêwîste ev tişt ji aliyê şoreşgerên ku ev sergûzeşt jiyane ve bê kirin. Li ser bingehê van dersên dewlemend hem pêwîste pêşiya xwe ronî bikin, hem jî ji bo têkoşîna rizgariya jinan û tevayî bindestan van dersan sûdwer bikin. Di vî alî de hewlek heye. Lê em nikarin bêjin di astek tê xwestin de hatiye nirxandin.

Niha her çendî parçeparçeyî be jî li ser bingeha dersên şoreşê di astên cuda de nirxandin tên kirin, pîrozbayî, daxuyanî hene, dîsa di hêjmarek zêde de civîn û goftogo mijara gotinê ne. Bêguman pêwîste ev hîn zêdetir gelemperî û kûr bibin, li ser vê bingehê tevayî sergûzeştan derxin holê. Ji ber ku di aliyê têkoşîna şoreşgerî de, hem ronîkirina pêvajoya pêşiya me hem jî qezençkirina hêzê bi vê ve girêdayî ye. Helbet Şoreşa 19'ê Tîrmehê xwedî cihekî girîng e. Di rewşa xwe ya niha de pir pesin jî tê dayîn. Lê yên rexne dikin jî ne kêm in. Heta yên ku bi çavê şoreşê li Rojava temaşe nakin jî hene. Ji ber wê jî pêwîste rewşa heyî hîn zêdetir bê nivîsin, dîsa bi rêya huner û wêjeyê bê watekirin.

Bêguman ji bo ders bên derxistin rexne-rexnedayîn pêwîst e. Lê pêwîste "Mafê Sezar bidin Sezar". Ev 12 sale gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê têkoşînek meşandin, ked dan, xwîn rijrandin, li ser vê bingehê encamek derxistin holê. Ji ber wê jî pêwîste em vê encamê bi awayek rast û têrker danin holê, mafê wan radestî wan bikin. Di vî alî de pêwîste nirxandin hîn dewlemendtir û gelemperî bin. Yan jî nêzîkayî û nirxandinên yekalî dê nekare rastiyê bi tevayî aliyê wê ve û têrker derxe holê. Pêwîste herî zêde li ser vê bingehê em dersên dewlemend ji vê sergûzeşta şoreşgerî derxin. Bêguman ji herkesî zêdetir pêwîste em vê bikin. Ji ber wê jî divê em li bendê nebin ku kesekî/a din vê bike. Jiber ku ji herkesê zêdetir ev maf û erkê me ye. Wê demê pêwîste em vê erkê di wextê wê de bînin cih. Pêwîste em kêmaniyên xwe yên di vê mijarê de derbas bikin. Nirxandin, goftogoyên di vê wateyê de tê kirin hîn berfirehtir, kûrtir û gelemperî bikin. Pêwîstî bi vê heye. Lê helbet em nikarin vê bi civakînekî, pîrozbayiyekî yan jî daxuyaniyekî bikin. Lê em dikarin li ser xisûsê hinek bingehan bi hinek sernavên kurt balê bikişînin ser. Em dixwazin di wê astê de hinek tiştan îfade bikin û vê roja dîrokî biwate bikin.

Em ji vê şoreşê re dibêjin "Şoreşa Azadiya Rojava yan jî Şoreşa Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê". Lê bê guman ev şoreş bi qadek wiha teng ve ne sînordar e. Pêwîste yekjimar neyê destgirtin. Ji beriya hertiştî ev şoreş parçeyek ji Şoreşa Azadiya Kurdistanê ye. Di vî alî de pêwîste Şoreşa Rojava, weke parçeyek Şoreşa Azadiya Kurdistanê ku qut nabe bê destgirtin, bi nava giştîbûnekî de bê nirxandin, xweseriyê wê jî di nava vê giştîbûnê de bên dîtin. Eger wiha neyê destgirtin dê şaş be. Dê hîna di serî de şaş û xapînok nêzî vê pêngava şoreşgerî bibin. Jiber ku lêgerînên wiha hene. Di vî alî de em pêwîstiyê bi îfadekirinekî dibînin. Şoreş kîjan rojê çêbû? Şoreşê kengî dest pê kir? Li Rojavayê Kurdistanê goftogoyên bi vî awayî çêdibin. Em vê bi şêweyên cuda dibihîsin. Ji ber wê jî Rojava ji Kurdistanê, Şoreşa Rojava ji Şoreşa Kurdistanê qutkirin şaş û xwexapandin e. Ji ber wê jî pêwîste nekevin rewşek wiha.



***Bi rastiya Rêbertiyê re pêwîste rastiyan şehîdan jî rast bê nirxandin. Gelê Rojava, jin û ciwanên wê pir bi awayek bi bandor beşdarî Şerê Azadiya Kurdistanê ku ji aliyê Rêber Apo ve hat pêşxistin û ji aliyê PKK'ê ve hat meşandin bûn. Ji 1997-80'an ve malûvanî kirin. Deriyên xwe vekirin, derfetên xwe parve kirin. Ji sala 1985'an ve jî hem derfetên li Rojava kom kirin û hiştin ku şerê gerîlla pêş bikeve, hem jî bi sedan, hezaran ciwan, li ku dera Kurdistanê dibe bila bibe ji şer re seferber kirin.***

**Şoreşa Rojava di Tîrmeha 1979'an de destpê kir**

Wê demê nêzîkayiya herî rast eve; Şoreşa Rojava bi Şoreşa Azadiya Kurdistanê re bê destgirtin, nirxandin, weke parçeyek a wê şoreşê bê dîtin, li ser wî bingehî ders ji sergûzeşta 12 salî bê derxistin. Bêguman dema em wiha bigirin dest, şoreş di Tîrmeha 1979'an de bi derbasbûna Rêber Apo ya ji bo Rojava re destpê kiriye. Ji vê dîrokê ve di pêşengiya Rêber Apo de li Rojava fikrên azadiyê pêş ketin. Li ser vê bingehê mirov bûn alîgir, sempatîzan û têkoşer. Beşdarî partiyê bûn. Li Rojavayê Kurdistanê têgihiştin, rêxistin û çalakiyên pir girîng pêş ketin. Ev tevayî bi derbasbûna Rêber Apo ya ji bo Kobanê re destpê kirin. Pêwîste ji beriya hertiştî binê vê rastiyê bê xêzkirin.

Rêber Apo, tam 20 salan li vê qadê xebata şoreşgerî meşand. Hema bêje kesek nema ku nas nekir û pêre nîqaş nekir. Di nava vê pêvajoyê de bi şêweyekî bandor li herkesê kir û perwerde kir. Di nava Kurdên Rojava de têgihiştin, vîn, rêxistinî û çalakgeriyek azadiyê ya bihêz pêş xist. Ev xebat, di serî de li Bakurê Kurdistanê, nirxên pir mezin xist nava şerê gerîlla û tevayî Têkoşîna Azadiyê. Hem di plansaziya giştî de pêşengî ji têkoşînê re kir, hem bû sedem ku gelê Rojava bi awayek pir bi hêz beşdarî têkoşînê bibe. Ne tenê şoreşgek bû ku li Bakurê Kurdistanê pêş ket, heman demê de li Rojava jî pêş ket. Rêber Apo şoreş weke, "hişmendiya şoreşê, rêxistinbûn û beşdariya şoreşê" pênase kir. Serhildana şoreşgerî jî wiha nirxand. Ji ber wê jî Rêber Apo beşdarbûna şoreşê û serhildana kesekî, welatparêzekî yan jî şoreşgerekî weke serhildan û şoreşek dît. Ji ber wê sedemê gel, jin, ciwanên Rojava, perwerde û rêxistinbûna herî berfireh, şoreşgerî û azadîxwaz, li ser bingehê qezençkirina hişmendî, fedekarî û cesaretê di dema xebatên Rêber Apo de pêş xist û qezenç kir.

Taybet jî Têkoşîna Azadiyê ya li Bakurê Kurdistanê dihat meşandin, dîsa şerê gerîlla tu caran ji Rojav qut nebû. Di salên 2011-2012'an de me hewl da li ser bingehê Şerê Gelê Şoreşgerî li Bakurê Kurdistanê Şreê Şoreşgerî pêş bixin. Bi guncawbûna konjonkturê re vî şerî di esasî de bandora xwe li Rojavayê Kurdistanê nîşan da. Ji ber wê jî pêngavek şoreşgerî ya wiha dîrokî û mezin di sala 2012'an de pêş ket. Nabe em tenê bi bûyerên li qada Ereban çêbûne re îzah bikin. Berovajî bi xebatên 20 salan ên Rêber Apo re, dîsa hişmendî û çalakgeriya li Rojavayê Kurdistanê ku li dijî kompoloya navnetewî derkete pêş û gihişt astekî, taybet jî di encama pêşketina têkoşîna şoreşgerî ya li Bakurê Kurdistanê di navbera 2011-2012'an de ev pêşketin çêbûn. Pêwîste em vê rastiyê baş bibînin û fêm bikin. Pêwîste em Pêngava Şoreşa Rojava ya di 19'ê Tîrmehê de destpêkir li ser vê bingehê binirxînin. Girêdana wê ya bi xebatên Rêber Apo û tevayî Kurdistanê re rast bibînin û îfade bikin. Pir diyare ku eger em destpêkirina wê li cihek din lê bigerin, parçeyî nêz bibin emê negihin encamek rast. Eger nêzîkayî li ser vê bingehê pêş ketibe, emê nikarin erk, stratejî,

teqtîk, terzê rast ê Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê di astek têrker de pêş bixin. Ji ber wê jî ev nêrînên şaş dê di aliyê erk û pratîkên rojane de de jî encamên rast û têrker dernexe holê.

Xala duyemîn jî ev e, nabe ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê, pêşketinên ev 12 sale li Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêdibin ji tevayîbûna Sûriyê cuda bê destgirtin. Em dikarin bêjin bi vê ve girêdayî hem di aliyê erdnîgarî de hem jî di aliyê siyasî de yekbûnek e. Qet nebe ev qada şoreşê, ji Şerê Cîhanê yê Yekemîn heta niha di nava yekbûna dewleta Sûriyê de cih digire. Di vî alî de dema em vê pêşketinê dinirxînin, pêwîste rewşa wê ya ji vê tevayiyê bandor bûye û bandor kiriye baldar bin. Dema em erkên şoreşgerî yên îroyî diyar dikin pêwîste di çarçoveya vê tevayiyê de bigirin dest, binirxînin. Teqez pêwîste di vê mijarê de jî teng û parçeyî nêz nebin.

Eger baldarbin em destpêkê li ser van herdû xisûsan rawestiyan. Ji ber ku gelek nêzîkayî hene ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê hem ji Kurdistanê hem jî ji tevayiya Sûriyê qut dikin. Nêzikayiyek pir teng û berovajî mijara gotinê ye ku hema bêje Rojava ji tevayî cîhanê qut dike, weke giravekî digire dest. Ji ber wê jî rewşek ku nizane tevayiya Kurdistanê çiye, dê nêzîkayiya wê çawa be heye. Jixwe di pêvajoya derbasbûyî de ev xal weke mijarek nîqaşê hertim derkete pêşiya me.

Bi heman şêweyî erk û berpirsyariyên pêşxistina Şoreşa Sûriyeya Demokratîk pir nadin ser milê xwe. Pêwîste şoreşê bikin Şoreşa Sûriyê, bînin rewşa Şoreşek Demokratîk, heta di ser Sûriyê re belavî qada Ereban, Rojhilata Navîn bikin û bînin rewşa şoreşek herêmî. Lê li beranberî vê nêzîkayiyên ku tenê xwe bi çareseriya bi Rêveberiya Sûriyê re sînordar dike, bala xwe dide ser lihevkirina bi wê. Wisa difikire ku dê xwe bi hinek hêzên dijî rêveberiya Sûriyê re bikare xwe bikarêz e. Ev nêzîkayî pir in. Dema em li pratîkê dinêrin em pêşketinek giştî û belav dibe nabînin. Yan jî pêşketinek pir teng û sînordar mijara gotinê ye. Mînak dema dixwaze li Sûriyê belav bibe hema bêje ji civaka Kurd qut nabe. Ji bo perwerdekirin û rêxistinê hema Kurdek li ku be li wê/wî digerin. Xwe tenê bi civaka Kurd re sînordar dike û tenê li hemberî Kurdan berpirsyar dibîne. Dema derbasî derveyî sînorê xwe dibe jî vê helwestê derbas nake. Ji ber wê jî pêşketinên di vî alî de pir teng û lewaz dimînin.

### Cesaretkirina Pêngava Şoreşgerî ya 19'ê Tîrmehê bûyerek dîrokî bû

Niha şoreş ket sala xwe ya 13'an. Demeke 12 salî ya hatî jiyîn heye û ev qet jî ne demeke kurt e. Eger em qala vê "Rewşa Şoreşgerî" ya li ser bingehê paradîgmaya me hatiye jiyîn bikin, cihê ku herî zêde ev lê hat jiyîn Sûriye bû. Ji ber wê dikaribû li her qada Sûriyê xebatên herî şoreşgerî, perwerde û birêxistinbûn pêş biketina. Ji bilî çeteyên faşîst, paşverû yên bi dewleta Tirk a qirker-mêtînger re li hev kirine, dikarin herkesî perwerde bikirina û birêxistin bikirina. Li ser vê bingehê dikaribû şoreşê hîn bi bandor û bihêztir bikirina. Ji bo vê derfet hebûn. Kesek nikare bêje derfeta vê tune bû, ji ber wê ma nekarî bikin. Dîsa kes nikare bêje ji ber pêwîstiya siyasetê me wiha nekir. Eger wiha be em dikarin bêjin li holê şaştiyên pir mezin hene. Ji be wê jî nêzîkayiyek wiha tê wateya felsefe, bîrdozî, rêxistinî, aliyê wê yê enternasyonal nayê dîtin. Dijbûna kesayeta Şoreşa me ya gerdûnî û herêmî ye. Dema wiha bibe jî hişmendiya rast dernakeve holê. Pêwîste em vê bi awayek zelal bibînin. Di rewşa niha de tengbûnek, zêde parastin, perpitîna "hema em destkeftiyan biparêzin, winda nekin" hinekî jî çavkaniya xwe ji van hişmendiyan digire. Ew helwest encama vê hişmendiyê ne.

Ji sala 2010'an ve li qada Ereban serhildanên gel pêş ketin. Li Sûriyê jî ev serhildan pêk hatin û erê bi vê re ev şoreş pêş ket. Pevçûnên ku di nava Sûriyê de pêş ketin, dema rêveberiya heyî hejandin, li ser xetên sînor valeyiyek çêbû. Rêveberî û hêza dewleta serwer nema, mirov bi serê xwe man. Bêguman nirxandina rewşek wiha û cesaretkirina Pêngava Şoreşgerî ya 19'ê Tîrmehê bûyerek dîrokî bû, pir bi wate û nirx bû.

Rexneya me ya ji bo nêzîkayiyên ku vê şoreşê ji şoreşa Kurdistan û Sûriyê qut dike, çavkaniya xwe ji naveroka şoreşê digire. Ji ber ku bi wê re nagunce em vê îfade dikin. Erê ev nêzîkayiyên teng wê demê jî hebûn. Lê ne di vê astê de bi bandor û diyarker bûn. Eger wisa bûya, ev şoreş ne ku 12 salan, 12 hefteyan jî berdewam nedikir.

Jixwe ji ber van nêzîkayiyên şaş piştî demeke kurt rûbirûyê êrişên îmhayê hat. Şoreşa bêxwîn, ji bo xwe biparêz e û bide jiyîn neçar ma gelek xwînê birijîne. Ji ber vê nêzîkayiya şaş



evqas xwîn hat rijandin.

Helbet di serî de Komara Tirk a faşîst-qirker, gelek paşverûyên li herêmê dê êriş bikirina. Dîsa dê di asta gerdûnî de êriş çêbûna. Ji bona wê dê berxwedan, şer û xweparastinê pêwîst bikira. Lê nabe ku em tevayî êriş û bûyerên çêbûne bi vê re bigirin dest. Gelek bûyerên ku hatin jiyîn di encama nêzîkayiyên teng de derketin holê. Evê jî bi xwe re hîn zêdetir xwîn rijand û bû sedemê zirarê. Di rewşa heyî de rast fêmkirin û di wextê xwe de bicihanîna erk û berpirsyariyên şoreşê, ev nêzîkayî rolek girîng dilîze. Jiber wê sedemê pêwîste ji nêzîkayiyên teng, yekalî, qut û parçebûyîn dûr bikevin. Teqez ev nêzîkayî û hişmendiyên wiha şaş in. Pêwîste xwe ji van xilas bikin. Heta em xwe ji vê qut nekin, emê nekarin dersên rast û têrker ji vê sergûzeşta dewlemend derxin holê. Dema bi nêzîkayiyek rast bê destgirtin, emê bikarin dersan derxin holê.

Xala sêyemîn a ku pêwîste em li ser bisekinin jî ev e. Pêwîste rastiya Rêbertiyê û şehîdan di pêngavek wiha ya şoreşgerî de rast bê destgirtin. Me îfade kir, ev pêvajoya şoreşê Rêber Apo di 1979'an de bi derbasbûna Kobanê da destpêkirin. Tam 20 salan li vê qadê xebat da meşandin. Li ser vê bingehê danehevek pir mezin derxiste holê. Dîsa bi têkoşîna Rêber Apo û PKK'ê re, pêşketinên ku li Bakur, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê çêbûn, di kêliyên de, ji destê yekemîn û rastreast li ser civaka Kurd a Rojava û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bandora xwe çêdikir. Tenê bi vê qadê re sînordar nedima, li ser tevayî Sûriyê, heta li ser civaka Libnanê jî bandorek mezin çêdikir, şopa xwe dihêla. Bi vî awayî li vê qadê ji şoreşên ferdî, heta şoreşên malbatî, şoreşên jina bihêz derketin holê. Van pêşketinan ev pêngava dîrokî derxiste vê astê. Ji ber wê jî pêwîste ev cesaret û pêngav weke kerameta ferdî neyê dîtin. Pêwîste girêdana wê ya bi têkoşîna Rêber Apo, partiyê, gerîlla û gelê çar parçeyên Kurdistanê re baş bê dîtin. Ya din jî bandora Paradîgmaya Demokratîk-Ekolojîk-Azadîxwaziya Jinê ye. Vê paradîgmayê xw di nava civaka Rojava de belav kir, gel perwerde kir, hîn bi cesarettir, fedekartir û têgihiştîtir kir. Ev rastiyek e.

Berxwedana Îmraliyê û têkoşîna ku li dora vê berxwedanê li dijî kompl oya navnetewî hat meşandin, pêşketina vê têkoşînê li Rojava û bandora wê pêwîste bê dîtin. Ev tevayî bandora Rêbertiyê ye. Pêwîste ev bi bandora Rêber Apo, perwerdeya ku dayî û pêşketina çêkirî ve girêdayî bê destgirtin. Yanî li holê Rêbertiyek wiha, rastiya pêşengiyek wiha heye. Ha ev tevayî jiyanîkirina vê rastiyê û pratîkkirina wê ne. Yan jî ev encam ne ji ber xebateke din derketine holê, yan jî tu girêdana xwe bi berxwedanên berê yên li Kurdistanê pêkhatine re tune ye, yan jî bandorên partiyên cuda jî çênebûne. Berovajî, hertim bandora van partiyên din zirar dane. Ji ber wê jî xebata Azadiya Şoreşgerî li aliyekî jî ji bo derbaskirina van diyardeyên bi zirar ked daye.

Bi rastiya Rêbertiyê re pêwîste rastiyan şehîdan jî rast bê nirxandin. Gelê Rojava, jin û ciwanên wê pir bi awayek bi bandor beşdarî Şerê Azadiya Kurdistanê ku ji aliyê Rêber Apo ve hat pêşxistin û ji aliyê PKK'ê ve hat meşandin bûn. Ji 1997-80'an ve malûvanî kirin. Deriyên xwe vekirin, derfetên xwe parve kirin. Ji sala 1985'an ve jî hem derfetên li Rojava kom kirin û hiştin ku şerê gerîlla pêş bikeve, hem jî bi sedan, hezaran ciwan, li ku dera Kurdistanê dibe bila bibe ji şer re seferber kirin. Li ser vê bingehê ciwanên Rojava ji Pêngava 15'ê Tebaxê ve di nava Pêngava Gerîlla de cih girtin. Kartêkariyek bi bandor çêkirin. Beşdariyên binirx çêbûn. Singa xwe li hemberî zehmetiyên mezin kirin sîper, di pêşxistina berxwedanên mezin de rolê bingehîn lîstin. Weke hevalê Xebat ji quriyetiyê heta fermandariyê, li ku çi kar hebe dibeziya, li cihê ku pêwîst kir xwîn rijandin, şehîd bûn. Rastiyek wiha derxistin holê.

Yanî beriya ku Pêngava Şoreşgerî ya 19'ê Tîrmeha 2012'an destpê bike, jixwe Rojava di nava şoreşê de bû. Ji ber wê ji bo şoreş bê fêmkirin, hîn şênbertir bibe, dikarin rojekî weke nîşane diyar bikin. Ji bo vê 19'ê Tîrmehê jî guncaw e. Pêngavek pir girîng bû, xwe dispart nirxandinek rast. Ruhê pêngavî yê Apoyî îfade dikir. Karê fedekarî û cesareteke mezin bû. Jiber ku dibe bi

encamên pir girantir re rûbirû bimaba. Li gel van xeterî û nediyariyan jî, dema derfet derketin holê pêgava mijara gotinê de hat pêkanîn. Ya ku ev pêngav derxistî holê ev xebatên şoreşgerî, nirx, pêşketin, têgihiştin û rêxistinbûna şoreşgerî bû. Divê herkes bizane ku eger ev nebûna, dê di 19'ê Tîrmeha 2012'an de li Kurdistanê tiştek çênebûya. Rastî wiha ye û pêwîste ev rastî wiha bê pejirandin. Ji ber wê sededmê tevayî nêzîkayî, wate, li ser vê bingehê hişmendiyên pêş dikevin, nirxandinên siyasî yên ji vê qut şaş in. Di vî alî de ya ku civak perwerde kir, birêxistin kir, cesaret dayê, bi temamî xiste nava têkoşînê rastiya şehîdan bû. Beriya şoreşa 19'ê Tîrmehê, li Rojava hema bêje malbatekek ku şehîdê wê tuneyî nebû. Ne tenê şehîdek jî, hinekan du, hinekan sê şehîd dane vê têkoşînê. Hem jin hem jî mêr bi aktîf beşdar bûn. Taybet jî pêwîste em beşdariya jinên Efrînê ku niha di bin dagirkeriyê de ye di bîra xwe de bigirin. Pêwîste nêzîkayiya li hemberî Efrînê li gorî wê hişmendiyê be. Tevlîbûnên destpêkê jî wiha bûn. Yekemîn şehîdên jin ên vê qadê jî Efrînî bûn. Di demeke ku gerîlla nû nû li Bakurê Kurdistanê bicih dibûn de, heval Dîcle û hevalên xwe cih di nava têkoşînê de girtin û şehîd bûn.

Dîsa ji gelê Ereb ê li qadê jî tevlîbûn çêbûn. Bi vê boneyê pêwîste hevalê Ezîz jî bi rêzdarî bê bîranîn. Di atmosferek wiha de hinekê jî bi bandora hişmendiya çep-sosyalîst beşdarî şoreşê, şer bûn û şehîd ketin. Emê hertim bandora van a mezin esas bigirin. Ji ber wê jî ev şoreş şoreşa Rêber Apo û şehîdan e. Yê ku vê wiha nebîne dê şaş nêzî şoreşê bibe. Taybet jî yên vê wiha nebînin jî li gorî xwe hişmendiyan ava dikin û rastiyên şoreşê berovajî dikin. Ev şaş û xeternak e. Çi dibe bila bibe pêwîste em hertim vê di her derfetê de îfade bikin. Pêwîste tenê îfade nekin, baş fêmbikin. Bi îfadeya Rêber Apo re heta hestiyê xwe hîs bikin û ji wê rastiyê, ji rastiya Rêber Apo û şehîdan tucar qut nebin. Bibin xwedî seknek ku berovajî neke. Pêwîste em derfetê nedin nêzîkayiyên ku berovajî dikin. Eger em wiha nekin, li ser vê bingehê seknek bîrdozî nîşan nedin, wê demê emê rast nêzî rastiya Rêber Apo û şehîdan nebin. Wê demê emê qasî tê xwestin xwedî li nirxên mezin ên wan ava kirine dernekevin û bi serkeftî pêk neyîn.

**Ji ber ku Şoreşa Rojava Şoreşa Azadiya Jinê ye bandorê li herkesî dike**

Bêguman hestiyariyek di nava tevayî hêzên azadiyê, taybet di nava gelê Kurd û jinan de heye. Di nava tevayî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jî hişmendî û hestiyariyek wiha heye. Ev pir baş e. Jixwe rastiya ku ev 12 sale dihêle di nava atmosferek wiha de li ser piyan bimîne jî ev hestiyarî û rastî ye. Hestiyariya ji bo Rêber Apo û şehîdan e. Eger di vir de lewazî hebûya, di atmosferek evqas tevlîhev de vê şoreşê nedikarî evqas xwe li ser lingan bigire û bidomîne.

Xala çaremîn jî kesayeta şoreşê ya jin e û beşdariya jinê ye. Li ser vê bingehê pêşketina pêşengiya jinê ye. Ev rastî pir tê nîqaşkirin. Bi rastî jî di pêngavên şoreşî yên heta niha pêşketine de evqas bi giştî, kûr û berfireh beşdariyek jinê çênebûye. Jixwe dema dibêjin "Şoreşa Jinê" li ser bingehê jiyîna vê rastiyê tê îfadekirin. Pêwîste vê bigihînin hişmendî û birêxistineke ku hîn zêdetir bi wate bike, bi berfirehî bigire dest, baştir fêm bike, dersên rasttir jê derxe û pêş bixe. Ji ber ku dema xeta azadiya jinê di şoreşê de serwer bibe, jin bi xwe xwe li ser vê xetê pwerwerde bikin û bibin pêşeng, li tevayî qadên têkoşînê cih bigire, şoreşê kûr û berfireh bike, dê ji bo pêvajoya şoreşgerî bibe çavkaniyek mezin a hêzê. Ji derveyî vê rastiyê tiştek din a şoreşê bigihîne vê astê, bihêz bike, bandor bike û pêş bixe tune ye.

Bêguman beşdariya ciwanan pir bi cesaret û fedekariye. Lê hem di aliyê hişmendiyê de, hem jî di pêşengiya rêxistinî û çalakiyê de rolê jina rêxistinkirî sereke ye. Ha pêşengiya YPJ'ê şervaniyek azadiyê ya ku tevayî cîhan bandor kir derxiste holê.

Bi pêşengiya Kongra- Star rêxistinbûna jinê têgihiştî dibe, di siyaset, perwerde, çand, huner, civakîbûn, perwerde û tevayî qadên civakî de bi bandor dibe û pêşengiyê dike. Vê di asteke girîng de jî pêk tîne. Têkoşîna jinê ya di vê astê de, di şoreşên sedsala 21'emîn de jî kesayetekî dide qezençkirin. Di sedsala 21'emîn de li ser vê bingehê weke Sedsala Azadiya Jinê hat îlankirin. Dîsa şoreşên sedsala 21'emîn jî weke şoreşên ku li ser Xeta Azadiya Jinê pêş dikevin hatin pênasekirin. Hişt ku li cîhanê hema bêje gelek derdor vê bipejirînin û bi vî awayî binirxînin. Bêguman nirxandin û nêrînên Rêber Apo di vê de rolek girîng dilîzin. Lê heman demê de weke pratîkî jî, pêkhatina Şoreşa Rojava, Şoreşa Azadiya Jinê bandorê li herkesî dike. Bi awayekî bi bandor vî rolî dilîze. Nirxandinên Rêber Apo yên li ser bingehê jineolojiyê jî bihêz dike, piştrast dike. İspat dike ku dibe pêk were û vê nîşanî herkesî dike.

Bêguman nabe ku em weke pêvajoyeke jixwe berê çêbûye qalê bikin. Ji ber ku nabe sînorek wisa ji Têkoşîna Azadiya Jinê re bê xêzkirin. Di rastiyê de rewşek bêsînor a şoreşê îfade dike. Ji ber wê jî em nikarin bêjin tiştên li Rojava çêbûne bi encam bûne, her tişt pêkhatiye. Eger em wisa bêjin dê şoreş bi dawî bibe. Eger şoreş bi dawî bibe dê jiyan jî xilas bibe. Bi vî awayî fikirîn weke qiyametê ye. Li gorî ku em bi vî awayî nagirin dest, wê demê gelek tiştên ku em bikin hene. Hem aliyên ku pêwîste bi awayê teorî-bîrdozî bên pêşxistin hene, hem jî di aliyê pêşxistina perwerdeyê, rêxistinkirin û beşdariya civakê de tiştên ku pêwîste bên kirin hene. Lê di rewşa heyî de têrê dike ku Şoreşa Rojava bibe şoreşa jinê.

**Şoreşa Rojava ji şoreşgeran re bû navendek**

Xala pêncemîn jî kesayeta şoreşê ya enternasyonalîst e. Pêwîste em wê jî weke taybetmendiyek girîng îfade bikin. Di serî de jin û ciwan, hem bandor li tevayî karker, kedkar, gel, tevayî herêm û mirovayiyê kir, hem jî bû navendek kişandina şoreşgeran. Bi rastî jî ji bo jin û ciwanên ku ji sosyalîzmê bawer dikin, dil dane sosyalîzmê, dixwazin weke sosyalîst bijîn, taybet jî jin û ciwanên piştî têkçûna sosyalîzma pêkhatî li sosyalîzma rast digerin, li Rojava kom bûn. Rojava ji wan re bû qada kombûnê, qadek perwerde û çalakiyê. Li ser vê bingehê hema bêje ji çar aliyên cîhanê şoreşger û sosyalîst hatin qada Rojava. Di astên cuda de beşdarî xebata şoreşgerî bûn. Herî zêde jî bi cesaret û fedekariyek mezin beşdarî şerê li dijî DAIŞ'ê bûn. Bi dehan şehîd ketin. Ji ber vê jî eger ev qad di serî de ji jinan re, ji tevayî gelên bindest re bû navendek a enternasyonal, girêdana xwe bi têkoşîna di vî alî de, dîsa şahadetên di vê têkoşînê de çêbûne re heye.

Di rastiyê de tiştek bi navê Rojava nebû. Qadeke biçûk a dorpêçkirî bû. Rojava li aliyekî, di cîhanê de xebera kesî bi Kurdistanê nebû. Rêber Apo got, "Welat û gelê ku kesî nediwêrî qala navê wan jî bike". Tu kesî di vê astê de li Rojava û Têkoşîna Azadiyê nedinêrî. Li ser vê bingehê ne xwedî têgihiştin û agihiyekî bûn. Taybet jî ji aliyê rêberên kevneşop ve Kurd, bi awayekî neyînî bi tevgerên şoreşger-çepgir dabûn nasandin. Bêguman Berzaniyan di vê de rolê sereke lîstibûn. Kiryar, têkilî, terzê têkoşînê, tifaqên PDK'ê ku di pêşengiya Berzanî de ye, gelê Kurd ne weke endamek alema pêşketî, azadîxwaz û demokratîk, weke parçeyek paşverûtiya modernîteya kapîtalîst, paşverûtiya nedewletê lê hatibû. Bêguman vê ji Kurdan re astengiyek mezin çêdikir.

Ya yekemîn Kurd gelek bû ku dihat înkarkirin û heta navê wan nedihat zanîn. Ji ber wê jî pêwîst bû ku vî zirxê înkar û îmhayê bihata şikandin. Ya duyemîn jî li cihê ku ev înkar dihat derbazkirin, vê carê jî teyîsînên bi zirar û neyînî derdiketin pêş. Ji be wê jî pêwîst dikir ku ev bandor jî bên şikandin û sererastkirin. Bêguman ev rewş ji nasandina tiştek nedihat zanîn zehmettir bû. Şoreşa Rojava di naskirina gelê Kurd, welatê Kurdistanê, Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de rolekî diyarker lîst. Bi vî aliyê xwe jî xwedî wateyek mezin e. Ev hem di nava jin û ciwanên cîhanê de hem jî di nava gelan û derdorên demokratîk de belav kir. Rastiya Kurd û Kurdistanê, hişmendî û vîna Kurd a ji bo azadiyê, bi fikrên Rêber Apo re belavî tevayî cîhanê kir. Ev jî pir pir girîng e, yek ji taybetmendiyên wê ye. Pêwîste kesayeta jin a şoreşê, bi kesayeta wê ya enternasyonal re pir baş fêm bikin. Nirxek pir mezin e. Ev di encama kedên pir mezin û rijandina xwînê de ava bû. Gelek sûd da Kurdistanê û gelê Kurd. Ji ber wê jî pêwîste em vê pir baş û rast binirxînin. Ji ber wê jî pêwîste çavkaniya hêza me hertim ev rastî û li ser vê xetê be. Pêwîste tucar em ji vê xetê dernekevin.

**Xweseriya Demokratîk û Konfederalîzma Demokratîk**

Rehenda din a di qada navnetewî ya ya herî tê nîqaşkirin, balê dikişîne, bandorê li atmosfera gerdûnî dike, taybet jî di atmosfera Rojhilata Navîn de bandorê dike rehenda Netewa Demokratîk e û li ser vê bingehê pêşketina şoreşê ye. Dîsa di aliyê siyasî û rêxistinî de esasgirtina Xweseriya Demokratîk û Konfederalîzma Demokratîk e. Ev nêzîkayî xwe li ser yekîtî û beşdariya demokratîk a cudahiyan ava dike. Hişmendî, piştgirî û siyasetek ku her cudahiyê di nava xwe de bi azadî û xweseriya wê birêxistin dike, jiyana bi hev re û wekhev pêş bîn dike, her cudayiyekî dixe nava yekîtiya demokratîk esas digire.

Çawa ku xala ev 5 hezar sale hevneşopiyê xwe pê girtiye zayendperestî ye, ev dused sale, sêsed sale netewperestî jî rolek wiha dilîze. Di vê pêvajoyê de pir derkete pêş. Hem şovenîzm û netewperestiya dewletê, hem jî netewperestiya ku netewên tên perçiqandin derxistine holê, ji şûna pirsgirêkan çareser bike hîn zêdetir giran dike û tevlîhev dike, bê çareserî dihêle. Bûn hêncetên herî bingehîn ên şer. Li ser vê bingehê ev sed sale netewperestî di lûtkeyê de ye. Her ku ber bi roja me ve tê netewperestî hîn zêdetir dibe û derdikeve pêş. Ji ber vê netewperestiyê ev dused sale Rojhilata Navîn bûye gola xwînê. Li her derê şer heye, herkes bi hev re di nava şer de ye û şer dikin. Yekîtiyek demokratîk û xweseriyek demokratîk a vê pêk bîne nayê pêşbînkirin. Xeta ku esas tê girtin yên bihêz ên bêhêz biperçiqînin û tune bikin e. Ev jî karîgeriya herî bi nakokî û pevçûnê zêde dike ye. Ji sala 1990'an heta niha hîn jî

Rojhilata Navîn navenda Şerê Cîhanê yê Sêyemîn e, ne diyare dê ev heta kengî û bi ku ve here. Her ku wext derbas dibe şer kûrtir dibe û belav dibe. Jixwe Kurdistan ev 200 sale ji ber vê netewperestiyê bûye gola xwînê. Hertim di nava nakokî û pevçûnê de ye.

Gelek qadên cîhanê jî ji vê ne cudatir in. Di vî alî de netewdewletên yekparêz-faşîst-navendîparêz pirsgirêka herî giran û paşverû ye. Ji ber wê jî ji bo derbaskirina vê atmosfera şer, xweseriya demokratîk weke modeleke ku destdayî derdikeve pêşiya me. Lê li gorî vê rastiyê jî modela çareseriyê herî kêm li Rojhilata Navîn tê nîqaşkirin. Bêguman divê rewş berovajî bûya. Di zanabûna Rojhilata Navîn de lewaziyek heye. Rêber Apo teoriya vê lewaziyê di parêznameyên xwe de diyar kiriye. Hem ji ber wê hem jî pratîka Şoreşa Rojava qasî tê xwestin negihaye qada Ereban û Rojhilata Navîn. Sedemên vê lewaziyê ev in. Em di vê xalê de kêm in, nêzîkayiyên şaş hene. Taybet jî rola hêzên dijber û netewperesiya wan sereke ye. Netewperestiyên Tirk, Ereb û yên din di vê de nûnertiyê dikin. Rastî tê veşartin. Bi vî dixwazin kesayeta netewa demokratîk a Şoreşa Rojava maske bikin. Pêwîste em van hewldanan bişkînin, bi ferasetek rast van helwestan têk bibin. Lê cîhan vê pir baş fêm dike. Taybet jî sosyalîst, tevgerên şoreşger, dîsa hêzên demokrat, bi kurayî yên zirar ji faşîzma netewdewleta yekparêz, despotîzm û dîktatoriya wê zirar dîtine, bi wê re çareserî nedîtine, yên ketine lêgerîna çareseriyê xeta netewa demokratîk weke rizgariyekî hembêz dikin. Di Şoreşa Azadiyê ya Rojava de rastiyek pratîkî ya wiha heye.

Qada Bakur û Rojhilatê Sûriyê qadeke ku gel, êl, qebîle di nava hev de dijîn. Li gorî qadên din hîn zêdetir komên netewî û baweriyên cuda lê hene û bi hev re dijîn. Bi awayê dîrokî wisa şêwe girtiye. Osmaniyan beşên ku li xweşa wan nediçûn mişextî wir kirin. Dîsa Şam û Bexdayê gelek mirov û civak mişextî wir kirine. Ji ber wê jî herêma Firatê, taybet jî herêmên Reqa û Dêrazorê bûye cihê komkirina van komên hatine mişextkirin. Di demên dawî de dewleta Sûriyê jî heman tiştan dike. Mirovan mişextî van herêman dike. Dîsa qad ji ber hinek aliyên xwe balê jî dikişîne. Dema ev karîgerî tevayî tên gel hev, qadeke ku hebûna netewî ketiye zikhevde derdikeve pêşiya me.

Bêguman li qadeke wiha pêşxistina konfederalîzma demokratîk a xwe dispêre Xweseriya Demokratîk, yanî birêxistin û avakirina aliyê siyasî ya em jêre dibêjin netewa demokratîk pir girîng e. Dibe derseke pir fêrker a ku herkes dixwaze fêr bibe û bala xwe dide ser. Ji ber ku li qadeke wiha ku herî zêde şer lê pêş bikeve, avakirina jiyanek demokratîk a bi hev re, ji bo çareseriya pirgirêkên mirovayî dijî pir girîng e. Di vî alî de jî dibe mînakek pir girîng û yekane. Ji ber wê jî dersên wê pir in. Bi rastî jî modelek e û di astek girîng de jî pêk tê. Hîna tam saz nebûye û pergalek çênekiriye. Ev di pêvajoya avakirinê de gav bi gav pêk tê, bi ceribandinan tê fêmkirin. Nêzîkayiyên bê sûd û şaş tên derbaskirin. Helbet li gel tevayî kêmaniyan, niha li vê qadê mirov li ser heman armancê bê şer û pevçûn, bi xwişk û biratî bi hev re dijîn. Atmosferek wiha li cihek din ê cîhanê tune ye. Ji bo ji holêrakirina pevçûnên netewperestiya heyî, fêmkirina pênaseya netewa demokratîk û pêkanîna wê, bi vî awayî jiholêrakirina pirsgirêkên netewperesiyê ava kirine, hêza çareseriyê ya vê sergûzeştê derxistiye holê heta asta dawî girîng e. Ji ber ku em qala rewşeke heta niha bizavên fikrî û projeyên polîtîk çareseriya wê nedîtine dikin.

## Rêberê çeteyan Tayyîp Erdogan

Herî dawî pêwîste li encama şer û berxwedana ku ev 12 sale didome binêrin. Niha, rêveberiya AKP û dewleta Tirk bi tevayî hêza xwe hewl dide rêveberiya Hafiz Esad bixapîne. Di demek nêzîk de heman têkilî bi rêveberiya Bexdayê re danî û hinek encam girtin. Niha bi heman şêweyî, bi bandortir dixwaze heman encaman ji Beşar Esad bigire. Helbet dema vê dike jî, ji bo Kurdan hertim di xizmeta xwe de bihêle di bin gefan de dihêle.

Niha, argûmana herî bingehîn a di stratejiya xapandina rêveberiya Şamê de çi ye? Bêguman argûmana rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê parçe dike, zirarê dide Sûriyê, karîgeriyek a pevçûnê ye. Argumana dewleta Tirk ev e. Yanî bi vî awayî ji rêveberiya Beşar Esad re dibêje dijminê te yê herî mezin ev hebûna siyasî ye. Di rastiyê de rewşek berovajî mijara gotinê ye. Heval jî hertim binê vê xet dikin.

Di nava van 14 salan de rêveberiya Esad li ser lingan ma, piştgiriya Rûsya û Îranê di vir de xwedî cihek girîng e. Lê pêşketina şoreşgerî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê derket û berxwedana 12 salî jî piştgiriyek pir bi bandor çêkir.

Başe ev çawa çêbû? Tê zanîn, di serî de ev çeteyên girêdayî Ixwan Mislimîn hebûn. Xwe bi navên cuda îfade kirin. Herî dawî ji xwe re gotin Artêşa Azad a Sûriyê. Niha jî qaşo Hikumeta Muxalîf a Sûriyê ava kirine. Ev avabûn bi temamî di bin venêrîna Tayyîp Erdogan de ye. Jixwe rêberê wan jî Tayyîp Erdogan bixwe ye. Dîsa bi wan re şaxên El-Qaîdê jî êrîşî herêmê kir. Herî dawî êrîşên DAIŞ'ê pêk hatin; êrîşên DAIŞ'ê yên ji Mûsilê destpêkirin, berê tevayî hêza xwe dane Sûriyê, pêşbîn dikirin ku Şamê bigirin. Di encamê de ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir bikin tevayî hêza xwe seferber kirin.

Eger em têkoşîna şoreşgerî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Pêngava Azadîxwaz a 19'ê Tîrmehê û berxwedana wê destpê nekiriba, tiştek ji rêveberiya Beşar Esad nedima. Fatiha wî jî nedihat xwedin. Jixwe demekî hema bêje hatibû ber tunebûnê. Erê, bi piştgiriya ji hêzên cuda girtibû demekî li ber xwe da, lê êrîşên ku Artêşa Azad a Sûriyê, Ixwanî Mislimîn, El- Qaîdê û DAIŞ'ê di hindir de dayîn destpêkirin, Berxwedana Bakur û Rojhilatê Sûriyê ew êrîş şikandin.

Di aliyê dîrokî de hêza ku herî zêde zor da rêveberiya Hafiz Esad ev hêza Ixwanî Mislimîn bû. Li Helebê, Hemayê, Himsê her cih û demê ku derfet didîtin serhildan çêdikirin. Rêveberiya Hafiz Esad hertim di devê topê de bû. Yanî di wê astê de rêxistinkirî bûn. Hafiz Esad tenê bi komkujiyan karî rêveberiya xwe li ser lingan bigire. Hîna ji wê demê ve hêzek bi vî awayî bûn. Ji ber wê jî bi pêşketinên li qada Ereban re dikarîbûn rêveberiya Şamê bihejînin û tevayî Sûriyê bidest bixin. Di serî de DYE û Komara Tirk piştgirî dan van û hewl dan pêş bixin. Heta 2015'an jî tifaqa wan hebû. Ji bo vî karî tevayî derfetên xwe seferber kirin, kamp ava kirin û ev çêker biçek kirin. Paşê polîtîkayên DYE û AKP'ê ketin dijberî hev. Di vî alî de her çendî tam ji holê ranebû jî piştgiriya DYE yê ya ji bo van hêzan lewaz bû. Lê piştgiriya AKP-MHP'ê heta dawî berdewam kir. Ji ber wê jî hêzek evqas piştgirî digirt dikarî tevayî Sûriyê dagir bike û rêveberiya Şamê hilweşîne. Jixwe di demên cuda de gihişt wê xalê jî. Ji ber wê jî ya ku êrişên faşîst-çetewarî şikand, yanî hişt ku rêveberiya Şamê li ser piyan bimîne, berxwedana şoreşgerî ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû.

Vê çetetiyê tenê gef li Sûriyê nedixwar, gef li tevayî Rojhilata Navîn dixwar. Ne tenê Rojhilata Navîn gef li tevayî cîhanê dixwar. Li her aliyê cîhanê êriş û gefên DAIŞ'ê hebûn. Mirovayî hatibû wê rewşê ku ji terora DAIŞ'ê ditirsiya. Ji ber vê yekê jî Berxwedana Bakur û Rojhilatê Sûriyê ne tenê rejîma Sûriyê, tevahî cîhan ji van êrişên çeteyî-faşîst parast. Di vî alî de bandora xwe li tevayî cîhan û mirovayiyê kir. Bû şoreşa ku DAIŞ bin xist. Ku ne Iraqê, ne jî Sûriyê kêliyekî jî li hember DAIŞ'ê li ber xwe neda. Eger hinekan berê meşa DAIŞ'ê ji Bexdayê nedabûya Şamê, dê bi hêsanî Bexda û Şam bigirtina. Kêmek mabû herdu paytext jî bikevin. Lê berxwedana mazin a ji Kobanê destpê kir ev asteng kir.

Di rastiyê de Kobanê bû destpêka berxwedana li dijî DAIŞ'ê û qada binkeftina DAIŞ'ê. Lê beriya wê bi van hêzên çeteyî re hatibûn beranberî hev. Ji Çileya 2013'an ve li Serêkaniyê bi duvikên Artêşa Azad a Sûriyê û El-Qaîdê re pevçûn çêbibûn. Vê pêvajoyê bidestxistina Sûriyê asteng kir.

Niha faşîzma AKP-MHP'ê li şûna vana êriş dike. Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kiriye. Dîsa aliyê Idlibê bi temamî venêrîn dike. Bi vî awayî faşîzma AKP-MHP'ê gefa dagirkirinê li tevayî Sûriyê dixwe. Rewşa wî ya heyî ev e. Hertim nexşeyan dide destê xwe û dibêje, “Hûnê 30 km yên li ser sînor bidin min”. Lê eger derfetê bibîne teqez dê bi vê re sînordar nebîne, tevayî Sûriyê dagir bike. Di aqilê rêveberiyên Komara Tirk de teqez ev heye. Jixwe dema derfetê dibînin jî vê bi awayek vekirî dibêjin. Armanca wan a herî mezin ewe ku li Mizgefta Emewî nimêjê bikin. Dixwazin Şamê bigirin û careke din Siltaniya Emewî li Rojhilata Navîn ava bikin. Ew bixwe vê îfade dikin. Yan jî ev ne gotinek a me ye.

Niha dîsa ev berxwedan dagirkeriya Tirk dişkêne. Dîsa Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Berxwedana wê hêza van çeteyên faşîzma Tirk şikand, lewaz kir, derbe kir û bin xist. Dema Komara Tirk dît bi vî awayî nikare encamekî bidest bixe, vê carê jî rasterast bi hêza artêşa xwe dest bi êrişên dagirkeriyê kir. Bêguman dîsa tenê Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî van êrişan sekinî, têkoşiya. Bi îfadeyek din ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tevayî Sûriye parast.

Em dizanin ku çiqas hêza liberxwedanê ya rêveberiya Esad heye. Pir ne bi hêz e. Desthilat û pergala wê ya dewletê, her çendî di çavê NY yî de rewabûnek wê hebe jî rola xwe pir nalîze. Nikare sînorên xwe û xaka girêdayî xwe jî biparêz e. Parastina Kurd û Kurdistanê bide aliyekî, nikare axa girêdayî xwe jî biparêz e. Di vî alî de berxwedana Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hemberî êrişên dewleta Tirk, Ixwanî Mislimîn, DAIŞ û El- Qaîdê ne tenê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, heman demê de tevayî Sûriye parast û rolek girîng lîst. Di têkoşînê de şehîdên mezin dan. Gelek xwîn hat rijandin. Yek ji şerên herî bi wate û girîng ên dîrokî hat jiyîn. Ji ber wê jî dersên vî şerî, hem di aliyê stratejîk û hem jî di aliyê zanista teqtîkî de pir girîng in. Hem jî di aliyê pêşxistina siyaseta şoreşgerî de, qezençkirina teqtîk û terzê rast de pir girîng e. Me di destpê de jî diyar kir, pêwîste şoreş tenê bi aliyê siyasî ve neyê girêdan. Pêwîste ji guhertina rêveberiya siyasî re nebêjin şoreş. Rêber Apo di parêznameyên xwe de ev xisûs pir bi awayek diyar danî holê.

Ev di aliyê pergala desthilat û dewletê de kir. Ji ber wê jî guherînên bi awayekî dîrokî di nava pergala dewlet û desthilatê de hatine jiyîn, weke şoreş fêmkirin û pênasekirin rast nedît. Gelek feraset û teoriyên şoreşgerî bi vî awayî pênase dikirin. Bêguman Tevgera Azadiyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê rewşê bi vî awayî esas nagire.

Bi 19'ê Tîrmeha 2012'an re rêveberiya siyasî ya li Rojava hat guhertin. Helbet guherîna siyasî jî, bûyîna rêveberî jî pir pir girîng e. Di vî alî de dîrokên wiha ji bo şoreşê weke nîşane diyarkirin jî tê fêmkirin. Lê dema şoreşê bi vê dîrokê re didin destpêkirin, pêwîste ji destçûyîna rêveberiyê weke şoreş çêbû û xilas negirin dest. Pêwîste şoreşê wiha teng nekin. Ji Tîrmeha 1979'an ve pêvajoya xebata şoreşgerî destpêkiriye û heta roja me ya îro tê. Vê xebata şoreşgerî ya ku 40 sal derbas kiriye hişmendî û terzek jiyanê derxistiye holê. Terz û hişmendiyek guhertiye û pêş xistiye. Wê demê pêwîste ev guherîn bên lêkolînkirin. Bi rastî jî vê xebata şoreşgerî, li ser civaka Kurd a Rojava û gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi rehenda hişmendiyê re di kîjan astê de û çawa guhertin-veguherîn bi xwe re aniye? Çiqasî karî gel ji van fikrên netewperest, olperest, zayendperest û zanista pozîtîvîst dûr bike? Çiqas karî xet û hişmendiya şaristaniya demokratîk, têgîna modernîteya demokratîk bide fêmkirin? Çiqas karî çêkera wê ya hişmendiyê, xeta wê ya bîrdoziyê, terz, tempo û islûbê wê bigire? Pêwîste em pêngava şoreşgerî ya bi 19'ê Tîrmeha 2012'an de destpêkiriye, yanî Şoreşa Azadiyê ya Rojava bi vê rehendê re binirxînin.

### Perwerde û hewlên Rêbertiyê Kurdên Rojava kir civak

Bi rastî dema di salên 80-90'î de Rêber Apo bi xwe li qadê dixebitî, civaka Rojava, jin û ciwanên Rojava guherînek çawa ya hişmendî û terzê jiyanê pêk anîn? Çiqas hatin perwerdekirin? Li ser xeta civaka exlaqî û polîtîk çiqas xwe guhertin, perwerde kirin û taybetmendiya civakbûnê qezenç kirin? Beriya wê ev ast tune bû. Civakek bû ku ji cihê cuda hatibûn û kom bibûn. Kurdên Rojava bi xebat û perwerdeya Rêber Apo bûn civak. Ew hişmendî wiha ava bû. Niha ew giştîbûn bi vî awayî tê jiyîn. Beriya wê giştîbûnek bi vî awayî nebû. Derfetên yekkirina Cizîrê, Kobanê û Efrînê nebû. Tu partiyan ew nekirin yek. Ji derveyî PKK'ê, tu partiyên ku li tevayî Rojava birêxistinkirî tune ye. Tenê PKK'ê birêxistin kir. Em wan deman pir baş dizanin. Partiyên din weke partiyên êlekî, herêmekî û derdorek diyar hebûn. Ev parçebûn sekna civakê jî bû.

Eger niha li Rojava rastî û giştîbûnek ku ev derbas kirî hebe, ev bi saya xebatên azadîxwaz-şoreşgerî ku ev ji 40 salî zêdetir tê meşandin çêbûye. Di nava vê demê de, xebatên Rêber Apo yên salên 80-90'î encama îro derxistiye holê û zemîn daye avakirin. Guherîna hişmendiyê ya herî mezin wê demê hat jiyîn. Hişmendiya azadiyê, hişmendiya civakbûnê wê demê qezenç kirin. Dîsa jinan hişmendiya azadiyê wê demê qezenç kir. Rêber Apo bi taybet bi jinan re eleqeder bû. Di nava jinan de xebatên taybet birêxistin kir û da meşandin. Li ser vê bingehê Şoreşa Jinê ya Rojava pêş ket. Yan jî hema wisa ji ber xwe de, piştre pêş neket, hema wisa ji tunebûnê, di carekî de dernekete holê.

Niha ev 12 sale xebateke girîng tê meşandin. Hem di aliyê rêxistinkirina siyasî, jiyana civakî-aborî de, hem jî di aliyê pêşxistin, kûrkirin û birêxistinkirina çandî de pêvajoyek girîng a şoreşê heye. Lê pêwîste em şoreşê teng negirin dest. Pêwîste em Kurdistanê, Sûriyê û Rojhilata Navîn weke tevayiyekî binirxînin. Bêguman tişta herî xeter helwest û ferasetên ku şoreşê tenê weke siyaset û rêveberiyê dibînin hene. Tu têkiliya vê nêzîkayiyê bi şoreşê re tune ye. Şoreş hişmendî û terzek ê jiyanê ye, guherîn û pêşketinek bîrdozî ye. Pêwîste em şoreşê weke şoreşa hişmendiyê, şoreşa bîrdoziyê, şoreşa terzê jiyanê bibînin û li ser vê bingehê pêş bixin.

Di vê çarçoveyê de, di pêvajoya borî de gelek êrişên îmhayê pêk hatin. Ji ber vê jî berxwedanên leşkerî derketin pêş. Ji bo ev berxwedan bê domandin bi hêzên herî dijber re tifaqên leşkerî hatin çêkirin. Ev ne şaş jî bûn. Encamên girîng jî derxistin holê. Di vî alî de derfetên ku pêşketin li ser bingehê van êrişan hatin bikaranîn. Mirov vê dibîne û fêm dike. Rewşeke ku tê fêmkirin e. Nabe ku em fêm nekin. Helbet her ku derfet hat dîtin pêwîste em ji vî zemînê siyasî-leşkerî, di aliyê hiş û bîrdoziyê de jî xwe derbas bikin, rehenda şoreşê ya bîrdozî û çandî jî pêş bixin. Em çiqasî şoreşa bîrdozî, şoreşa çandî, şoreşa exlaqî pêş bixin, dê şoreş ewqasî civakî bibe, ewqas bikok bibe, ewqas mayînde bibe, ewqas zornebirî bibe. Yan jî şoreş tenê bi serkeftinên siyasî û leşkerî nayê parastin û pêş nakeve. Di siyaset û leşkerî de serkeftin jî heye, windakirin jî heye. Tu derfetan jî bidest dixî û zirarê jî dibînî. Derfetên ku tu ji wir digirî hêzê ava dike û ev hêz jî girîng e. Di jiyanê de rol dilîzin. Ji ber wê jî girînge rehenda leşkerî-siyasî tu caran ji nedîtî ve neyên û kêm nebînin. Lê pir şaşe ku jiyana civakê, xebata şoreşgerî, heman demê de şoreşê tenê weke bûyerek siyasî-leşkerî bibînin. Ev nêzîkayiyek teng, kêm û parçeker e. Nedîtina rehenda bingehîn a şoreşê, nedîtina bingehê wê îfade dike. Ji ber wê jî pêwîste em rehenda bîrdozî, rehenda hişmendiyê ya şoreşê baştir bibînin û hîn zêdetir binirxînin.

### Xeta ku pêwîst dike fedayîtiye

Dema şoreşa Rojava 10 saliya xwe temam kir, me ji bo ku 10 saliya duyemîn bibe Dema Şoreşa Çandî nêrîn diyar kiribûn. Di vî alî de nîqaş jî çêbûn. Di vî alî de xebat çiqas pêş dikevin, çiqas bi bandor in em tam nizanin. Em nikarin tiştekî bêjin. Lê pêwîste em girîngiya van xisûsan bibînin.

Me her qala xebatên Rêber Apo, pêşengiya partiyê û gerîlla kir. Di encamê de asta partîbûn û gerîlatiya Rêber Apo li vê qadê pêşxistî û derxiste holê di cîhanê de yekan ye. Di tu dema dîrokî de, di vê astê partîbûn û gerîllatî çênebûye. Em dizanin di dîrokê de hewldana pêşxistina tevgerên fedayî çêbûne. Dema em li mînaka Hasan Sebah jî dinêrin, xwe nedispart hişmendiyekî, em dibînin ku tenê weke tevgerekî tolhildanê pêş ketiye. Ya ku ev anî rewşa hişmendiyê rastiya Rêber Apo bû. Ji ber wê jî pêwîste partîbûn û partiya pêşeng a di PKK û PAJK'ê de derketiye holê rast bigirin dest. Pêwîste weke bûyerek asayî û ji rêzê neyê dîtin. Ji ber wê jî pêwîste jiyana partiyê, cesaret û fedekariya di partiyê de, yanî xeta em jêre dibêjin xeta fedayî ya Apoyî, pîvana wê kêm nekin. Her tişt girêdayî vê ye. Ev bi pêşengiya partiyê çêdibe. Ev 12 sale li hemberî evqas êrişan li ber xwe dide. Vê xeta fedayîtiyê ev berxwedan pêk anî û ser xist. Ji ber wê jî pêwîste ev sekna fedayî rast bê fêmkirin, tucar pîvanên partiyê lewaz nekin. Pêwîste ferdperestiyê, milktiya taybet, fêlbaziyê nexin nava vê. Pêwîste yek ji rastiyên diyarker û herî girîng a gerîlla, şer û jiyana partiyê yanî rastiya rêhevaltiyê biçûk nexin. Dema derfet ava bûn pêwîste nebêjin, "demê wê derbas bû, niha dema xwarinê ye", bi vê re ferdperestiyê, madîyatê, helwest û hişmendiya bûrjuvaya biçûk nejîn. Hişmendiyên wiha di nava me de derdikevin. Ji ber wê jî pêwîste pîvanên kadrotiyê neyên xistin, pîvanên têkoşeriya pêşeng neyên xistin, nekevin rewşeke jirêzê. Pêwîste cesaret, fedekarî, hişmendî, xeta wê ya fedayîtiyê, rewşa wê ya li hemberî madiyatê, komînalîteya wê neyê paşxistin. Pêwîste bi gotinên ev pêwîst dikin neyê xirabkirin. Dibêjin, "fikra yek alî, madî, pratîkî ji me re pêwîst e, wiha hîn baştir e". Lê aliyê wê yê rehenda bîrdozî-hişmendiyê, rehenda terzê jiyanê qet nayê dîtin. Em bi awayekî erênî li vê nanêrin. Ev nayê pejirandin.

Hema rewş di aliyê parastinê û gerîlla de jî derbasdar e. Jixwe partî tê wateya gerîlla. Wisa derkete holê. Qada parastinê û ewlehiyê tu caran nakeve bazarê. Em jê re dibêjin "Parastina Cewherî". Pêwîste naveroka têgînê baş bê fêmkirin. Parastina Cewherî nabe ji hinekên din re bê hiştin. Eger tu parastin û ewlehiya xwe radestî hinekên din bikî, nabe parastina cewherî. Dê bibe parastina wan. Ji ber wê jî eger ev çêker di bin wî navî de birêxistin bibe û hêza çekdarî bixe destê xwe, dikare veguhere hêzek mêtînger û hêzek zextê dike. Ji wir jî desthilat û dewlet derdikeve holê. Ji ber wê jî em dîroka mirovayiyê lêkolîn dikin, hewl didin fêm bikin. Em qlanê, civaka xwezayî, şoreşa neolîtîk, şaristaniya dewletperest, derketina desthilatdariyê lêkolîn dikin. Mêtîngerî çawa destpê kir? Çawa dest danîn ser nirxên hinekên din û kî ev kir? Bêguman hêzên taybet ên bi çek kirin. Yên ku çek girtin destê xwe, ji ber wê jî yên xwe weke berpirsyarê civakê îlan kirin ev yek kirin. Ji ber wê jî niha pêwîste hema em wisa nexwînin û derbas nebin. Pêwîste em fêm bikin û dersê jê derbixin. Pêwîste em bi awayekî rast pêk bînin. Nabe ku ferdperestî û madiyet bikeve nava parastin û ewlehiyê. Li wir xet fedayîtiye. PKK weke tevgerek fedayî ji dayîk nebû, gerîlla jî ne wisan bûn, di destê wan de tu çek nebûn. Di demek dirêj de, di astên cuda de têkoşiya, paşê gihişt xetek fedayî ya wiha. Dîsa li ser bingehê pêwîstiyên vê têkoşînê bû partî, gerîlla û gihişt vê xeta fedayî. Ev 40 sale, ji 15'ê Tebaxa 1984'an ve bi vê şer dide meşandin. Li hemberî êrişên DAIŞ, Artêşa Azad a Sûriyê, El- Qaîde û faşîzma AKP-MHP'ê, bi vê hişmendî, rêxistinbûn û seknê Bakur û Rojhilatê Sûriyê parast. Tiştek din neparast. Ne çek parast, ne jî hêzên ji cihên cuda hatine ku jêre dibêjin "kualîsyon". Parastina wan tenê hêzek bi bandor bûn. Pêwîste em karîgeriya diyarker ji nedîtî ve neyên. Ji ber wê jî nayê pejirandin ku vê qada parastinê veguherînin qada madiyatê û milkê taybet. Rastiya şerê li Kurdistanê vê red dike. Ev ji bo tevayî mirovayiyê derbasdar e. Ji bo Kurdên ku hêzên pergala modernîteya kapîtalîst dixwestin wan tune bikin û neyî dihesibandin, ev hezar qat derbasdartir e. Rêber Apo dema manîfesto amede dikir, ji bo têkoşîna pratîk a vê got, "Em tevgerek nû ya MED didin destpêkirin. Pêwîst bike emê 300 salî li ber xwe bidin, şer bikin". Di vê wateyê de bi pêşketinek biçûk nabe ku hema wisa dest ji qada parastinê bê berdan. Nabe ku xeta Kurdan dike hêz, dike hêza azadiyê xirab bibe. Aliyek vê yê bê pejirandin tune ye.

Dîsa pêwîste rehenda hişmendiya şoreşê bê pêşxistin. Pêwîste kadro xwe jî li ser vê

bingehê birêxistin bike, li gorî pîvanên exlaqî-polîtîk guhertina terzê jiyana gel pêşbîn bike, civakek nû ya birêxistinkirî ava bike. Pêwîste em ji karîgeriyên modernîteya kapîtalîst bandor nebin û neşibin wê. Di vê mijarê de pêwîste civakê baş perwerde bikin, hişmendiya wê bidin civakê û birêxistin bikin. Ji ber wê jî sekna kadro ya ji gel dûr, perwerdekirin û birêxistinkirina gel weke berpirsyariya xwe nabîne nayê pejirandin. Jixwe kadroyekî wiha jî nabe. Eger li ser vê bingehê rast nêz bibin, ji derveyî kulmek xayîn dikarin herkesê li Kurdistanê perwerde bikin. Ji ber ku li hemberî van tiştên ferz dikin yekane rê berxwedana bi fedayî ye, ji derveyî vê rêyek din li Kurdistanê tune ye. Eger weke Kurdekî, weke mirovekî rêyek din a jiyanê hebûya, hingê me dikarî bêjin "nêrîna herkesî ya li gorî xwe heye, ferdperest, madiyatperest nêz dibin, lewma wiha dibe". Lê li Kurdistanê mercên vê tune ye. Li Kurdistanê rastiya ku heye jî zemînê fedayîtiyê ye. Wê demê bi rastî jî pêwîste em rehenda şoreşê ya bîrdozî û çandî baş pêş bixin.

### Komîn dendika civaka demokratîk û netewa demokratîk e

Mînak pêwîste em şoreşa ekolojîk hîn bihêztir, kûrtir û bi watetir bigirin dest. Gelo hişmendiyek ekolojîk, plansazî û xebatek ekolojîk heye? Na, pir tune. Ekolojî aboriyê, hilberînê, pervekirinê digre nava xwe, ew jî birêxistinbûna civakê digire nava xwe. Mînak me di jiyana aborî de, birêxistina civakî de pergala komînal pir pêş nexist. Tiştên me digotin derketin holê lê Şoreşa Rojava ev 12 sale civak bi awayek rast di pergala komînal û kooperatîfan de perwerde nekir û birêxistin nekir. Yan jî modelên wê yên destpêkê hîna pêş nexistiye. Weke nav an jî têgîn heye lê hindirê wê vala ye û bêha milkiyetê jê tê. Ma qet bi milkê ferdperestî komîn an jî kooperatîf çêdibin? Ew li ser bingehê milkiyeta komînal çêdibin. Erê, weke ku di Yekîtiya Sovyetê de pêwîste milkiyeta dewletê a di bin navê "Milkiyeta giştî" de, weke milkiyeta komînê neyê hesibandin. Lê komîn dendika civaka demokratîk û netewa demokratîk e. Ev jî tenê bi pergalek rast a komînal re çêdibe. Eger ev feraseta milkiyeta ferdperest-taybet neyê derbaskirin, ne şoreşa ekolojîk pêş dikeve, ne jî Şoreşa Azadiya Jinê. Bêguman ev rastî ji Şoreşa Azadiya Jinê re hîn zêdetir xwedî girîngî ye. Yê ku fikir û hêza çekdarî bidest bixe, yê ku hêzê qezenç bike milkiyeta takekesî ya taybet derdixe holê. Ji ber wê jî ya ku ji beriya her tiştî kirine milk jin e. Ma dîroka 5 hezar salî ne wisa ye? Wê demê ev xisûsên di zikhev de ne, bi hev ve girêdayî ne. Girêdanek bihêz di navbera hişmendiyek rast a ekolojîk, birêxistinî, xetek rast a azadiya jinê, jiyana wê, li ser wê bingehê gihiştina civaka azad, civaka demokratîk û komînbûnê de heye. Pêwîste teqez em vê têkiliya ku qut nabe baş bibînin. Ji ber wê jî rewşa ku em jêre dibêjin şoreşa bîrdozî, şoreşa çandî, perwerde û rêxistina civakê û ferd a li ser bingehê komîna demokratîk û xeta jiyana azad e. Di serê her karî de ev bicihkirin e. Tevayî xebatên partiyê, xebatên pêşeng di vir de seferberkirin e. Di vî alî de jî pêwîste rewşa Rojava bê nirxandin. Ji bo kêmaniyan hêncetên cuda derdixin pêş, lê yek ji wan jî li ser bingehê xetê nayên pejirandin.

Hinek deman tişên tên jiyîn dibe ku ji ber mercên heyî bi awayekî demkurtî bên pejirandin, lê dema ew merc ji holê rabûn neçare tiştên tên jiyîn jî biguherin. Rûsyayê neguherî, çi bi serê Sovyetê hat. Ji ber wê jî pêwîste em jî guherînên bi vî awayî pêk bînin. Hema wisa bi nîşandana hinek zehmetiyan nabe ku ji berpisyariya perwerdekirin û rêxistinkirina civakê dûr bisekinin. Dîsa nabe ku em ji jiyana komîn a demokratîk, mezinkirina nirxên civaka polîtîk û exlaqî paşde bimînin. Pêwîste teqez ev bên pêşxistin. Aha şoreşa çandî ev e. Exlaqekî nû dê bi vî awayî derkeve holê. Yanî ne ku bi armanca kara zêde civakê mêtîn bikin û di bin zextê de xwezayê talan bikin. Berovajî pêwîste hertim tiştên di destê xwe de bi yê kêleka xwe re parve bikin, hişmendî û exlaqekî ku bi cîran û rêhevalê xwe re parve dike pêş bixin. Pêwîste sekna mirovên vê yekê bikin, civakek xwedî vê astê derxin holê. Pêwîste ji vê re nebêjin "çênabe". Ev wisa bi zorê nabe. Lê binêrin, Di Yekîtiya Sovyetê de, di bin navê "Şoreşa Dijber" de, di navbera salên 1921-1938'an de jimara mirovên hatine kuştin 640 hezar kes e. Bêguman ev jimarên fermî ne. Yên li aliyê dijber vê jimarê bi milyonan îfade dikin.

Erê, ya tê jiyîn şer e. Eger di cih de be û guncaw tundî jî pêwîst dike, lê bi vî awayî nabe. Eger wiha bikî dê dawiya te jî weke ya Sovyetê be. Ji ber vê jî em wisa nakin. Jixwe weke paradîgmayî jî pêwîste xeta desthilat û dewletê neyê esasgirtin. Divê di vê mijarê de girîngiya hişmendî û bîrdoziyê danin holê. Ji ber wê jî pêwîste perwerde û hişmendkirin çeka me ya sereke bin. Heta ku ev neyê kirin, neyê bikaranîn, derfet û hêzê li ser vî bingehî seferber nekin, heta xebatên şoreşgerî û pêşeng bi vir ve nedin girêdan, bi gotina "nabe" bi şêwazê berê re lihevkirin, derxistina pêş a feraseta ferdperest û milkiyeta taybet, ne rast e û nayê pejirandin. Wisa nabe. Me di destpêkê de diyar kir, eger wisa be dibe ku şoreş bi demê re taybetmendiyên xwe yên erênî winda bike. Erê, niha li hemberî faşîzma yekparêz a li cîhanê, li Rojava li ser bingehê konfederalîzma demokratîk, netewa demokratîk hişmendkirinek jinê û bandorek wê heye. Lê ev birêxistinbûnek netewî ye. Ji ber wê jî ji bo azad bibin û bigihin heqîqetê ev têrê nakin. Civak û jiyan heqîqeta xwe tam bi awayekî rast dernaxe holê. Ji bo ev bê derbaskirin, têrker bibe, pêwîste di tevayî qadên bîrdozî-çandî-hunerî de kûr bibin. Pêwîste hêza perwerdeyê, hêza hûner û wêjeyê li ser vê bingehê bi awayek bandor bê bikaranîn. Sînordariyek di vê de heye. Yan jî derbasnekirina paradîgmaya berê heye. Kêmbûna hişmendiyê, lewaziya baweriyê û kêmaniya vînê heye.

19'ê Tîrmehê meşek ber bi hişmendbûnê ve, cesaretkirin bû. Lê em cesareta ji bo temamkirina rehenda şoreşa bîrdoziyê nabînin. Nêzîkayiyên em ji cîhanê qut nebin, cuda nebin, hinekî bişibin wan, hinekî derdikevin pêş û bi bandor dibin. Ew jî zirarê dide. Rê ji berhewabûna derfetên mezin re vedike.

Şerê 12 salên derbasbûyî, rastiyên vî şerê fedayî hîn zêdetir derxiste holê. Tevayî civakê û mirovan ev jiya û dît. Li ser vê bingehê derfeta perwerde dîtinê, rêxistinbûn û têgihiştinê zêdetir çêbûne. Ev rewş hîn jî didome. Eger derfetên heyî di demê wê de neyên nirxandin, tiştên pêwîst neyên kirin, dê paşê derfetên heyî winda bibin. Piştî wê jî nabe ku bêjin, "ma em çi bikin merc hatin guhertin, derfet neman, em dest ji şoreşê berdidin". Pêwîste em sergûzeşta Yekîtiya Sovyetê baş fêm bikin û binirxînin. Di vê mijarê de, di pratîkê de çi hatine kirin, karîgeriyên wêranker çine, pêwîste em baş fêm bikin. Ne tenê ew jî, eger em tevayî tevgerên azadiyê yên di dîrokê de, encama wan, çi bi serê wan hatiye bigirin dest û binirxînin, emê rastiyan li vir bibînin.

Niha derbasî sala nû, sala 13'emîn a şoreş û têkoşînê dibin. Pêwîste em di vê salê de li ewleyî û parastinê baldar bin. Li ser vê bingehê pêwîste em avabûna civakî jî pêş bixin. Taybet jî pêwîste Partiyê û parastinê di xeta fedayîtiyê de bidin rûniştandin. Çêkera exlaqî-polîtîk a civakê, nirxên wê bihêz bikin. Eger li ser vê bingehê nirxandinek bîrdozî û çandî bê kirin, dê hem şoreşê kûr bike, belav bike hem jî zornebirî bike, bike xwedî hêzek mezin.

Di sala 13'emîn de em bawer dikin ku dê fikir û nêzîkayiyên wiha hîn zêdetir pêş bikevin, rastiya şoreşê baştir bê fêmkirin, dersên wê hîn kûrtir û têrker bên fêmkirin, biryar û planên ji bo pêşxistina rehenda şoreşê ya bîrdozî, hişmendî û çandî di pratîkê de derkevin holê. Ji bo wisa nebe tu sedem û astengî tune ne. Eger bê xwestin, bawerkirin, rast bê dîtin dikare bê kirin. Di vê mijarê de qada herî bi pêşwendî qada Rojava ye. Zemîna Rojava, ji bo şoreşek wiha ya heqîqetê û şoreşa modernîteya demokratîk zemîneke pir guncaw e. Ji ber wê jî qada Rojava ji ceribandineke wiha re qadeke herî guncaw e. Ji ber ku Rêber Apo bingeha wê amede kiriye.

Niha dîrokê jî ev weke derfetekî, weke tevgerek a azadiyê û şoreşgeriya Kurdistanê danî pêşiya me. Wê demê em rast fêm bikin û rast nêz bibin. Wê demê pêwîste em li gorî xwe negirin dest, ji hinekên din bandor nebin û li çep û rast nekevin û berovajî nekin. Teqez eger rewşek wiha di aliyê me de çênebe, civak ji bo her nirxê exlaqî-polîtîk, azadîxwaziyê, pêşxistina komînal bigihîne asta herî jor vekiriye. Wê demê pêwîste em jî weke xebata pêşeng vê hişmendiyê û birêxistinbûnê pêş bixin, piştgiriyê bidin vê. Em şoreşê li ser vê bingehê hîn zêdetir kûr bikin. Eger ev bê kirin hem dê şoreş kûr bibe, bi kok bibe, civakî bibe hem jî zornebirî bibe.

Li ser vê bingehê dîsa di serî de em Rêber Apo bi rêzdarî silav dikin. Bi rastî jî dema tê gotin şoreşa li Rojava, ji beriya hertiştî pêwîste rastiya Rêbertiyê bê dîtin, fêmkirin, dersên wî derxin holê û girêdayî bimînin. Sergûzeştek evqas dersên dewlemend ên şoreşgerî, li Rojava 12 salan pêşxistina vê pir girîng e. Em nebêjin mûcîze ye, lê xwedî girîngiyek mezin e. Ne karekî wisa hêsan e. Rewşek tijî nirxên dîrokî ye. Wê demê em di salvegera 12'emîn de, gavek wiha, pêngav, cesaret, fedekariyek wiha, vê hişmendî û biryardariyê, weke Biryara Rojiya Mirinê ya 14'ê Tîrmehê silav dikin.

Eger li Rojava kar weke hişmendiya şehîd Xeyrî Dûrmûş ku di ber şehîdbûnê re got, "Li ser kêlê min binivîsin deydar" bimeşe, wê demê kesek nikare pêşiya vê şoreşê bigire û kesek nikare bin bixe. Wê demê pêwîste vê pîvanê û vê xetê lewaz nekin. Ji ber sedemên asayî yên madî ji wê xetê dûr nekevin. Di vê çarçoveyê de em careke din sala 13'emîn a şoreşê silav dikin, em kesên ku keda wan di vê şoreşê de çêbûye û ev şoreş ava kirine pîroz dikin. Em şehîdên şoreşê bi rêzdarî û minet bîr tînin. Di sala 13'mîn de serkeftinê ji xebatên kûrkirin, mezinkirin û belavkirina şoreşê re dixwazin. Em dixwazin ku di sala 13'emîn de Şoreşa Azadiyê ya Rojava hîn kûrtir bibe, bi kok bibe. Erkên xwe yên pêşengiyê hîn zêdetir bîne cih. Ji mirovayiyê re hêvîdayîn û ronîkirina rêya mirovayiyê bidomîne. Vê taybetmendiya xwe hîn zêdetir pêş bixe. Em li ser vê bingehê şoreşê silav dikin. Serkeftinê ji kesên têdikoşin re dixwazin.

***Bijî Pêngava Şoreşgerî ya 19'ê Tîrmeha 2012'an!***
***Bijî Rêber APO***

■■■

# ŞOREŞA ROJAVA TÎRÊJA ROJEKE NÛ YE

**Xalîde Engîzek**

Di 12'emîn salvegera Şoreşa Rojavayê Kurdistanê û Suriyê de, di serî de ez di kesayeta rêheval Xebat Dêrik, Bawer Rojhilat, Çekdar Amed, Gulê Selmo, Silava û Bêrîvan, Şîlan Helêq, Azadî Dêrik, Jiyan Ehrez, Hevraz, Firat Amed, Rêbîn Rojhilat, Sozdar Kobanê, Zekeriya Efrîn, Jînda Tiltemir, Ronahî Reşo, Lewend, Serhed, Zerdeşt, Goran, Yasir Qamişlo, Abid Xelîl, Îsa Hiso, Şehîdên Qestelê, Şehîdên Til Hemîs û Tilbirakê, Şehîdên Berxwedana Mezin a Kobanê, Arîn Mîrkan, Rêvana, Cûdî Amed, Gulan Batman, Gelhat Gabar, Ebû Leyla, Şehîdê Şoreşa Suriyê Hemzeyê Biçûk û tevahiya şehîdên şoreşa Suriyê û Rojavayê Kurdistanê bi rêzdarî bi bîr tînim û bejna xwe li ber bîranîna wan ditewînim, bi mîsogerkirina şoreşê re emê doza wan teqez bigihînin serkeftinê.

Bi rasthatina 12'emîn salvegera şoreşê re, gelên ku li Bakur-Rojhilatê Suriyê dijîn, bi taybetî jî yên li herêmên ji milê faşîzma Tirkiyê ve hatine dagirkirin dijîn, careke din rabûne ser piyan. Ji ber polîtîkayên faşîzma Tirkiyê û pergala ku nûnertiya wê dike, şoreşa gelên Suryê ji wan dizîn, şoreş kirin qurbana berjewendiyên xwe yên kirêt. Opozîsyona Suriyê û artêşa azad li ba xwe hewandin, her wiha bû sedema şerê hundirîn, koçberkirina bi mîlyonan gelên li Suriyê dijîn, gelê koçber birin ba xwe û ew weke rehîne li ba xwe ragirtin. Li ser navê wan ji saziyên navnetewî bi milyaran dolar girtin, ew kirin hemwelatiyên sexte û di hilbijartinan de dengên wan bikaranîn. Ew kirin karkerên bi heqdestê erzan. Ew kirin sîxûr û şandin herêma şoreşê, kirin dijminê gelê xwe. Ciwanên wan ji xwe re kirin leşker, jinên wan ji xwe re birin kerxanê. Di hêla siyasî de jî weke karteke zextê li hemberî raya gîştî ya cîhanê bikaranîn, her kes pê tehdît kir û got "Ger hûn bi ya min nekin, ezê tevahiya penaberên Suriyê berdim ser çavên we." Niha jî ketiye nava hewldana bazareke pir qirêj û dixwaze xaka Kurdistanê ya milê Rojava û Başûr dagir bike û wan penaberan bînê lê bi cî bike. Bi vî awayî dixwaze him xwe ji derdê penaberan rizgar bike, him jî têkilya xwe ji nû ve bi dewleta Suriyê re baş bike. Ji lewre gelên li Bakur-Rojhilatê Suriyê li qada ne û bi artêşa Tirk a dagirker û karmendên wê re di nav pevçûnê de ne û xwestin wan ji ser axa xwe der bikin. Di van serhildanên gel de careke din bi dehan welatiyan jiyana xwe ji dest dan û bi sedan jî birîndar bûn. Em hêvî dikin ku ew gelên ku li qadên dagirkirî jiyan dikin, rastiya dewleta faşîst a Tirk bibînin û li gorî esaleta şoreşa gelan tevbigerin. Esas dibû êlê Ereb û bi taybetî jî artêşa azad, Xalid Ermoşî ji bîr nekiriba. Wî bi Tirkiyê bawer kir ku piştgiriya muxelefetê dike, ji artêşê reviya û tevlî artêşa azad bû. Lê dewleta Tirk ew radestî Suriyê kir û paşiyê rêjîma Beasê ew û malbata wî tev qetil kirin. Ji lewre ger wê demê ew rastî bidîtana, îro wê rewşa gelên li Suriyê wiha nebûya bazara destê Tirkiyê û berjewendiyên wan.

### Tirkiye li ku be bi navê NATO'yê li wir e

Beriya 12 salan wan gelan bi ked, xwîn û xwedaneke mezin şer û tekoşîneke mezin a bê hempa dan da ku li welatê xwe Suriyê şoreşê pêkbînin, pergala heyî biguherînin, rêjîma dîktator a Esad hilweşînin û di welatê xwe de demokrasî, azadî û wekheviyê pêkbînin, jiyaneke azad û komînal ava bikin. Bi van hest û xeyalan dest bi şoreşê kirin. Lê belê tevî ku 12 sal di ser şoreşa Suriyê re derbas bûn, ji bilî Bakur-Rojhilatê Suriyê, tevahiya herêm û qadên din ên Suriyê reşbînîyekê jiyan dikin. Weke me li jor jî anî ziman, dewleta Tirk a dagirker vê rewşa şoreşê ku zemînê wê li Rojhilata Navîn hatî avakirin, dixwaze bixe xizmeta xeyalên xwe yên Osmanî. Sînorên Mîsaqî Milî danîbûn ber xwe lê bi Peymana Lozanê re wîlayetên Mûsil û Kerkûk jê hatin derxistin. Niha dixwıze wan sînoran dagir bike û wan deveran tevlî axa xwe bike. Ji lewre ev 12 sal in Rojhilata Navîn û bi taybetî jî Suriye kiriye gola xwînê da ku guhertinên li vir çêbibin ne li gorî berjewendiyên şoreşa gel bin, berovajî wê li gorî berjewendiyên hêzên faşîst ên li dijî şoreşê bên zîvirandin. Dewleta Tirk weke ku li dijî Emerîka û Koalîsyona Navnetewî ye xwe nîşan dide, ji lewre ji her kesî re dibêje "Ew dagirker in, hatine li Suriyê bi cî bûne." Qaşo ew destekê didin şoreşê, lê divê gelê me û tevahiya gelên Suriyê bizanibin ku Tirkiye dewleteke NATO'yê ye, Tirkiye li ku derê be, bi navê NATO'yê li wir e. Dixwaze bi van gotinên xwe gelan bixapîne ku mîna li dijî DYE'yê ye, lê ev ne rast e. Esas DYE ji wan dixwaze li ser navê pergalê biçe Rojavayê Firatê. Rûsya ji milekî ve DYE ji milê din ve bi karta Tirkan dixwazin guhertinên şoreşî li Suriyê nekevin di bin xizmeta Kurdan de. Ji milekî ve hêzên Koalîsyona Navnetewî, ji milekî ve Rûsya, ji milekî ve jî dewleta Tirk a dagirker ketine nava pêşbirkekê ku şoreşa Suriyê ji naveroka wê xalî bikin û bixin xizmeta berjewendiyên xwe. Heya niha ne dihêlin ku şer biqede û çareserî pêk bê, ji lewre jî temenê rêjîma Beasê her ku diçe dirêj dibe, ne jî dihêlin gelên Suriyê bi xwe çarenûsa xwe diyar bikin û çareseriya xwe ava bikin. Di nav van 12 salan de tevahiya bajarên Suriyê rûxiyan, deverên dîrokî hatin hilweşandin û wêrankirin. Gelê Suriyê li tevahiya cîhanê belav bû û koçber bû. Nîvê xaka Suriyê ji aliyê faşîzma dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin, destên derve ên hêzên hegemonîk ketin hundirê Suriyê û êdî bêyî wan kes nikare ti guhertinê çêbike. Tevî van hemûyan jî, rêjîma dîktator ya Beşar Esad ji hespê xwe peya nabe û dixwaze her tişt vegere berê, weke beriya sala 2011'an lê bê. Bêguman ev xwe xapandineke mezin e.

### Şoreşa Rojavayê Kurdistanê weke çirayekî di tarîtiyê de pê ket

Di vir de girîngî û wateya şoreşa Rojavayê Kurdistanê xwe dide der. Li Rojhilata Navîn bi navê nakokiyên etnîkî, mezhebî, çînî û zayendî bi hezarên salan e gelên herêmê hevdûdu qir dikin, serî ji laşan cûda dikin. Di warê hişmendiyê de jî ronakbiriya xwe pêk neanîne, di hişmendiya dogmatîk a kevnar de mane. Tevahiya ronakbîr û şervanên xwe yên heqîqetê an bi destê xwe an jî hêzên derve ji holê rakirine. Nezan, belengaz û bêçare mane, li welatê dayîk ê pîroz qirêjayî serwer bûye. Li welatê nan birçî mane, li welatê ronakbîriyê ku xwediyê Şoreşa Neolîtîk e û çanda Til-Xelef û Mezopotamyayê lê geş bûye, koletî û tarîtî serwer bûye. Hin jî van hêzan îro jî dixwazin vê civakê di vê tarîtiyê de biçikînin. Lê belê Şoreşa Rojava weke çirayekê di nava tarîtiyê de pêket, ronahî da tevahiya mirovahiyê.

Şoreşa Rojava destpêkê wekî îradeyeke siyasî, pişt re jî wekî berxwedaneke leşkerî pêşket. Ev pêşketin hem ji bo gelê Kurd hem jî ji bo kedkar û gelên herêmê û cîhanê bû heviyeke mezin. Li ser navê şoreşê 12 sal in şer û berxwedaneke mezin tê meşandin. Di vê oxirê de me bi deh hezaran şehîd dan. Niha xeteriya deskeftiyên ku şoreşê bi dest xistine ji dest biçin heye. Ji lewre divê şoreş ji hêla bîrdozî û çandî ve bê pêşxistin û kûrkirin. Encax bi vî awayî dikare bi paradîgmayê re hemaheng bibe û di encamê de bibe pergaleke civakî û mayînde bibe. Divê di sala nû ya şoreşê de herî zêde li ser van rastiyan bê sekinandin. Divê em bizanibin, ger em tedbîra şoreşê negirin, em di aliyê bîrdozî û çandî de şorêşê kûr nekin, em pergala civakî ava nekin, ev bîrdozî nebe çand, nebe wîjdanê civakê, bi awayekî rêxistinkirî nesekinin û li berxwe nedin, emê wenda bikin. Em xwe nexapînin, em nebêjin min ked da, min xwîn da, bila xelk vê bibîne û min qebûl bike. Ev xefleteke mezin e. Divê em bizanibin bi qasî tu xwe birêxistin bikî, nirx û pîvanên şoreşê di jiyanê de mayînde bikî, wê şoreş bê parastin. Ger wisa nebe, wê ketina nava pergalê çêbibe û şoreş bi xwe xwe biqedîne. Ji bo bikarin li cihê rast û di dema herî guncav de xwedî li erkên şoreşgerî yên roja me ya îro derkevin, divê ji dîroka xwe ya têkoşînê û ya gelên cîhanê dersan derxînin, jê fêr bibin. Eşkere ye ku dîroka me û gelên cîhanê ya têkoşînê



bi dersên mezin û girîng dagirtî ye. Lewma divê tevahiya gel û rêhevalên me yên ku kedeke mezin di şoreşê de dane, di vê meha nû ya Tîrmehê de, li ser van dersên dîrokî yên şoreşê lêhûrbûn bikin, nêzîkatiyeke rast raber bikin û xwe bigihînin encamên têrker. Wê li ser vê bingehê xwe nû bikin û xwe di serkeftina Pêngava Azadiya Kûrewî de kilît bikin. Beriya du salan di 10'emîn salvegera şoreşê de me biryar da ku di aliyê çandî de jî şoreşa duyemîn pêk were. Ji wê demê heya niha, di van du salên dawî de li ser esasê ku em şoreşa duyemîn a çandî pêk bînin hewldan tên kirin. Çanda jiyana komînal û azad ku tê de ekonomî û dada civakî serwer e, xwe parastin esas e bê avakirin. Rast e hin hewldan hene lê belê hîn jî di her warî de şoreşa çandî pêk nehatiye. Ger heya niha jî gel bi xwe li ax û çanda xwe xwedî dernakeve, parastina xwe nake, di her kêliyê de çavê wan li koçberî ye, di şoreşê de pêşeroja xwe nabîne, di bihaya ku di berdêla wê de canê xwe bide kar nake, jiyanê înşa nake, ev tê wateya ku me erka xwe ya demê pêk neanîye. Niha divê gel û rêhevalên me bersiva pirsa "em çawa bijîn, çi bikin û ji ku dest pê bikin" bidin. Ewê bersiva vê pirsê çawa were dayîn, bêguman di piratîkê de wê were dayîn. Emê çawa bijîn? Emê azad bijîn. Emê çi bikin, emê di her warî de jiyana azad û rizgariya demokratîk înşa bikin. Emê ji ku derê dest pê bikin? Bêguman emê ji komînê destpê bikin. Mîna Rêbertiya me gotî "Ger ez ji vê hûcrê derkevim, mîna ku ji tofana Nûh rizgar bûme, ezê biçim biniya Çiyayê Agirî, Cûdî, Amed an jî Rihayê li gundekî dest bi avakirina komînekê bikim." Bêguman xebatên din jî girîng in, xebata siyasî, dîplomasî û hwd. Lê xebata herî bingehîn xebata înşaya civaka komînal a li ser hîmê azadiyê ye. Di vê xebata înşayê de, hêzên herî dînamîk û pêşeng jin û ciwan in. Ji ber avakirina pergala hevjiyana azad pergaleke civakî ye û li derdora jinê tê sazkirin. Divê ev rast were fêmkirin, jin nayê û tevlî gîştî nabe, jin jiyanê bi xwe ava dike, ji ber ew esas e. Çawa di Neolîtîkê de jiyan li dora jindayîka xwedawend ava bû, ji ber ku wê demê bi awayê herî xwezayî jinê tevahiya civakê weke zarokên xwe didîtin, niha bi zanistê jî hat îspatkirin ku jin mêr jî di nav xwe de dihewîne. Lewre jin vê rola pêşengiyê bi awayekî xwezayî ya xwe dibîne. Ne ku ev rol jê re tê dayîn, ev rol ji xwe ya jinê ye. Ji ber ku azadiya jinê, di civaka komînal a ku xwe dispêre hevjiyana azad de mîsoger dibe.



Lewre jin di ber avakirina jiyan û pergalê de berpirsyar û pêşeng e. Lewre em dibêjin Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye.

### Pêwîste jin ji bo azadiyê pêşengiyê ji şoreşê re bike

Ji ber ev şoreş, ji bo ku demokrasî, azadî û wekhevî pêk were, hate pêşxistin. Beşa civakê ya ku herî zêde pêdiviya wê bi azadiyê û demokrasiyê heye jin e. Ji lewre jin ji bo xwe bigihîne azadiya xwe diviya ku tevlî şoreşê bibe, ji şoreşê re pêşengiyê bike. Ji ber azadî tiştekî wisa ye ku tê bi destxistin û jiyan kirin. Azadî nayê dayîn û ti kes azadiyê di sênîka zêrîn de pêşkêşî kesî nake. Berevajî vê yekê bi tekoşînê, him jî bi tekoşîneke herî dijwar a ku di oxira wê de tiştê xwe yê herî giranbuha bidî tê bidestxistin. Lewre vê dema em tê de jiyan dikin, rast dîtin, famkirin û li gorî wê helwesta xwe raberkirin, karê kesayet û tevgerên dîrokî ye. Em di ferqa wê yekê de ne ku du erkên me yên dîrokî hene. Yek tekoşîna me ya netewî ye ku tekoşîna me ya netewî bi çiqasî pêş bikeve wê ewqasî bingeha netewa demokratîk bi hêz bibe. Ya din jî erka me ya şoreşa jinê heye. Divê em kesayeta xwe li gora wê ava bikin, tekoşîna xwe jî li ser esasê ku em pêşengiyê ji şoreşa jinê re bikin bi rê ve bibin. Lewre weke jinên Kurd, bi saya bîrdoziya ku Rêbertiya me pêşkêşî me kirî, me karî pêşiya xwe bibînin û erkên xwe nas bikin, rewşa demê fam bikin, li gora wê helwesta xwe ya şoreşgerî diyar bikin. Em ketin ferqa wê yekê ku di destpêka sedsala 21'emîn de pirsgirêka jinê weke pirsgirêka sereke hat xuyakirin û têkoşîna jinan bilind bû. Pergala kapîtalîst ji bo pêşî li têkoşîna jinan bigire bi awayekî birêxistinkirî him di asta komkujiyan de êrîşên fîzîkî him jî êrîşên îdeolojîk pêk tîne. Armanca avahiyên zayendperest, netewperest, olperest û desthilatdariyên rastgir destpêkê bûn jin. Me dît polîtîkayên ku li ser têkoşînên azadiya jinê yên pêş dikevin û radîkal dibin tên ferzkirin piralî ne. Bi malbatperestî û normên kevneperest ên civakî re pêşiya wê digrin, ji hêla din ve cara yekem jinan ewqasî wek metaya zayendî dibînin, li ser beden û keda jinê ewqasî mêtingerî pêş dixin, jinan di qada ekonomîk û siyasî de ji bo pergalê weke amûr dişûxilînin, têkoşîna jinê bi teoriyên lîberal ên weke LGBT- Queer berevajî dikin û pêşiya hevparîbûna têkoşîna jinan digrin. Ji bo vê jî her cûre polîtîka dimeşînin. Nava nirx û teoriyên ku bi têkoşîna jinê re derdikevin holê vala dikin. Ji xwe re kirina mal jî talûkeyeke girîng e. Li gel êrîşên fîzîkî yên îdeolojîk û polîtîk, di salên dawî de polîtîkayên qirkirin û tundiya li dijî jinê pir pir zêde bûne û ev jî asta êrîşên fîzîkî û asta şerê li dijî jinê nîşan dide. Komkujiyên ku di vê rewşa şer de pêş dikevin, destdirêjiyên di rêkên koçberiyê de tên serê jinan, kolekirina jinan, firotina jinan, xizantî û hemû êşên ku jin dikşînin nayên vegotin. Em li axa xwe ya ku şer bi awayekî giran lê dimeşe, dibin şahîdên wan. Me ev rastî dît û ev jî sedema me ya şoreşê û pêkanîna şoreş ye. Şoreşa Rojava ji bo vê dikare bibe zemînekî baş ku em lê şoreşa jinê pêşbixin.

Şoreşa jinê beriya her tiştî şoreşa jiyana nû ye. Li welatê me li ser navê jiyanê çi hebe xiyanet lê hatiye kirin. Li ser vê erdnîgariya warê xwedawendên dayîk ku li pey xwe çandeke pîroz a jiyana wekhev û azad hiştin, li şûna jiyanê mirin, bêhêvîtî û bêeşqî hatiye sepandin. Ji lewre li ciyê ku jiyanê wenda kiriye, jin di bin nîrê zilma mêr-dewletê de têkçûye, êdî jiyaneke bê wate û bê armanc lê tê sepandin. Li vir egera şoreşê derdikeve pêş û dibe şertekî jê neveger. Ji lewre jina Kurd di pêşengiya fikir û felsefeya Rêber APO de li xwe hayîl bûye, di pey jiyana azad de direve û ji bilî jiyaneke azad ti şêweyên din ên jiyanê qebûl nake. Ji lewre Rêber APO di nirxandina xwe ya li ser çalakiya rêheval Zîlan de wiha dibêje.

"Jina ku çeka azadiyê digire destê xwe divê wek di wesiyeta Zîlan de zanibe wê çawa berê xwe bide xebatê. Nikare li derveyî vê li eleqe û têkiliyê bigere. Rûmet û asîlbûna jinê di vê xetê de ye. Xweşikî, hêza jiyana mezin xwe li vê derê dide der û êdî ketine vê riyê. Ev rê pîroz e, mezin e. Ne tenê jinên me bi wan re welat jî, azadiyê jî dide qezenckirin. Zîlan ne kesek e, xetek e. Şêwazê jiyanê ye, şêwazê şer e. Şêwazê serkeftinê ye. Bêguman ev jî li beramberî rastiya dijmin a ku li ser gelê me tê ferzkirin dibe bersiva herî bi serketî. Dibe ku kêmasiyên we hebin. Dibe ku di her astê de di nav hin şaşîtiyan de bin. Lê heke xeta Zîlan rastiyek be -ku ji vê şik naye kirin- heke wek rastiyekê ku dijmin herî zêde dide tirsandin berdewam dike, wê demê hem di jiyanê de meşa YAJKê meşeke mezin a azadiyê ye hem jî di şer de meşa serkeftinê ye."

Bêguman pergala mêr-dewletê jî di ferqa vê sekn û helwesta jinê de ye. Ji lewre li hemberî şoreşa jinê, şoreşa dijber kûr dike. Her mêrekî ku bi netewperestî û zayendperestiyê tê jehrîkirin û hewldidin ku bikin dijmin û kujerê jinan, ev li dijî jinan îfadeya herî xirab û lûtkeyî ya şaristaniya pênc hezar salî ya pergala mêrê serdest e. Ev pergala kapîtalîst pergaleke herî bê exlaq ku heqîqetê berevajî dike ye, di dema van polîtîkayan pêk tîne de xwe weke pergala herî azadîxwaz û demokratîk nîşan dide. Bi vê yekê jî dixwaze serê jinên têkoşer şîlo bike û ji tekoşînê paş de bide. Lê tevî wê jî em dibînin têkoşîna jinan li dijî êrîşan ne ku paş dikeve berevajî vê gerdûnî dibe û radîkaltir dibe. Weke Tevgera Jina Kurd em yek ji dînamîkên girîng a vê têkoşînê ne û bandora me diyar e. Bi şoreşa Rojava re ev rola me hîn zêdetir diyar bûye.

Dema me têkoşîna azadiya jinê da destpêkirin, me hemû pergal da hemberî xwe ku em di ferqa wê yekê de bûn. Rêbertî dibêje "Ji ber ku min di mijara azadiya jinê de wêrekî nîşan da û hemû pergal li hemberî xwe dît, mîna Prometheus bi zinaran ve hatim mîxkirin." Ji bo ku pergala pênc hezar salî hebûna xwe bidomîne serdestiya mêr li ber xwe dide. Ev berxwedanî bi şer û êrîşeke mezin pêş dikeve. Li dijî jinên azadî dixwazin û li dijî beşên ku demokrasî û azadiyê dixwazin pêş dikeve. Helbet me jî li dijî vê pergalê şer daye destpêkirin. Li dijî avahî, zîhniyet, sazîbûna wê ya serdestiya mêr, li dijî pergala wê ya dewletparêz, malbat, têkilî, rastiya jin û mêr, ango li dijî hemû avahiyên vê pergalê em di nav şerekî de ne. Em dixwazin alternatîfa vê pergalê

ava bikin. Em ji vê re dibêjin ŞOREŞA JINÊ. Em ji herî binî destpê dikin, jiyana civakî azad dikin, jinan dikin endama wekhev û azad a jiyan û civakê. Ev têkoşîna ku em dimeşînin û modela em datînin holê bandor li ser cîhanê dike. Ev jî dike ku zemîna ku pergal xwe lê digire û dispêrê bişemite. Lewma, em êrîş û hêrsa wan fêm dikin. Em van dizanin, pêş de dibînin û têkoşînê dimeşînin. Divê em bi vê zanabûnê xebata xwe bilind bikin, li gorî vê xwe bigihînin aqileke stratejîk, rêxistinbûn, helwesteke îdeolojîk-siyasî û xweparastinê.

### Bi dirûşma "JIN JIYAN AZADÎ" felsefeya me gerdûnî bû

Pergala modernîteya kapîtalîst pir ditirse ku ji konjonktûra siyasî ya li herêmê û dinyayê, Kurd û jin bi qezenc derkevin. Ya rastî, tevî hemû zehmetiyan jî em di serdema ku dikarin qezenc bikin de ne û pergal jî vê yekê dibîne. Lewma, ji bo ku em ji pêvajoya nû ya li Rojhilata Navîn û Suriyê pêş dikeve sûde wernegirin, êrîşê me dikin. Tevî ku ji bo pêşveçûnan hêz û bandoreke me ya girîng jî heye di mijara baş bikaranînê de, em kêm û teng dimînin. Em vê hêza xwe nakin dînamîka guhartin û veguhartinê. Zêdebûna zextên pergalê û dijmin, dihêle ku di bin zextê de em biryaran bigirin, di pêşxistina aqilê stratejîk de lawaz bimînin, nêzîkatiyên realist zêdetir nîşan bidin. Em dikarin li dijî pirsgirêkên Rojhilata Navîn û krîzên kapîtalîzmê bi rêxistinbûn û paradîgmaya xwe bibin bersiv lê pirsgirêka nerêxistinkirina fikrê mezin derdikeve pêşberî me. Divê em bileztir polîtîka ava bikin, em hîmê demokarasiyê bihêz bikin, pergala xwe li dora jinê, hiş û hestên jinê ava bikin. Şoreşa Rojava ya ku di pêşengiya jinê de pêş ket, rê li ber wê yekê vekir ku tevgera me ya azadiyê ya jinên Kurdistanê, di têkoşîna azadiya jinê, têkoşîna hevpar a bi tevgerên jinan re bêhtir pêş bixe, xwe bigihîne rêxistinbûna kûrewî. Bi dirûşmeya JIN-JIYAN-AZADÎ re felsefe û dirûşmeyên me yên azadiya jinê gerdûnî bûn. Ji ber xisletê xwe dirûşmeya Jin-Jiyan-Azadî, felsefeya Rêbertî û formûla bi efsûnî ya guhertinê bû malê tevahiya jinên cîhanê.

Di ronahiya vê perspektîfê û mîrasa tekoşîna tevgera me bi giştî, bi taybetî jî tevgera azadiya jina Kurdistanê de, jin li Rojava li xwe hayîl bûn û tevlî tekoşîna azadiyê bûn. Di refên pêş ên şoreşê de ciyê xwe gitin. Di hemû qadên tekoşînê, xwe parastin, siyaset û makanîzmayên biryarê, qada civakî û bîrdozî de jinê cî girt û tekoşîn meşandin. Jinan di berxwedana li dijî hêzên paramilîter, çete û artêşên mêr-dewletê de li sengerên herî pêş şer kirin, mohra xwe li binê serkeftinên mezin dan û bûn hêvî ji bo tevahiya jinên herêmê û yên cîhanê. Hevalên şehîd ên ku me li jor binavkirin û weke din di şerê Kobanî û Efrînê de qehremanên weke Arîn, Rêvan, Avêsta, Barîn, Zehra Penaber, Şîlan Goyî, Gulan Batman, Viyan Peyman, Sosin, Jiyan, Roj, Evîn Dêrîk, Warşîn, Jînda Tiltemer û bi hezaran jinên din ên ku di çeperên herî pêş de şer kirin, hêza herî zalim û tarî ya weke DAÎŞ'ê tirsandin û bi berxwedanê gihan asta şihadetê. Jinan di şer de îradeyeke bê hempa raber kirin, di çeperan de birîndar bûn, bi xwe birînên xwe girêdan û bi destên birîndar ku xwîn jê diherike çeka xwe rakirin û şer kirin. Wan di çeperan de şervan bi cî kirin, çebilxane birin, textîk pêşxistin û şer birêvebirin. Wan helwesta welatparêziyê ya herî bilind nîşandan û gotin, "kesên sînorên Rojava derbas bikin û koçber bibin, diçin xiyanetê." Wan bi xwîna xwe ya pak mohra xwe, di şoreşa Rojava de li dîroka jinên cîhanê dan.

Her wiha bi dehan û sedan jinên ku di qadên din ên tekoşînê de kar dikirin, karên siyasî, civakî û înşayê dikirin; ên weke Gulê Selmo, Fatma Ebo Hecî, Hevrîn Xelef, Zeyneb Saroxan, Yusra, Hind û Emel ên ji netewa Ereb, Zehra Berkel, Yadê Emîna, Hebûn Kobanê, Leyla Agirî, Rîhan Amûdê û hevalên din, di dema li ser karê xwe bûn, hevjiyana azad bi rêxistin dikirin bûn hedefa pergala mêrtî û gihan asta şehadetê. Tevgerekê xwedî evqas şehîdên pêşeng, xwedî bîrdozî û paradîgmaya jiyanê, xwedî hêza parastina jinê ku di pergala rêveberiya xweser de li ser hîmê beşdarî û temsîlîyeta wekhev de cî digire, bêguman wê bendewarî û hêvî jê zêde bin. Him jinên Kurd, him ên herêmê û him jî jinên cîhanê bendewariya wan ji tekoşîna me heye. Di vî warî de gavên berbiçav hatine avêtin, heya astekê jin beşdarî jiyanê bûn, di pergala demokratîk de cî girtine, lê hîn jî aliyên kêm mane û ên xwe weke têgihînên şaş disepînin hene ku divê werin derbaskirin. Ger em van kêmaniyan nebînin, di dema xwe de li ser nesekinin û derbas nekin, emê jî aqûbeta şoreşên gelan ên di dîroka dûr û nêz de derketine rizgar nebin. Dema em li şoreşên cîhanê dinêrin, em dibinin ku di hemûyan de jinê rol lîstiye, lê piştî şoreş bi ser ketiye, jin vegeriyane merheleya ku jê dest pê kirine. An vegeriyan nava çar dîwaran û bûn jinên malê, an jî bi zagonên şoreşê hatine darizandin û cezakirin. Di dîroka nêz de jî, di şoreşên li welatên Ereb û Îranê de jî jinan pêşengiya tekoşînê kirin lê ji ber ku li şûna wê tiştekî nû ava nekirin, jin vegeriyan rewşeke kambaxtir. Me di Şoreşa Rojava de hîn ji despêkê ve balkişand ser vê xala girîng û me hewlda em pirsgirêka azadiya jinê nehêlin piştî şoreşê. Ji xwe lingê esasî ya paradigmaya me azadiya jinê ye. Ger ev neyê pêkanîn, paradîgma bi xwe pêk nayê. Lê belê dîsa jî kêmaniyên cidî, ên tavilê werin derbaskirin hene.

Du mijarên jiyanî hene divê werin derbaskirin û werin sererastkirin. Heya niha rewşa ku şoreş tê de ye dide diyarkirin ku eger ev mijar neyên sererastkirin, wê şoreşa me nîvco bimîne. Ya yekem; di warê hişmendî de xwe weke tê xwestin neguhertin e. Jin bi gelemperî ji nav malê derket û tevlî karên şoreşê bû. Lê belê di aliyê hişmendiyê de guhertineke bingehîn nedaye avakirin. Hîn jî bandora zayendperestiya civakî, ya olî û çînayetî li ser heye. Ji lewre tenê derketina ji nava malê weke azadî hesibandin, di rih, hest û mêjî de guhertinên bingehîn ava nekirin wê bibe sedema xwe xapandineke mezin. Wê xwe mîna ku azad bûye bibîne, ev jî bibe sedem ku pêdiviya xwe bi azadiyê nebîne. Yanê wê bi azadiya şeklî ve xwe têr bike û pêdivî bi têrkirina hişmendiyê nebîne. Ji ber ji niha ve diyar e, li Rojava tevî hemû ked û hewldana jinê ya di tekoşînê de hîn jî weke tîp modêlek ava nebûye. Ji ber asta pêşketina civakekê, bi asta pêşketina jinên wê civakê diyar dibe. Lê em dibinin ku jin li her derê heye lê modêla xweser nîne, hîn xwe ji bandora modêlên pergalên heyî rizgar nekirine. Zimanê wan vebûye, diaxifin, lê kûr nebûne, seransertiyeke cidî heye. Bi kurtasî divê jin asta perwerdehiya zanistî bilind bike, şoreşa hişmendî û wîjdanê jî kûr bike ku şoreş bigihe wateya xwe.

### Li gorî zanista Jineolojiyê bijî û bide jiyîn

Ya duyemîn jî ew e ku beşek ji jinan di jor de tevlî karên rêveberiyê dibin, cûda diteyisînin, ji civaka jinan a giştî qut dimînin. Yanî çîneke elît di jor de derdikeve holê, tenê bi siyaseta jorîn re mijûl dibin. Ev jî xetereyeke pir mezin e ku pergala mêr herî zêde li ser vê beşa jinan hesaban dike. Yanî ji civakê û civakbûnê qut dimînin, di heman demê de jî xwe azad dibînin. Weke Rêber APO di derbarê rêheval Zîlan de gotî "Zîlan felsefeya jiyanê ye, manifesto ye." Divê pîvan danekeve biniya manîfestoya jiyana azad. Ger wisa be, wê demê cudabûna ji pergala heyî namîne. Wekî din jî ev 12 sal in şoreş pêk hatiye. Hîn jî şêwazê têkiliya di navbera cinsan de, malbat û beşdariya jinê li gorî hevjiyana azad nîne. Li wir hin qanûnên jinan hene ku tevahiya tevgerên jinan bi hevûdû re nîqaş kirine û di meclîsa zagonsaz re derbaskirine, kirine qanûnên jinê. Lê ev weke qanûn sepandin wê nebe çareserî, dibe ji mecbûrî an jî ji tirşe were qebûlkirin. Dema rewş wisa be, kengî fersendê bibîne wê serî li rêbazên din bide. Ji ber li rex zagonên jinê yên rêveberiya xweser, zagonên şerîetê jî hene, yên li gorî hiqûqa dewleta netewê jî hene. Bi van rêbazên ku pê jiyan hatî rêxistin kirin re jin tê kolekirin. Lê ew ne di ferqa wê yekê de ye. Ji lewre li şûna zagona jinan, Rêbertî hevpeymana civakî ya jinê pêşniyar kiribû. Divê em hevpeymanekê çêbikin, bi hemû beşên civakê re nîqaş bikin, li ser wê li hevûdû bikin. Eger civak bi dil jiyana azad pêşwazî bike, ev pir girîng e. Dema qebûl neke jî dibe mijara me ya tekoşînê. Ji lewre jin di aliyê çand, ziman, perwerde û aborî de bibe xwedî roleke sereke di jiyanê de. Ya herî girîng jî parastina xwe ji destê kesî re bernede. Bi giştî li gorî zanista jinê Jîneolojiyê bijî û bide jiyîn. Ev her dû xalên sereke ne, bêgûman xalên din jî hene ku mirov li ser raweste.

Ji ber van sedemên ku me anîn ziman, tevahiya hêza jinan neherikî şoreşê. Ji ber vê sedemê û gelek sedemên din ku weke kêmanî derketin holê, hêza civakê nehat rêxistin kirin û ji lewre hin bajarên me yên weke Efrîn, Girê Sipî, Serê Kaniyê hatin dagirkirin. Niha li wan bajarên me ên dagirkirî, bi her cure mêtingerî û zordarî li ser jinê tê meşandin, mîna ku ji jinê tolê rabike êrîşî hemû nirxên jinê dike. Jinên Kurd û yên Bakur-Rojhilatê Suriyê divê ji wan jinên di bin dagirkeriyê de mane, ji rewşa jinên Şingalê ku bi fermanê re hatin kolekirin û li bazaran hatin firotin, dersên mezin derxin û bi hemû hêza xwe tevlî tekoşînê bibin. Di salvegera şoreşê de, bêgûman emê şahiyan jî lidarbixin, di asta herî jor de kelecana şoreşê jiyan bikin. Lê belê di rojên wiha de divê em pratîkên dema borî di ber çavan re derbas bikin, kêmanî û şaşiyên xwe bibînin û li ser bisekinin. Niha şoreşa me bi xeteriyên pir cidî re rû bi rû ye. Weke me li jorê jî bilêvkir, hewldana têkbirina hêza me ya şoreşê heye. Dewleta Tirk a faşîst û hêzên hegemonîk ên cîhanê di her warî de rê li ber şoreşê digirin, Rûsya dixwaze me bi rêjîmê re li hev bîne, koalisyon jî dixwaze bi dewleta Tirk û PDK'ê re bîne ba hev. Bêgûman bi her kesî re dikarin diyalogê bikin û pirsgirêkan nîqaş bikin. Ger di wan diyalogan de hewldana çareseriyê hebe jî divê mirov piştguh neke. Lê ya tê kirin ne diyalog e, teslimiyet e û anîna Şoreşa Rojava li beramberî PKK'ê ye. Dixwazin tevahiya deskeftiyên şoreşê têk bibin û Rojava careke din bixin di bin serweriya xwe de. Ji lewre dibê em di ferqa van êrişan de bin, sekn û tekoşîna xwe ya ji bo înşaya jiyana azad û biratiyan gelan bilind bikin. Di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de em netewa demokratîk ava bikin, jiyana azad saz bikin. Bi pêngava dema azadiya Rêber Apo re, bibin serkeftinê. Careke din ez salvegera şoreşê li tevahî milîtanên PKK'ê, PAJK'ê, Rêber Apo, gelê me, tevahiya jinan û tevahiya mirovahiyê pîroz dikim.

■■■

# Rastiya Herî Zêde Dide Jiyîn: 14'ê Tîrmehê

**Piling Zerdûşt**

Ez di destpêkê de hişmendî, ruh û afirînerê vê berxwedana mezin a dîrokî Rêber Apo birêzdarî silav dikim, li ser vê bingehê di xeta Rêbertî de pêşengên serkeftina bîrdozî ya partiya me di şexsê Kemal, Xeyrî, Akîf û Eliyan de hemû şehîdên me yên tekoşîna azadiyê birêzdarî û biminet bibîrtînim.

Her çiqas li ser berxwedana rojiya mirina mezin wextek dirêj derbas bibe jî, hîna wekî duh bêyî ku wateya xwe winda bike di dil, ruh û mejiyê me de jiyan dike. Hê zêde hêza tekoşîn kirin û berxwedanê dide me. Îro ev tekoşîn li Kurdistanê, dibe cewher, gotin û çalakiya tekoşîna azadiyê ya ku gelê me di pêşengtiya gerîla de bilind dike. Ji her demê zêdetir ruh, azwerî, û baweriya serkeftinê dide gelê me. Ji bo vê jî her çiqas hêzên faşîst, paşverû bi hemû derfetên xwe ve êrîş bikin jî û li gel hemû astengiyan jî gelê me ji berxwedana xwe, tekoşîna xwe ya azadî û demokrasiyê pêngavekê jî paşda na avêje. Meş, berxwedana 14'ê Tîrmehê di kîjan zirûfan de û çawa pêşket? Kîjan encam derxist holê? Belkî pirsên herî girîng ên ku pêwîste em îro bipirsin ev bin. Di vê wateyê de rastiya berxwedana 14'ê Tîrmehê bûye rastiya ku tişta tineyî pêkanîn e, tişta ku digotin nayê derbas kirin derbas kirine û tişta ku digotin xerab nabe xerab kirine. Ev tekoşîna ku di zirûfên cuntaya faşîst a 12'ê Îlonê de ji bo pêşeroja azad û rûmeta mirovahiyê hatî dayîn, îro di pêşengtiya PKK'ê de li Kurdistan, Rojhilata Navîn û di hemû cîhanê de ji gotinê wêdatir, wek tevgerek guhertinê xwe rêxistin kiriye, pêşdikeve. Bi bîranînên wan şehadatên mezin ve girêdayî, veguhestina fikr û felsefeya Rêber Apo ya ji hemû gel û mirovahiyê re dibe bersiva herî biwate ya ji bîranînên şehîdan re. Ji ber ku wan di her kêliya jiyana xwe de Rêber Apo bicih kiribûn. Wan, di rojên ku rûmeta mirovahiyê xistin bin lingan de, rêyek ku mirov dikare wek mirov azad, bi rûmeta xwe ve û bi hebûnên xwe ve jiyan bike, dîtin û di vê rê de jî eger pêwîst bike zanîn xwe feda bikin. Di vê wateyê de kesayetên wan, seknên wan pîroz in. Wan di zirûfên ku rejîma faşîst qirker bi hemû derfetên xwe ve êrîş kirî, derveyî teslîmiyetê ti jiyan nehatîn qebûl kirin, gelek rêxistinên çep-sosyalîst belav bûn, hatin tepisandin de, bi gotina Rêber Apo ve destpêkê parastina partiyê kirin. Gotin: "Em di vê partiyê de zaferê dibînin, em di Rêbertî de zaferê dibînin." Bi vê baweriyê ve hetanî dawî pêwîstiyên mîlîtaniya partiyê bicih anîn û girêdayî man. Serxistina berxwedana ku heval Mazlum Dogan û Ferhad Kurtayan dan destpêkirin, esas wergirtin. Rêber Apo got "Dema ku wan biryara vê çalakiya mezin dan, di pêngava destpêkê de gotin 'em dest ji PKK'ê' bernadin." Di pêngava duyemîn de jî bi gotina "Em ji Rêbertî jî, ji vê hevrêtiya mezin jî paşda pêngav na avêjin" ve, erkên xwe yên dîrokî bicih anîn. Dijmin, di wan zirûfên zehmet de di şexsê wan de PKK'yek ku ji cewherê xwe, sekna xwe ya şoreşger, sosyalîst û enternasyonalîst dûrketî, ber bi sînorên kapîtalîzmê ve hatî kaş kirin, dest ji tekoşîna hebûnê ya gelê ku ketî bin nîrê qirkirinê berdayî û PKK'yek nerm û ji polîtîkayên xwe yên qirêj re dibezîne hedef dikir. Dijmin ji bo ku wan armancên xwe yên teslîmiyetê ferz dikin pêk bîne, belkî jî hovitiyek ku mirovahî hetanî wê rojê şahidî jê re nekirî, pêk dianî. Li hember wê, bi gotina em serî hildidîn, em ê li ser navê gelê xwe, navê mirovahiyê teqez serkevîn ve tekoşîn bilind kirine. Ev seknek rûmet e. Pîvane, ferasete, berpirsyariye û exlaqê şoreşê ye. Li vê derê tenê li hember zilma ku dijmin bi destê Esad Oktay pêk dianî re berxwedan, tekoşîn pêşneketiye, li dijî xayînên ku xwe li ser xeta hevkarî-teslîmiyetê razandin jî tekoşînek mezin pêşketiye. Li dijî ketinê, bêrûmetiyê, tekoşînek mezin a îradeyê hatiye dayîn, rûmeta mirovahiyê parastine. Ji bo ku PKK'ê ber bi xetek teslîmiyetê ve bikişînin, ji cewher û rastiyên bingehîn dûr bixînin, wan kesayetên xayîn her cure feraseta serwer, jiyanek paşverû û koledar ferz kirine. Carek din di pêvajoyek ku ti derfet tuneyî, hetanî dawî zehmetî heyî de hêza xeta PKK'ê xwe îspat kiriye. Serkeftina timî ya PKK'ê; bi xwe spartina hêza cewherî ve, bi bawerî û esas girtina zehmetiyên her pêvajoyê ve û bi bikaranîna derfetên qasî serê derziyê ve derbas dibin.



Kadroyên rêber ên PKK'ê ji bo ku jiyanek azad û di oxira wê de fedakirinê jî li dijî jiyana ketî ya di wan zirûfên zehmet de bi tekoşîn û felsefeyên xwe yên jiyanê ve derbixînin holê her cure fedekarî kirine. Hetanî dawî bi dozê re girêdayî mane. Ji gelê Kurd re bûne doktrîna ku wê bi tarzê çawa ve di zirûfên Kurdistanê de tekoşîn bike. Bûne pêşengên rêya ku diçe 15'ê Tebaxê. Zelaltî û dirûstiya PKK'ê di rastiya wan hevrêyan de veşartiye. Heval Kemal Pîr, di zirûfên rojiya mirinê de gotiye "Em qasî ku di oxira wê de bimirîn ji jiyanê hez dikin." Dîsa gotiye "Me singek li dewleta tirk xist eger bikare derbixîne bila derbixîne." Li vê derê îfade kiriye ku xeta tekoşînê ya ku PKK'ê û Rêber Apo pêşxistî, wê teqez dewleta Tirk a ku xwe dispêre înkar, mêtîngeriyê têk bibe. Heval Kemal Pîr, timî bi bawerî û biryardariyek mezin ve meşiya ye. Ji bo ku bibe layiqê Partî û Rêber Apo, her cure fedekarî kir. Bi sekna xwe ya ku ti sînoran nasnake ve, di dijmin de jî bandor çêdikir. Û bi vî ruhê xwe yê azad û biwêrektiya xwe ve ji sosyalîst û ciwanên şoreşger re bibû çavkaniya îlhamê. Bi vê ve girêdayî ji bo ku bibî mîlîtanê/a tekoşîna azadiyê, divê ji jor û hetanî jêr di uslub, tarz û tempoyê de bibî Kemal Pîr.

Belkî rastiya şehîdên PKK'ê jî qasî ku bi ti dema dîrokê re neyê miqayese kirin mezine. Wateyek wê ya kûr heye. Heval M. Xeyrî Durmuş timî bi kamiltî û cidiyetek dilnizm û mezin ve erkên partiyê yên her demê girtiye serxwe û ji bo ku wan erkan pêk bîne jî hetanî dawiyê bi berpirsiyar nêzîk bûye. Di zirûfên rojiya mirinê de wiha gotiye: " Em li hember hewldanên rêxistinê bitaybet jî yên Rêbertiya partiyê kêm man û hinek jî deyndar ketîn", "Li ser kêliya gora min deyndar binivîsînin." Ji bo rêxistinê, ji bo gel her tiştê xwe dide, lê li gel vê jî dibêje ez deyndar im. Sekneke ku ji serî hetanî binî partiyê, Rêbertî temsîl dike. Kesayetên wan ên ku bi zaferê re bûne yekpare timî bûne rênîşan. Em ji ber wê dibêjin ev kesayet wê heta hetayî neyên ji bîr kirin. Heval Akîf Yilmaz di zirûfên zîndana ku zilm serwer bû de gotiye "Bila berxwedanek mezin çêbibe ez ê ji bo vî gelî û hevalên xwe canê xwe feda bikim." Timî zanîn bibin gelparêz. Bêfikar timî xizmeta gel û hevalan esas girtine. Mêrxasî û mezintî di vê derê de dîtin. Di vê wateyê de nirx tevî nirxan kirin. Heval Elî Çîçek hîna di temenê ciwantiyê de zehmetiyên tekoşînê hildaye, ji baweriya xwe ya ji serkeftinê re pêngavek jî ber bi paş ve neavêtiye. Êşên ku gel jiyan dike vegerandiye hêrsek mezin a şoreşgerî, bi kelecan û çoşa ciwanan ve berxwedana xwe mezin kiriye.

Dema ku Rêber Apo li hember wan şehadetan berpirsyariya pêwîst tîne ziman wiha dibêje " Li ser bingehê rast ji vê wesiyet, ji vê bîranînê re bersiv dayîn nedayîn, di derdora wê de bahoz rakirin ne rakirin, qasî şîrove kirina wê ya rast pêkanîn ne pêkanîn, di tehlîla dawî de girêdayîn bûna zirûfên zaferê ya ku bûye yekane şertê wesiyetê, dayîn û ne dayîna bersiva ku vêya pêkan dike; bi afirandin û ne afirandina derfet, rêxistin û çek ve girêdayî ye. Ew rastiyên bingehîn in, aliyê ku îstîqamet dide polîtîk û hemû taktîkan ev cehwere. Ji bo vê jî eger pêwîst bike wê devê xwe bêkêmasî bikî, dest-lingên xwe bêkêmasî eyar bikî, dilê xwe bihêz bikî, çavên xwe xurt bikî, wê di asta fermandariyê de bimeşî, wê behra te ya polîtîk hebe, zirûf û qad çi bixwazin wê vêya bikî, wê ji vêya re bêjî; ev îfadeya pêkhatî ya herî şênber û rast e, girêdayî wê dîrokî bimînî, beşdar bibî, bipejirînî û bi wê dîrokê ve ber bi pêşerojê ve bimeşî. Ji min re wek pir eşkere ev wesiyet hat hiştin. Ez îro wek hinek cesaret, xwe bawer biryardariya vê berpirsyariyê nîşan didim.

Derveyî vê zimanek din, dilek din, tarzek din wek yekpare di min de derbas nabe." Wekî ku Rêber Apo destnîşan kirî hemû hebûna PKK'ê, ew e ku girêdayî vê kêlî û vê wesiyetê bibe û pêwîstiyên wê bicih bîne. Derveyî vê ti girêdayîn û nêzîkbûyîn rast nîn in.

## Xeta berxwedana 14'ê Tîrmehê timî bi gelê Kurd daye qezenç kirin

Dema ku em di rojek wiha de û wek jiyankerên vê roja berxwedanê, hê zêde bûn partî, li gorî esasên xetê mîlîtaniya ku dem pêşbînî dike pêşxist, em teqez pêşerojan qezenç bikin. Xeta berxwedana 14'ê Tîrmehê timî bi gelê Kurd daye qezenç kirin. Neteweya demokratîk, ziman, çand, hunera Kurd li ser vî bingehê pêşketiye. Rastiya gelek ku bûye fedaî li ser vî ruhî hatiye afirandin. Ev dîrok bi dehan caran bûye şahidê vê. Eger hêzên mêtînger gelek caran li hember mîlîtaniya PKK'ê têk çûbin, sibê jî mehkumê têkçûnê ne. Di vê wateyê de rastî, feraset û felsefeya PKK'ê, ruh û heqîqeta vê pêvajoyê ye jî. Ji vê wêdatir tineye. Em qasî ku bi PKK'ê re bimeşin dikarin pêşketin bidestbixîn. Tekoşîn li Kurdistanê wiha pêşket, wiha berdewam dike. Vejîn, berxwedan wiha pêşket. Tekoşîna azadiyê ya gelên Rojhilata Navîn bi PKK'ê re hê zêde hêz qezenç kir. Îro mirovahiya cîhanê bi fikrên Rêber Apo re hê zêde ronî dibin, hişmendî qezenç dikin, jiyana xwe ya civakî li gorî vê rêkûpêk dikin.

Di salvegera 42'emîn a derketina mezin a fedaî ya 14'ê Tîrmehê de, Rêber Apo di zirûfên herî giran a tecrîd û îşkenceya Îmraliyê de berxwedana herî mezin pêşxistiye. Li ser vê bingehê wek partî, wek gerîla, wek gel li hember her cure êrîşên dijmin bi berxwedanek biheybet ve bersiv hatiye dayîn, dijmin hatiye asta rûxandinê. Piştevaniyek ku tifaqa faşîst a pêkhatî xwe bispêrê, nemaye. Dîsa em di pêvajoyek ku tekoşîna azadî û demokrasiyê ya gelan bilind dibe, pergala kapîtalîst jî li seranserê cîhanê hê zêde teng dibe, dirûxe de ne.

Wek tevger îdîaya me pir bihêze, em pir biryarîn ku em vê sedsalê di serî de ji gelê Kurd re, bikin sedsala hemû gelan û em ji her demê hê zêdetir nêzîkî serkeftinê ne.

Dîrok li ser vê bingehê carek din li bendê ye ku erkên demê bi ruhê fedaî ya Mazluman, Kemalan, Xeyriyan, Sarayan, Zîlanan, Rojhatan, Erdalan bên bicih anîn. Em carek din soz bidîn mirovahiyê ku em ê bi vê ferasetê ve giranî bidîn erkên demê û divêtiyên sozên xwe bicih bînin.

***Bijî Rêber Apo***
***Bijî ruhê Fedaî ya 14'ê Tîrmehê***
***Bimre faşîzm û her cure paşverûtî***